T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

**Cevdet KARAMAN**

# EḤMED ḤÎLMÎ EL QOẋÎ VE REHBERÊ SANÎ ŞERHAEQÎDA EḤMEDÊ XANÎ İSİMLİ ESERİ

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ-2017**

**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Cevdet KARAMAN**

# EḤMED ḤÎLMÎ EL QOẊÎ VE REHBERÊ SANÎ ŞERHA EQÎDA EḤMEDÊ XANÎ İSİMLİ ESERİ

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**

**Doç. Dr. Harun POLAT**

**MUŞ – 2017**

**K.T.**
**ZANÎNGEHA MUŞ ALPARSLAN**
**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Cevdet KARAMAN**

# EḤMED ḤÎLMÎ EL QOẊÎ Û BERHEMA WÎ YA BI NAVÊ REHBERÊ SANÎ ŞERHA EQÎDA EHMEDÊ XANÎ

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**

**Doç. Dr. Harun POLAT**

**MUŞ-2017**

**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Eḥmed Ḥîlmî El Qoẋî Û Berhema Wî Ya Bı Navê Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☐ Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim/Raporum sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

☒ Tezimin/Raporumun üç yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

**30.03.2017**

**Cevdet KARAMAN**

## TEZ KABUL TUTANAĞI

## SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Harun Polat danışmanlığında, Cevdet KARAMAN tarafından hazırlanan bu çalışma 15/02/2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili Ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| **Başkan** | : | Doç. Dr. Harun POLAT | İmza | : | ……………………… |
| **Jüri Üyesi** | : | Yrd. Doç. Dr. Zahir ERTEKİN | İmza | : | ……………………… |
| **Jüri Üyesi** | : | Yrd. Doç. Dr. Ayhan TEK | İmza | : | ……………………… |

## NAVEROK

**NAVEROK** ........ **I**

**KURTE** ........ **VI**

**ÖZET** ........ **VII**

**ABSTRACT** ........ **VIII**

**ALFABEYA TRANSKRÎBSÎYONÊ** ........ **IX**

**KURTEBÊJE** ........ **XI**

**PÊŞGOTIN** ........ **XII**

**DESTPÊK** ........ **1**

**BEŞA YEKEMÎN**

**EḤMED ḤÎLMÎ, JIYAN KESAYET Û BERHEMÊN WÎ**

**1.1. JIYANA EḤMED ḤÎLMÎ EL-QOẋÎ** ........ 7

1.1.1. Neseba Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ........ 7

1.1.2. Xwendin û Tehsîla Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî ........ 8

1.1.3. Zewaca Eḥmed Ḥîmî El-Qoẋî ........ 10

1.1.4. Melatî û Muderîstîya Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî ........ 11

1.1.5. Terzê Mamostetîya Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî ........ 12

1.1.6. Meşrebê ‘Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî ........ 12

1.1.7. Mezhebê ‘Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî ........ 14

1.1.8. Xettadîya Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî ........ 15

1.1.9. Helbestvanîya Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî ........ 18

1.1.10. Exlaqê Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî ........ 19

1.1.11. Wefata Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî ........ 20

**1.2. BERHEMÊN EḤMED ḤÎLMÎ EL-QOẋÎ** ........ 20

1.2.1. Berhemên Te’lîfê Taybet ........ 21

1.2.1.1. Tefsîra Ḥîlmî ........ 22

1.2.1.2. Emelê Şev u Rojê ....... 22
1.2.1.3. Eqîda Ḥîlmî ....... 23
1.2.1.4. El ‘Ewamîl ul- Ḥîlmî ye Me‘e Ḥewaşîha ....... 23
1.2.1.5. Ez- Zuruf u we l-Cumel ....... 23
1.2.1.6. Rîsalet ul-Ḥîlmîye Fi l-Qewa‘îd ul-Wed‘îye ....... 23
1.2.1.7. Rîsala Mentiqê ....... 24
1.2.1.8. Rîsala Munazarê ....... 24
1.2.1.9. Rîsaletun Fî l-İstî‘are (Rîsala İstî‘arê) ....... 24
1.2.1.10. Sîlsîletu Sadatin-Nexşebendîyye ....... 25
1.2.2. Berhemên Te’lîfê Wek Şerh ....... 25
1.2.2.1. Hedîyet ul-Ḥebîb ....... 25
1.2.2.2. Rehberê ‘Ewam Şerha Nehc ul-Enam ....... 26
1.2.2.3. Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî ....... 26
1.2.2.4. Gulzara Hemukan Şerha Nûbîhara Biçûkan ....... 27
1.2.2.5. Şerḥa Mewlûda Bateyî ....... 27
1.2.2.6. Şerḥa Mem û Zînê ....... 28
1.2.2.7. Zurûf Digel Şerha Xwe Zêrîn Ḥuruf ....... 29
1.2.2.8. El-‘Ewamîlul-Curcanîye Me‘e Şerḥîhî el-Mesaîlul-Mercanîye ....... 29
1.2.2.9. Terkîba Mele Yûnûs Me‘e Ḥaşîyetî et-Et Tertîb’ul Munîs ....... 30
1.2.3. Berhemên Ku Haşiye Li Wan Hatine Zêdekirin ....... 30
1.2.3.1. Ḥewaşî Şerh îl-Muẋnî (Haşîyeyên Şerḥ ul-Muxnîyê) ....... 30
1.2.3.2. Ḥewaşî Şuzûr uz-Zeheb (Haşîyeyên metnê Şuzûr uz-Zehebê) ....... 30
1.2.3.3. Sirr ul-Meḥşer ....... 31
1.2.3.4. Metnê Cezerî û Te’lîqatên Wê ....... 31
1.2.3.5. Lamiyetu İbnîl-Werdî ....... 31
1.2.3.6. Qewa‘îd ul-İ’rab û Te’lîqatên Wê ....... 32

1.2.3.7. Elfîyetu İbnî Malîk ..... 32
1.2.3.8. Qitr en-Neda We Bell us-Seda û Te’lîqatên Wê ..... 32
1.2.4. Berhemên Ku Ji Kesên Muxtelîf Hatine Civandin ..... 33
1.2.4.1. Dîwana Cami’ (Dîwancivîn) ..... 33
1.2.4.2. El-Kelîmat ul-Qudsîye lî s-Sadat en-Neqşebendîye ..... 33
1.2.5. Berhemên Ku Ji Nû Ve Hatine Îstînsaxkirin ..... 34
1.2.5.1. Rewdetun-Ne‘îm ..... 34
1.2.5.2. Se’dullah Seẋîr Me‘e Ḥaşîyet’ul-Gerewî ..... 34
1.2.5.3. El kafîyet ul-Kubra Fin-Neḥwî ..... 34
1.2.5.4. Fethul-Celîl ..... 35
1.2.5.5. Dîwana Melayê Cezerî ..... 35
**1.3. TERZÊ NIVÎSKARÎYA EḤMED ḤÎLMÎ EL-QOẊÎ ..... 35**

**BEŞA DUYEMÎN**

**TRANSKRÎBSÎYONA REHBERÊ SANÎ**

**2.1. DI DERBARÊ REHBERÊ SANÎ DE ..... 37**
2.1.1. Bi Kurtî Danasîna Rehberê Sanî ..... 37
2.1.2. Di Rehberê Sanî Şerhea Eqîda Ehmedê Xanî de Uslûba Şerhê ..... 39
2.1.3. Zimanê Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Eḥmedê Xanî ..... 39
2.1.4. Di Rehberê Sanî De Bikaranîna Çavkanîyan ..... 42
**2.2. TRANSKRÎBSÎYONA METNÊ REHBERÊ SANÎ ..... 44**
2.2.1. Sifetên Xwedê Te‘ala ..... 45
2.2.2. Nubuweta Muḥemmed ..... 47
2.2.2.1. Xatemun-Nebîyyîn ..... 49
2.2.2.2. Bûraq ..... 52
2.2.2.3. Ḥeywanên Ku Wê Herne Cennetê ..... 52
2.2.2.4. Îsra Û Mî’rac ..... 55

2.2.2.5. Qabê Qewseyn ....... 56
2.2.2.6. Ji Teref Resûlûllah Ve Dîtina Xudê Te‘ala ....... 58
2.2.2.7. Ru’yet Li Ku Derê Çêbîye ....... 64
2.2.2.8. Di Derḥeqê Mi’racê De Ji Ustad Bedi‘ûzzeman ....... 65
2.2.3. Sifetê Seb‘e (Sibûtî) ....... 70
2.2.4. Xulf Ul-We’d Û Xulf Ul-We‘îyd ....... 74
2.2.4.1. Teklifa Ma La Yutaq ....... 77
2.2.4.1.1. Muḥalê Zatî ....... 78
2.2.4.1.2. Muḥalê ‘adî ....... 78
2.2.4.1.3. Muḥalê ‘aridî ....... 78
2.2.5. Tiştek Li Ser Xudê Te‘ala Wacib Tune ....... 81
2.2.6. İrade Û Riza Xudê Te‘ala ....... 83
2.2.7. Cuzi’ Îxtiyar ....... 87
2.2.8. İman Besîte Yan Murekeb e ....... 90
2.2.9. Mum’înê Gunehkar Di Cehennemê De Ebedî Namînin ....... 92
2.2.10. Tobe ....... 94
2.2.11. Ḥalê Kesê Cahil ....... 95
2.2.12. Ḥusn Û Qebḥ ....... 97
2.2.13. İmana Teqlîdî ....... 98
2.2.14. Tobe Û İmana Di Weqtê Sekeratê De ....... 100
2.2.15. Pêyẋemberî ....... 102
2.2.15.1. Kerametê Ewliya ....... 103
2.2.16. Dîtina Xudê Te‘ala Di Cennetê De ....... 106
2.2.17. Tenasux Û Ḥulûl ....... 108
2.2.18. Cuz Ê La Yetecezî ....... 110
2.2.19. Beḥsa Loqmanê Ḥekîm Û İskender ....... 115

2.2.20. Melaîket Û Cin Û Şeytan ........ 118
2.2.21. Rizq ........ 121
2.2.22. Tefadula Esḥaban ........ 121
2.2.22.1. Neseb Û Jiyana Her Çar Xelifeyan ........ 126
2.2.23. Şefa‘Et ........ 127
2.2.24. Tesira Du‘ayan ........ 128
2.2.25. Çuna Cennetê Bi Fedla Xudê Te‘ala ........ 131
2.2.25.1. Cennet Û Cehennem Vêga Hene ........ 133
2.2.25.2. Cennet Û Cehennem Vêga Li Ku Der in ........ 134
2.2.26. Ḥîsabê ‘Emelan ........ 137
2.2.27. Sual Û ‘Ezabê Qebrê ........ 138
2.2.28. Mêzina Xêr Û Gunehan ........ 141
2.2.29. Sirat ........ 145
2.2.30. Xatime Û Munacat ........ 147
**2.3. METNÊ EQÎDA ŞÊXÊ XANÎ ........ 148**
**ENCAM ........ 151**
**ÇAVKANÎ ........ 152**
**PÊVEK 1. Ferhenga Rehberê Sanî ........ 154**
**PÊVEK 2. Hevpeyivîna Bi ‘Ebdussamed Yalçin re ........ 164**
**PÊVEK 3. Hevpeyivîna Bi Mele Celal Bozdaş Re ........ 169**
**PÊVEK 4. Ji Metnê Orjînalê Rehberê Sanî Serrûpel, Rûpela Pêşîn Û Ya Dawî.. 178**
**PÊVEK 5. Wêneyek Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ........ 181**
**JÎNENÎGARÎ ........ 182**
**ÖZGEÇMİŞ ........ 183**

# KURTE

## TEZA MASTIRÊ

## EḤMED ḤÎLMÎ EL-QOẊÎ Û BERHEMA WÎ YA BI NAVÊ REHBERÊ SANÎ ŞERHA EQÎDA EḤMEDÊ XANÎ

**KARAMAN, Cevdet**

**Şêwirmend: Doç. Dr. Harun POLAT**

**2017, 196 Rûpel**

Ev xebata me ji du beşa pêk tê. Di serî de teza me ji hela armanc, naverok, ehemmiyet û çavkanîyan ve hatiye nirxandin. Di beşa yekemin de kurtejîna Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî û danasîna berhemên wî niştecîh in. Di teza me de mijara me ya eslî beşa duyemîn e. Me di vê beşê de, berhema Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a bi navê *"Rehebrê Sanî Şerha Eqîda Eḥemdê Xanî"* ji Tîpên 'Erebî bi bal Tîpên Latînî ve veguherand û ferhengokek lê zêde kir da ku nifşê nû ê ku ji xwendina Tîpên 'Erebî meḥrûm in karibin jê îstîfade bikin.

Em hêvîdarin dê di pêşerojê ev xebata me ji bo nifşê nû bibe çavkanîyek sudmend û pira pêywendîya do û îro.

**Peyvên Sereke:** Eḥmed Ḥîlmî, Eḥmedê Xanî, Melayên Kurd, Eqîde, Rehberê Sanî, Şîî, Ehlî Sunnet, Mutezîle, Harîcî

# ÖZET

## YÜKSEK LİSANS TEZİ

## EḤMED ẊİLMİ EL-QOẊİ VE REHBERÊ SANİ ŞERHA EQÎDA EḤMEDÊ XANÎ İSİMLİ ESERİ

**Cevdet KARAMAN**

**Tez danışmanı: Doç. Dr. Harun POLAT**

**2017, 196 sayfa**

Bu çalışma iki bölümden oluşmaktadır. Girişte tezin içerik, önem ve kaynakçsından bahsedilmiştir. Birinci bölümde Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî'nin hayatı ve eserlerî anlatılmıştır. Tezin ana omurgasını teşkil eden ikinci bölümde de Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî'nin arap alfabesiyle yazdığı *"Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî"* isimli eseri latinize edildikten sonra bir sözlükçe eklenerek Arap Alfabesiyle okuyamıyan yeni nesil okuyucunun istifadesine sunulmuştur.

Bu çalışmamızın Kürt Dili ile ilgilenen gelecek kuşaklar için faydalı bir çalışma olması en önemli dilek ve temennimizdir.

**Anahtar Kelîmeler:** Eḥmed Ḥîlmî, Eḥmedê Xanî, Eqîde, Rehberê Sanî, Şii, Ehli Sunnet, Mutezile, Harici,

**ABSTRACT**

**MASTER’S THESIS**

**EḤMED HİLMİ EL-QOXİ AND REHBERÊ SANÎ ŞERHA EQÎDA EHMEDÊ XANÎ NAMED WORK**

**Cevdet KARAMAN**

**Advisor: Asisstant Professor Dr. Harun Polat**

**2017, Page: 196**

This study is comprised of two chapters. In the Introduction part, I will discuss the content, significance and bibliography of the thesis. In the first chapter, I will talk about the life and the works of Ḥîlmî el-Qoẋî. In the second chapter, which is the basis of the work, I will transcribe the study of Qoxî named “Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî” written in Arabic script and then I will attach a glossary for the readers who are not able to read Arabic.

I hope the study will be helpful for the posterity.

**Key Words**: Eḥmed Ḥîlmî, Eḥmedê Xanî, Eqîde, Rehberê Sanî, Shiah, Followers of Sunnah, Mu’tazila, Khawarij

## ALFABEYA TRANSKRÎBSÎYONÊ

Di zimanê Kurdî de jimara deng û ḥerfan bi nîqaş be jî nuha di nav Kurdên Surî û Turkiyê de di warê alfabeya Latînî de alfabeya Celadet Bedirxan (1893-1951) wek alfabeyek sitandard hatiye qebûlkirin. Lê çend kêmasîyên vê alfabê hene ku dengên wek dengê "ح, ع , غ" di xwe de naḥewîne. Lê ev deng di zimanê Kurdî de dengên 'eslî ne. Ji lew me çareserîya vê pirsgirêkê a di transcrîbsîyonê de di aposrof û sembolan de dît. Ji bil vê em di tîpguhêzîya *"Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Eḥmedê Xanî"* de li ser şopa Celadet Bedirxan meşiyan û me alfaba wî bikaranî. Di latînîzekirinê de me ḥerfên 'Erebî û Latînî wihareng hevber kir:

| **Jimar** | **Herfê 'Erebî** | **Navê ḥerfê** | **Muqabilê Di Latînîzekirinê de** |
|---|---|---|---|
| **1** | آ | **Elîf** | **a** |
| **2** | ء ، ا | **Elîf** | **a, e, î, û** |
| **3** | ب | **Be** | **b** |
| **4** | پ | **Pe** | **p** |
| **5** | ت | **Te** | **t** |
| **6** | ث | **Sê** | **s** |
| **7** | ج | **Cîm** | **c** |
| **8** | چ | **Çe** | **ç** |
| **9** | ح | **ḥê** | **ḥ** |
| **10** | خ | **Xê** | **X** |
| **11** | د | **Dal** | **d** |
| **12** | ذ | **Zal** | **z** |
| **13** | ر | **Rê** | **r** |

| | | | |
|---|---|---|---|
| **14** | ز | **Zê** | **z** |
| **15** | ژ | **Je** | **j** |
| **16** | س | **Sîn** | **s** |
| **17** | ش | **Şîn** | **ş** |
| **18** | ص | **Sad** | **s** |
| **19** | ض | **Dat** | **d** |
| **20** | ط | **Tê** | **t** |
| **21** | ظ | **Zê** | **z** |
| **22** | ع | **‘Eyn** | **‘a ‘e, ‘î, ‘û** |
| **23** | غ | **Ẋeyn** | **ẋ** |
| **24** | ف | **Fê** | **f** |
| **25** | ق | **Qaf** | **q** |
| **26** | ک | **Kaf** | **k** |
| **27** | گ | **Gaf** | **g** |
| **28** | ل | **Lam** | **l** |
| **29** | م | **Mîm** | **m** |
| **30** | ن | **Nûn** | **n** |
| **31** | و | **Waw** | **w, u, û, o** |
| **32** | ه،ه | **Hê** | **h** |
| **33** | ی | **Yê** | **y, i, î** |

**KURTEBÊJE**

b. : Bersîv
b.n.r. : Binhêre
c. : Cevdet
h.b. : Heman Berhem
h.b.m. : Hevpeyivîna bi maîlê
h.b.t. : Hevpeyivîna bi telefonê
h.k. : Heman kovar
h.m. : Heman Meqale
h.w.d. : Herwekî din
j. : Jimar
jd. : Jidayîkbûn
mr. : Mirin
p : Pirs
r. : Rûpel
s. : Sûal

## PÊŞGOTIN

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî (1942-1996) yek ji wan ‘aliman e ku di Medresên Kurdistanê de li gorî perwerdehîya klasika medresa hatiye perwerdekirin û gelek berhemên fêdedarê wek te’lîf, şerh û xet li pêy hiştiye. Gelek berhemên wî di medresê Kurdistanê de bûne kitaben rêzê. *“Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî”* jî yek ji wan berheman e ku wek şerha *Eqîda Eḥmedê Xanî* (1650-1709) ji teref Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ve bi Xetê ‘Erebî wek pexşan hatiye nivîsandin û di Medresê Kurdistanê de wek kitêba dersê hatiye pejirandin.

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di vê berhema xwe de bi berfirehî li ser mijarên eqîdê sekiniye û lêkolinek berfireh kiriye. Dema em li vê berhemê mêze dikin, em dibînin ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di te’lîfa vê berhemê de bi terzek rexnegir ji berhemên kesên wek Se’ded-Dînê Teftezanî (1322-2390), Cahiz (767-7779), ‘İz bîn ‘Ebdusselam (jd.1181), Kuşeyrî (986-1074), Celaleddîn ed-Dewwanî (1502), İbnî Kesîr (1301-1373), Fexereddîn er-Razî (1149-1209), Qurtûbî (1214-1273), İmam Ebû Ḥenîfe (699-767), İmamê Ẋezalî (1058-1111), Se‘îd Nûrsî (1877-1960), ‘Elîyê Qarî (mr. 1605), Qadî ‘Eyad (1083-1149), Ḥesen ul-Besrî (jd. 642), İmamê Eş‘arî (873-941), Seyîd Şerîf Curcanî (1339-1414), Ebûbekir el-Baqilanî (mr. 1013), Ebû Mensûr el-Maturîdî (mr. 9449 û… hwd îstîfade kiriye. Lê mêla Eḥmed Ḥilmî el- Qoẋî bi giranî li ser tercîha Eḥmedê Xanî maye. Ji xwe bingeha vê berhemê li ser xîmê *Eqîda Eḥmedê Xanî* hatiye Damezrandin. Kesên ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ji berhemên wan sûd wergrtiye di warê İlmê Kelam de wek çavkanîyên klasîk û sereke tên zanîn.

Ji ber ku li welatê me forma perwerdehîyê li ser xîmê tîpên Latînî hatiye damezarndin, îstifada nifşên nû a ji vê berhemê ne mimkûn bû. Lewma me ḥewl da ku em di teza xwe ya lisansa bilin de li ser latînîzekirina vê berhemê bixebitin da ku nifşên nû karibin jê îstîfade bikin. Bê guman weke her xebatên beşerî ev xebata han jî ji xeletîyan xalî nîne. Digel vê ḥeta ji me hat me xwest ku em vê berhemê bê kêmasî latînîze bikin da ku nifşê nû bi hêsanî jê sudê werbigrin.

Di gel ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî li Kurdistana Bakûr nexasim li Amedê kesek naskirî û navdare jî, wek gelek ‘alim û zanayên Kurd çavkanîyên di derheqê wî de ji bil çend rûpelên *Kovara Kelha Amed* hema hema tunebûn. Lewra me di warê Kurtejîna

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî de bi giranî ji agahîyên lawên wî û çend hevalên wî îstîfade kir. Em ji wan re muteşekkîr in.

'Ebdussamed Yalçin digel meşẋulîyeta xwe, teza me ji serî ḥeta binî xwend û îbareyên 'Erebî bo me wergerand mala wî ava. Doç. Dr. Harûn Polat di warê amadekirina tezê de şêwirmendîya me kir. Bo keda wî ya li ser me em jê re sipasdar in. Ji Zanîngeha Bingolê Mehmet Tahir Gündüz di warê wergerandina îbareyên hedîsa de alîkarîya me kir mala wî ava. Bo şîretên wî yê hêja em ji Prof. Dr. Hasan Çiftçi re sipasdar in. Hevalê hêja Cihad Bakirhan û İbrahim Gözeten di xwendin û tesḥîha dawî de gelek alîkarîya min kirin Xwedê Te'ala ji wan razî be mala wan ava.

Min di hengama amadekirina tezê de serê malbata xwe gelek êşand bo sebr û teḥemmûla wê jê re muteşekkîr im. Roniya çavê min keça min Şuheda û lawê min Hasan Huseyîn di hengama amadekirina tezê de moralek baş dan min ji wan re jî muteşekkîr im.

**MUŞ-2017** **Cevdet KARAMAN**

## DESTPÊK

### Ehemmîyeta Ziman Û Giringiya Nîvîsandinê

Yek ji nasnameya milletan a herî berbiçav ziman û çanda wan e. Her qewm û milet bi zar û ziman û çand û bîr û bawerîyên xwe ji qewm û milletên dî vediqete. Gelê Kurd jî ew gele ku bi zimanê Kurdî diştexile û bi vî zimanî ji milletên din vediqete.

Domdarî û jîndariya zimanan jî bi nivîsandinê ve ‘eleqedar e. Nivîs ji bo parastina ziman wek mêjîyek nemir û arşîvek e. Goristana dîrokê îro ji gelek zimanên mirî dagirtiye ku ji nivîsê meḥrûm bûn.

Em dikarin bejin ku zimanê Kurdî digel zihnê gelê Kurd bi qelema zana û ‘ulemaên Kurd ji mirinê xelas bûye.

### Medrese

Peyva “Medresê” di eslê xwe de kelîmekî ‘Erebî ye. Mana wê ew cî ye ku tê de ders tê xwendin.[1] Ev peyv bingeha xwe ji fi’la ‘Erebî a “de-ra-se” werdigre.

Medrese ew cî ye ku şagird tê de dixwînin û fêrî ‘ilm nexasim ‘ilmê olî dibin. Mamosteyên vê muesesê wek muderrrîs tên binavkirin.[2]

Di tarîxa İslamê de destpêka Medresê dighê dewra Esḥabê Sufe ku sehabîyên bijare li ber destê ḥezretî pêxember di mescîda de bi ‘ilmê ve meşxûl bûne. Lê bi awayek fermî û metodolojik destpêka Medreseyan dighê Medreseyên Nîzamîye ku ji teref Nîzzamul-Mulk (1018-1092) ve li deverê muxtelîf hat damezrandin. Berya wê li deverên muxtelîf bi navê “Medrese” gelek sazî hebin jî Medresa Nîzamîye di vî warî de “Medresa Yekemîn” a bi rêk û pêk e. Medresa Nîzamîye a yekemîn li Bexdayê di sala (1066-1067)ê miladî de hat damezrandin. Xususîyeta vê medrese ew e ku hem ‘ilmê îslamî hem jî ‘ilmê fennî ê wek tibb, astronomi, matematik û…hwd di vê medresê de hatine xwendin. Ev medrese di bin baskê dewletê de bi awayek fermî û finansa weqfa di nav medreseyan de teşkîlatek birbiçav û balkêş e. Ẋezalî û İbnî Sîna daxil gelek ‘alim û zanayên meşhur pisporên ‘ilmê muxtelîf ji vê medresê rabûn.

---

[1] Bayram Kayhan, “Klasik Medreselerin Kurumsal Yapısı”, (**Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezî**) Süleyman Demirel Üniversitesi, SBE, 2014, r. 12.

[2] Ziya Yazıcı, “Medrese” **Şamîl İslam Ansiklopedisi,** Cilt 8, Şamil Yaınevi, İstanbul, 2000, r. 144.

Dîsa di warê ‘ilmê de Medresa El-Ezher û Dar ul-Ḥîkme jî du medreseyên muhîm in ku ji teref Fatimîyan ve li Misrê hatine damezrandin. Piştî van medresa di warê damezrandina medresa de keda herî mezin a Eyyûbîya ye ku li deverên muxtelîf gelek medrese ava kirine. Dewleta Osmanî jî ev kevneşop ji Selçûkîyan girt û perwerdehîya di medresê de li ser şopa Selçûkîyan domand.[3]

Bi rastî medreseyan heta dawîya esra 18. ji ‘ilmê re xizmet kirin. Gelek kesên wek Îmam Ẋezalî, Fexreddîn er-Razî, Îbnî Sîna, Farabî (870-951), Îbnî Xeldûn (1332-1406), El-Bîrûnî (973-1048), İbnî Ruşd (1126-11989) û… hwd ji medreseyên muslumana rabûn û di warê ‘ilmên muxtelîf de ji îslam û însanîyetê re xizmet kirin. Lê bi borina demê re medresa metoda te’lîma xwe bi bal te‘essûbê ve vegerandin.

Dawîya sedsala 18. bo medresa dema fetretê ye. Ji xwe piştî damezrandina Komara Cumhûrîyetê, li Turkiyê xwendina di medresa de bi awayek fermî hat qedexekirin. Lê medresa, nexasim Medreseyên Kurdistanê di şert û mercên û dijwar û naçarîyê de bit jî bi awayek ẋeyrîresmî te’lîma xwe ta nuha domandine.

**Medreseyên Kurdistanê**

Piştî ku gelê Kurd Îslam pejirandiye bi ‘ilmê Îslamê re jî hevnas bûye, Weke gelek gelên Musluman xwendin di nav Kurdan de jî bi saya Îslamê bi pêş ve çû. Lewra destpêka dînê Îslam ji emrê “îqra[4]” ye.

Destpêka Medreseyên Kurdistanê gelek kevin bit jî em dikarin bejin ku Medreseyên Kurdistanê bi awayeke têkuz Berdewama Medreseyên Nîzamîye û Medreseyên Eyyûbî ne. Lewra hem Selçûkîyan hem jî Eyyûbîyan ehemmîyetek gelek giring dane xwendin û medresê.[5]

Ji destpêkê bigre ta dawîya dewra Osmanîyan hema hema di her demî de Medresyên Kurdistanê di warê ‘ilmê de xizmeta xwe bikar anîne. Di vî warî de delîla herî qewîn ew e ku li çar terefê Kurdistanê nuha jî xirbê Medreseyên dewra Selçûkî, Eyyûbî, Merwanî û Osmanîya tên xwîyakirin. Li vir em dikarin Medresyên Kurda li ser sê şaxa dabeş bikin.

---

[3] Kayhan, **h.b.,** r. 12-19.

[4] Wate: Bixwîne

[5] Kayhan **h.b.,** r. 16.

**Medreseyên Mîra**

Li Kurdistanê dewra perwerdehîyê a zêrîn ji dewra Emewîyan dest pê dike heta sedsala 18.a miladî didome. Di navbera vî zemanî de li Kurdistanê nexasim piştî peymana Amasya a di navbera mîrên Kurd û Osmanîyan de xwendin bi pêş ve çûye. Gelek zanayên wek İbnî Ezraqê Farqînî (1117-?), İsmaîl Ebû 'İzz (1136-1206), Mewlana İdrîsê Bedlîsî (1452-1520), Melayê Cezerî (1567-1640), Eḥmedê Xanî û…hwd di dewra mîrên Kurda de rabûne û hem ji gelê xwe re hem jî însanîyetê re xizmet kirine.[6]

Ji Bedlîsê "Medresa Xetîbîye, Hecîbegîye, Şukrîye, Îxlasîye, Îdrîsîye, Exllaqîye," ji Amedîyê "Medresa Amedîye, Medresa Mayê, Medresa Nû, Medresa Sindiyan" ji Miksê "Medresa Mîr Ḥesenê Welîya," Medresa Zeynel Begê Şêrwanê Medrsa Şaqulîbegê Derzîn, gelek Medreseyên Bazid, ji Cizîra Botan Medresa Sor di vê beşe de ne.[7]

**Medreseyên Şêxa**

Rastîyek Kurda jî ew e ku Kurd gelek di bin tesîra ehlê tesewûfê de mane. Li Kurdistanê nexasim piştî Mewlana Xalidê Şehrezorî (1779-1820) ji teref şêxan ve gelek medrese hatine avakirin. Di van medresa de hem te'lîma tesewûfê hem jî te'lîma medresê hatiye dîtin.

Medreseyên Ekola Seyîd Taha el-Hekarî (mr. 1853), Norşîn, Oxîn, Zoqeyd, Xizna, Fersaf, Hîzan, Extepe, Tîllo, Palo, Oolhîsar û…hwd di vê beşê de ne.[8]

**Medreseyên Gunda**

Ev medrese di nav medreseyên Kurda de medresyên herî naçar in. Nexasim piştî qedexebûna xwendina di medresan de li gundên muxtelîf ji teref gundî û melayên gundan ve bi mizgeftan ve hatine vekirin.[9] Van medresa di şert û mercên zor û zehmet de bi awayek ẋeyrîresmî di warê perwerdehîyê de ji gelê Kurd re xizmet kirine. Gelek

---

[6] Şakir Epözdemîr, **Medreseyên Kurdistanê Di Dewra Mîran û Neqşebendîyan De**, İstanbul: Weşenxaneya Nûbîhar, 2015, r. 19-25.

[7] Epözdemîr, **h.b.,** r. 42-158.

[8] Epözdemir, **h.b.,** r. 102-158.

[9] Zeynelabidîn Zinar, **Xwendina Medresê,** Stocholm: Weşnxaneya Pencînar, 1993, r. 24-27.

berhemên kevnarê Kurdî bi destxeta mela û feqîyên van medresa gîhane berdestê nifşê nû.

**Di Nav Melayên Kurd De Taybetiya Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî**

Ehmed Ḥîlmî el-Qoẋî melakî ji melayên Kurd e. Di medresê Kurdistanê de xwendiye. Bingeha perwerdehîya wî hem ji medresê gundan hem ji medresê şêxan tê. Pewerdehîya wî perwerdehîya klasîka medresê ye. Tiştê ku Ehmed Ḥîlmî ji hevçaxên wî vediqetîne ewe ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî digel muderrîstîya xwe gelek berhem te'lîf kiriye gelek jî şerh û şîrove nivîsîye.

Eḥmed Ḥîlmî hem bi Zimanê Kurdî hem jî bi Zimanê 'Erebî berhem daye. Em dikarin di vê babetê de wî bi şibhînin Mele Xelîlê Sêrtî (1750-1843), Eḥmedê Xanî, 'Elîyê Teremaxî (sedsala 17.), Xelîfe Yûsufê Bazidî (1885-1965), Mele Yûnûsê Erqetînî (sedsala 18.) û…hwd. Lewra wan kesan jî ji bo tedrisata medresê berhem te'lîf kirine û piştî wan berhemên wan ketine nav mufredada medreseyên Kurdistanê. Taybetîya Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî ewe ku gelek berhemên wî ketine nav mufredata ehlê medresê û wek ders tên xwendin. Wek mînak *"Gulzara Hemûkan Şerha Nûbihara Biçûkan, Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî, Eqîda Ḥîlmî, Rehberê Ewam Şerha Nehc ul-Enam"* çend berhem in ku hem di saẋiya Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî de hem jî piştî wî ketine nav mufredata tedrisata ehlê medresê.

Bi rastî ked û kessba Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî barê wefayê li hiskorêxên Zimanê Kurdî bar dike. Lazime ku li ser berhemên wî lêkolîn pêk bên û bên nirxandin. Lewra wefa ji îmanê ye. Ji ber vê yekê bû ku me Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî û Rehberê Sanî ji xwe re wek mijara tezê hilbijart.

**Mewzûbeḥsa Teza Me Û Giringiya Wê**

Di nav kesên ehîl de heqîqetek bê nîqaş e ku destpêka Edebîyata Kurdî, nexasim edebiyata klasîk serkanîya xwe ji 'alim û şêx û meşayixên Kurd werdigre. Edebîyata Kurdî bi saya keda melayên Kurd ji windabûnê xelas bûye.

Melayên Kurd ji ber ku di medresê Kurdistanê de perwerde bûne bi giranî berhemên xwe bi herfên 'Erebî nîvîsîne. Lakîn piştî şoreşa li Tirkiyê di 24ê Çiriya Paşîna 1924ê miladî de ji teref damezrînerê Komara Cûmhûrîyetê ve înqilaba ḥerfan pêk hat. Di encama înqilaba ḥerfan de îmkana îstîfada ji berhemên bi ḥerfên 'Erebî ji

holê rabû. Ji ber ku nifşên nû ji xebatên ‘alimê Kurd bê sûd nemînin me latînîzekirina berhema Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a bi navê *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmed ê Xanî* ji xwe re wek mijara tezê hilbijart.

Mebeseta me a di vê xebatê de ew e ku em Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî û berhema wî ya bi navê *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî* bidin naskirin.

**Di Vê Xebatê Metod Armanc Û Çavkanîyên Me**

Bi rastî her xebat li ser metodek dighê armanca xwe. Me jî di vê xebata xwe de “metoda tîpguhêzîyê” bo latînîzekirina berhemeke Kurdîya bi ḥerfên Erebî pejirand. Tîpguhêzî di vir de metoda me ya ‘eslî ye.

Me di hengâma latînîzekirinê de Elfabeya Celadet Bedirxan ji xwe re wek bingeh pejirand. Lewra nuha ji bil “Elfabeya Bedirxan” bo latînîzekirinê elfabeyek çêtira bi rêk û pêk li ber destê me nîne. Ev elfabe nuha di nav rewşenbîr û ehlê qelemê de bo zimanê Kurdî wek elfabeyek sitandarda Latînî hatiye qebûlkirin. Lakîn çend kêmasîyên vê elfabê hene ku çend dengên kurdîyê eslî di xwe de naḥêwîne.[10] Ev jî hem di latînîzekirina berhemên bi tîpên ‘erebî de, hem jî di xwendina metnên Kurdî de alozîyek derdixe holê. Ji bo ku em vê alozîyê ji holê rakin me di vê xebata xwe de dengê ع a ‘erebî bi aposrofê dengê غ û ح jî bi sembolên navnetewî nişan da.

Beşa yekemîna teza me ji jiyan kesayet û berhemên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî pêk tê. Ji ber ku ji bil çend rûpelên “Kovara Kelha Amed” di derheqê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî de tu agahîyek nivîskî bi dest me neket. Me di hemgama nivîsandina beşa yekemin a tezê de wek çavkanî ji agahîyên ‘Ebdussamed Yalçin û ‘Ebdulquddûs Yalçin gelek îstîfade kir. Agahîyên wan di nivîsandina vê beşê de rê li ber me vekirin.

Di teza me de mijara eslî beşa duyemîn e ku ji tîguzêyiya *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî* pêk tê. Me di vê beşê de ji du berhema îstîfade kir. Yek destxeta Eḥmet Ḥîlmî bû ku di ḥeyata xwe de dabû çapkirin. Ev berhem ji teref muelîf ve di 16ê Sebata sala 1984ê miladî de hatiye temamkirin. Lê tarîxa çapê û çapxane ne diyar e. Me di tipguhêzîya latînî de herî bêtir xwe bi vê metnê ve gire da.

[10] Wek mînak ع, غ û ح di zimanê Kurdî de sê dengên ‘eslî ne. Mixabin Celadet Bedirxan di elfaba xwe de cîh nedaye hersê denga jî.

Di vî warî de çavkanîya me a duyemîn tesḥîa Ebdulquddûs Yalçin a ne çapkirî bû. Ebdulquddûs Yalçin bi awayek hurguli ev berhem ji nû ve tesḥîh kiriye û bi xeta compîturê ji nû ve nivîsîye. Wexta ku me ji ehlê malbatê daxwaza destûra xebata li ser *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî* kir, wî jî xebata xwe ji me re şand da ku em jê îstîfade bikin. Di hengama amadekirina tezê de nexasim di hengama xwendina gelek peyvên ku em di xwendina wan de diketin tengasîyê de ev xebat bo me bû rênîşanek muhîm. Dîsa di vê tesḥîhê de *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî* bi sernavên muxtelîf hatibû dabeşkirin ku ev sernav di xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî de tunebûn. Me tîpguhêzîyê de sernav ji tesḥîha ʻEbdulquddûs Yalçın wergirt.

Muelîfê *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî* di nav metnê orjînal de gelek ayet û hedîs bikar anîye. Ji ber ku muxatabê muelîf ehlê medresê ne, muelîf pêdivî bi wergera wana Kurmancî nedîtîye. Me di teza xwe de wergera ayet û hedîsa wek jêrenot li metnê zêde kir.

Dîsa di metnê orjînalê "Rehberê Sanî" de gelek jêrenotên ʻErebî cîh digrin. Me di latînîzekirinê de ew jêrenot wergerand Zimanê Kurdî û di dewsa jêrenotên ʻErebî de bi cîh kir.

Armanca me a di vê xebatê de ewe ku em bi wesîla latînezekirina *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî* bo nifşê nû di navbera do û îro de bibin pira peywendîyê. Da ku nifşê nû karibin ji berhemên ku bi herfên Erebî hatine nivîsandin îstîfade bikin.

Me hevî ewe ku wê nifşên pêşerojê di vî warî de ji me çêtir bixebitin û ji berhemên bav û kalên xwe îstîfade bikin.

## BEŞA YEKEMÎN

## EḤMED ḤÎLMİ, JIYAN KESAYET Û BERHEMÊN WÎ

### 1.1. JIYANA EḤMED ḤÎLMÎ EL-QOẊÎ

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di sala 1942yê miladî de, li gundê Qoẋê ji diya xwe di welide.[11] Gundê Qoẋê nuha bi qeza Bismila Amedê ve girêdayî ye. Ev gund bi qasî 12 km ji Bismil dûr e. Navê bavê wî Mele Yûsûf, navê diya wî ‘Eyşan e.

Li gorî beyana Mele ‘Ebdussamedê lawê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî: Ehlê malbatê ji mêj ve bi ‘ilmê re ‘eleqedar bûne.[12] Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî li gorî ‘urf û ‘adetê Kurdistanê navê kalê xwe, bavê wî Mele Yûsûf jî navê kalikê wî hilda ye. Neseba vê malbatê ḥeta ku dighê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî li ser yek weledkî domîya ye.[13] Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî wek yek weledkî ji diya xwe welidiye.

#### 1.1.1. Neseba Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî

Li gorî beyana ehlê malbatê neseba Eḥmed Ḥîlmî el Qoẋî wihareng e: Eḥmed Kurê Mele Yusuf e, Mele Yusuf Kurê Eḥmed e, Eḥmed Kurê Yusuf e.[14]

Malbata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ji ‘Eşîra Hevêda ne. Ehlê vê malbatê ji gundeki Qulpê ê bi navê Hacana çûne İsepara Bismil paşê jî li gundê Qoẋê bi cîh bûne.

Li gorê beyana ehlê malbatê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî hem ji alî dê ve hem jî ji alî bavê ve xwedî nesebek ‘ilimdar e. Bavê wî Mele Yusuf di dema xwe de kesek mutteqî, mutesewif û ehlê ‘ilmê bû.[15] Mele Yusufê bavê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî muntesîbê terîqa Nexşebendî bû û ji meşẋulîyeta ‘ilmê nexasim ji ‘ilmê fiqhê pur ḥes dikir.[16] Her wekî

---

[11] Mela ‘Ebdulquddûs Ḥîlmî, “Seyda Mela ‘Ehmed Ḥîlmî el-Qo‘xî”, **Kovara Kelhaamed**, j. 17, 2013, 51.

[12] Abdussamet Yalçın, h.b.t, Tarîxa têkildarîyê 14.08.2016

[13] Ḥîlmî, “Seyda Mela ‘Eḥmed Ḥîlmî el-Qo‘xî”, **h.k,** j. 17, r. 51.

[14] Ḥîlmî, “Seyda Mela ‘Eḥmed Ḥîlmî el-Qo‘xî”, **h.k,** r. 17, r. 51.

[15] Yalçın, “Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De,” h.b.t., Tarîxa têkildarîyê 14.08.2016

[16] Ḥîlmî, “Seyda Mela ‘Eḥmed Ḥîlmî el-Qo‘xî”, **h.k,** j. 17, r. 51.

ku tê zanîn terîqa Nexşebendî bi wesîla Mewlana Xalidê Şehrezorî û xelîfê wî Seyîd Taha el-Hekarî li Kurdistinê belav bûye.[17]

Çawa ku me di serî de jî beyan kir neseba Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ji alî dê ve jî ehlê ‘ilmê bûne. Wek mînak Mele Resûlê kalê dîya Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di medresa Kurdistanê ya meşhûra Extepê[18] de li ber destê Şêx Ḥesenê Nûranî (1793-1863) îcaza xwe ya ‘alimtîyê wergirtîye û bi seydatî dersa lawên Şêx Ḥesen ê bi navê Şêx’Ebdurrehman (1854-1910) û Şêx Muḥemmed Can (1857-1907) daye. Bavê diya Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî Mele ‘Ebdurreḥman jî hem ‘alim bû hem jî di warê zimanê Farisî û ‘Erebî de pispor bû. Di dema Şerê Cîhana yekemîn de serdestên demê di meselekî şer‘î de dixwazin ku seyda bibe şahidek derewîn û wan mafdar derîne. Lê seyda serê xwe ji wan re natewîne û teklîfa wan bi paş ve vedigerîne. Ji lew ew jî wek ceza navê Mele ‘Ebdurrehman dixin nav lista şervanên seferberlîka şerrê cîhana yekemîn. Seyda di dewsa şahidiya derewîn de riya mirinê dipejirîne, diçe şerrê cîhana yekemîn û hew vedigere. Piştî ku seyda di şerrê cîhana yekemîn de şehid dikeve keça wî ‘Eyşan xanim jî wek sebîkî ber pêsîrê sêwî dimîne.[19]

### 1.1.2. Xwendin û Tehsîla Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî

Çawa ku me di serî de jî got Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî hem ji alî dê ve hem jî ji alî bavê ve nevîyê malbatek ‘ilimdar e. Ji ber ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di malbatek zana û ehlê ‘ilmê de pê diavêje qada jiyanê, meraqa zanîn û xwendinê hê di zaroktîya wî de lê peyda dibe. Diya Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî hê di wextê zaroktîya wî de vê qabîlîyeta wî fêr dibe û wî li ber destê seydayê Gundê Qoẋê Mele Muḥemmed Şerîfê Bêkendî dide xwendin.[20] Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî demek li ber destê Mele Muḥemmed Şerîf dixwîne.

[17] Cevdet Karaman, “Ahmed Ahmed Zîyauddin Gümüşhanevi Hazretlerinin Mürşidi Mevlana Halidi Bağdadi’nin Hayat Hikâyesi” I. **Uluslararası Ahmed Zîyauddin Gümüşhanevi Sempozyumu,** Ankara: Gümüşhana Üniversitesi Yayınları, 2014, Cild. 2, r. 55-61

[18] Medresa Extepê di nav medresê Kurdistanê de ekolek taybet e. Ev medrese ji teref Şêx Ḥesenê Nûranî ve hatiye damezrandin. Li gorî beyana Zeynel ‘Abidîn Zinar di vê mederesê de bi çar zimana perwerdehî pêk hatiye. Purtikxana wê pir dewlemend bûye. Lê mixabin piştî buyera Şêx Se’îd temmamê pirtûkê ve medrese ji teref hêzên rayedar ve bêderê hatine şewitandin. (Zeynelabidin Zinar, Di Nava Medreseyên Kurdî De Girigiya Medreseya Extepê, **Uluslararası Medrese Ve İlahîyat Kavşağında İslamî İlimler Sempozyumu,** Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bîngöl: 2012, Cilt 2, r. 127-134

[19] Ḥîlmî, “Seyda Mela ‘Eḥmed Ḥîlmî el-Qo‘xî”, **h.k**, j. 17, r. 50.

[20] Eḥmet Ḥîlmî di mektebên fermî de hiç nexwendiye. Temmamê xwendina wî li gorî usûla Medresê Kurdistanê pêk hatiye. Di warê te’lîma fermî de mekteba jêrîn ji derve ve qedandiye. (Yalçın, h.b.t. Tarîxa têkildarîyê 14.08.2016)

Paşê Mele Muḥemmed Şerîf Mala xwe ji Qoẋê bar dike dibe gundê xwe yê bi navê Bêkendê. Ji ber ku zîhn û zekaweta Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bala Mele Muḥemmed Şerif dikşîne, Mele Muḥemmed Şerîf naxwaze ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ji ‘ilmê bê par bimîne, radibe Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi xwe re dibe gundê Bêkendê[21]. Seyda demek li ba Mele Muḥemmed Şerîf xwendina xwe domand paşê vegerîya di medersên muxtelîf de li gorî ûsûla Medresê Kurdistanê teḥsîla xwe ya ‘ilmê domand.

Melayên ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî li ber destê wan perwerde bûye ev in: Mela Muḥemmed Şerîfê Bêkendî, Mela Muḥemmed Şerîfê ‘Erebkendî (1911-1987), Mela Îbrahîmê Belê, Mela Yasînê Şemê[22] (1906-1994), Mela Se‘îdê Taxikî.[23]

Eḥmed Ḥilmî di nav seydayên xwe de herî bêtir li ber deste Şêx Muḥememmed Şerîfê ‘Erebkendî xwendiye û îcaza xweya ‘ilmê ji wî wergirtiye, bûye mirîde wî û ketiye terîqa Nexşebendî.

Pêywendîya Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî û Mele Muḥemmed Şerîf demek dirêj domîya ye. ‘Eḥmed Ḥîlmî di her ḥal û karî de mezintî û şexsîyata şêxê xwe anîye ziman. Digel ku paşê di meşreba siyasî de ji şêxê xwe veqetiyaye jî tu carî têkiliya xwe ji Şêx Muhemmemmed Şerîfê ‘Erbekendî nebiriye. Daîma çuye ziyareta wî û ḥurmet jê re nişan daye.[24] Ḥurmeta Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a ji şêxê wî re di van beytên wî de jî ‘eyan e:

*“Em hezar ḥemd û senaxwûn ebedî ne ji Xwedê ra*

*Ji cemala Semedê tirêjê nûr in bi qedê ra*

*Li ‘Erebkendê diîsî bi delîl û senedê ra*

*Ê nabîne du çav ‘ewr e bi êşa remedê ra*

*Lew tu serdefter î bo murşid û pîrên emedî*

*Ger kemalê dîn û dinya te divê her wî bibîn*

*Bi dil û can bibe teslîm û ḥîcabê melivîn*

*Şahê ser textê ‘edalet di sexa girti kemîn*

---

[21] Gundê Bêkend nuho bi Qurtalana Sêrtê ve ve girêdayî ye.

[22] Mele Yasîn di nav gel de Mele Yasîn Yusrî jî tê naskirin.

[23] Yalçın, “Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De”, h.b.m, 20.11.2015.

[24] Celal Bozdaş, “Hevpeyivîna Bi Mele Celalê Pîranî Re”, **Kovara Kelha Amed,** j. 16, Nîsan 2013, r. 25

*Ḥatem û Nosîrewan şagirtê wî bûn bi yeqîn*

*Ê di fermanê te bî, girtî ḥeyata ebedî"*[25]

Çawa ku ji berhemên wî jî dixwîye xwendina Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî piralî bûye. Wî digel 'ilmê klasîkê medresê di warê 'ilmê Îslamî yên 'esrî de jî bi berfirehî xwendina xwe domandiye.

Eḥmet Ḥîlmî digel ku xwendina xwe bi berfirehî domadîye jî dîsa li ser rêça ehlê sunnetê meşiya ye. Di berhemên xwe de ji çavakanîyên Şîî û Sûnîyan tev de îstîfade kiribe jî dîsa mêla wî li ser ehlê sûnnetê maye. Dema em li berhemên wî nexasim li *Hedîyet ul- Ḥebîbb* û *Rehberê Sanî û Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî, Rehberê 'Ewam Şerha Nehc ul-Enamê* mêze dikin ev taybetîya wî baş dixwîye.

Dîsa Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî berhemên Bedî'uzzeman jî xwendîye, ji wan hayîdar e û ji wan ders daye. Ḥeta em dikarin bêjin ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di warê 'eqîdê de bêtir li ser şopa Bedî'uzzeman meşiya ye. Li gorî beyana Mele 'Ebdussemed: "Eḥmed Ḥîlmî di xortanîya xwe de buye mubtalayê nexweşînek ẋerîb û wehmî, bi xwendina *Sözlera* Bedî'uzzeman re ji wê nexweşînê xelas bûye."[26]

### 1.1.3. Zewaca Eḥmed Ḥîmî El-Qoẋî

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi keça 'Erebê Birahîm ya bi navê Fedîle re di zewice. Ji vê zewacê Xwedê Te'ala pênc kur û çar keça dide wî.

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî temmamê zarokên xwe yên kur tev di medresa de daye xwendin. Dersa keçan jî li malê daye. Nûha zarokên wî tev de medrese xwendine û bi 'ilmên îslamî ve meşẋûl in. Temmamê lawê wî mela ne. Lawê wî mele 'Ebdul Qudûs û Mele Mehdî ḥalê ḥazir li ser şopa bavê xwe dimeşin û muderrîstîyê dikin.

Di nav zarwên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî de herî bêtir Mele 'Ebdul Quddûs û Mele 'Ebdussamed li ser tesḥîha berhemên bavê xwe dixebitin û ji nû ve berhemên wî bi Xetê 'Erebî tesḥîh dikin û diweşînin.

[25] Zinar, **Numune Ji Gencîneya Çanda Qedexe,** Stocolm: Weşana Yekîtîya Nivîskarên Kurd, r. 290-291.

[26] Yalçın, "Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De," h.b.t. Tarîxa têkildarîyê, 14.08.2016

### 1.1.4. Melatî û Muderîstîya Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî

Piştî ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî icazeta xwe ya ‘alimtiyê ji Seydayê xwe Mele Muḥemmed Şerîfê ‘Erbekendî werdigre tê li gundê xwe yê Qoẋê dest bi melatîyê dike. Paşê diçe li gundê ‘Elebociya[27] bi qasî çar sala melatîyê dike. Paşê tê li gundê Qeremûsê[28] dest bi melatîyê dike. Melatîya wî ya li van hersê gunda bi awayeke fexrî ye.

Eḥmet Ḥîlmî el-Qoẋî di sala 1975a de li bajarê Elazıẋ dikeve îmtîḥana îmamtîyê. İmtîhanê qezenc dike û tê li gundê Zeko[29] bi awayek resmî dest bi melatîyê dike. Melatiya wî a li vî gundî bi qasî deh sala didome. Li ser tewsîya hevalê xwe yê medresê ê bi navê Mele Celal ku miftiyê Batmanê ê wê demê bû tayîna xwe dixwaze Batmanê û li wir di sala 1982ya de li Camîya Ḥecî Xelîl[30] melatîya xwe didomîne.[31] Eḥmed Ḥilmî el-Qoẋî ji vê camîyê jî derbasî Camîya Ebûbekir dibe. Lê li Batman şert û mercên dinyewî destûr nadin ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî li vir zêde bimîne. Desttengîya dinyayê berê wî ber bi Bismil ve vedigerîne. Ji ber ku xanîyê wî li Bismil heye Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî tayîna xwe dixwaze Bismil û di sala 1985a de vedigere Bismil di Camîya İhsanîyê de melatiya xwe didomîne.

Seyda wexta dest bi melatîyê dike di ḥucra camîyê de jî feqîya xwey dike. Ji ber ku fitreta Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi perwerdehîyê re bûbû wek goşt û neynok bê feqî ḥedra wî nedihat.[32] Ji lew Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî li ku dest bi melatîyê kiribe yek dudu be jî îlla feqîyê wî hebûn. Seyda tu car bê feqî nemaye lê medresa xwe ya taybet li Bismil di ber Camîya İhsanîye de ava kir û feqî xwey kir.[33] Digel ku gelek feqîyên wî li ba wî gîhane dereca îcazetê jî wî dayîna îcazetê ji xwe re nekiriye ‘adet û îcazet nedaye tu kesî. Li gorî ku heval û zarwê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî dibên: “Ji ber ku gelek kesa wek fexr îcazet didan û pirdayîna îcazetê wek mezintiya muderris dihat qebûlkirin Eḥmed

[27] Gundê ‘Elebocîya: Ev gund gundeki Bismil e. Navê wîyê resmî Boyaci ye.

[28] Gundê Qeremûsê: Ev gund gundeki Bismil e.

[29] Gundê Zeko gundeki Bismila Amedê ye. Navê wîyê resmî Sekî ye.

[30] Ev camî di nav gel de wek Camîya Xelîlîye jî tê naskirin

[31] Ḥîlmî, “Seyda Mela ‘Eḥmed Ḥîlmî el-Qo‘xî”, **h.k**, j. 17, r. 49-50.

[32] Yalçın, “Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De”, h.b.t., Tarîxa têkildarîyê 30. 02.2016

[33] Yalçın, h.h.b.m.

Ḥîlmî el-Qoẋî nexwestiye îcazetê bide kesî. Lewra ew mirovek mutewazî bû û ji kibr û fexrê ditirsiya.” Ev exlaqê wî bûye sebeb ku îcazet nedaye zarwê xwe jî.[34]

### 1.1.5. Terzê Mamostetîya Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî

Ji ber ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di medresê Kurdistanê de bi awayeke klasik xwendîye wî jî wek seydayên xwe bi terzek klasîk ders daye feqîyên xwe.[35] Li gorî beyana lawê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî Mele ‘Ebdussamed, Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî li gorî sewîya feqîya yeko yek ders daye wan. Wî di muamela dersê de bi dilḥenûnî û şefqet û merḥemet ḥereket kiriye. Ḥeta feqîyên wî dersa xwe baş fêr nekiribin tiştekî dî bi wî nedaye xwendin. wî jî wek seydayên herêmê ehemmiyet daye tekrar û jiberkirinê. Digel kitêbên rêzê wek Rîsalê Nûr, Kitêbên Seyyîd Qutûb 1906-1966), Se’îd Hewwa (1935-1989) û hwd kitêbên İslamî yên ‘esrî jî daye xwendin.[36]

Dîsa di warê te’lîmê de taybetiyek Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî ew e ku wî di medresa xwe de wek serf û nehwê ‘ilmên alet, wek tefsir û ḥedîs û siyer û fiqh, tarîxê ‘ilmên dî bi hev re daye xwendin da ku şagirdên wî bi awayeke kamil fêrî Îslamê bibin û hem dînê xwe hem dinya xwe baş binasin û ji ḥal û eḥwalê dinê agahdar bin.

### 1.1.6. Meşrebê ‘Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî wek gelek alimên hevçaxê xwe bi terzek klasîk di medresê Kurdistanê de di bin tesîra tesewufê de perwerde bûye. Ji xwe seydayê wî yê herî balkêşê ku îcazet daye wî Şêx Muḥemmed Şerîfê ‘Erebkendî ye. Şêx Muḥemmed Şerîf jî şêxek ji şêxên Nexşebendî bû, di medresê Kurdistanê de perwerde bûbû û ji bo belavkirina Terîqa Nexşebendî di xebitî. Gelek murîdên wî hebûn. Giranîya murîdên wî ji feqî û mela pêk dihat.[37] Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî yek ji wan mela ye ku li ber destê wî tobe kiriye, ketiye terîqa Nexşebendî[38] û ḥeta dawîya ‘umrê xwe di warê îbadet de li ser şopa terîqa Nexşebendî meşiyaye.[39] Wird û zikrê xwe tu car terk nekiriye.

---

[34] Yalçın, h.h.b.m.

[35] Yalçın, h.h.b.m.

[36] Yalçın, “Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De,” h.b.t., Tarîxa têkildarîyê 14.08.2016

[37] Ekîncî M. Salîh, “Di Derbarê Ehmed ‘Hîlmî el-Qoxî de Hevpeyivîna Bi Maîlê”, h.b.m. 15.10.2015

[38] Ekîncî, h.h.b.m.

[39] Yalçın, “Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De,” h.b.t., Tarîxa têkildarîyê 14.09.2016

Di warê meşrebê siyasî de piştî İnqilaba İran û xwendina kitêbên ‘esrî[40] hinek fikrê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî guherîne. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî piştî hevnasîya bi kitêbên ‘alimên ‘esrî re terzek şoreşgerî pejirandîye û bi muslumanên şoreşger re hereket kiriye. Lewma piştî veguherîna meşrebê siyasî hinek dilsarî ketiye navbeyna Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî û şêxê wî.

Bi qasî ku ji helbestên Eḥmet Ḥîlmî tê fêmkirin wî tesewufa bê tetbîqa şerîetê qebûl nekiriye, wek bîd‘etek ḥesibandiye û bi zimanek tûj rexne kiriye. Sofî û şêxên ku muxalifê wî bûne jî ew bi şîîtîyê îtham kirine. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî vê yekê di helbesteke xwe de tîne ziman û bersîva wan sofî û şêxên ku ew û hevalên wî li hember dijraberê wan bi tenê hiştine wihareng dide:

*“Dînê me İslama sefa rehber Miḥammed Mustafa*
*Quran îmam e pur wefa qanûn ev e heq bernedî*

*De’wa ku em îro dikin dînê Xwudê ḥakim bikin*
*Reḥm û ‘edalet pur bikin zulm û teḥekkum hilvedî*

*Ev de’we ya pêyẋembera hem murşidan û rehbera*
*Şêx û mela û serwera hemyan li vê de’wê xwedî*

*Wek Şêxê Norşîna qewî şêxê di Mala Xeznewî*
*Seyda ku Şêxê Cizrewî hem Şêx Kemalê Eḥmedî*

*Em warisê wan in yeqîn lewra ji bo şer‘a mubîn*
*Malê xwe û canê şîrîn me kir feda wexta me dî*

*Ey Sofiyê ku dibî murîd ka we çi kirye ey pelîd*
*Emma me dane pur şehîd hey kor bûyo qey te nedî*

[40] Wek berhemên Ḥesen Elbenna, Seyyîd Qutub, Mewdûdî, Se‘îd Hewa, Xumeynî û… hwd.

*Ev lerz û hej, ev cezbe ye ev ḥalet û giryê te ye*
*Çendan bikî bê feyde ye ger tu bi dû şer'ê nedî*

*Eḥkamê şer'ê yek yekî hetta teva tetbîq nekî*
*Ne ji cezbe û ne ji giryekî qet'a te yek feyde nedî*

*Şêxê ku vê dewrê hene gellek ji wana sexte ne*
*Ew tabiê zewqa xwe ne ê wek te pur kirne kedî*

*De'wa şerî'et bû xwuya şêxê te bû wek kûviya*
*Tu jî li pey wek rûviya çû ket qulê kes we nedî*

*Paşê we got me şî'e ne hem munkir in xwey pere ne*
*Vana temam virrê we ne nîne li we şerm û fedî*

*Roja qiyamet radibit Ḥîlmî li te de'wê vekit*
Xaliq ji te pursê bikit çawa cewabê tê vedî"

### 1.1.7. Mezhebê 'Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî wek gelê herêma xwe di mezhebê fiqhî de li ser şopa İmam Şafi'î meşiyaye. Hetta wî kitêba xwe ya fiqhê a bi navê *Hedîyet ul-Ḥebîb* bi giranî li gorî Mezhebê Şaffi'î (767-820) nivîsîye. Lê şafi'îtîya Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ne bi terzek mute'esib bû. Wî di heman demê de ji temmamê mezhebên ehlê sunnet, ḥeta di hinek mesela de ji mezhebê Caferê Sadiq jî îstîfade kiriye.

Çawa ku ji kitêba wî ya bi navê *Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Eḥmedê Xanî* tê fêmkirin Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di warê 'eqîdê de li ser şopa mezhebê ehlê sunnetê meşiyaye û 'eqîda ehlê sunnetê nexasim mezhebê Eş'arîya ji xwe re wek mezhebê 'eqîdê pejirandiye. Dîsa em ji vê berhemê fêm dikin ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di warê eqîdê de jî li ser şopa teqlîdê nemaşiya ye. Wî ji 'alimên cûrbecûr îstîfade kiriye û xîmê

eqîda xwe li ser qaîdeyên zanistî danîye. Ji lew Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di Rehberê Sanî *Şerḥa Eqîda Eḥmedê Xanî* de ji Fexreddînê Razî bigre ḥeta Se'îd Nursî ji gelek 'alimên kevn û nû îstîfade kiriye û ji berhemên wan wek delîl gelek neqil wergirtiye kitêba xwe.

Dîsa ji beyana mele Miḥemmedê Bêcirmanî wisa di xwîye ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi pisporî *Şerhul-Eqaîda Teftezanî* hem xwendiye hem daye xwendin.[41]

### 1.1.8. Xettadîya Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî

Huner û hunermendîya xettadîyê digel qabîlîyeta fitrî perwerdehîyek duvdidirêj dibê. Lewra nivîs ew fêkî ne ku ji sertiliyên benîadem di welidin.[42] Lê qabilîyeta nivîsandinê nexasim qabilîyeta xweşnivîsandinê di her însanî de nîne. Hinek kesên xwedî qabiliyet jî hene ku ev wesfê wan encax bi perwerdehîyê dertê holê. Ji vê sedemê ye ku xettadî wek zanistiyek xweser tê qebûlkrin.

Di 'ilmê xettadîyê de, di terzên cûrbecûr de ji her ḥerfî re pîvan û şeklên cûrbecûr hene. Eger nivîs li gorî wan şekl û pîvana bê nivîsandin tesîrek taybet li însan dike. Eḥmed Farûq di derheqê sin'etê xet û xetên Camîyê Sitenbôlê de wiha dibe:

> *"Sin'etê xet, meḥsûlê kedeke zeḥmet, dijwar û tekamuleke daîmî ku bê navbir e. Bi nivîsandina daîmî û bi derbasbûna di nav sin'et de û bi zewq û kêfsitendinê merev hîn dibe. Ustadên xet ku mesele tê ser te'rîfê dibejin: "Evêya karê zewqê ye, di gotin û te'rîfan hilnayê". Çimkî di xettan de hinik xusûsiyet hene ku di van sin'etên din de tune ne. Ev xusûsiyet ji riḥê însan di welide. Te'rîfeke meşhûr heye ji bona xet. Ew jî ev e: Xet hendesekî rûhanî ye, bi aletên cismanî tê meydanê.*
>
> *Di xet de hendesa maddî ew şekl û xetik in ku xettat li ser wan meşq dike û van şekla di zihna xwe de ḥifz dike. Nivîs bi nivîs ber bi sen'etkariyê ve diçe ḥeta ku ev hal tê de dibe fitrî. Ku bû fitrî êdî ew sin'etê ku di riḥê wî de cih girtiye bi îbda' (çêkirineke nû) xwe dide derve. Ha ev e ku merev dibêje "husnu xet" (nivîsa xweşik), di esil de "husnu fitret" (fitreta xweşik) tê qestkirin ku ew jî hendesa rûhî ye. Vê xusûsiyetê tesîreke werê daye xettên 'Erebî ku di tu sin'etên din de ev tesîr tune ye.*
>
> *Xettat Mûhemmed Bedreddîn Yazir beḥsa hevalki xwey 'eskeriyê dike. Vî hevalê wî yê ku ji Macaristan e, hem sûbay hem jî ressam e, di heqqê xettên camiyên Sitenbol*

---

[41] M. Muhemmedê Bêcirmanî, "Seydayê Min Mela Eḥmedê Qoẋî", **Kovara Kelha Amed,** j. 16, Nîsan 2013, r. 32.

[42] Eḥmed Farûq, "Sin'etê Xet Û Seydayê Mela Eḥmed Bi Xettadî", **Kovara Kelha Amed,** j. 16, Nîsan 2013, r. 33.

*de wiha dibêje: "Van nivîsên we ku ewil merev lê dinêre sade û bê deng xuya dikin. Nêrîna merev ku dewam dike hereket li wan dikeve û can tê wan. Pişt re wek hawê ku di herikin û bê deng rihê merev di lebitînin. Belê wê ahengê guh nabhîzin, merev di dilê xwe de li wan guhdarî dike. Xweşikayîyeke ẋerîb dilê min cezb dike û ez pê muferreh dibim…"*

*Kesê ku bi van wesfa di xemile zerafet di keve rihê wî û di zeka wî de jî firehî û zêdeyî çê dibe. İbnû Xeldûn dibêje: "Kesên ku bi xettan û 'ilmê hîsab re mijûl in, dibin zekî. Ji ber vê milûk û hukumdar wan li dora xwe di civînin û ji wan îstîfade dikin."*

*Nivîsa bi sin'et tişkî dî ye, hîskirina zewqa wê tişkî dî ye, fêmkirina ji wê tişkî dî ye û nivîsandina tiştê ku merev jê fêm dike jî tişkî dî ye. Ji ber vê, muxatebê nivîsa xweşîk ne her kes e. Kesê ku paqijiya fitreta xwe wenda nekiriye û zewq û îdraqa wî xera nebû ye ji sin'etê xet zewq distîne. Belê digel ku werê ye jî, di xweşikayiya xet de tesîrnî me'newî hatine derckirin. Di nezera gelekî xettadan de xet; wek hawê murebbiyekî Rebbanî ji bona van kesê ku paqijiya fitreta wan xera bûye rêbertiyê dike. Û tiştê ku ji destê wan çû ye ji xesletên fitrî wan pê dihisîne, hêdî hêdî xesletên wan li wan dizivirîne. Di çavê xettadekî de sin'etê xet ji bona van kesan wek medresekî/fakultekî ye"*[43]

Eḥmed Ḥîlmî jî yek ji wan kesa ye ku hê di zaroktiya xwe de bi qabiliyeta xweya xetadî bala seydayên xwe kişandiye ser xwe û gelek berhemên İslamî bi xetên xwe nivîsîye. Taybetîya xetatîya Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ew e ku wî bê mamostekî taybet xwe 'elimandîye sin'etê xet. Nuha xetadîya wî bi awayek fitrî derbasî zarwê wî bûye.[44] Di derheqê xetadîya 'Eḥmed Ḥîlmî de pêdivî bi peyvên dirêj nîne. Di vî warî de ji berhemên wî *Dîwana Cami'* û ev peyvên Eḥmed Farûq wesfê hunermendîya wî ya xetadîyê baş îsbat dikin:

*''Seydayê Mele Eḥmedê Xetat di feqîtiya xwe de meraq bera ser xet da. Ew zewqa fitrî ku di kûraniya rihê wî de hebû zû xwe da nişandan. Bê mu'ellim û ustadê xet, ji ber xwe ve, li gor imkan/bê îmkan û şertê wê dewrê, bi qelem û kaẋet û ḥubra gelek îbtîdaî meşq kir. Meraqa wî, zewqa İlahî ku di fitreta wî de derc kirîbû hê di biçûkaniya wî de xwe da nîşandan. Ji bo wê hendesa xwe ya rûḥanî derxe derve bê îmkaniyan mani'*

---

[43] Farûq, h.m, **h.k,** r.33-34

[44] Wek mînak di nav zarwê Eḥmed Ḥîlmî de Ebdussamed Yalçın bi xeta xweya taybet mushefek nivîsîyê û di nav weşanên dûa de weşandiye. 'Ebdulquddûs Yalçın jî berhema Eḥmed Ḥîlmî a bi navê 'Emelê Şev û Rojê bi xeta xwe nivîsandiye û di nav weşanên Weşanxaneya Du'a de weşandiye

*qebûl nekir. Peydekirina qelemên cawa yan jî zîlikên Îranê*[45] *jê re ne mumkun bû. Ne wan nas dikir ne jî karibû xwe bighînê. Kaẋetê bi aher û kaẋetê kûşe*[46] *ne dîtibû ne bihîstibû ne jî nas dikir. Ḥubra dû jî wek vana. Hê di demên paşî de wana nas kir. Bi qelemê serê wî hesin û bi dolmeqelem bi bal meqseda xwe ve meşiya. Serikê qelemê xwey hesinî (divit qelem) di kevir da ḥeta ku anî 'eyara ku pê bi nivîsîne. Û li ser kaẋetê defteran, defterên bê qelîte, defterên adî ku ji hevîrê duyem hatiye çêkirin meşq kir. Çimkî ê ku di nivîse ne qelem e, ê ku di nivîse xwedî 'eql û îdraqekî ye ku di pişt qelem de ye nayê dîtin.*

*Seyda ewil ji boy şexsê xwe ḥaşiyan û hinek metin nivîsand. Pişt re Rewdetunne'îm, piştre Fetḥulcelîl û bi vî hawayi dewam kir, him bi him ber bi kemalê ve çû. Ḥeta dawiya umrê xwe tevlî berhemên telîf û xet di seriya çilî re berhem nivîsand. Van berhemê ku nivîsand jî teva anî ḥeddê çapkirinê. Hineka çap kir, hinek jî ji tineyî çap ne kir, li benda çapkirinê sekinandî ne. Berhema wî ya paşî Hedyetul-Ḥebîb e ku di sala 1995ê mîladî de wî bi xwe çap kiriye.*

*Di demên wî yê paşî de xetê wî gihaştibû derecekî ji kemaliyetê. Ji xwe kemaliyet û xweşikayiya mutleq xasê bi Rebbê 'alemê ve ye. Di vê demê de dibêje: "Xetê min hatiye dereca ku îdî merev kare Quranekê pê bi binivîsîne." Ḥeta wê demê digel gelek teklîfan jî xetê xwe ji bona nivîsandina Quranê layiq nedidît. Piştî ku Rehberê 'Ewam çap kir hevalkî wî jê re got: "Xetê te xweşin, Yasînkî binivisîne em teb' bikin." Belê Seyda xwe neda berê.*

*Me'lûme xet jî bi pîvan tê nivîsandin. Ev pîv jî nuqte ne. Mesela dirêjiya elîfê şeş nuqte ne. Elîf ku ji şeş nuqteyan dirêjtir yan jî kintir were nivîsandin bi sebeb ku ji pîvê der e, ne xweşik tê ḥesibandin. Min ji xettatekî Sitenbolê xettên Seyda pirsî da ku ez fêm bikim di nezera xettatan de xettê seyda çewa ne. wî xettadî wiha got: "Ez van xettan nas dikim. Min Nuxbetulle'alî dîtiye, xettên wî ne di pîva xettan de ne belê xetnî şêrînin."*

*Xettên Seyda ne di pîva xettan de ne, belê ne bê pîv in jî. Pîv tê de hene û pîvên wî jî xettên wî jî xasê bi wî ve ne û şêrînin. Muhîm ew e ku xetên bi pîv xweşik be û çav bikşîne xwe. Ew çax dibe sin'et. Xettatekî ku li gor pîvan dinivîsîne bêje "filan xet şîrîn e" dêmek di wî xettî de sin'et heye. Ji vê jî wirdetir, xettê seyda ji teref temamê kesên ku dîtine ve hatiye 'ecibandin û teklîfa nivîsê lê hatiye kirin. Seyda jî ji van teklîfan kitêbên ku di ketin serê wî qebûl dikir hinka jî qebûl nedikir. Mesela Ḥuseyn Hilmî IŞIK bi*

[45] "Qelemê Cawa" û "zilikê Îranê" qelemên ku xet bi wan tê nivîsandin. Esas qelemê xet vana ne.

[46] "Kağetê bi aher" ewê ku xettat li serê xet di nivisînin. "Qûşe" jî ê ku li ser meşq dikin re tê gotin.

*sebeb ku xetê seyda di bîne û di êcibîne, di sala 1977a de ji Sitenbol kitêba bi navê Nuxbetullealî ji bona ku binivîsîne ji seyda re dişîn e. Seyda di sala 1978a de di qedîne û diçe Sitenbolê bi destê xwe kitêba ku nivîsiye teslîm di ke. Hilmî IŞIK pir di 'ecibîne û li ser vê yekê kitêba Hediyyetulmehdiyyîn jî didiyê ji bo ku binivîsîne. Seyda wê jî di sala 1979 de di qedîne. Herdû kitêb jî hatine çap kirin.''*[47]

### 1.1.9. Helbestvanîya Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî

Helbestvanî û nivîsandina helbestê xesletek fitrî ye. Kemilandina vê xesletê bi cehd û ẋeyret û nîvîsandin û xwendinê ve girêdayîye. Eger însanek di vî warî de bi xwine û binvîse dê ev qabîlyeta wî jî bi kemile û bi pêş de here.

Dema em li berhemên 'Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî mêze dikin em dibînin ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî gelek berhemên xwe yê taybetê wek *Şerha Mem û Zîn, Gulzara Hemûkan Şerha Nûbihara Biçûkan, Rehberê 'Ewam Şerha Nehc ul-Enam* û… hwd bi îzahên berfireh û fikrên orjînal li ser şerh û şîroveya mesnewîyên kurdîyên klasîk nivîsandiye. Ji xwe zeḥmetîya fêmkirin û şerha klasîka jî tiştekî aşîkar e. Ev xebatên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi me didin zanîn ku ew di warê fêmkirin û xwendina helbesta Kurdî de nexasim di warê helbesta klasîk de şareza ye. Di nav xebatên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî de *Dîwana Cami'* wek antoljîyek xweser û taybet dixwîye ku ev berhem digel Dîwana Şêx 'Ebdûrrehmanê Extepî, Dîwana Kerbelayî, Dîwana Seyid 'Elîyê Findîkî gelek qesîde û helbestê 'alim û şêx û meşayixên Kurd di xwe de di ḥewîne. Ev xebat rast didêrîn ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî hem hiskiroxê helbestên Kurdî ye hem jî tomarkarê wan e. Gelek helbestên winda bi keda wî gîhane me. Lê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi awayek taybet li ser telîfa helbesta ne xebitiyê.

Bi qasî ku em jî bîranînên hevalê wî hayîdar dibin Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî nivîsandina helbesta wek nexweşînek qelbî ḥesibandiye. Di vî warî de ji hevalê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî Mele Enwer Kılıçarslan bîranînek xwe ya wihareng tîne ziman:

> *"Seyda di heqê emradên (nexweşînên) qelbî de du ḥeb kaset dagirtibû. Pir xweş û dirêj li ser emradê qelbî sekinî bû. Rojekê ez û wî û Xwedê selametîyê bidyê Mela Mihemed (Mizgîn) li mala Seyfullah bûn, ji me ra beḥsa emradên qelbî kir. Di got "yek ji emradê qelb pir şi'r gotine û yek jî li sazxistine." İja Mela Mihemed pir ş'ir di nivîsandin, Seyfullah jî sazê wî di seriya me ra daleqandî bû. Tabi seyda ne ku qesda wan kir û got, ji xwe hema wiha lihev hat. Îja me go:*

[47] Farûq, h.m, **h.k**, r. 33-34

*"Seyda, welle M. Mihemed şi'ra pir dinivisîne û Seyfullah jî wayê sazê wî li vir daleqandiye û pir li saz dixe. Îja em bi halê xwe keniyan û keniyan."*[48]

Mimkûne ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qox̌î ji ber vê bawerîya xwe zêde helbest nenivîsandibe. Digel vê jî Eḥmed Ḥîlmî el-Qox̌î car cara bi israra hevalên xwe çend helbest nivîsandiye. Nûha wek dîwançeyek biçûk heft helbestên wî li ber destê me hene. Em ji van helbestên wî fêr dibin ku qabîlîyeta wî ya şairiyê bê nîqaş e. Wî helbestên xwe bi zimanek hêsan û herikbar nivîsandiye. Ji hêla ziman ve qusûra helbestên wî nîne. Ji hêla naverokê ve jî ji bil helbesta wî ya ku wî li ser şêxê xwe nîvîsandiye temmamê helbestên wî li ser rexnekirina muxalif û dijraberên wî ne. Em dikarin bêjin ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qox̌î helbestên xwe hem ji bo propaganda doza xwe hem jî ji bo rexnekirin û derewdêrandina muxalifên xwe nivîsî ye. Eḥmet Ḥîlmî di helbestê xwe de fedekar û bê perwa ye û ji tu kesî minnetê nakşîne. Wek mînak ev beytên wî vê xesleta wî nîşandin.

*"De'wa me her İslam e her razîbûna Rebbê me*
*Te divê 'alem tev dujmin bî ew ser me bigre kîn e*

*Her çî ehlê İslamê bin sê tişt ser wan lazim tên*
*Mal birjînin, sebrê bînin, bidne canê şîrîn e"*

### 1.1.10. Exlaqê Eḥmed Ḥîlmî El-Qox̌î

Li gorî beyana ehlê malbatê Eḥmet Ḥîlmî mirovek sernerm û exlaqxweş bû. Hem di nav malbata xwe de, hem di nav feqîyên xwe de, hem jî di nav xelkê de gelekî dihat ḥeskirin. Bi mezina re mezin, bi biçûka re biçûk bû.[49] Temmamê zarwên xwe li ser exlaq û edeba îslamî terbiye dikir. Xwe û ehlê xwe ji karên neqencê wek ḥesûdî, çavnebarî, derew, paşgotin û hwd diparast.[50] Eḥmed Ḥîlmî el-Qox̌î baş dizanibû ku di hengâma meşa sûk û kolanan de meşa bi qurretî û nêrîna li der û dor li dijî sunnetê ye. Ji lew ew jî dema ku di sûk û kolanan de di meşîya ji bil mecbûrîyetê li der û dora xwe

[48] Mele Enwer Qiliçarslan, "Di derbarê Ehmed Hîlmî el-Qo 'xî de hevpeyivîna bi maîlê," tarîxa têkildariyê, 15.09.2015.

[49] Yalçın, h.h.b.m.

[50] Yalçın, h.h.b.m.

nedinêrî.[51] Wî belavkirina sunnetê wek sunnetek winda qebûl kiribû.[52] Ji lew gelek ehemmiyet dida belavkirina sunnetê. Eḥmet Ḥîlmî ji xwendina Quranê pir ḥes dikir. Dîsa Eḥmet Ḥîlmî ehemmîyetek zêde dida qencî û qerz-i ḥesen.[53] Eger nasên wî bi deyn ango ne bi deyn pere jê bixwestina eger li ba wî pere heba îlla dida. Lê ji hêla taqîba malê xwe ve misqalek sist bû.[54] Lewma gelek cara hinek kesa pere jê distendin û perê wî dixwarin. Ew jî nediket pêy wan. Ev exlaqê wî di nav malbatê de car cara bûye sebebê tengasîya aborî.[55] Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ji camî û cemaetê pir ḥes dikir. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî pir ehemmiyet dida heq û huqûqê cîrantîyê. Hasilî kelam Eḥmet Ḥîlmî di warê exlaq de waris û muqellîdê pêyxember bû û li gorî Qur'an û sunnetê di meşiya.

### 1.1.11. Wefata Eḥmed Ḥîlmî El-Qoẋî

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ḥeta dawîya 'umrê xwe bi rakirina feqî û te'lîfa berheman ve meş ẋul dibe. Daxwaza wî ya dawîya herî mezin ewe ku meal û tefsîrek Kurdî binvîse. Bi vê niyetê dest bi *Tefsîra Ḥîlmî* dike lê Xwedê Te'ala pêre nebe serî. Ev xebata wî nîvcû dimîne. Di vê demê de qabîlîyeta hereketa destê wî ze'îf dibin. Di hengâma nivîsandinê de nexweşînek wek desthêjê lê peyda dibe. Digel vê jî Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî dev ji xwendin û nivîsandinê bernade tim bi telîfa berhemên olî û xwendina feqîyan re meşẋûl dibe.

Nîhayet Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di 16ê Gulana sala 1996ê miladî de êvara înê di mala xwe de li ser şîvê kirîza qelb derbas dike û diqelibe ser torineka xwe. Wî radikin Nexweşxana Bismil. Doxtor wî ḥewaleyî Amedê dike. Lê nagîje nexweşxanê di rê de wefat dike.

## 1.2. BERHEMÊN EḤMED ḤÎLMÎ EL-QOẊÎ

Di Medresê Kurdistanê de telîf û nivîsandina berhema nebûye adetek gelemperî. 'Alimên Kurd di medresê xwe de bi giranî berhemên 'Erebî dane xwendin. Meriv dikare bêje ku cara yekemîn Eḥmedê Xanî nebaşîya vê rewşê fêm kiriye û ji bo gelê Kurd

---

[51] Bozdaş, h.h, **h.k,** r. 25

[52] Yalçın, h.h.b.m

[53] Qerz-i ḥesen: Ewe ku mirov wek qencî bi deyn pere an tiştekî dinê bide yekî û paşê ji bo sitendînê 'ecele neke bi sebire. (c)

[54] Yalçın, h.h.b.m

[55] Yalçın, h.h.b.m

nexasim ji bo zarokên Kurda berhem te'lîf kiriye. Piştî Eḥmedê Xanî wek 'Elîyê Teremaxî, Mele Xelîlê Sêrtî, Mele Yûnûsê Ereqtenî çend kesên dî jî bi vî terzî berhem telîf kirine. Digel vê jimara 'alimên ku bi Kurdî berhem telîf kirine pir zêde nîne.

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî yek ji wan kesa ye ku hem bi zimanê Kurdî hem jî bi zimanê 'Erebî ji bo gelê Kurd nexasim ji bo feqîyên medresê berhem telîf kiriye.

Eḥmed Ḥîlmî giranîya berhemên xwe ji bo perwerdehîya zarokên xwe û feqîyên xwe telîf kiriye. Paşê têgîhaye ku lazime ev berhem di medresên din de jî bên xwendin. Ji lew digel desttengîya dinyayê jî berhemên xwe daye çapkirin da ku feqîyên medresê dî jî jê îstîfade bikin.

Eḥmed Ḥîlmî temamê berhemên xwe bi xetên xwe û Elîfba ya 'Erebî nivîsandiye. Li gorî bawerîya me ev tercîha Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî tercîhek bi zanîn bû. Lewra li Tirkiyê piştî înqilaba ḥerfa îrtîbata gel ji çavkanîyên wanê sereke hatibû birîn. Ji lew Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî dixwest ku di navbera do û îro de bi terzê xwe bibe wek pirek û îrtîbata nivşên nû bi berhemên kevn re temîn bike. Dîsa Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî wek Seîd Nûrsî herfên Qur'anê wek malê ummetê yê muşterek didît û elfaba latînî jî di nav 'erda İslamê de wek tovek biyanî didît.[56] Ji lew Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di te'lîfa berhemên xwe de hîç elfaba latînî bikar neanîye.

Nuha çi çapbûyî çi ne çapbûyî gelek berhemên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî li ber destê me hene. Hinek berhemên wî ji teref kesên muxtelîfê wek Zeynel Abîdîn Zinar, Emîn Narozî û… hwd ve hatine latînîze kirin. Hinek berhemên wî jî ji teref lawên wî ve bi bal zimanê Tirkî ve hatine wergerandin. Hinek berhemên wî jî hê çap nebûne û wek destxet mane li benda çapkirinê ne. Hinek ji van berhema telîfên xweser in. Bi şeklek taybet hatine nivîsandin. Hinek ji wan jî şerh û şîroveya berhemên klasîk in. Li vir em dikarın Berhemên Eḥmed Ḥîlmîl el-Qoẋî li ser pênc şaxa dabeş bikin.

### 1.2.1. Berhemên Te'lîfê Taybet

Berhemên ku di vê beşê de ne te'lîfatên taybet in. Ji teref Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ve di mewzûyên cûrbecûr de hatine nivîsandin. Hinek ji van berheman bi zimanê Kurdî ne hinek jî bi zimaê 'Erebî ne.

---

[56] Yalçın, "Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De," h.b.t., Tarîxa têkildarîyê 09.11.2016

### 1.2.1.1. Tefsîra Ḥîlmî

Digel ku di Medresê Kurdistanê de tefsîrên ‘Erebî bi zimanê Kurdî dihatin şîrovekirin jî nivîsandina tefsîrên Kurdî yên taybet nebûbû ‘adet. Ev kêmasiyek ji kêmasiya ‘alimên Kurd e. Lê dîsa jî çend kes hene ku li dijî vê ‘adetê meşiyane. Hinekan meal, hinekan tefsir nivîsîne.

Eḥmed Ḥîlmî jî yek ji wan kesa ye ku li dijî vî adetî meşiyaye û dest bi nivîsandina tefsir û mealek Kurmancî kiriye. Lê ‘umrê wî wefa nekiriye û ev mexseda xwe nebiriye serî. Tenê tefsîra Suretê Fatîhe û Beqere qedandiye û çend ayet jî ji Suretê Alî İmran tefsir kiriye û wefat kiriye. Ev xebata wî jî wek muswedde maye. Paşê di sala 2015ê miladî bi tesḥîha ‘Ebdulquddûs Yalçin di nav weşanên Weşanxana Bangaheq de hatiye weşandin. Zimanê vê tefsîrê zimanek hêsan û Kurmanciyek herikbar e. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di vê berhema xwe de ji tefsîrên muteber istifade kiriye. Tefsîra Ḥîlmî 297 rûpel e.

Li ser tefsir û mealên Kurdî di berhema Haşîm Özdaş a bi navê “Kuran’ın Kürtçe Çevirilerinde Karşılaşılan Problemler Ve *Meala Fîrûz Şerha Qurana Pîroz* Örne ği” de agahîyên berfireh niştecîh in.[57] Di vê xebatê de kurteagahîyek di derheqê Tefsîra Ḥîlmî de jî heye.[58]

### 1.2.1.2. Emelê Şev u Rojê

Çewa ku me di serî de jî got Eḥmed Ḥîlmî ‘alimek mutesewif bû. Lewma ehemmîyetek mezin dida zikrê. Li gorî ku ehlê malbatê dibên: Eḥmed Ḥîlmî di rabûn û rûniştin û temmamê jiyana xwe de bi zikr û du‘a hereket dikir û dixwest ku Musluman tev de di ḥeyata xwe ya rojane de zikr û d‘ua îhmal nekin.[59] Ji lew Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ji bo vê pêdivîya ‘ûmûmî di warê du‘a de kitêbek wek kitêba bêrîkê nivîsî û di vê kitêbê de çi duayê ku di ḥeyata muslumana de ji bo ḥeyata maddî û manewî lazime civand. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di telîfa vê kitêbê de lefzên zikra bi giranî ji *el-Ezkara* İmam Newewî (1233-1277) wergirtiye. Di serê her du‘ayî de bi zimanê Kudî wextê

---

[57] Haşîm Özdaş, Özdaş, Kuran’ın Kürtçe Çevîrîlerînde Karşılaşılan Problemler Ve Meala Fîrûz Şerha Qurana Pîroz Örneği, **(Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi),** Dîcle Üniversitesi, SBE, 2015, r. 8-43

[58] Özdaş, h.b. r. 42

[59] Yalçın, “Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De” h.b.t., Tarîxa têkildarîyê 09.10.2015

xwendina du‘a hatiye nivîsandin. Car caran jî hinek lefzê du‘ayan bi bal zimanê Kurdî ve hatine wergerandin.

Ev kitêba hicmpiçûk û naverokdewlemend piştî cara ewil di sala 1996a de hatiye çapkirin. Paşê lawê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ‘Ebdulquddûs Yalçin ev berhem bi bal zimanê Tirkî ve wergerandiye.

*Emelê şev û Rojê* digel wergera Tirkî bi xeta ‘Ebdulquddûs Yalçin wek pirtukek sê zimanî di nav weşanên Weşanxaneya Dua de hatiye weşandin. Çapa Duayê beşa Tirkî 112 beşa Kurdî û ‘Erebî 105 rûpel e.

#### 1.2.1.3. Eqîda Ḥîlmî

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhema xwe bi awayeke kurt ji bo te’lîma zarokên xwe û zarokên Kurmanca bi zimanê Kurdî wek pexşan telîf kiriye da ku zarokên Kurmnca di demeke kurt de li gorî fehm û îdraqa xwe bi kurtî fêrî esasên ‘eqîdê bibin. Ev berhema Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî 16 rûpel e.

#### 1.2.1.4. El ‘Ewamîl ul- Ḥîlmî ye Me‘e Ḥewaşîha

Eḥmed Ḥîlmî ev berhema xwe di warê neḥwê de te’lîf kiriye. Xusûsîyeta vê berhemê ew e ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi giranî ji ayet û ḥedîs û termên İslamî mîsal anîye. Ehmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhema xwe di xebata xwe ya bi navê *Resaîl el-Xems* de civandiye. Ev berhem 20 rûpel e.

#### 1.2.1.5. Ez- Zuruf u we l-Cumel

Eḥmed Ḥîlmî ev berhema xwe bi Zimanê ‘Erebî di warê giramera ‘Erebî de di warê zerfan de te’lîf kiriye.

Taybetîya vê berhemê jî ewe ku mîsalên wê ji ayet û ḥedîsa ne. Ehmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhema xwe di xebata xwe ya bi navê *Resaîl el-Xems* de civandiye. Ev berhem 15 rûpel e.[60]

#### 1.2.1.6. Rîsalet ul-Ḥîlmîye Fi l-Qewa‘îd ul-Wed‘îye

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev rîsala xwe ji bo jiberkirinê di warê ‘ilmê wed‘ê de bi awayek kurt ji bo jiberkirina feqîyan bi zimanê ‘Erebî nivîsîye. Paşê ji bo ku baş bê

---

[60] Ḥîlmî, “Xebatên Seydayê Ḥîlmî”, **Kovara Kelha Amed,** j. 16, Nîsan 2013, r. 56

fêmkirin hinek haşiye lê zêdekiriye. Ev berhem di Adara sala 1989a de hatiye te'lîfkirin û ji 47 rûpela pêk hatiye. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhema xwe di berhema xwe ya *el-Mutun* de civandiye.[61]

#### 1.2.1.7. Rîsala Mentiqê

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhema xwe bi dewlemendkirina jêrenotên wek haşiye di warê 'ilmê mantiqê de ji bo jiberkirina feqîyan te'lîf kiriye. Li gorî beyana Mele 'Ebdulquddûs jêrenotên vê berhemê gelek fêdedar in. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhema xwe di berhema xwe ya *el-Mutun* de civandiye. Ev berhem digel haşîyeyên xwe 62 rûpel e.[62]

#### 1.2.1.8. Rîsala Munazarê

Eḥmed Ḥîlmî ev berhema xwe di warê 'ilmê munazarê de bi zimanê 'Erebî te'lif kirîye û bi jêrenotên wek haşiye xemilandiye. Li gorî agahîyên Mele 'Ebdulquddûs ev berehem û haşîyeyên vê berhemê gelek fêdedar in. Lewra Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî piştî tecrubeyek duvdirêj pêdivî bi nivîsandina van berhema dîtîye.[63] Ev xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ji 55 rûpela pêk hatiye. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhema xwe di berhema xwe ya *el-Mutun* de civandiye.

#### 1.2.1.9. Rîsaletun Fî l-İstî'are (Rîsala İstî'arê)

Eḥmed Ḥîlmî ev berhema xwe ji bo te'lîma zarokê xwe û feqîyên xwe di warê 'ilmê beyanê de nivîsîye û wek ders bi wan daye xwendin. Ev xebata wî wek muswedde maye nehatiye weşandin. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhema xwe di berhema xwe ya *el-Mutun* de civandiye.

---

[61] Ḥîlmî, "Xebatên Seydayê Ḥîlmî", **h.k,** j. 16, r. 57.

[62] Ḥîlmî, "Xebatên Seydayê Ḥîlmî", **h.k,** j. 16, r. 57.

[63] Ḥîlmî, "Xebatên Seydayê Ḥîlmî", **h.k,** j. 16. r. 57.

### 1.2.1.10. Sîlsîletu Sadatin-Nexşebendîyye

Di derheqê sadatên Nexşbendî de lewḥeke meşhûr e. Di vê lewhê de sadatên Nexşebendî nav bi nav hatine rêzkirin. Ev lewhe te’lîfata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ye.

### 1.2.2. Berhemên Te’lîfê Wek Şerh

Berhemên ku di vê beşê de ne ji teref Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ve ji bo şerha metnên muxtelîf hatine te’lîfkirin. Ev şerh şerhên berfirheh in.

Hinek ji van berhema bi navê xwe ji metnên ku di hengama nivîsandina van berhema de wek çavkanîya sereke hatine pejirandin vediqetin. Lewra navê şerhê musteqîl û cûda ye. Hinek jî tenê wek şerh hatine binavirin.

### 1.2.2.1. Hedîyet ul-Ḥebîb

Ev berhema Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî şerha *Ẋayet ul-Îxtîsara* Qadî Ebû Şûca‘e (mr.1107), Xayet ul-Îxtîsar di warê Mezhebê Îmam Şafi‘î de metnekî kevnar û çavkanîyek sereke ye. Kitêbek ji kitêba rêzê ye. Di medresê Kurdistanê de ji teref feqîyan ve tê xwendin û jiberkirin. Ev metn wek bingeha îlmîhala Mezhebê Şafi‘î ye. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev metn bi awayek berfireh, bi zimanek herikbar û bi kurdîya Kurmancî ji nû ve babet bi babet şerh kiriye. Wek beḥsa Quran û xîlafetê du mewzû lê zêde kiriye û daye çapkirin.

Eḥmed Ḥîlmî di vê xebata xwe de li ser şopek ‘ilmî meşiya ye. Ji gelek berhemên fiqhê mîsal anîye û gelek meselên nû bi şîroveyek zelal ḥel kiriye. Wek ku ji navê wê jî tê fêmkirin ev berhem ji Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bo birayên wî yê Kurdê bawermend diyariyek ‘ilmî ye ku bi zimanê wan ji wan re hatiye nivîsandin. Ev berhem gelek cara, ji teref gelek kesan ve hatiye çapkirin û li çar terefê Kurdistanê hatiye ‘ecibandin. Ev berhem cara dawî di nav weşanên Weşanxaneya İhsan de bê destûra warisên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî hatiye weşandin.[64] Çapa İhsanê 275 rûpel e.

‘Ebdulquddûs Ḥîlmî jî ev xebata bavê xwe bi tenzîm û tertîbek nû bibal zimanê Tirkî ve wergeandiye û di nav weşanên Weşanxaneya Du‘a de daye weşandin.

[64] ‘Ebdussamedê lawê Eḥmed Ḥîlmî di hengâma hevpeyivîna me ya taybeta bi telefonê de beyan kir ku “Weşnxaneya İhsan bê destûra wan temmamê berhemên Eḥmed Ḥîlmî bi awayek qorsan weşandiye.” h.t.b.w.t. Tarîxa têkildarîyê 14.08.2016)

#### 1.2.2.2. Rehberê ‘Ewam Şerha Nehc ul-Enam

*Nehcûl Enam* berhemek ji berhemê Mele Xelê Sêrtî ye ku di medresê Kurdistanê de ji wexta te’lifê ta nuha wek ders hatiye xwendin û jiberkirin. Mele Xelîl ev berhema xwe di warê eqîde, exlaq, adab û tesewufê de wek helbest bi kurtî nivîsîye.

*Nehcul-Enama* Mele Xelîl di nav mesnewî û klasîkên Kurdî de berhemek taybet û giranbiha ye. Eḥmet Ḥîlmî jî ev berhem bi awayek berfireh û bi zimanê Kurdî şerh kir. Di dawîya vê berhemê de jî *Sirrûl-Mehşera* Feqî Reşîdê Hekarî digel çend qesîdeyên taybet bi cîh kir û weşand.

Xebata Eḥmet Ḥîlmî a li ser *Nehcul-Enamê* li çar terefê Kurdistanê ket rewacê û belav bû. Ev berhem 78 rûpelî pêk hatiye. Zimanê wê zimanek herikbar û sivik e. Li gorî beyana Mele ‘Ebdulquddûs dema ku ev berhem hat telîfkirin û ket piyasê çi ‘ewam û çi xewas gelek kesan sipasîya xwe raberî Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî kirine.[65]

Ji Zanîngeha Mûşê İbrahîm Gözeten jî li ser *Nehcul-Enama* Mele Xelîl têza lisansa bilind çêkiriye û di teza xwe de wek çavkanîyek sereke ji şerha Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî îstîfade kiriye.[66]

Rehberê ‘Ewam ji teref weşanxaneya İhsan ve digel *Sirrul Mehşerê* hatiye çapkirin. Çapa weşanxaneya İhsan 85 rûpel e. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di dawîya vê berhemê de bi qasî rûpelek kurtejîna Mele Xelîl jî nivîsîye.

#### 1.2.2.3. Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî

*Eqîda Eḥmedê Xanî* Berhema yekemîne ku ji bo tedrisata bi zimanê Kurdî di warê eqîdê de li gorî eqîda Eş‘arîyan bi awayek kurt wek menzûm hatiye nivîsandin. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî cara yekem ev berhem ji xwe re wek bingeh qebûl kiriye û bi zimanê Kurdî wek şerhek berfireh li ser çêkiriye.

Zeynelabîdîn Zinar diyar dike ku wî ev berhem di sala 1986ê miladî latînîze kirye û li Almanya daye çapkirin.[67] Bes me tîpguhêza Zinar nedîye û em nizanin ku çawan e.

---

[65] Ḥîlmî, “Xebatên Seydayê Ḥîlmî”, **Kovara Kelha Amed,** hj. 16, Nîsan 2013, r. 59

[66] İbrahim Gözeten, Gözeten, İbrahim, “Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wîya Nehcul-Enam Metn û Lêkolin”, **(Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi),** Muş Alparslan Ünîversitesi, SBE, 2015, r. 13

[67] Zînar, “Eqîdeya Ehmedê Xanî”, **Kovara Nûbihar,** j. 13, Çiriya Pêşîn, r. 11

Lawê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî Mele ‘Ebdul Quddûs ev eberhema wî ji nu ve bi xetê ‘erebî tesḥîh kiriye lê hê ne weşandiye. Me jî ev xebata Eḥmet Ḥîlmî ji xwe re wek mijara teza lisansa bilind pejirand. Ev berhema Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi Xetê ‘Erebî 78 rûpel e.

### 1.2.2.4. Gulzara Hemukan Şerha Nûbîhara Biçûkan

*Nûbîhara Biçûkan* Berhema Eḥmedê Xanî ye. Eḥmedê Xanî ji ferhengên ‘erebî bi qasî hezar kelîmeyên sereke hilbijartiye[68] û mana wana Kurdî di Nûbihara Biçûkan de nîvîsandiye.

Eḥmed ê Xanî ev berhema xwe li gorî ‘ilmê ‘erûzê di qalibê beḥrên muxtelîf de nivîsand. Ev berhem di medresê Kurdistanê de ji bo fêrbûna Zimanê ‘Erebî bû çavkanîya destpêkê û ji teref feqîyan ve hat jiberkirin.

Eḥmed Ḥîlmî jî ev berhema ‘Eḥmed ê Xanî bi Kurmanciyeke herikbar û belîẋ wek pexşan bi ḥerfên ‘Erebî şerh kir û di 24ê Tebaxa sala 1994ê miladî de ev şerh qedand.

Ji ber ku Eḥmedê Xanî her beşekî *Nûbiharê* li gorî behrek ‘erûzê nivsand, Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî di serê *Gulzara Hemûkan* de bi Zimanê ‘Erebî bi awayek kurt li ser ‘ilmê ‘erûzê sekiniye û beḥsa van behra kiriye.

Çawa ku tê zanîn Eḥmedê Xanî di Nûbiharê de bi qasî hezar kelîmeyên ‘Erebî digel mana wana bi Kurdî bikar anî ye. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di dawîya Gulzara Hemûkan de ji bo danasîn û jimara kelîmeyên Kurdî û ‘Erebî cedwelek saz kiriye. Li gorî vê cedwelê di Nûbihar û şerha wê de 848 kelîmeyên Kurdî û 1354 kelîmeyên ‘Erebî hatine bikaranîn.[69] Ji vê jimarê jî ‘eyan e ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di şerha Nûbiharê de ji bil kelîmeyên Nûbiharê ê ku Eḥmedê Xanî bikar anîye 354 kelîmeyên ‘Erebî yên nû jî bikar anîye. Ev berhema Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî 85 rûpel e.

### 1.2.2.5. Şerḥa Mewlûda Bateyî

*Melayê Bateyî* (1414-1492) ew kese ku di nav Kurda de cara yekemîn Mewlûdek bi zimanê Kurdî nîvîsîye. Ev mewlûd di nav Kurda de li her derê Kurdistanê hatiye ‘ecibandin û ji roja te’lîfê ta nuha di şîn û şahîyên Kurda de hatiye xwendin.

---

[68] Kadrî Yıldırım, **İnanç Risalesi,** İstanbûl, Weşanxaneya Avesta, 2008, r.40

[69] Ḥîlmî, “Xebatên Seydayê Ḥîlmî”, **h.k,** j. 16, r. 58

Temmamê Mewlûdên Kurdî yên ku piştî *Mewlûda Bateyî* hatine nivîsandin tev di bin bandora wê de mane, gelek ji wan jî teqlîdê wê ne. Lê pir şerh û şîrove li ser nehatine çêkirin. Li gorî beyana Ewladên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî, Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî pir zêde di bin bandora mewlûda Bateyî de maye. Dema ku Mewlûd xwendiye bi ji xwe çûye û ketiye halekî din.[70] Lê wî jî ḥeta wexta salên xwe yê dawîn cesaret nekiriye ku Mewlûda Bateyî şerh bike. Di salên dawîya ʻumrê xwe de giranîya wextê xwe daye ser û bi Kurdîya Kurmacî şerhek li ser Mewlûda Bateyî çêkiriye. Ev xebata wî wek muswedde maye. Lewra ʻumrê wî têra tesḥîh û çapkirinê nehatiye. Ev berhema wî nuha wek muswede ye û li benda teshih û weşanê ye. Şerha Mewlûda Bateyî a wek muswedde 50 rûpel e.

**1.2.2.6. Şerḥa Mem û Zînê**

*Mem û Zîn* te'lîfa ʻEḥmed ê xanî ye ku ji roja te'lîfê ta nuha ji teref gelek kesan ve li gelek cîha hatiye çapkirin. Lê pur zêde şerh li ser nehatine çêkirin.

Ji ber ku di *Mem û Zînê* de gelek kelîmeyên Farisî, ʻErebî û Kurmancîya kevnar hebûn pêdivî bi şerha Mem û Zînê hebû. Lê şîrova vê berheme karekî zehmet bû lewra ji bo vî karî wek Farisî, Kurdî û ʻErebî başzanîna sê zimana mecbûrî bû.

Xebata li ser vê berhemê ji hêla fermî ve jî cesaret dixwest. Lewra ji ber ku zimanê Kurdî qedexe bû, Kurd jî li gorî sîstemê tunebûn, di wan sala de qonaxa nivîskarên zimanê Kurdî an ḥebs û zindan, an reva ji war û welat, an jî jîna bi fîrarî bû. Di dem û dewrek wihareng de Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî xwe da ber vî barî û bi zimanê ʻErebî dest bi şerha *Mem û Zînê* kir û di sî salîya ʻumrê xwe de bi xetên xwe di sala 1972yê miladî de dawî li şerhê anî. Lê ji ber şert û mercên demê ev xebat neçapkirî ma û nuha li benda çapkirinê ye.

Eḥmed Ḥîlmî di *Şerha Mem û Zînê* de li ser beşên evînê, li ser ʻilmê felekîyatê sekiniye û tiştên balkêş nivîsîye.

Ev xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî pisporîya wî ya li ser zimanê Kurdî, ʻErebî û Farisî baş nîşan dide. Lewra wî di vê şerhê de gelek peyvên Kurdîya kevnar, gelek peyvên zimanê ʻErebî û Farisî şîrove kiriye.

[70] Yalçın, "Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De" h..b.t., Tarîxa têkildarîyê 14.08.2016

Ev şerh di babetê xwe de li ser Mem û Zînê bi zimanê ‘Erebî şerha yekem e û ji 252 rûpela pêk hatiye.

### 1.2.2.7. Zurûf Digel Şerha Xwe Zêrîn  Ḥuruf

*Zurûf* Berhema Mele Yûnusê Erqetînî ye. Li gorî beyana ‘Ebdurrehman Adak Mele Yûnûs an li gundê Helqetîna Qulpê an jî li Helqetîna wanê di sedsala 17. de hatiye dinê. Lê bi borîna demê re navê wî bi awayek şaş wek Mele Yûnûsê Erqetînî hatiye bilêvkirin û wek Erqetînî maye.[71]

Mele Yunusê Erqetînî jî wek ‘Elîyê Teremaxî û Eḥmedê Xanî ji bo perwerdehîya zarokên Kurda bi Kurdî berhem nivîsîye. Kitêba Zuruf jî yek ji wan e ku li ser neḥwa ‘Erebî ye û ji hinek zerfan pêk tê.

Ji ber ku zimanê Zurufê zimanek giran bû ‘Eḥmed Ḥîlmî bi Kurmacîya Diyarbekir[72] bi navê *Zêrîn Ḥurûf* şerhek li ser nivîsî da ku bêtir jê bê îstifadekirin. Şerha Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî digel metnê Zurûfa Mele Yûnis 15 rûpel e.[73] Ev berhem di xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a bi navê *Resaîl el-Xems* de hatiye civandin.

### 1.2.2.8. El-‘Ewamîlul-Curcanîye Me‘e Şerḥîhî el-Mesaîlul-Mercanîye

*‘Ewamîla Curcanî* di eslê xwe de berhema Şêx ‘Ebdulqahirê Curcanî (?-1078) ye. Ev metn bi awayeke kurt beḥsa sed ‘amilên ‘ilmê nehwê dike. Li gorî Beyana ‘Ebdulquddûs Yalçin ev berhem di warê te’lîma neḥwa ‘Erebî de berhemek meşhur e ku gelek şagirdan jê îstîfade kiriye û gelek şerh li ser hatine çêkirin. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî ji nû ve ev berhem bi terzekî nû û navekî cûda şerh kiriye da ku bêtir fêdedar be.[74] Ev berhem 25 rûpel e. Ev berhem di xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a bi navê *Resaîl el-Xems* de hatiye civandin.

---

[71] Abdurrahman Adak, **Destpêka Edebîyata Kurdî Ya Klasîk**, İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar, 2014, r. 305

[72] Ḥîlmî, “Xebatên Seydayê Ḥîlmî”, **h.k,** j. 16,  r. 56

[73] Ḥîlmî, “Xebatên Seydayê Ḥîlmî”, **h.k,** j. 16,  r. 56

[74] Ḥîlmî, “Xebatên Seydayê Ḥîlmî”, **h.k,** j. 16,  r. 57

### 1.2.2.9. Terkîba Mele Yûnûs Me‘e Ḥaşîyetî et-Et Tertîb’ul Munîs

*Terkîb* berhema Mele Yûnisê Erqetînî ye û di warê neḥwa ‘Erebî de bi Kurdîya Kurmacî hatiye nivîsandin ketiye mufredata te’lîma Medreseyên Kurdistanê.[75] Ev berhem berhemek gelek fêdedar e ku ta nuha feqîyên Kurd jê îstifade dikin. Ev berhem di medresê Kurdistanê de tê jiberkirin lê zimanê wê misqalek giran bû.[76] Ji bo ku ev metn bêtir bê fêmkirin Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi navê Haşiye *et-Tertîb ul-Munîs* bi terzek nû wek te’lîf bi zimanê ‘Erebî şerhek li ser vê berhemê çêkir. Di vê şerhê de xalên dijwar bi berfirehî vejand û hêsan kir. Ev berhema Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî digel metnê terkîba Mele Yûnis 50 rûpel e.[77] Ev berhem di xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a bi navê *Resaîl el-Xems* de hatiye civandin.

### 1.2.3. Berhemên Ku Haşiye Li Wan Hatine Zêdekirin

Ev berhem di eslê xwe de ne te’lîfa Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ne. Bes Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhem hem bi xeta xwe ji nû ve meşq kiriye hem jî ji bo hêsankirinê haşiye li wan zêde kiriye.

### 1.2.3.1. Ḥewaşî Şerh îl-Muẋnî (Haşîyeyên Şerḥ ul-Muxnîyê)

*Şerhul Muẋnî* di warê nehwa ‘Erebî de berhemek navdar e. Ev berhem di Medresê Kurdistanê de jî wek kitêba rêzê di rêza heşta de tê xwendin.

Ji ber ku pêdivî bi şerhek nû hebû, Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi zimanê ‘Erebî hinek haşiye û şerh li vê berhemê zêde kir.

### 1.2.3.2. Ḥewaşî Şuzûr uz-Zeheb (Haşîyeyên metnê Şuzûr uz-Zehebê)

*Metnê Şuzûru z-Zehebê* berhemek ji berhemên İbnî Ḥaşim (mr. 833) e ku di warê ‘ilmê neḥwê de hatiye nivîsandin.

Ji ber ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhem ‘ecibandiye wek ders bi lawê xwe yê mezin daye xwendin. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di hengama dersdana vê berhemê de bi

---

[75] Adak, **h.b,** r. 306

[76] Ḥîlmî, “Xebatên Seydayê Ḥîlmî”, **h.k,** j. 16, r. 56

[77] Ḥîlmî, “Xebatên Seydayê Ḥîlmî”, **h.k,** j. 16, r. 56

zimanê ‘Erebî hinek haşiye lê zêde kiriye. Ev xebata Eḥmet Ḥîlmî wek muswedde maye nehatiye çapkirin.[78]

#### 1.2.3.3. Sirr ul-Meḥşer

Ev berhem ji teref Feqî Reşîdê Hekarî (sedsala 18.) ve di derheqê ḥeşr û mîzan û qiyametê de hatiye nivîsandin û di goşê medresa de hatiye jibîrkirin.

Eḥmed Ḥîlmî ev berhem ji nû ve bi xetên xwe nivisîye. Wek jêrenot bi hinek haşîyeyên kurt şîrove kiriye, di hinek cîhan de jî xeletîyên feqî sererastkiriye û di dawîya *Rehberê ‘Ewam* de weşandiye. Tama zimanê Feqîyê Teyran ji vê berhemê tê.

Di derheqê jiyana Feqî Reşîd de malûmatên zêde nînin. Lê ji ber ku berhema xwe ya Sirr ul-Mehşer di sala 1796ê miladî de nîvîsîye em di zanin ku di sedsala 18. De jiyaye.[79] Ji ber ku di derheqê jiyana Feqî Reşîd de malûmat di destê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî de jî tunebûne di serê vê berhemê de di derheqê wî de dibê: “Dibêjin ku ji koçerê Hekarîya ye.”

#### 1.2.3.4. Metnê Cezerî û Te’lîqatên Wê

Ev berhem berhema Muḥemmed İbn el-Cezerî ye. Di warê ‘ilmê tecwîdê de bi awayek menzûm bi zimanê ‘Erebî hatiye nivîsandin. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî bi kurtî wek jêrenot bi zimanê ‘Erebî hinek haşiye li ser çêkiriye. Ev berhem digel haşîyeyên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî 16 rûpel e. Ev berhem di xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a bi navê *el-Mutun* de hatiye civandin.

#### 1.2.3.5. Lamiyetu İbnîl-Werdî

Ev berhem bi awayek menzûm ji teref Îbnî Werdî (1292-1343) ve di warê hinek adab û şîretan de bi Zimanê ‘Erebî hatiye nivîsandin. Ji ber ku qafîya wê bi ḥerfa “Lam”ê diqede wek “Lamîye” meşhur bûye.

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî wek jêrenot bi awayek kurt bi zimanê ‘Erebî hinek haşiye li ser vê berhemê nivîsîye û ev berhem bi xetê xwe ji nû ve vejandiye. Ev berhem digel haşîyeyên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî 16 rûpel e. Ev berhem di xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a bi navê *el-Mutun* de hatiye civandin

[78] Yalçın, “Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De,” h.b.t. Tarîxa têkildarîyê 14.08.2016

[79] Adak, **h.b,** r. 331

### 1.2.3.6. Qewa‘îd ul-İ’rab û Te’lîqatên Wê

*Qewa‘îd-ul İ’rab* di warê nehwa ‘Erebî de ji teref Îbnî Hîşam (mr. 833) ve hatiye nivîsandin. Ev berhem di nav Medresê Kurdistanê de berhemek rewacî ye. Hem tê xwendin hem tê jiberkirin. Ji ber ku ḥicmê wê zêde mezinbûne Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhem di ḥicmê deftera bêrîkê de ji nû ve nivîsandiye û bi gelek haşîyeyên fêdedar xemilandiye da ku feqî hem karibin rihet di bêrîka xwe de bigerînin, hem jî karibin li herderî li ser jiberkirina wê bixebitin. Ev berhem 46 rûpel e. Ev berhem di xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a bi navê *el-Mutun* de hatiye civandin

### 1.2.3.7. Elfîyetu İbnî Malîk

*Elfîye* ji teref Muḥemmed İbnî Malîkê Endulusî (1203-1273) ve di warê ‘ilmê neḥwê de, bi zimanê Erebî li gorî ‘ilmê ‘erûzê di qalibê Behra Recez de wek menzûm hatiye nivîsandin.

Ev metn ji hezar beytî pêk hatiye û di nav ehlê medresê de metneke meşhur e. Hem pir tê xwendin, hem tê jiberkirin.

Ji ber ku metnên mewcûd di warê xettê de tevlihev bûn û bi zeḥmedî dihatin xwendin Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhem ji nû ve bi xetê xwe nivîsî û bi jêrenota fêmkirina wê hêsan kir.

Ev xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî digel haşiyên xwe 110 rûpel e û di Ḥezîrana sala 1991ê miladî hatiye temamkirin.[80] Ev berhem di xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a bi navê *el-Mutun* de hatiye civandin

### 1.2.3.8. Qitr en-Neda We Bell us-Seda û Te’lîqatên Wê

Ev metn ji teref İbnî Hîşam ve di warê ‘ilmê nehwê de bi zimanê ‘Erebî hatiye nivîsandin. Ji ber ku Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di warê te’lima nehwê de pêdivî bi dersdana vî metnî dîtiye ev metn ji nû ve bi xetên xwe nivîsîye û bi jêrenota xemilandiye da ku feqî herî bêtir jê îstîfade bikin. Ev berhem bi tevlî şerhên xwe 39 rûpel e. Ev berhem di xebata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî a bi navê *el-Mutun* de hatiye civandin

[80] Ḥîlmî, “Xebatên Seydayê Ḥîlmî”, **h.k,** j. 16, r. 57

### 1.2.4. Berhemên Ku Ji Kesên Muxtelîf Hatine Civandin

Ev berhem ne yên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ne. Bes ji teref wî ve wek antlojî hatine civandin. Di van berheman de berhemên gelek kesa cîd digrin.

#### 1.2.4.1. Dîwana Cami' (Dîwancivîn)

Eḥmed Ḥîlmî di temmamê 'umrê xwe de digel te'lîfa berhema û xwendina feqiya bi tomarkirina dîwan û helbest û qesîdeyên 'alim û şêx û meşayixan ve jî meşẋûl bûye. Dîwana civîn jî yek ji wan xebatên wî ye ku bi sala hatiye tomarkirin.

Di vê dîwanê de *Dîwana Şêx 'Ebdurrehmanê Extepî, Dîwana Kerbelayî* (1885-1930), *Dîwana Seyid 'Eliyê Findikî* (1890-1967), çend helbestên Hafizê Şîrazî (mr. 1390), çend Helbestên Şemsê Tembrîzî (1185-1248), Çend Helbestên Eḥmed ê Xanî, çend helbestên Şêx 'Elaûddînê Xeznewî (mr.1969) û helbestên gelek 'alim û şêx û meşayixên Îslamê cîh giritne.

Wek qesîda hezretî Ebûbekir çend helbestên 'Erebî, wek helbestên mewlana Camî çend helbestên Farisî ne tê de ev berhem bi giranî bi zimanê Kurdîye. Ev berhem di mijara xwe de antolojîyek taybet e.

Li gorî beyana 'Ebdulquddûs Yalçin ev berhem di heyata Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî de nehatiye temamkirin. Lewra Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî hêj jî li ser tomarkirina gelek berhem û helbestên Kurdî di xebiti. Lê 'umrê wî têr nekir. Ev berhem piştî wefata wî wek temambûyî hatiye ḥesibandin û bi navê Dîwana Cami' hatiye weşandin. Cara dawî Dîwana Cami' di nav weşanên Weşanxaneya İḥsan de hatiye weşandin. Çapa İhsanê 455 rûpel e.

#### 1.2.4.2. El-Kelîmat ul-Qudsîye lî s-Sadat en-Neqşebendîye

Ev berhem ji rîsale û peyvên sadat û şêxên Nexşebendî pêk hatiye. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di vê rîsalê de cara yekemin peyv û rîsaleyên sadatê Nexşebendîyan tomar kiriye û bi xeta xwe meşq kiriye

Ev berhem bi zimanê 'Erebî hatiye nivîsandin û ji 400 rûpelî pek hatiye.

### 1.2.5. Berhemên Ku Ji Nû Ve Hatine Îstînsaxkirin.

Ev berhem jî ne yên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ne. Wî bi xeta xwe ji nû ve van berheman meşq kiriye. Hinek ji wan jî cara yekem bi keda Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî hatine keşfkirin.

#### 1.2.5.1. Rewdetun-Ne'îm

Ev berhem te'lîfa Şêx 'Ebdurrehmanê Extepî ye. Şêx 'Ebdurrehmanê Extepî murşîdek ji murşîdê terîqa Nexşebendî ye. Şêx 'Ebdurrehman di 20ê Gulana 1854'e miladî de li gundê Extepe hatiye dinê.[81] Rewdetun-Ne'îm berhemek ji berhemên wî ye.

Ev berhem ji hêla naverokê ve berhemek sîyerî ye. Bi giranî li ser wesfên Hezretî Pêxember û hedîsa mîracê disekine. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhem bi xetê xwe sala 1966ê miladî de cara ewil dinvîse.

Piştî ku ev berhem tê çapkirin rayedarên wê demê dest didin ser û nahêlin ku bê belavkirin.[82] Ev berhem piştî Şêx 'Ebdurrehman cara ewil bi xetê Eḥmed Ḥîlmi el-Qoẋî li Turkiyê hatiye naskirin. Rewdetûn-Ne'îm 200 rûpel e.

#### 1.2.5.2. Se'dullah Seẋîr Me'e Ḥaşîyet'ul-Gerewî

Ev berhem di warê neḥwê de hatiye te'lîfkirin. Ji bo ku di mederesa de bê xwendin 'Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî bi xetê xwe ji nû ve ev berhem nivîsî ye. Ev berhem 50 rûpel e.

#### 1.2.5.3. El kafîyet ul-Kubra Fin-Neḥwî

Ev berhema Mele Xelîlê Sêrtî ye.[83] Di warê neḥwê de hatiye nivîsandin. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî jî ev berhem ji nû ve bi xetê xwe nivîsiye da ku feqî bi hêsanî jê îstifade bikin. Ev berhem piştî Mele Xelîl cara yekem bi saya destxeta Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di medresê Kurdistanê de ketiye rewacê.

---

[81] Ozaydin, Dr. Mûrat, **Şeyh Abdurrahman Aktepe**, İstanbul: Cihan Yayınları, 2009, r. 69

[82] Zinar, **Numune Ji Gencîneya Çanda Qedexe,** r. 162.

[83]Adak, h.b, r. 328.

### 1.2.5.4. Fethul-Celîl

Çawa ku ji Hedîtyetul-Ḥebîb jî tê zanîn Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî piştî zimanê ‘Erebî herî bêtir ji şuxla li ser fiqhê ḥes kiriye. Fethul-Celîl jî berhema Mele Ḥuseynê Kiçik (1871-1955) e ku di warê fiqhê de bi zimanê ‘Eerebî hatiye nivîsandin.

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî ev berhem ji nû ve bi xetê xwe meşq kiriye û raberî îstîfada ehlê ‘ilmê kiriye. Ev berhem 138 rûpel e.

### 1.2.5.5. Dîwana Melayê Cezerî

Melayê Cezerî di edebiyata Kurdîya klasîk de xwedî cîhekî muhîm e. Dîwana wî di nav ehlê medresê de gelek belevbûyî û gelek meşhur e. Gelek melayên Kurd ew ji nû ve bi xetê xwe nîvîsîne.

Li gori ku Ruḥullah Oz dibê: Di pirtukxana Muḥsîn Doskî ya taybet de bi destxeta Eḥmet Ḥîlmî el-Qoẋî nusxeyek Dîwana Melayê Cezerî heye.[84]

Gelo Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî Dîwana Mela çi wextê bi xetê xwe nivîsîye em nizanin. Me ev mesele ji lawê wî ‘Ebdussamed pirsî di vî warî de agahîyek wî tunebû tenê got ku xebatek seydayê wihareng nîne.[85]

## 1.3. TERZÊ NIVÎSKARÎYA EḤMED ḤÎLMÎ EL-QOẊÎ

Gelek hevçaxên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di nav nivîsê xwe de guh nedidan destnîşankirina çavkanîyan. Lê bi qasî ku ji berhemên wî tê fêmkirin Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di berhemên xwe yên te’lîf de li ser riyek zanistî meşiya ye. Çavkanîyên xwe ê wek ayet hedîs, şexis u berhem diyar kiriye. Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di berhemên xwe de dema ku ji çavkanîyek îstifade kiribe ew çavkanî jî di berhema xwe de nişan daye. Çavkanîyên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî yên sereke wek berhemê Sadeddînê Teftezanî (1322-1390), İbnî Kesîr, İbnî Teymîye (1263-1328), ‘Elîyul-Qarî (mr.1605), Fexreddînê Razî û… hwd klasîkên kevnar in. Digel vê Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di nav ‘alimên ‘esrî de herî bêtir ji Se‘îd Nursî îstîfade kirye û di xebatên xwe de nexasim di Rehberê Sanî de berhemên wî wek çavkanîyek sereke nîşan daye.

---

[84] Oz Ruḥullah,Öz, “Molla Eḥmed el-Cızîrî’nîn Divaninda Kelamî Konûlar”, (**Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi**), Harran Üniversitesi, SBE Kelam Anabilim Dalı, r 74.

[85] Yalçın, “Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De”, h.b.t., Tarîxa Têkildarîyê 14.08.2016

Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî di berhemên xwe de nexasim di berhemên Kurdî de zimanek herikbar û hêsan bikar anîye. Di gel vê di berhemên wî de nexasim di damezrandina hevokên şerha kitêbên ‘Erebî de tesîra zimanê ‘Erebî ‘eyan e. Wek mînak wî hevokên şerhê wek terzê rêzkirina ‘Erebî li ser mana şikestî bikaranîye. Dîsa di nav hevokên Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî de gelek peyvên ‘Erebî cîh digrin. Car caran di nav metnê de cîh dide hedîs û ayetan lê bi bal zimanê Kurdî ve wernagerîne. Ev terz terzê melayên Kurdistanê ye gava ku di meselekî de ji ayet û hedîsan delîl tînin tenê ayet û ḥedîsa dixwînin lê tercume nakin. Em dê li vir bi mînakek ji Rehberê ‘Sanî dawî li vê mijarê bînin.

> ‘‘Dema te ev bihîst, duruste tu tetbîqa herdû mesleka li hev bikî. Lewra mimkûne ku ayeta كَانَتَا رَتْقًا فَفَتَقْنَاهُمَا[86] îşaret bike ku erz digel menzûma şemsîye wek hevîrekî bû. Destê qudretê wî ‘ecinand ji cewherekî besît, yanî ji madda esîrê ku wek ava seyale nifûz dike bi ceryana di navbeyna hemî mewcûdatan de. Weya وَكَانَ عَرْشُهُ عَلَى الْمَاءِ[87] îşaret be bi bal vê madda ku wek ba ye.’’[88]

Herwekî ku di vir de jî ‘eyan e Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî tenê bi zikra ayetê qani’ bûye pêdivî bi tecumê nedîtîye.

[86] (Erd û asîman) bi hev ve zeliqandî bûn (wî) ewji hev veqtandin (enbîya30)

[87]Hê ku ‘erşê wî li ser avê bû. (Hûd 7)

[88] Eḥmed Ḥîlmî, El-Qoxî, Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî, (Weşanxane, cîhê weşanê û tarîxa çapê ne diyar e,) 1984, r. 51

## BEŞA DUYEMÎN

## TRANSKRÎBSÎYONA REHBERÊ SANÎ

### 2.1. DI DERBARÊ REHBERÊ SANÎ DE

#### 2.1.1. Bi Kurtî Danasîna Rehberê Sanî

*Rehberê Sanî Şer'ha Eqîda Eḥmedê Xanî* berhemeke pexşan e. Ev berhem ji teref E'hmed Ḥîlmî el-Qo'xî ve ji bo *Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî*[89] hatiye te'lîfkirin.

Herwekî ku tê zanîn E'hmedê Xanî eqîda xwe ji bo te'lîma zarokên Kurmanca bi awayeke menzûm te'lîf kiribû da ku zarokên Kurmanca di hengâma te'lîmê de bi hêsanî karibin jiber bikin. Lê Eḥmed Ḥîlmî el-Qo'xî *Rehberê Sanî Şer'ha Eqîda Eḥmedê Xanî* ne ji bo zarokên Kurmnaca belkî ji bo te'lîma wan feqîyên ku di te'lîmê de gîhane asteke berkemal nivîsîye. Zimanê wê hêsan be jî naveroka wê giran e. Kesê ku di warê 'ilmê kelam de agahîyek wî tunebe dê di fêmkirina vê berhemê de zehmet bibîne.

Metnê *Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Eḥmedê Xanî* ê ku li ber destê me ye metneke destxete lê di metba'ayê de hatiye çapkirin. Bes di vî metnî de ne çapxane ne jî cîhê çapê diyar e.

Muelîf di dawîya *Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Eḥmedê Xanî* de tarîxa temamkirina *Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Ehmedê Xanî* wihareng diyar dike: *"Bi alîkarîya Xudayê Kerîm û 'ḥekîm me te'lîfa vê şerḥa delal û nefîs temam kir, di 14ê meha Cemadîyel Ewel da, 1404ê h. Sebat 3, 1399ê Rûmîye. Sebat 16, 1984ê miladîye. Yewmel Xems."* Ji vê beyanê derdikeve holê ku Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Ehmedê Xanî li gorî ḥesabê Teqwîma Hîcrî di 14ê meha Cemadîyel Ewel de, li gorî ḥesabê Teqwîma Rûmî di 3ê Sebata 1399a de, li gorî ḥesabê Teqwîma Mîladî jî di 16ê sebata 1984a de hatiye temamkirin.

[89] Ehmedê Xanî ji 'Eşîra xanîya ye, di sala 1650yê miladî de li Bazidê hatiye dinê û teqrîben di sala 1706ê miladî de li Bazidê wefat kiriye. Tirba wî nuha li bazidê ye. Ehmedê xanî li pêy xwe wek Mem û Zîn, Nûbehara Biçûkan, Eqîda Îmanê sê berhemên taybet hişitiye. Dîwaneke wî jî heye ku piştî wefata wî ji helbestên wîyê muxtelîf ji teref hinek kesan ve hatiye amadekirin.


Muelîf piştî ku dawî li *Rehberê sanî Şerḥa Eqîda Eḥmedê Xanî* anîye di dawîya şerha xwe de cîh daye metnê *Eqîda Ehmedê Xanî*. Di xebata Ehmed Ḥîlmî el-Qoxî de metnê *Eqîda Eḥmedê Xanî* 70 beyt e.

Muelîfê *Rehberê Sanî Şer'ha Eqîda Ehmedê Xanî* rûpela ku tê de şerh çêkiriye bi cetwelê wek çarcoveyek çargoşe nîşan kiriye. Piştî destnîşankirina çarçowê beytên ku hatine şerhkirin berya şerhê di nav du xêza de ji şerhê hatine veqetandin. Dema ku mirov li metnê dinêre bi hêsanî dixwîye ku kîjan beyt di kîjan rûpelî de hatiye şerhkirin.

Metnê *Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Ehmedê Xanî* bi hêsanî tê xwendin. Dema ku mirov li metnê *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmede Xanî* dinêre carna di bin şerhê de kurteşerhên ku bi reqem û xêzekî ji metnê hatine veqetandin xwîya dibin. Giranîya van kurteşerha bi zimanê 'Erebî ne. Carna jî di goşê rûpelan de bi îşareta qelemê hinek kêmasîyên hevoka ji teref muelîf ve hatine sererastkirin an jî kurteagahî hatine dayîn.

Eḥmed Ḥîlmî el-Qo'xî di rûpelê 12.ê *Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Ehmedê Xanî* de ji bo danasîna "Qabê Qewseyn" li gorî tarîfa "Qurtûbî" resmê du kevana hûnaye, berê wan daye hev da ku di zîhn de şeklek ji bo awayê "Qabê Qewseyn" bê rûniştin.

Wêneya resmê ku Ehmed Ḥîlmî el Qo'xî bo danasîna "Qabê Qewseyn" çêkiriye wihareng e:



Metnê Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Ehmedê Xanî ê ku li ber destê me ye ji 78 rûpela pêk hatiye. Kaxizê vê metnê kaxizeke ji hevîrê sêyemîn û rengzer e. Li ser cîlda *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî* ev îbare niştecîh in:

"Kitab, *Rehberê Sanî*, Te'lif, Eḥmed Ḥîlmi El-Qoẋî Ed–Dıyarbekri, El Eş'arî 'Eqide, Ẋeferellahû we lî Walîdîye Amîn, Şerḥa 'Eqida Şêx Eḥmedê Bin İlyas El-Xanî, Teyyeîbellahû Sirrehû We Ce'el El-Cennete Meswahû Amîn"

### 2.1.2. Di Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî de Uslûba Şerhê

Di *Rehberê Sanî Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî* de uslûbek şerhê yê mu‘eyyen nîne. Ehmed Ḥîlmî el-Qo‘xî di vê berhema xwe de li ser terzên muxtelîf dimeşe. Eḥmed Ḥîlmî el-Qo‘xî di şerha hinek beytan de tenê bi şîroveya kelîmeyên beyta qani’ dibe bes qena‘eta xwe beyan nake, di hinek beytan de kelîmeyên beyta hem ji hêla ferhengî ve hem ji hêla termên istilahî ve şîrove dike, paşê qena‘eta xwe beyan dike. Di hinek cîhên *Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Ehmedê Xanî* de tenê destpêka beytê hatiye zikirkirin paşê şerh li dû hatiye. Di hinek beytan de muelîfê *Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Ehmedê Xanî* wek Eḥmedê Xanî nafikir e bes beyta Ehmedê Xanî te’wîl dike. Ehmed Ḥîlmî el-Qo‘xî di hinek cîhên *Rehberê Sanî Şerḥa eqîda Ehmedê Xanî* de ji eslê beyte vediqete û bi şîroveyên berfireh babetê vedike bes şîrove ne wek şerha beytê dimîne. Lewra xanî bi agahiyek kurt û li gor Eş‘arîyan babetê beyan dike. Ehmed Ḥîlmî bi awayeke cûda û beyankirina bawerîyên muxtelîfê dijberî hev meselê vedike û şîroveyên kûr dike.

Di *Rehberê Sanî Şerha Eqîda ‘Ehmedê Xanî* de tiştê herî balkêş ewe ku Eḥmed Ḥîlmî el Qoxî di vê xebata xwe de di hinek babetan de bawerîya ‘Eş‘arî, Mutezîlî, Qederî, Cebrîye û… hwd gelek ekolên eqîdê îslamîyê aniye ziman û nirxandiye. Paşê bawerîya xwe ya taybet di nav metnê de bi peyvên wek “*tu bizan, tenbîh, faîde, welḥasil, xulase*” aniye ziman.

### 2.1.3. Zimanê Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Eḥmedê Xanî

Rehberê sanî Şerḥa Eqîda Eḥmedê Xanî bi Kurdîya Kurmancî devoka Bismil hatiye te’lîfkirin. Zimanê wê zimanek hêsan e. Lê ji ber ku ev metn li gor Kurdîya sitandard nehatiye te’lîfkirin cî bi cî qalibê hevokên wê diguherin. Carna ayet, hedîs an jî hevokek ‘Erebî bê werger dikevin nav metnê *Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Eḥmedê Xanî,* carna wek jêrenot şîroveyên dirêjê ‘Erebî di vê berhemê de cîh digrin. Ev uslûb di warê fêmkirina metnê de ji bo ehlê medresê muşkîl nîne. Lewra giranîya wan ji xwe van metna xwendine û ji wan hayîdar in. Lakîn ‘ewam ne wisa ne. Ji bo wan di xwendina metnên wihareng de wergera îbareyên ‘Erebî lazim e. Da ku ev muşkîlat ḥel bibe. Di vî warî de çend mînakên jêrîn bes in.

*"İmam Eş'arî gotiye: "Qebûla tobê muḥeqeq e eger şertê wê li cî bin bi delîla ayeta* وَهُوَ الَّذِي يَقْبَلُ التَّوْبَةَ عَنْ عِبَادِهِ *lê ku meriv du'a dike: Ya Rebbî tu toba min qebûl bikî lewra meriv nizane ka şertê wê li cîh in yan na.*[90]*"*

*"Dîsa 'eqil durust didêre ku Xudê Te'ala kafîran û gunehkaran têxe cennetê. Tê de ebedî nî'met li wan bike. Ev jî di nezera şerî'etê de ne duruste. Lewra Xudê Te 'ala wan we'îyd û tehdît kiriye ku bi cehennemê wan bide 'ezabdan. Çewa ku gotiye:* إِنَّ الَّذِينَ كَفَرُوا مِنْ أَهْلِ الْكِتَابِ وَالْمُشْرِكِينَ فِي نَارِ جَهَنَّمَ خَالِدِينَ فِيهَا *û gotiye:* وَمَنْ يَعْصِ اللّٰهَ وَرَسُولَهُ وَيَتَعَدَّ حُدُودَهُ يُدْخِلْهُ نَارًا خَالِدًا فِيهَا *û gotiye:* وَمَنْ يَقْتُلْ مُؤْمِنًا مُتَعَمِّدًا فَجَزَاؤُهُ جَهَنَّمُ خَالِدًا فِيهَا *lakîn tenfîz û bicîhanîna we'd û tehdîdê lazime şer'en di ḥeqqê kafîra da, ne di ḥeqqê mu'mînê gunehkar de. Lewra kufra kafîra ne duruste şer'en bête 'efûkirin. Lê gunehê mu'mîna çiqas pirin jî 'efûkirina wan duruste.*[91]*"*

*"Seyyîd Şerif di Şerḥa El Mewaqifê de qeza û qederê wiha Te'rîf kiriye:* قضاء الله عند الأشاعرة هو إرادته الأزلية المتعلقة بالاشارة على ما هي عليه فيما لا يزال وقدره إيجاده إياها على قدر مخصوص وتقدير معين في ذواتها وأحوالها *Yanî di musteqbelê mute'aqib de duruste di te'rîfa qezaê de tu bibêjî "îlmûllah" di bedêla "îradetullah" de. Emma ḥedîsa* فَحَجَّ آدَمُ مُوسىٰ *Adem gotiye:* أَتَلُومُنِي عَلىٰ أَمْرٍ كَتَبَهُ اللّٰهُ عَلَيَّ قَبْلَ أَنْ أُخْلَقَ *mûrad pê Adem di ḥucceta xwe de xalib geriya, di def'a loma piştî tobê de. Lewra mirad ji ḥedîsê* أَ تَلُومُنِي بَعْدَ التَّوْبَةِ عَلىٰ أَمْرٍ قَدْ قُضِيَ عَلَيَّ قَبْلَ أَنْ أُخْلَقَ *Lewra îcma' waqi'e ku loma li ser guneha berya tobê ye. Ema piştî tobê lome tune."*[92]

*"Ev beyt redda mu'tezîlîyan dike ku înkara şefa'etê dikin dibêjin: "Faîde tê de tune. Lewra gunehê kebaîr 'efû nabin bê tobe di dinê de." Delîla wan van ayeta ne û ayeta* وَاتَّقُوا يَوْمًا لَا تَجْزِي نَفْسٌ عَنْ نَفْسٍ شَيْئًا وَلَا يُقْبَلُ مِنْهَا شَفَاعَةٌ *ehlê sunetê dibêjin: "Van ayeta xas in bi kafîra ve." Belkî van ayeta ku herdû ayetên pêşî ne îsbata şefa'etê ji mu'mîna re dikin. Lewra nefya hukmê ji hinek kesa dixwaze îsbata wê ji xeyrî wan re. Hem îsbata şefa'etê tê kirin bi ayeta* وَاسْتَغْفِرْ لِذَنْبِكَ وَلِلْمُؤْمِنِينَ وَالْـمُؤْمِنَاتِ *hem bi hedîsa* شَفَاعَتِي لِأَهْلِ الْأَكَابِرِ مِنْ أُمَّتِي *û ḥedîsa* يَشْفَعُ يَوْمَ الْقِيٰمَةِ ثَلَاثَةٌ: اَلْأَنْبِيَاءُ ثُمَّ الْعُلَمَاءُ ثُمَّ الشُّهَدَاءُ *û xeyrî vana.'Hedîs di babê şefa'etê de pir in.*[93]*"*

Di nav metnê Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî de ji ayet, ḥedîs û çavkanîyên muxtelîf jêgirtinên wihareng gelek zêde ne.

---

[90] El-Qoẋî Eḥmed Ḥîlmî, **Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî,** (Weşanxane, cîhê weşanê û tarîxa çapê ne diyar e,) 1984, r. 38

[91] El-Qoẋî , **h.b.** , r. 25
[92] El-Qoẋî , **h.b.** , r. 31
[93] El-Qoẋî , **h.b.** , r. 61

Ji ber ku muelîfê Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Ehmedê Xanî di medresê de perwerde bû te'sîra zimanê 'Erebî bi wayek aşîkar di vê berhemê de dixwîye. Hem di berhemê de gelek peyvên 'Erebî hatine bikaranîn hem jî gelek hevokên vê berhemê li gorî qaibê hevokên 'Erebî hatine damezrandin.

Ji ber ku me ferhenga *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî* amade kir em li vir cîh nadin wan peyvên 'Erebîyên ku di *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî* de hatine bikaranîn. Bes emê çend hevokên ku di *Rehbere Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî* de li gori qalibê hevokên 'Erebî hatine bikaranîn di vir de wek mînak nîşan bidin û wan hevoka li gorî qalibê hevokên Kurmancî di vê tabloyê de sererast bikin da ku mebesta me bê zanîn.

**Ji Rehbere Sanî Çend Hevok Û Sererastkirina Wan**

| Di Rehbere Sanî De Bikaranîna Hevokê | Sererastkirina Hevokê |
|---|---|
| İz bîn 'Ebdusselam gotiye: "Ne kafire kesê ku cihetkî ji Xudê re îsbat bike. | İz bîn 'Ebdusselam gotiye: "Kesê ku cihetkî ji Xudê re îsbat bike ne kafire. |
| Kes nikare kitaba mohrkirî veke ji ẋeyrî xatemê pê ve. | Ji xatem pê ve kes nikare kitaba mohrkirî veke |
| Kes nikare ḥeqîqeta 'ulûmên Quranê beyan bike îlla xatemê enbîya. | Ji xeyrî xatemê enbîya kes nikare heqîqeta 'ilmên Qur 'anê beyan bike. |
| Lazime ji xezînê re mifte û muhr. | Ji xezînê re mifte û muhr lazim e. |
| Lewra zû diçû wekî birqê. | Lewra wekî birqê zû diçû |
| Lewra şewq dida wek berq jê diçû hingê sipî bû. | Hingê sipî bû şewq dida wekî ku birq jê diçu |
| Tu guhdêre ḥedîsa ku Qadî 'Eyad di şîfaê de rîwayet kiriye ji Enes bîn malîk di ḥeqqê Bûraqê de. | Tu guh bide hedîsa ku Qadî 'İyad di Şîafê de di heqê Bûraqê de ji Enes bîn Malîk rîwayet kiriye. |
| Ev Refref di ḥedîsên mî'racê de tune îlla di ḥedîsa Bîzarî û Beyḥaqî de. | Ev refref ji xeyrî Bîzarî û Beyhaqî di hedîsên mîracê de tune |
| Winda kir bi sebeb ku kete pişt ḥeft asîmana. | Ji ber ku ket pişt heft aşinana winda kir. |

| | |
|---|---|
| Xudê Te‘ala perde rakir ji nevbeyna xwe û pêyẋember. | Xudê T‘ala ji navbeyna xwe û pêyxember perde rakir |
| Yanî tu bi zanibe bê ẋereza înadî ku Xudê ne yek ji van tişta ye. | Yanî tu bê ‘xereza înadî bi zanibe ku Xudê ne yek ji van tişta ye |
| Qewlê racih’ ji herdû qewlê Eş‘arîyan ew e ku waqi’ nebûye. | Ji herdû qewlê Eş‘arîyan qewlê raciḥ ewe ku waqi’ nebûye. |
| Teklîfa mûḥalê ne caize bi nezera ‘eql. | Bi nezera ‘eql teklîfa mu ḥalê ne caiz e. |
| Hemî kâinata bi îrada Xudê ne bi gotina selefê saliḥîn. | Bi gotina selefe salihîn hemî kâinata bi îrada Xudê ne. |
| Eger nebe li gor qanûn û nizama şerî‘etê | Eger li gor qanûn û nizama şerî‘etê nebe. |
| Tesdîqkirina me’na kelîma şehadetê bi qelb | Bi qelb tesdîqkirina me’na kelîma şehadete. |
| İqrara bi ziman şert e ji bo eḥkaman. | Ji bo eḥkaman îqrara biz iman şerte |
| Ev beyt redda Mu’tezîlîyan û Xarîcîyan tevde ye çewa ku di ḥedîsa Muslîm û Buxarîde ye. | Çewa ku di ḥedîsa Muslîm û Buxarîde ye ev beyt redda Mu’tezîlîyan û Xarîcîyan tevde ye |
| Hemî pêyẋemberan bêrîne ji ‘ezlê, bi tifaqa hemî ‘aliman. | Bi tifaqa hemî ‘aliman hemî pêyẋemberan ji ‘ezlê bêrîne |

### 2.1.4. Di Rehberê Sanî De Bikaranîna Çavkanîyan

Bo berhemên ‘îlmî çavkanî û destnîşankirina çavkanîyan xaleke muhîm e. Ehmed Ḥîlmî el-Qo‘xî jî di *Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî* de gelek çavkanîyan bikar tîne. Lê di *Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Ehmedê Xanî* de awayê bikaranîna çavkanîyan muxtelîf e.

Muelîfê Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmmedê Xanî carna tenê wek îşaret bala xwendevanê Rehberê SanîŞerha Eqîda Eḥmedê Xanî bi bal çavkanîyê ve vedigerîne. Di vê babetê de eger çavkanîya muelîf ayet be dibê “ çawa ku ayet dibêj e û metnê ayetê zikir dike.” Eger ḥedîs be dibê “ Çewa ku ḥedîs dibêje û ḥedîsê zikir dike. Eger şexis be dibê fulan kesê gotiye û baweriya wî zikir dike. We mînak:

*“Dîsa ‘eqil durust didêre ku Xudê Te‘ala kafîran û gunehkaran têxe cennetê. Tê de ebedî nî’met li wan bike. Ev jî di nezera şerî‘etê de ne duruste. Lewra Xudê Te ‘ala wan we‘îyd û tehdît kiriye ku bi cehennemê wan bide ‘ezabdan. Çewa ku gotiye:* إِنَّ الَّذِينَ كَفَرُوا مِنْ أَهْلِ الْكِتَابِ وَالْمُشْرِكِينَ فِي نَارِ جَهَنَّمَ خَالِدِينَ فِيهَا *û gotiye:* وَمَنْ يَعْصِ اللّٰهَ وَرَسُولَهُ وَيَتَعَدَّ حُدُودَهُ يُدْخِلْهُ نَارًا خَالِدًا فِيهَا *û gotiye:* وَمَنْ يَقْتُلْ مُؤْمِنًا مُتَعَمِّدًا فَجَزَاؤُهُ جَهَنَّمُ خَالِدًا فِيهَا *lakîn tenfîz û bicîhanîna we’d û tehdîdê lazime şer‘en di ḥeqqê kafira da, ne di ḥeqqê mu’mînê gunehkar de.*[94]*”*

Herwekî ku di van rêza de dixwîye Eḥmed Ḥîlmî el-Qo‘xî di vir de van ayetan wek delîl nîşan dide, bes ne wergera ayetan ne jî navê sureyên ku ayet tê de cîh digre diyar nake.

“Yeḥya bin Mu‘az gotiye: We’d ku îxbara bi menfî‘etê ye. Ḥeqê ‘îbada ye li Xudê Te‘ala. Buye damin ku îta‘a bikin wê filan qencîyê bi wan bike. Kes wek Xudê wefadar tune. Lê wa‘îyd ku îxbara bi zererê ye, ḥeqê Xudê ye li ‘îbada ku ji wan re bêje: “Filan tişt nekin ezê we ceza bikim!” Wan jî kir wê demê Xudê bi kêfa xwe ye. Yan ‘efwe, yan ‘ezab e. A qenc ‘efwe lewra Ẋefûr û Reḥîm e.[95]”

Herwekî ku di vir de ‘eyane Ehmed Ḥîlmî el Qoxî di vir de peyvên Yeḥya bîn Mu‘az wek çavkanî pejirandiye. Bes diyar nekiriye ku ev peyv di kîjan berhemê de derbas dibin

Eḥmed Ḥîlmî El-Qo‘xî di hûnandina Rehberê Sanî Şerḥa Eqîda Ehmedê Xanî de carna çavkanîya ku jê îstîfade kiriye digel muellîfê çavkanîyê diyar dike. Di vê babetê de îqtîbasên dirêj carna di nav metnê de, carna di jêrenotan de wek ‘Erebî cîh digrin. Wek mînak:

Alûsî (1802-1854) gotiye: “Siḥr ne xarîqul ‘adet e. Lê di şibhe wê. Lewra bi te’lîmê tê meydanê. Teḥsîla wê bi îrtikaba qebaîḥa ye. Wek elfazê şirkê û medḥê şeytana û ‘îbadetê ji sitêra re û enwa‘ê fasiqîyan. Kesê ku van tişta bike dibe munasibê şeytana, alîkarîya wî dikin. Lewra tenasub şertê alîkarîyê ye. Lewra şeytan ancaẋ alîkarîya wî kesî dikin ku dişibhe wan di necaset û xebîsîyê de bi qewl û fi’l û î’tîqadê. Çewa ku melaîket ancaẋ alîkarîya wî kesî dikin ku di şibhe wan di dewama ser ‘îbadet û teqerrûba bi bal Xudê Te‘ala ve bi qewl û fi’lê. Bi vî tiştî siḥirbaz vediqete ji nebî û welîyan. Li nik cumhur ji siḥrê re ḥeqîqet heye. Siḥirbaz digîje dereca ku bi fire di hewa

[94] El-Qoẋî , **h.b.** , r. 25

[95] El-Qoẋî, **h.b.** r. 25

de û li ser avê bi meşe û nefsa bikuje û însana bigerîne ker. Fa‘ilê ḥeqîqî her Xudê Te‘ala ye. Lakîn nikare beḥrê bike şeq û miriya saẋ bike û ḥeywana bide peyvandin û ẋeyrî wan ji ‘elametê pêyẋemberan. *Rûhul-Me‘anî* 1/388”[96]

Ehmed Ḥîlmî el-Qo‘xî di vir de di warê sihre de ji tefsîra Alûsî a bi navê *Rûhul-Me‘anî* îstîfade kiriye. Hem muelîfê çavkaniyê, hem navê çavkaniyê hem jî cîld û rûpela berhemê di vir de hatiye diyarkirin. Bes cîh û tarîxa weşana çavkanîyê nehatiye diyarkirin.

## 2.2. TRANSKRÎBSÎYONA METNÊ REHBERÊ SANÎ

Bîsmîllahîrreḥmanîrreḥîym[97]

Elḥemdûlîllahî Rebbîl-‘alemîn, wes-sellaat û wes-selamû ‘ela seyyîdîna Muḥemmedîn Xatemîl-enbîyaî we l-murselîn, we ‘ela alîhî we seḥbîhî ecme‘în. ḥeşerna Ellahû fî zîllî şefa‘etîhî yewmed-dîn, amîn ya Rebbel-‘alemîn.[98]

1- Li ba te muḥeqqeq bitin ev cewab, duhû gote min hatifî bê ḥîcab

2- Sa Eḥmed sena ke bi qewlê seḥîh, li tewḥîdê Barî bi qewlê fesiḥ

Li ba te: Li nêk te ya kesê ku jê re xeber didim!

Muḥeqqeq bitin: Bira mu’heqqeq be, şubhe tê de nebe.

Ev: Yanî ev te’lîfa min e. Nezma ku di ‘ilmê tewḥîdê de ye.

Cewab: Yanî ev nezma bi vî terzî cewab e. Ez pê cewaba sailekî ẋeybanî didim.

Duhû: Roja berya îro.

Gote min: Ji min re got.

Hatifî: Dengê ẋeybê ku xweyê wî naête dîtin.

Bêḥîcab: Bê perde, yanî bê şubhe.

Sa Eḥmed: Em rastî me’na “sa” nehatine. Lê meqam dixwaze ku bi me’na “ya!” be.

Sena ke: Xeberdan û peyva qenc bike.

---

[96] El-Qoẋî, **h.b.** , r. 44-45

[97] Wate: Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîym.

[98] Wate: Hemdê bê hed layiq û babetê Rebbê ‘alemê ne. Selat û selam li ser seyyîdê me xatemul enbîya ḥezretî Muhemmed (s.a.w.s.) ê ku bi wezîfa pêyxembertîyê hatiye şandin û ehlê beyta wî û temmmamê seḥabîyên wî bit. Xwedê Te‘ala me di roja mehşerê de di bin siya şefa‘eta wî de heşir ke.

Bi qewlê seḥîh: Bi gotinê mu’teber ku ze‘îfî tê de nebin.

Li tewḥîdê Barî: Li ser tewḥîda Xwedayê ku xaliqê ‘alemê ye. Yanî qenc xeberde di ḥeqê îsbata weḥdanîyetê de.

Bi lefzê fesîḥ: Bi lefzê ku xweşike di bihîstinê de.

Tu bizan: Tew’hîd; Di luẋetê de bi me’na hukumkirin û pêkanîna tişta ye. Di şerî‘etê de bi me’na xaskirina ‘îbadete bi Xwedê ve digel i’tiqada yekîtîya wî. Ew tesdîqa ku Xudê Te‘ala di zat û sifatan û ef‘alê xwe de yeke.

Tewḥîd: Di istîlalaḥa ehlê kelamê de ‘ilmek e. İqtîdar pê çêdibe. Li ser îsbata ‘eqîdeyên dînîye, têne kesbkirin ji delîlên yeqînî.

### 2.2.1. Sifetên Xwedê Te‘ala

3- Xudê yeke bê hevrîyû bê heval, ne me’zûlîye ne mirin ne zewal

4- Ne esl û fesl û ne da û ne bab, heyin wî heyîna wî nabit ḥîsab

Hevrî: Heval

Ne me’zûli ye: ‘Ezilbûn ji Xûdê Te‘ala re tune. Her Xuda bû. Wê her Xuda be.

Ne zewal: Ji kemalatê zail nabe. Noqsanî lê çê nabe.

Ne esl: Koka ku Xûdê Te‘ala jê be tune. Çi madde, çi sulale.

Ne fesl: Tiştê ku ji Xudê Te’ala be tune. Çi zurrîyet, çi ẋeyrî wê.

Heyin wî: Yanî hene jê re. Ev lefzê bi menzîla xeberê ye. Ji bo her ḥeft nehyê pêşî. Yanî vana tev ji Xudê re ne hene. Yek ji wan jî jê re nîn in.

Heyîna wî nabit ḥîsab: Yanî hebûna wicûda Xudê Te’ala bê ḥîsab e. Tefsîla bê ḥîsabîyê di van hersê beytên hatî de ye.

5- Ji bo wî çunîne cîhat û mekan, ne manend û misl û ne hemta nişan

6- Li wî ra neborîne weqt û zeman, ne sal û ne mah û ne ḥîn û ne an

7- Ebed dê hebitin ezel her heye, di dinya û ‘uqba Xudayê me ye

Cîhat: alîyan,

Mekan: Cîh, der. Ferqa cîhat û mekan eve:

Cîhat: Tê qestkirin ku nêzbûn bi bal ve çê bibe.

Mekan: Tê qestkirin ku ḥusûl û qerargirtin tê de çê bibe. Cîhat cîhê paşiya ḥereketê ye. Ne ku ḥereket tê de seḥîḥe.

Kitêbên ‘eqîdê dibêjin, gotina ‘amîyan ku dibêjin: Xudê li her derî heye. Lazime men’ bibe. Lewra wehma ḥulûlê jê tê kirin. ‘Amî jî nizanin wê zen bikin ku Xûdê bi zatê Xu li her derî ye. Bîr nabin ku me’na wê: Xudê Te‘ala bi ‘lim û zanîna xu li her derî ye. Yanî ‘ilmê Xûdê bi her tiştî heye. Çawa ku murada Mecnûn jî wisa ye:

**اَيَارَبَّ لَـيْلىٰ اَنْتَ فِي كُـلِّ مَوْطِنٍ وَ اَنْتَ الَّذِي فِي رَحْمَـةِ اللّٰهِ اَطْـمَعُ**[99]

İmam Bîrgîwî ji Tarxanî neqil kiriye: Kesê ku bêje: “Ya Rebbî ne tu xalîyî ji tu mekanî, ne tu mekan ji te xalîye, ew kafir dibe. Lewra îsbata mekan ji Xûda re dike.

Mu’tezîlî dibêjin: Xudê di temmamê mekana de ye bi zatê xwe. Delîla wan ayeta وَهُوَ الَّذِي فِي السَّمَٓاءِ اِلٰهٌ وَفِي الاَرْضِ اِلٰهٌ[100] e. Yanî wî Xudayê wisa ku di erd û asîmanan de İlah e.

Ehlê Sunnetê dibêjin: “Me’na ayetê yanî: Asarên Rebbîtîyê û meşandina emrê Xudê Te‘ala di asîman û erdê de ye.” Emma bilindkirina destan bi jor ve lewra asîman qibleya dû‘a ye. Çewa ku Ke’be qibleya limêjê ye. Yanî qehra Xudê li ser ‘îbadên wî heye. Xwe zelîl nîşan didin.

İz bîn ‘Ebdusselam gotiye: “Ne kafire kesê ku cihetkî ji Xudê re îsbat bike.” Bacûrî jî pê razî bûye.

Newewî gotiye: “Eger ew kes ji ‘amiyan be ne kafir e.” Hinka gotiye: “Eger ew cîhet jor be ne kafir e. Eger ê jêr be kafir dibe. Lewra kêmanî tê de heye.”

Ne manend: nîne misl.

Hemta: Nezîr. Ferqa misl û nezîr eve: Mislê tişt: Ê ku wek wî ye bi her hawayî. Nezirê wî: Ê ku wek wî ye di zatê wî de.

Nîşan: Ji Xudê Te‘ala re tune. Lewra nîşan, ji bo naskirina tiştekî ji nav emsalê wî ye. Ji Xudê Te‘ala re emsal nînin.

Li wî ra: Di ser Xudê re

---

[99] Eya Rebbê Leyla! Tu li her derî heyî, her Tu yî ku ez bi rehmeta Xweda dixwazim

[100] Ew (Xuda)her ew e ku hem li asîman hem jî li erde îlah e. (Zuxrûf 84)

Seyda di kitêba xwe de jimara ayeta di nav metnê de di dawîya ayeta orjînala ‘Erebî de nivîsî bû. Lê ji ber ku di metnê de tevlihevî çê nebe em dê di vê xebata xwe de jimara ayetê di gel meala wê wek jêre not binvîsin. Dîsa em dê hedîs û metnên ‘erebî bi awayên orjînal di nav metnê de bi cîh bikin û meala wan wek jêre not binvîsin. Lê seyda metnê orjînal de wek jêrenot gelek şîroveyên ‘Erebî rêz kiriye. Em dê di vê xebata xwede tenê cîh bidin wergera jêrenotên ‘Erebîyê ku di metnê orjînal de cîh digrin. (c)

Weqt û zeman: ‘Elîyê Qarî gotiye: “Me’na herduwan yekin.” Lakîn belkî şêx îrade kiribe bi weqt û zemanekî mu‘eyyen û bi zeman, zemanên muxtelif.

Se’dûd-dînê Teftezanî gotiye: “Zeman, li ba me ‘îbaretê ji muteceddîdekî ye. Ku muteceddîdekî dî pê tê teqdîrkirin.”Muteceddîd tiştê ku nedîbe wekî niha “ez ji rojhilat hatim.” “Hatin” muteceddîdekî wehmî ye. Hilatina rojê, Muteceddîdekî me’lûm e. Hatin bi hilatinê hatiye teqdîrkirin. Beraberîya hatinê, bi hilatinê re zeman e.

Feylesof dibêjin: “Zeman gera felekê ye.” Li kullê ḥal zeman mexlûqekî Xudê ye. Di ser mexlûqan de diçe. Di ser çi de here muẋeyyer dibe. Xudê ji tu zemana cûda nabe, naqete. Nabe ku di serde herin.

Ezel: Tiştê ku serî ji ewelê wî re tune. Wek qidemê. Lewra di luẋatê de navê wî tiştîye ku dilê meriv ji teqdîrkirina bîdayeta wî re teng dibe. Hatiye Girtin ji “ezelî” bi me’na tengî.

Ebed: tiştê ku paşî ji axirê wî re tune. Wek beqayê. Lewra di luẋatê de navê wî tiştî ye ku dil di reve ji teqdîrkirina nîhayeta wî. Hatiye Girtin ji “ubûdî” bi me’na “nefret.” Temmamê ‘alemê ne ezelî ye, ne ebedî ye. İnsan û milyaket ebedî ne, ne ezelî ne. İ’dama ḥewadîsan ‘ezelî ye, ne ebedî ye. Xudê Te‘ala ezelî ye, ebedî ye.

Ebûl-Beqa gotiye: “Nebêje Xudê di ezelda hebû. Lewra divê ku Xudê Te‘ala zemanî be. Yanî ji wicûda wî re zeman hebe.” Ḥaşa we kella.

### 2.2.2. Nubuweta Muḥemmed

8- Ewî aferandin em û cumle xelq, nehin ẋeyrê wî qet çu xaliq bi ḥeq

9- Resûlê di wî cumle heqq in temam, xusûsa Muḥemmed ‘eleyhîsselam

10- Ku serdefterê cumle ‘alem ew e, nubuwet xwe meketûb e xatem ew e

Aferandin: İcad kirin, xuliqandin. Nûn ji bo cem‘ê ye. Bi î’tibar û ecnas û efradê ‘alemê ne.

Nehin: Nîninin.

Resûlê di wî… îlx: Wacibe ku em tesdîqa temmamê resûlan bikin. İ’tîqad bikin ku Xudê Te‘ala wan şandîye ji bo mesleḥeta ‘ibadan, hem dînî, hem dunyewî. Lewra kesek bi ‘eqlê xwe nizane sewabdana ehlê ta‘etê bi cennetê û ‘ezabdana gunehkaran bi cehennemê beyan bike ku resul nebêjin.

Hem wacibe em î’tîqad bikin ku şandina resûlan li ser Xudê Te‘ala caiz e. Ne wacib e. Welakîn ḥîkmeta İlahî dixwaze şandina wan. Lewra mesleḥet tê da heye. Gerçê Xudê Te‘ala ne muḥtacê wî qasî ye.

Xusûsa Muḥemmed: Nexasim Muḥemmedul Mustefa (selelllahû ‘eleyhî we sellem.) Naskirina wî bi resûlî û ḥeskirina wî û zanîna ḥeyata wî digel mu’cîzat û şemailê wî li me lazime, bêhtir jî naskirina hemî resûlên dî. Lewra eşrefê mexlûqa ye, Çawa ku gotiye:

Serdefter… ilx: Yanî kesê ku navê wî di serê defterê de nivîsandî ye, berya navê herkesî. Yanî hun ya كُنْتُمْ خَيْرَ اُمَّةٍ[101] ji ber ku şerefa wî bêhtir e Xudê Te‘ala gotiye: Ummeta Muḥemmed qenctirê ummetan bun li nêk Xudê. Qenctirîya vê ummetê ji kemalîya dînê wî ye. Ew jî bi sebeb kemaliyeta Pêyẋember e (selellaahû ‘eleyhî we selem) gotiye: «أَنَا أَكْرَمُ الْأَوَّلِينَ وَ الْاٰخِرِينَ عَلَى اللّٰهِ وَ لاَ فَخْرَ» [رَوَاهْ التِّرْمِذِي][102]

Nubuwet xwe mektûb e: Nebîtîya wî nivîsandî ye. Yanî ‘elametê nebîtîya wî muhrek e. Bi terzekî ‘ecêb hatibû nivîsandin. Neqişkirîbû di nav milê wî de, li aliye çepê, di hember dil de. Di şeklê wî de xîlaf heye bi vî terzî: Wek esera ḥecamê, yan bişkoja çadirê, yan bişkoja sitara text, yan wek hêka kevokê, yan wek çar tiliyê girtî di kefê de, yan şanekî reş, yan kesk bû. Li ser nivîsandî bû مُحَمَّدٌ رَسُولُ اللهِ[103] yan اَللهُ وَحْدَهُ لاَ شَرِيكَ لَهُ[104] yan سِرْ فَاَنْتَ الْـمَنْصُورُ[105]

Sebebê îxtilafê eve ku: Muhra nubuwetê carna bilind dibû, carna nizm dibû, carna fireh dibû, carna di civîya, carna xet lê pir dibûn li gora ḥaletan û tecellîyatan. Heryekî di ḥaletkî de didît. Sebebê ku li alîyê çep bû ev e ku şeytan xortuma xwe di nav milê însan re dike ji alî çep dighîne dil weqta meriv zikrê Xuda dike bi paş ve diçe.

Muhra nubuwetê sîpera xortuma wî mel‘ûnî bû. ‘Illetê ku muhra nubuwetê di nav herdû milada ye: Tê zanîn ji neqla Îmam Dimeyrî di “ Ḥeyatul Ḥeyewan” de, ku “yekî ji welîyan ji Xudê Te‘ala xwest ku Xudê nîşanî wa bide ka çawa şeytan weswese dike. Xudê Te‘ala heykelê însankî nîşanî wî da di sûretê cama belûr de. Di nav mile wî de şanek reş hebû wek hêlînê. Şeytan hat di sûretê xinzîr de xortuma wî wek a fîl bû. Her terefê wî heykelî teftêş kir. Hat navbêyna herdû milê wî. Xortûma xwe têra kir ji hember dilê wî ve. Dema zikir kir şeytan bi paş ve çû.” Ji wî qasî hatiye navdan “xennas.” Yanî ê ku bi paş ve diçe. Lewra dema nura zikir di dil de çê dibe, şeytan bi

[101] Ummeta herî bi xêrtir her hun in. (‘Alî îmran 110)

[102] Her ez im qenctirê wan kesên ku di pêş de bi bal Xweda ve çûne û ê ku di paş de tên. Ev jî ne fexr e. (Ji Tîrmîzî hatiye rîwayetkirin.)

[103] Mu ḥemmed (selellaahû ‘eleyhî we sellem ) qasidê Xweda ye

[104] Xwedê Te‘ala her waḥide, tu şerik ji bo wî nînin.

[105] Bi meşe (elbet) dê alîkarîya te bê kirin.

paş ve diçe. Ji ber ku nav mila cîhê têrakirina şeytan e pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) ḥicam li nav milê xwe dixist û emrê xelqê pê dikir. Cebraîl ew wesîyet lê kir. Ji bo madda şeytan ze‘îf bike. Rê lê teng bike. Lewra wewesa wî di cîhê xwînê de di herike. Çewa ku ḥedîs dibêje: [106]اِنَّ الشَّيْطَانَ يَجْرِي مِنْ ابنِ اٰدَمَ مَجْرَى الدَّمِ Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) hate ḥifzkirin ji weswesa wî çawa ku gotiye: «اَعَانَنِي اللهُ عَلَيْهِ فَاَسْلَمَ» وَ فِي رِوَايَةٍ: «حَتَّى اَسْلَمَ» [رَوَاهُ مُسْلِمْ][107] Li ser rîwayeta ewil yanî şeytanê min musluman bû. İdî weswesê çê nake. Li ser rîwayeta dawî mutî’ bû, ji weswesê geriya bi sebeb muhra İlahî. Emma şeytanê Adem musluman nebû. Weswese lê çêkir. Lewra nehatibû muhrkirin. كَانَ شَيْطَانِي كَافِرًا فَاَسْلَمَ وَكَانَ اَزْوَاجِي عَوْنًا لِي وَكَانَ شَيْطَانُ آدَمَ كَافِرًا وَ كَانَتْ زَوْجَتُهُ عَوْنًا عَلَى خَطِيئَتِهِ» [رَوَاهُ الْبَيْهَقِي. رُوحُ الْبَيَانْ ١٩٠/٧ و تَاجْ ٢٣٣/٥][108]

### 2.2.2.1. Xatemun-Nebîyyîn

Xatem ew e: Yanî ê ku di paşîya pêyẋembera tev de hatiye, tev pê xetim bûne û tekmîl bûne her Muḥemmed e. (Selellaahû ‘eleyhî we sellem.) Lewra Xudê Te‘ala gotiye:[109]وَخَاتَمَ النَّبِيِّينَ Xatem bi fetḥa “ta” ê aletê xetimkirinê ye. Yanî tiştê ku xetimkirin pê çê dibe bi kesra “ta” ê li qiraeta ẋeyrî ‘Asim îsmê fai’l e. Yanî Muḥemmed (selellaahû ‘eleyhî we sellem) fai’lê xetmê ye. Yanî ê ku enbîya xetim kir Muḥemmed e. (Selellaahû ‘eleyhî we sellem.) Bi herdû qiraetan jî bi me’na ku Muḥemmed axirê nebiya teva ye. Piştî wî tu pêyẋember tunin. Çi ku ḥedîsa seḥîḥ gotiye: إن مثلي ومثل الأنبياء من قبلي كمثل رجل بنى بيتا فأحسنه وأجمله إلا موضع لبنة من زاوية فجعل الناس يطوفون به ويعجبون له

---

[106] Bê gûman Şeytan wek xwînê di damarê benîadem de diğere.

[107] Xwedê Te‘ala li dij wî alîkariya min kir. En nihayet ew jî teslîm bû. Di rîwayetkî de jî “hetta ku teslîm bû.” (Ev hedis ji Muslîm hatiye rîwayetkirin)

[108] Şeytanê min kafir bû, bû musluman. Hevaljînên min jî li dij şeytan alîkariya min dikin. Şeytanê Adem kafir bû, hevaljîna wî di xetaê wî de alîkarê wî bû. (Ev ḥedîs ji beyhaqî hatiye rîwayetkirin. “Rûḥ ul-beyan” c.5. R. 190, “Tac” c. 5 R. 233)

[109]Yanî ew xatemul enbîya ye. Nubuwet bi wî hatiye xetimkirin. Eḥmed Ḥîlmî di vir de bi Zimanê‘Eerebî te’lîqateke kurt nivîsîye wergera wê wiharenge: Çimkî wî nubuwwet xetim kiriye. Yani bi hatina wî nubuwwet temam bûye (Mufredat)
“Xatemê nebiyan” û ê dawî ji wan ku wan xetim kiriye. Yan jî, li gorî qîraeta ‘Asım ku bi fethe were xwendin, ew bi wî xetim bûne. Her çıqas ji pêy‘xember (s.a.w.s) re kure ki bali‘x ku layiqî meqamê wî bin hebûna wê bibûna pêy‘xermber nîne jî dîsa xatem ew e. Çewa ku (a.s.w) dibêje: “Ger İbrahîm bijiya wê biba p‘ey‘xmber.” Nuzûla ‘İsa a piştî wî, xelelê naxe vê gotinê. Çimkî wê ‘İsa li ser dînê wî nazil bibe. Û ji xwe meqsed di virde ji ê paşî ji ew kesin ku pêy‘xermberî ji wan re hatiye. Ellah bi her tiştî zane. Xweda zane bê kî layiqe ku nubuwwet pê xetim bibe û gerek wesfê wî çawabe. “Beydawî” di tefsîra ayetê de dibêje: “Ê dawî ji wan” ev li gorî qîraeta bi kesra ta “xatem” e. Çimkî ev kelîme îsmû fa’il e bi me’na “ê ku xetim dike” ye. Û dibêje “bi wî pêy‘xember hetine xetimkirin.” Ev jî li ser qîraeta bi fetha taê ye. Çimkî ev kelîme dibe îsmû alet. Wek kelîma “tabe’ bi me’na ê ku pê teb’ çêdibe, û wek kelîma “qaleb”. Bes meala wê dîsa bi me’na “ê paşî” ye. Gotina ku me got “liser qîraeta ‘Asim” qeyda me’na duyemîn e. (Şîhab: 7/175, Sûretê Eḥzab)

ويقولون: هلا وضعت هذه اللبنة. قال: فأنا اللبنة، وأنا خاتم النبيين[110] Sebebê ku pêy’xember xatemê enbîya ye ev e ku bibe reḥmet ji bo temmamê ‘alemê. Ummeta wî pir dibin. Erdê de namînin, tu ummetê dî bi ḥewalê wan nizanin. Şerî‘eta wî nesix nabe.

Welḥasil: Ev ayet fayde dide ku şefqeta wî li ser ummetê zêde ye. We ummet jî wî zêde mezin didêrin. Lewra nebîyê ku piştî wî nebî hebin dibe ku hinek ji nesîḥet û beyanan bihêle. Lewra piştî wî têne tedarukkirin. Emma ê ku piştî wî nebî nînin, hingê şefqeta wî pir tiştekî nahêle. Tevê beyan dike da ku ummet zanibe êdî nebî ranabin. Kesê ku de’wa nebîtîyê bike kezab e û deccal e gerçê xarîqa li ‘adeta derîne wekî şu’beza û enwa‘ê siḥrê û tılsıma ku Eswedê ‘Ensî û Museylemetul Kezab der tanîn. Wihareng hemî kesê ku wisa bike ḥeta roja qiyametê, ḥetta ku kezab bêne xetimkirin bi deccalê ku pur ‘ecaîb xarîqan derîne, ‘aliman û mu’mînan wê şehdê bidin bi derewên wî.

Tu bizan: Di “Hellur-Rumûz” ê de gotiye: “Kes nikare kitaba mohrkirî veke ji ẋeyrî xatemê pê ve.” Yanî ê ku muhr lê daye. Wihareng e kes nikare ḥeqîqeta ‘ulûmên Quranê beyan bike îlla xatemê enbîya. Hem dema ku xezîna paşa muhrkirî be kes nikare veke îlla xezînedarê ku nîşana paşatîyê lê hebe. Qur’an jî xezîna hemî kîtabên ku ji cem Xudê Te‘ala hatin e. Hem xezîna hemî ‘ulûmên ḥeqîqetên İlahî ye. Lewma xatemê enbîya jê re hate ḥazirkirin û amadekirin. Ji bo vê ḥîkmetê muhra nubuwetê li nav milê wî bû. Lewra xezîna paş ji alî der ve tê muhrkirin ji bo muḥafaza hundur.

Xûdê Te‘ala di ḥedîsa qudsî de gotiye: “Ez xezînekî xefî bûm.”[111] Lazime ji xezînê re mifte û muhr. Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) hate navdan bi xatem. Lewra muhra Xudê Te‘ala ye li ser xezîne ya wicûdê. Hem hate neqandin bi fatiḥ lewra mifteya xezîna ezelî ye. Pê tê muhrkirin û vekirin. Nayê zanîn çi di xezînê de heye. İlla bi xatimê ku mifte ye. Xudê Te‘ala got: “Min va ku ez bême naskirin.” Naskirin ḥasil

[110] Bê guman mîsala min û pêxemberên berya min wiha reng e: Mirovek xaniyeke baş ava dike lakîn di quncikekî tenê de yek kelpîçek kêm dihêle. Dema ku însan li der û dora wî xanîyî tên û diçin wî xanîyî pir di ‘ecibînin û dibên “xwezî ev kelpîç jî di vî quncikî de hatiba danîn.”Hezretî Pêxember got: “Aha ez ew kelpîç im. Hem xatemul enbîya me.”

[111] Lefzê hedîsê: “Ez xezînekî xefîbûm, min xwest ku ez werim naskirin, min xelk xuluqand da ku min nasbikin”. İbni Teymiye gotiye: “Ev gotin ne gotina pêy‘xember (s.a.w.s) e û ne senedeke wêya sehîh ne jî ze’îf tê zanîn.” Zerkeşî, Hafiz İbnû Hecer û Suyûtî û ‘xeyrî wan jî li dû İbnu Teymiye çûne. ‘Elîyulqarî gotiye: “Me’na wê sehîh e, ji vê ayetê hatiye derxistin: Min însan û cinn ji bo ku ji min bi tene re îbadet bikin xuluqandiye” (Zariyat: 56) Yanî ji bo min nas bikin. Îbnu ‘Ebbas ji wiha tefsir kiriye. Hedis bi vî şekli ji hatiye: “Min xwe da naskirin, ew jî bira min nas bikin”. Ev di kelamê sofiyan de gelek derbas dibe û pê i’timadkirine, usulên xwe li ser vê avakirine. (Keşful-Xefa: 2/137)

bû bi feyda ḥesê li ser zimanê ḥebîb. Lewma xatem hate navdan bi "Ḥebîbûllah." Lewra esera muhrê li ser xezîneya paşa sûretê ḥeskirina wî ye ji bo tiştê ku di xezînê de ye.

Gotine: Me'na "xatemûn nebîyyîn" eve ku Xudê Te'ala nebîtîya hemî enbîya kom kir û li dilê Mustefa gerande me'dena wan û muhra nubuwetê lê danî. Da ku dujmin rê nebin ser cîhê nubuwetê. Ne hewa nefsê, ne şeytan, ne xeterên xirab. Ev muhr ji pêyẋemberê dî re nebû. Ew ji xeteran emîn nebûn. Paşê Rebbê 'alemê ji bo kemala şerefa Mustefa bi danîna muhrê di dilê wî de bi tenê qayîl nebû. Belkî di nav milê wî de eşkere kir ku herkes bibine.[112]

11- Xudê afirandin ji bo wî felek, ji bo xizmeta wî şîhandin melek

12- Ku Qur'an ji 'erşan digel wan hinar, ji bo wî ḥebîbê xwe yê bextiyar

Afirandin: Xuliqand û îcat kir.

Felek: Bi me'na dewr e. Yanî gera di xetek gurover de. Buye navê tebeqê asîmanan. Ev beyt îşarete bi bal ḥedîsa qudsî ve لَوْلاَكَ لَوْلاَكَ لَمَّا خَلَقْتُ الْأَفْلاَكَ Yanî Xudê Te'ala dibêje: Eger tu nebûna ya Muḥemmed! Min van erd û asîmanan îcad nedikir.

Ku Qur'an... ilx: Yanî xizmeta milyaketan ji pêyẋember (selellaahû 'eleyhî we sellem) re bi vî terzî bû ku jê re weḥîy anîn. Qur'an nazilê ser kirin. Bûraq jê re anîn û birin mî'racê û ẋeyrî wan.

'Erşan: Cem'a 'erş e. Bi me'na tiştê bilind e di ser meriv re. Ew bi me'na textê padîşah e. Bû nav ji 'Erşê Xudê Te'ala re. Mûrad bi 'erş tebaqatên asiman û 'erş û kursî û lewḥul meḥfûz e. Bi î'tîbar teẋlîya 'erşê 'ezîm.

Hinar: Şihand.

Bextîyar: Mubarek, se'îd, xwey para qenc.

Tu bizan: Tefsîr dibêjin: Temmamê Qur'anê bi hev re di Şeva Leyletul-Qedrê de ji lewḥul meḥfûz nazilî asîmanê ewil bû ye. Cebraîl tev ji milyaketa re xwend. Wan jî nivîsandin. di seḥîfan de. Wan seḥîfan tev di cîhekîde bûn. Jê re tê gotin "Beyta 'izzetê." Paşê Cebraîl di zerfê bîst û sê salan de ayet bi ayet nazilî ser pêyẋember kir. Ḥîkmeta wî ev e: Ku asîmanê ewil muşterek e di nabeyna 'alema jêr û jor de. Qur'an tev bi hev re hatiye wê der ji bo kêfxweşîya pêyẋember (selellaahû 'eleyhî we sellem) ku

[112] Ruḥûl beyan c. 8 r 189- 191

wê tev jê re were. Ji wê der ayet bi ayet hat ji bo hogirîya dilê wî û yê ummeta wî û riḥetîya nefsa wan, teltîfa bi wan. Eger bi hev re bihata zêdeyî taqetê bû.

#### 2.2.2.2. Bûraq

13- Ji bal xwe bûraqek ji bo ra şihand, lê zînek muresse’ ewî rûnîhand.

Bûraq: Ḥeywanek e, ji kerê mestir e, ji hêstirê biçûktir e. Navê wê Bûraq e. Lewra zû diçû wekî birqê. Yan lewra şewq dida wek berq jê diçû hingê sipî bû. Wechê wê wechê însan bû. Dûvê wê dûvê ẋezalê bû. Yan ê deveê bû. Lingê wê lingê ga bûn. Yan ê deveê bûn. Li gor îxtilafê cesedê wê cesedê hespê bû. Sîmê wê sîmê ga bûn. Ser pişta wê wek durrekî sipî bû. Du bazkê wê hebûn, di hêtê wê de bûn. Çavê wê kê der didît, lingê xwe di avête wê der. Çewa ku di ḥedîsa seḥî’h de ye. Bûraq milyaketeke li vî şeklî ji bo hilgirtina enbîya çewa ku dîkê ‘erş milyakete. Yan bûraq ḥeywanek cennetîye wê dîsa here cennetê.

#### 2.2.2.3. Ḥeywanên Ku Wê Herne Cennetê

Gotine wê hinek ḥeywanên erdê jî herne cennetê. Wiha nezim kirine.

**بُراقُشَفِيعِ الْخَلْقِ نَاقَةُ صَالِحٍوَعِجْلٌ لِإبْراهِيمَ كَبْشٌ لِنَجْلِهِ**

**وَهُدْهُدُبَلْقِيسَ وَ نَمْلَةُ بَعْلِهَاحِمَارُ عُزَيْرٍ كَلْبُكَهْفٍ لِمِثْلِهِ**

**وَحُوتُ ابْنِ مَتَّى ثُمَّ بَاقُورَةٌلِمَنْ يَبُرُّ بِأُمِّفِي رَخَاهُ وَ مَحْلِهِ**

**فَهَذِهِ عَشْرٌفِي الْجِنَانِ وَغَيْرُهَايَكُونُ تُرَابًا يَوْمَ حَشْرٍ لِكُلِّهِ**[113]

---

[113]Şihab ‘Elî el Şîfaî 1/97

Bûraqû şefî‘ûl-xelq: Yanî bûraqa pêy‘xemberê me (selellaahû ‘eleyhî we sellem) ku şefa‘etkiroxê temmamê xelqê ye di qiyametê de.

Naqetûs-Salîḥ: Deveya Saliḥ pêy‘xember. Deveka pir mezin bû. Qewmê Semûd gotin: “Mu’cîzekî nîşanî me bide. Devekî ji vî zinarî derxe.” Saliḥ pêy‘xember du‘a kir. Deng ji zinar hat wek dengê deveya ku dizê. Deveka bi ḥemle jê derket. Paşê za. Weledkî wek wê mezin jê re çê bû. Navê wê deveyê “Kaîbet” bû. Ava bîrê temam vedixwar. Av rojkî ji wê re bû, rojkî ji wan re bû. Roja ku av ji wê re bû bi şîrê wê îdare dikirin. Lewra ew didotin. Fira‘xê xwe tije şîr dikirin. Yekî wê kuşt. Navê wî “Qedar” bû. Weledê wê reviya çû. Ew zinar jê re vebû ket hundir wî, lê hat hev. Xuda wan bir helakê.

‘İcl ul-İbrahîme: Golika İbrahim Xelîl. Weqta ku Cebraîl û Mikaîl û İsrafîl bûn mîhvanê wî, nizanibû ku milyaket in, ji wan re golikek serjê kir. Li ser kevir biraşt û danî ber wan. Dît ku naxwun. Tirsiya go qey xayin in. Lewra kesê xwarina meriv nexwe fikra wî xerab e. Gotin: “Netirse. Em milyaket in. Hatine ku Qewmê Lût bibin helakê.” ḥerema wî Saret kêfxweş bû bi helaka qewmê Lût û keniya. Milyaketa gotin: “Mizgîn li te be. Wê kurek ji te re çê bibe. Navê wî İsḥaq e.” Saret got: “Emrê min not û neh sal e. Zilamê min sed salî ye. Ev ‘ecêb e.” Gotin: “Çewa tu ji emrê Xudê Te‘ala ‘ecêbmayî dimînî.”

Kebşûn lî neclîhî: Beranê kurê İbrahîm. Cebraîl anî ji bo ku bibe fedayê kurê wî İsma‘îl. Wexta kurê xu danîbû ‘erdê ji bo wî serjê ke. Lewra şeva terwiyê di xew de dît ku yek jê re dibêje: “Xudê emrê te kiriye ku tu kurê xwe serjê kî.” Bû sebebê fikra ku (ev reḥmanî bû ya şeytanî bû.) Şeva ‘erefê dîsa wisa dît. Êdî nas kir ku ji teref Xudê ye. Şeva ‘îdê dîsa wisa dît. Qesda serjêkirina kurê xwe kir. Lewma navê wan roja bû “terwîye û ‘erefe.”

Neḥr: Yanî tefekur û naskirin û serjêkirin. Ew beran qurbana Habîl bû. Cebraîl wî ji cennetê anî. Goştê wî cinawir û teyra xwar. Lewra agir goştê ḥeywana cennete napijîne. Serê wî bi mezrîba Ke'bê ve daleqandî ma hetta zemanê İbnî Zubeyr ku Ke'be şewitî.

Hudhudu Belqîse: Dewdewka wê, Bûtbutka wê ku xebera Belqîsê ji nebî Suleyman re anî.

We nemlûhû be'lîha: Gêrika zilamê Belqîse. Yanî moristanka ku bi nebî Suleyman re xeber dabû li Taîfê, yan li Şamê weqta diçû alî Yemenê. Gotine ew gêrik reîsê gêrika bû. Kulek bû. Yanî qopî bû. Du bazkê wê hebûn. Û gotine ew gêrik ji wanê sor bû ku bi lez di meşîn. Kuştina wan ḥeram e. Lewra zirar nakin. Ne ji ê reş ku hêdî diçin. Kuştina wan durust e. Lewra zirar dikin.

Ḥîmarû 'Uzeyr: Kerê 'Uzeyr pey'xember. Bûxtûnesrê zalim girte ser bajarê Qudsê. Zilam kuştin, jin û zarok bi xwe re birin bajarê Babîlê. Wê demê 'Uzeyr zarok bû. Tevî wan çû. Piştî ku mezin bû li kerê xwe siwar bû hat nihêrî ku bajar xirabe ye. Dilê wî li ser êşîya got:"Wê çewa Xudê vî bajarî ava ke ?" Pirê ku ḥesret kişand û bê hêvî bû yanî meriv nizane Xudê Te'ala bi çi şeklî şu'xla dike. Û wê bi çi hawayî ava ke. Lewra qudreta wî pire. Bi her hawayî heye. Ne ku şek jê re çê bû. Paşê têr fêkî ji dara xwar û selika xwe tije hêjîr kir. Firaqek wî hebû şîra tirî tê de 'esirand. Kerê xwe girê da û raza. Xûdê ruḥê wî û ruḥê kerê wî tev sitend. Heftê salî mirî man. Xûdê Te'ala paşakî ji Faris bi 'eskerê wî ve musellet kir. Hatin bajarê Qudsê ava kirin ji berê çêtir. Benû İsraîl dîsa hatin der û dorê bajêr ava kirin. Sîh salî jî wisa man. Xudê nehişt çavê kesî 'Uzeyr bibine. Cesedê wî muḥafaze kir. Paşê Xudê Te'ala wî sa'x kir û got:

-Ev çiqase tu liv ir sekin? 'Uzeyer got:

-Yan rojkî, yan hinek ji rojê ye. Xudê Te'ala got

-Ev sed sale. Binêre hêjîrê te û şîra te xera nebûne. Hem binêre li kerê xwe. Nêrî ku hestiye wî sipî dikin. Xudê Te'ala kere wî sa'x kir rabû ziriya. 'Uzeyr got:

-Ez dizanim qudreta Xudê Te'ala li ser her tiştî heye.

Kelbû Kehfî: Sehê şikeftê ku "Qitmîr" e.

Lî mîslîhî: Ji ê wek xwe re. Yanî ew sehê wan kesa bû ku wek wî ehlê şikeftê bûn. Meşhûr in bi navê "Esḥabê Kehf."

Ḥûtû îbnî Meta: Masîyê Yûnûs Kurê Meta. Yanî masîyê ku Yûnûs Pey'xember (sellellahû 'eleyhî we sellem) dabel'andibû. Ji qewmê xwe re got:

-Weqta ku îman pê neynin, wê piştî çil roja 'ezab were ser wan. Qewmê wî piştî sîh û pênc roja 'elametê 'ezab dîtin. Tobe kirin 'ezab ji ser wan hilat. Yûnûs ku dît 'ezab bi ser wan de nayê yekcar ji wan 'xeyidî. Reviya çû li gemîyê siwar bû. Gemî di pêlê avê de sekini. Sebebê wê pirsin. Yûnûs got: "Yekî revok tê de heye." Sê car qur'e kirin. Qur'e li wî ket. Wî avêtin Çemê Dîcle. Masî wî dabel'and.

Beqaretûn: Cem'a "beqer e." Yanî çêlek. Murad pê yeke.

Lî men: Ji wî kesî re ye.

Yebûrrû bî ummîn: Qencî bi diya xwe dikir. Bê gotina wê tiştek nedikir.

Fî rexahû we meḥlîhî: Di ḥalê firehî û tengîyê tev de qencî dikir. Wî xortî du car çêleka xwe bir sukê ku bifroşe. Fiyetê wê ne wek hev bû. Dihat ku ji diya xwe re bê je: "Ez bidim yan nedim?" Cara sisiya milyaketekî jê re got: "Ji diya xwe re bêje vê çêlekê bihêle. Wê nebî Musê bikire ji bo sa'xkirina yekî ku wê bê kuştin.Bira nede ḥeta ku çermê wê tije zêr kin." Dewlemendkî Benû İsraîl hebû. Navê wî 'Amîl bû. Warisê wî tunebûn, ji 'xeyrî du ḥeb kurmamê wî yê feqîr. Herduwan wî kuştin ji bo malê wî. Û wî avêtin ber derê gundîkî. Paşê de'wa ḥeyfa wî kirin. Mûsê du'a kir got: "Ya Rebbî tu vê ji me re keşif bikî." Xudê Te'ala got: "Goştê wê çêleka wî xortî li wî kuştîyî bidin wê sa'x bibe." Çûn ew çêlek kirîn, çermê wê tije zêr kirin, dan xweyê wê digel ku qîmeta çêleka wî zemanî sê zêr bûn. Zimanê wê weya qarçika wê lê dan sa'x bû got: "Herdû kurmamê min min kuştine." Herdû jî kuştin û wan ji warisiyê meḥerûm kirin.

Fe hazîhî 'eşrun: Ev deh ḥeywan in.

Fîl cennetî: Wê bikevine cennetê.

We'xeyrîha: Herçî ḥeywanên dî ji 'xeyrî van deha

Tu bizan: Xudê Te'ala karibû bê wasita tişkî pêyẋemberê xwe (sellelllahû 'eleyhî we sellem) bi gehîne ḥizûra xwe. Welakîn melaîketên mezin şand û Bûraq şand ji bo hogiriya wî. Bi derbasbûna ser 'adetê û ji bo kerameta wî bide nişandan. Lewra 'adetê milûkan ku dişinin pê dostê xwe hinkî xewas û eşrafan dişînin. Digel ḥeywanka xweyê qîmet bi temamî cîhazên siwarîyê ve.

Bûraq ne bi şeklê hespê bû, lewra ḥaletê selametîyê bû ne ê ḥerbê bû. Hem ji bo lez û beza wê ya pir xwîya bibe.

Lê zînek muresse': Li ser Bûraqê zînekî neqşandî bi enwa'ê cewheran hebû.

Ewî: Pêyẋember (sellelllahû 'eleyhî we sellem)

Rûnîhand: Danî ser. Yanî Xudê Te'ala pêyẋember (sellelllahû 'eleyhî we sellem) danî ser pişta wê Bûraqê û lê siwar kir.

Tu guhdêre ḥedîsa ku Qadî 'Eyad di şîfaê de rîwayet kiriye ji Enes bîn malîk di ḥeqqê Bûraqê de **إنّ النّبِيَّ  أتِيَ بِا الْبُرَاقِ** Yanî bi teḥqîq pêyẋember (sellelllahû 'eleyhî we sellem) Bûraq jê re hat. Cebraîlê emîn jê re anî bi emrê Xudê Te'ala. **لَيْلَةَ أسْرِيَ به** Şeva ku wî birin mî'racê. **مُلَجَّمًا** Bûraq gemkirî bû, **مُسَرَّجًا** Zînkirî bû." İmam Suheylî Gotiye: "Berya pêyẋember (sellelllahû 'eleyhî we sellem) enbîya li wê Bûraqê siwar dibûn. Çewa ku Nesaî û Qurtûbî û İbnî Hîşam rîwayet kirine." Li gor gotinan ev sabit û seḥîḥ e. Welakîn îmam Newewî û Îbnî Ḥecer qebûl nekirine. Li ser gotina wan her pêyẋemberkî jê re Bûraqkî xusûsî hebû. فَاصْتَصْعَبَ عَلَيْهِ Yanî siwarîya wê li ser pêyẋember (sellelllahû 'eleyhî we sellem) zeḥmed geriya. Lewra Bûraqê xwe şemûs kir piriya ku kêfa wê hat. Yan jî tirsiya ku wê teqsîratê bike di ḥeqqê pêyẋember de (sellelllahû 'eleyhî we sellem.) Yan ji bo ku pê re soz bide ku di cennetê de jî lê siwar be. Li gorî gotina Newewî û Îbnî  Ḥecer: Ku kes lê siwar nebûbû. Lewra hînî siwarîyê nebûbû. Lewra şemûsî kir. Yan sebebê şemûsîyê ew e ku pêyẋember (sellelllahû 'eleyhî we sellem) di ber senemkî de derbas bû. Paşê di fetḥa Mekkê de wî şikand.**فَقَالَ جِبْرِيلُ** Cebraîl ji Bûraqê re got **أ بِمُحَمَّدٍ تَفْعَلُ هَذَا** tu çi vê şemûsîyê dikî di ḥeqqê Muḥemmed de. **فَمَا رَكِبَكَ أحَدٌ** li te siwar nebûye kesek **أكَرَمُ عَلَى الله مِنْهُ** ku li cem Xudê çêtir be ji wî." Yanî kesek ku ji Muḥemmed (selellahû 'eleyhî we sellem) çêtir be li te siwar nebûye Xweydan ji Bûraqê herikî ji şerma. فَارْفَضَّ عَرَقًا Paşê sekinî mutî' bû

---

Yekûnu turaba: Wê bibin ax û xwelî.

Yewme ḥeşrî lî kullîhî: Roja ḥeşra hemî ḥeywanata ku roja qiyametê ye.

### 2.2.2.4. Îsra Û Mî’rac

14- Bûraqê digel Refrefê dest bi dest, bi emre Xudê ew birin pêşî dest

Boraq û Refrefê pêyẋember dane destê hev û birine ḥizûrê. Bûraqê wî teslîmî Refrefê kir, Refrefê wî bir hizûra Xudê Te‘ala. Ev gotina Şêxê Xanî wek gotina Şîhab e di şerḥa Şîfayê de[114] ku pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) dema ji Camîya Qudsê çû esmana li ser Refrefê hilkişîya, yanî li ser mî’raca ji nûrê.

Ev gotina Şîhab divê ku “Refref” mî’rac e, yanî nerdîwana nûranî. Eger em wiha nebêjin wê Şêxê Xanî bibe tabi‘ê wan kesê ku dibêjin: “Pêy’xember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) tevî Bûraqê hilkişiyaye asîmana, ḥeta asîmanê ḥefta.” Çewa ku İbnul Munîr gotiye: “Boraq ji erdê ḥeta asîmanê ewil bi gavekî çû. Bi ḥeft gava çû ser ḥeft asîmana bi mûcîbê ḥedîsa [115][رواه مسلم] يَضَعُ رِجْلَهُ عِنْدَ مُنْتَهَى طَرْفِهِ

Refref: Di luẋatê de bîsat e. Yanî tiştê ku tê raxistin. Yan bîsata kesk e. Hatiye tefsîrkirin bi tej û xaliya. Murad pê di vir de raxistina kesk e ji nûrê ye. Meznaya wê ji şerqê ḥeta ẋerbê ye. Di şeklê secadeyê de ye. Hatiye xaskirin bi wezîfa nêzkirina tişta bi bal Xudê û şu’lên ku waqi’ dibin di cîhê nêz de. Refrefên ewliya di cennetê de ji vê refrefê ne, yanî bîsatê kesk. Gava ku li ser qirar digrin di firin ḥeta cîhê ku di xwazin. Ev Refref di ḥedîsên mî’racê de tune. İlla di ḥedîsa Bîzarî û Beyḥaqî de ku İbnû Kesîr di tefsîra xwe de nivîsîy e. [116]وَ لُطَّ دُونَ الْحِجَابِ رَفْرَفُ الدُّرِّ وَ الْيَاقُوتِ Ûgotiye: “Eger ev seḥîḥ be divê ku ne şeva mî’racê be. Ancaẋ ev di eserê esḥaba de heye ku ayet tefsir kirine wekî ‘Ebdûllah îbnû Mes‘ûd di ayeta [117]"لَقَدْ رَاٰى مِنْ اٰيَاتِ رَبِّهِ" الْكُبْرٰى de gotiye: “Yanî Mu’hemmed Refrefa kesk dît. Temamê terefa girtibû.” Hem wekî ku ‘Ebdullah îbnû ‘Ebbas di ayeta [118] ثُمَّ دَنَا فَتَدَلّٰى de gotiye: “Yanî Refref ji Muḥemmed re (selellaahû ‘eleyhî we sellem) berjêr bû di şeva mî’racê de. Li ser rûnişt. Paşê bilind bû nêzî Rebbê xwe bû û got: Ji min qetiya û temamê denga ji min hatin birîn. Û min kelamê Rebbê xwe bihîst[119]”

[114] 1/199

[115] Her gavek wê bi qasî wê dîtinê bû ku bi çavê wî dihatin dîtin heta muntehayê. (Ev hedîs ji Muslîm hatiye rîwayetkirin)

[116] Refrefa ku ji încî û yaqût hatibû xuliqandin li pêş perdê hat sekinandin.

[117] Bi sond wî dît! Hem jî qismek ji ayetên Rebbê xwe yê herî mezint dît (Necm 18)

[118] Paşê nêz bû (û ber bi erdê ve) daket (Necm8)

[119] Qestelanî 8/360 Şîhab 2/334

Tu bizan: Siwarbûna pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) li Refrefa keska nûranî li Sîdretul Muntehayê çêbûye. Çewa ku ji gotina İbnî Mes‘ûd tê zanîn û rîsaleyê mî’racê dibêjin. Çewa ku Şîhab neqil kiriye.[120] Pêyẋember dema gihîşt Sîdretul Muntehayê Cebraîl jê re Refref anî û hilanî firand bi bal ‘erş ve. Refref merkeba wî ye çewa ku Bûraq merkeb e.

Eger em Refrefê bi vî terzî tefsir bikin wê gotina Şêxê Xanî bibe xîlafa seḥîḥî. Lewra qewlê seḥî’h li gor ḥedîsa eve: Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) ji Camîya Ḥeremê li Bûraqê siwar bû hate Camîya Qudsê. Li wir peya bû. Bûraqa xwe bi xeleka derê camîyê ve gire da. Çewa ku ḥedîsa Muslîm dibêje. Paşê Cebraîl wî ji xelekê vekir. Anî hat bir kevirê mezin ku di nîvê camîyê de ye. Cebraîl tiliya xwe di kevir ra kir, qul kir û Bûraq pê ve girê da çewa ku’hedîsa Bîzarî û Tîrmîzî û İbnû Ḥîbban dibêje: “Çû hundurê camîyê. Hemî enbîya lê civiyan. Li pêşiya wan limêj kir. Paşê Cebraîl wî hilkişand asîmana. Ḥeta bire Sîdretul Muntehê.” Li gorî zahirê ḥedîsa Bûxarî: “Weya jê re nerdîwanek anî pê ve hilkişiyan ḥeta asîmanê ewil, paşê ḥeta asîmanê ḥeftaa.” Li gorî zahire ḥedîsa Beyheqî û Taberî: “Paşê çû Sidretul Muntehê li cîhekî billind û fireh ku dengê qelêmên milyaketa bihîst li wir Cebraîl jê qetiya. Weḥîy jê re hat. Xûdê pê re tekellum kir û limêj li ser ferz kir.” Çewa ku ḥedîsa Muslîm û Bûxarî dibêje.

Weya li nik Sîdretul Muntehayê Refref jê re hat lê siwar bû. Çû ḥizûra Xudê. Çewa ku eserên esḥaba dibêjin. Li kullê ḥala gotina Şêx ne muwafiq e. İlla ku em bêjin me’na gotina wê “dest bi dest” yanî Bûraqê û Refrefê wezîfa xwe rast û durust kirine ku bi wasita herdûwa pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) çû ḥizûra Xudê. Çewa ku kelîma “digel” wisa dixwaze.

#### 2.2.2.5. Qabê Qewseyn

15- Di ḥeft asîmanan ewî êwerand, bi qasê du qewsan vî bal gîhand

Êwerand: Winda kir bi sebeb ku kete pişt ḥeft asîmana.

Bi qasê du qewseyn: Yanî bi qasî dirêjîya du kevana. İşaret dike ku “قَابَقَوْسَيْنِ” di ayetê de bi me’na “bi qasî du kevana” ye. Yanî “qab” qas û mîqdar e. Yanî Xudê Te‘ala Muḥemmed (selellaahû ‘eleyhî we sellem) wisa nêzî xwe kiriye ku di navbeyna wan de

120 2/334

bi qasî dirêjîya du gavan ma. Şêx Fexreddînê Razî di Tefsîra Kebîr de gotiye: “Ev li gorî ‘adetê ‘Ereba ye. Dema ku du ḥeb mezinê wan sulḥ bibin heryek ji wan terefê kevanê xwe dide terefê kevanê hevalê xwe. Di navbeyna herduwan de mîqdarê du kevanan dimîne. Qewmê wan jî destê xwe didin hev.” Mucahîd û Ḥesenul Besrî gotine: “Qab” navbeyna jêka kevan û qevda wê ye. Ev li ser gotina Xefacî îşarete bi bal ‘adetê ‘Ereban ku sulḥ dikirin di berya İslamê de: Du kevan dertanîn. Herdûwa bi hev dikirin. Qabê wan bi hev ve dibûn ḥeta ku herdû kevan dibûn bi qabekî tenê. Paşê bi herduwan tîrek berdidan. Me’na wê ev bû ku yek ji wan ji çi razîbe ê dî jî razî ye. Eger ne razî be ê dî jî ne razî ye. Li ser vê gotinê her kevankî du qabê wê hene. Çewa ku Qurtûbî gotiye: “Qab navbeyna kevan û sîta wê ye.”

Hinka gotine: Murad bi ayetê yanî bi qasî du qabê kevana. “Sîyet” xwarîya ku di herdû aliyê kevanê de ye. Sîta jor destê kevane, sîta jêr lingê wê ye. Şêx ‘Ebdurreḥman gotiye: قَابَ قَوْسَيْنِ Yanî mîqdarê navbeyna herdû birûwê însan. Ev gotinê ehlê tefsîrê ne. Hinkî gotinê dî jî hene. Em pê napêyivin. Lê çi ‘ecêbe ku keskî ji ‘ulemayê tefsîrê nişan neda ye ku murad ji قَابَ قَوْسَيْنِ yanî mîqdarê nêzbûna qabê du kevana ku herdû terefê wan ji alî jêka wan de bi gihîne hev ḥeta ku bibe wekî daîrekî nuzûl û ‘ûrûcê.

Daketin û hilkişandin: Tê de bête teserufkirin. Nîvê daîrê ‘îbaretê ji qewsa wacibul wicûdê ye. Nîvê dî ‘îbaretê ji qewsa mimkûnul wicûdê ye. Wekî ku İbarhîm Ḥeqqî beyan kiriye. Sûretê wê di dawîya kitêbê de ye. Wê demê merteba “ew edna” tête teserrûfkirin bi derbaskirina sirrê herdû kevana di hevra ḥeta ku jêka herduwa di hember hev de bibe wek xetkî di nezera çav de. Ev te’wîl ji gotina ehlê tesewûfê tê zanîn. Bîhneka wê ji kelamê Şêxê Razî tê. Qencê te’wîla eve.

Faîde: Tefsîra ayeta ثُمَّ دَنَا فَتَدَلّٰى فَكَانَ قَابَ قَوْسَيْنِ اَوْ اَدْنٰى[121] Ev ayet gelek ‘aliman gotine: Beyana nêzbûna Xwudê Te‘ala ye ji pêyẋember re ye. Lê cumhûrê ‘aliman gotine: Beyana nêzbûna Cebarîl ji pêyẋember re dike. دَنَا Xwudê Te‘ala nêz bû, yan Cebraîlê emîn nêz bû bi alî pêyẋember ve (selellaahû ‘eleyhî we sellem.) فَتَدَلّٰى Daket bi alî wî ve. Weya bêhtir nêz bû. Eslê “tedellî” dirêjbûna ji jor ber bi jêr ve ye çewa ku dewl tê avêtin di bîrê de. Paşê hate îsti’malkirin di nêzbûna ji jor ve. Çi ḥissî çi me’newî.

[121] Paşê nêz(î pêy ‘xember) bû û (ber bi jêr ve) daket û daket, heta (di navbeyna herduwa de) bi qasî dirêjîya du kevanan mesafe ma. (Necm 8-9 )

Tedellîya Cebraîl dema ku Muḥemmed (selellaahû ‘eleyhî we sellem) wî li ser sûretê ḥeqîqî dît, jê tirsiya. Cebraîl ket sûretê însan û hat wî da ber sînga xwe, ḥeta tirsa wî sekini. Yan دَنَا yanî Muḥemmed (sellelllahû ‘eleyhî we sellem) nêzî Rebbê xwe bû çewa ku İbnû ‘Ebbas gotiye. فَتَدَلّٰى Bêtir nêz bû. فَكَانَ قَابَ قَوْسَيْنِ Mîqdarê mesafa nêzbûna wî bû wek mîqdarê mesafa qabê du kevana. Yan wek mîqdarê mesafa du kevana. اَوْ اَدْنٰى yan nêztir اَوْ ji bo teḥqîqa qedrê mesafê ye, ne ji bo şikê ye. Wekî ayeta وَاَرْسَلْنَاهُ اِلٰى مِاَةِ اَلْفٍ اَوْ يَزِيدُونَ[122] Yanîne kêmî sed hezarî bûn.

Emma nêzbûna Xudê Te‘ala bi bal pêyẋember ve (selellaahû ‘eleyhî we sellem) tê te’wîlkirin bi nêzbûna me’newî û qedandina meqsûd û metlûbê wî. Û bilindkirina merteba wî û beyankirina me’rîfeta İlahî. Û itla‘a li ser ḥeqîqetê ji teref Xûdê Te‘ala ve. Wek te’wîla ḥedîsa مَنْ تَقَرَّبَ مِنِّي شِبْرًا تَقَرَّبْتُ مِنْهُ ذِرَاعًا وَمَنْ اَتَانِي يَمْشِي اَتَيْتُهُ هَرْوَلَةً[123] ku nêzbûna qebûla tobê û dayîna îḥsanê û ‘ecelekirina bi me’mûrata ye. Emma nêzbûna ḥîssî ewe tê te’wîlkirin bi lutf û î’hsan û îkramê. Wekî te’wîla ḥedîsa يَنْزِلُ رَبُّنَا اِلَ السَّمَاءِالدُّنْيَا[124] ku murad bi nuzûlê, nuzûla în‘am û fi’lên qenc û qebûla toba xelqê û îḥsana bi bal wan va ye.

Emma nêzbûna pêyẋember (sellelllahû ‘eleyhî we sellem) bi bal Xûdê Te‘ala ve tê te’wîlkirin bi izhara menzîla mezin û teşrîfa merteba wî û îşraqa enwarê me’rîfeta Xûdê û muşaheda esrarê ẋeybê û qudreta wî

### 2.2.2.6. Ji Teref Resûlûllah Ve Dîtina Xudê Te‘Ala

16- Hilanî Xudê perde rakir nîqab, cemala Xudê dît ewî bê ḥîcab

17- Du caran bi çehvan cemala wî dit, li derrê melaîn dibêjin nedît

18- Nebe bê sebeb munkîrê “qed re a”, ji xelqê “tumarûn ‘ela ma yera”

Rakir nîqab: Xudê Te‘ala perde rakir ji nevbeyna xwe û pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem.) Ev tekrar mubaleẋa di keşfê de ye ji bo îsbat û teḥqîqa ku pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) Xudê Te‘ala dîtî ye.

Bê ḥîcab: Bê perde. Lewra ḥîcab bi me’na men‘e. Murad pê perde ye.

---

[122] Me ew (bi pêy‘xembertî) ji sed hezar (însaî re) şand. Belkî (jimara wan însana) ji (sed hezarî jî)zêdetir bû. (Saffat 147)

[123] Herçî kesê bi qasî buhustek bi bal min ve bê ezê bi qasî zîra’ekî bi bal wî ve biçim. Eger ew kes bi meş bi bal min ve bê ezê bi bez bi bal wî ve biçim. (Tîrmîzî)

[124]Es-Sîretu-İbnî Ebî ḥatem

Tu bizan: Perde di vir de meznaya Xudê Te‘ala ye. Û tîrêjê nûra wî ne. Perde di ḥeqqê mexlûqa de ye. Ne di ḥeqqê Xudê de ye. Wiharenge hedîsa حِجَابُهُ النُّورُ Yanî perdeya ku men‘a mexlûqa dike ji dîtina Xudê Te‘ala nûra mezin e. Besera mexlûqa ze‘îf e, xwe ranagre li ber rojandina nûrê.

Mesela ku Xudê her tiştî dibine lewra perde jê re tune lê tiştek wî nabîne ev e: Qulika kûr tê de gêrik hebe yekî çiqas tujawir here ser qulikê jî gêrekê nabîne. Lê gêrik wî dibîne. Yanî Du caran: Carekî li “sîdretûlmuntehayê,” carekî ji li nik “qabê qewseyna.” çewa ku Şîhab gotiye.[125] Lê dawûdê Qersî di şerḥa Nûnî ya Xidir Beg de gotiye: “Carekî şeva mî’racê, carekî jî li Medîna Munewer ku temamê tiştan jê re keşif bûn çewa ku ji İbrahîm re keşif bûn.[126]وَكَذٰلِكَ نُرِى اِبْرٰهِيمَ مَلَكُوتَ السَّمٰوَاتِ وَالْاَرْضِ ”

Bi çehvan cemala wî dît: Çewa ku İbnî ‘Ebbas gotiye di rîwayeta meşhûr de. Hem Ḥakim û Nesayî û Taberanî jî rîwayet kirine ku gotiye: “Xudê Te’ala Musa xas kiriye bi kelam û İbrahim Xelîl û Muḥemed (selellaahû ‘eleyhî we sellem) bi dîtinê.” Ḥucceta wî ev hersê ayet in:

مَا كَذَبَ الْفُؤٰادُ مَا رَاٰى Yanî dilê pêyẋember înkar nekir tiştê ku bi çavê wî dît. Yanî dile wî tesdîqa çavê wî kir. İ’tîqada xîlafa wî nekir. Bi hev re muwafiq bûn di dîtina Xudê de. Lewra İsbat bûye bi ḥedîsa seḥîh çewa ku Şîhab gotiye[127]

اَفَتُمَارُونَهُ عَلٰى مَا يَرٰى Yanî çewa hun mucadele dikin pê re di dîtina wî de. Yanî dîtina wî ya ku Xudayê xwe dît. Xîtaba İlahî ji muşrîka re ye. Lewra înkara dîtinê dikirin bi temamî.

وَلَقَدْ رَاٰهُ نَزْلَةً اُخْرٰى Yanî Xudayê xwe dît careke dî ‘eletteḥqîq. Ebû Zerê ’Xifarî û Mû‘az bîn Cebel wek İbnî ‘Ebbas gotine. Hem ji ‘İkrîme û İbnî Mes‘ûd jî wisa hatiye rîwayetkirin. Ḥesen ûl-Besrî sond xwarîye bi Xudê ku Muḥemmed (selellaahû ‘eleyhî we sellem) Rebbê xwe dîtîye. İmamê Ḥenbelî gotiye: “Ez wek İbnî ‘Ebbas dibêjim dîtîye, dîtîye, dîtîye.”İmamê ‘Eş‘arî û komeke hevalê wî gotine: “Bi çavê xwe dîtîye. Û

---

[125] 2/310

[126] Her wiha: Me melekût (ḥukumranîya İlahî ya di) erd û asîman de nîşanî İbrahîm dida.

[127] 2/310

gotiye Xudê Te‘ala temmamê mu’cîzatê enbîya daye pêyẋemberê me (selellaahû ‘eleyhî we sellem.) Hem wî xas kiriye bi dîtinê[128]"

Lî derrê: Di zirar û xesaretê da ne.

Melaî dibêjin nedît: Civat û cema‘etê ku dibêjin Muḥemmed (selellaahû ‘eleyhî we sellem) Rebbê xwe nedîtîye wek mu’tezîlîyanû hinek ji ehlê ‘ilmê ḥedîs û ‘ilmê fiqhê û ehlê ‘ilmê ‘eqîdê. Çewa ku Qadî ‘Iyad di Şîfaê de gotiye:[129] Sebebê ku wana di zirarê de ne, lewra hindik in. Ḥucceta wan ze‘îf e. İmam Newewî di şerḥa Muslîm[130] de gotiye: "Qewlê raci’ li nêk ekser ‘aliman eve ku pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) Rebbê xwe dîtîye bi çavê serê xwe şeva mî’racê." İbnî Ḥecer jî di fetawa ḥedîsîye de[131] gotiye: "Cumhûrê ehlê sunnetê wisa gotine." Muxalefeta cumhur ne xalîye ji zirarê. Lewra mutabe‘eta pira lazime bi ḥukmê ḥedîsa seḥîḥ. Kesê ku ji pêyẋember ḥes bike bira xwe bi gotina cumhur bigre. Çewa ku şêx tewsîye kiriye ku gotiye:

Mebe bê sebeb munkirê "qed re a": Bê sebeb înkar neke dîtina ku ayeta وَلَقَدْ رَاٰه[132] delalet dike li ser.

Ji xelqê "Temarûn ‘ela ma yera": Yanî nebe munkîrekî ji wan xelqê ku ayeta "اَفَتُمَارُونَهُ عَلٰى مَا يَرٰى[133]" li ser wan carî dibe. Mirada Şêxê Xanî eve ku zahirê ayeta " وَلَقَدْ رَاٰهُ " dîtina bi çav dixwaze. Dema ku wisa ye murae û cîdalê neke di vê meselê de. Nebêje ku nedîtî ye. Da ku tu nebî hedef ji bo tîra ‘îtaba İlahî ku ji kevanê ayeta celîle dertê. Yanî ayeta اَفَتُمَارُونَهُ murada wê ne ewe ku munkîrê dîtinê digrin ji wan kesên ku ayet di ḥeqqê wan de nazil bûye. Lewra xîtaba ayetê bi muşrîka re ye çewa ku Tefsîra Celal dibêje. Bi sebeb ku înkara dîtinê dikirin bi her hawayî.

Tenbîh: Diya me ‘Aîşe û hinek ji esḥaba wek İbnî Mes‘ûd û ẋeyrî wî ku bûne tabi‘ê wê redîyellahû ‘enhûm gotine:"Mirad ji ayeta وَلَقَدْ رَاٰهُ بِالْاُفُقِ الْـمُبِينِ[134] û ayeta وَلَقَدْ رَاٰهُ

---

[128] Şîfa

[129] 158

[130] 9/92

[131] 108

[132] Bi sond wî ew dîtibû (Necm 13)

[133] (Digel vê) ma hunê niha di derheqê wî tiştê ku wî dîtîye de bi wî re bikevin nîqaşê. ( Necm 12)

[134] Bi sond wî (pêxember) ew di ufûqek aşîkar de dît (Tekwîr 23)

نَزْلَةً اُخْرٰى[135] eve ku pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) Cebraîl dîtîye du cara li ser sûretê wî yê ḥeqîqî. Carekî li erdê di ewelê rîsaletê de, carekî jî li Sîdretul muntehayê. Navbeyna herdû dîtina deh sal e.” ‘Aîşe û hevalên wê dibêjin: “Pêy’xember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) bi çavê serê xwe Xudê Te‘ala nedîtîye bi delîla ayeta لَا تُدْرِكُهُ الْاَبْصَارُ وَهُوَ يُدْرِكُ الْاَبْصَارَ[136] û ayeta وَمَا كَانَ لِبَشَرٍ اَنْ يُكَلِّمَهُ اللهُ اِلَّا وَحْيًا اَوْ مِنْ وَرَاءِ حِجَابٍ[137] Hem dibêjin: Lakîn bi dilê xwe Xudê Te‘ala dîtîye.” Du rîwayetê îbnî ‘Ebbas jî wisa dibêjin çewa ku di ḥedîsa Muslîm da ne. Lê ne wek ya pêşî meşhûr în. Taberanî ji: İbni ‘Ebbas rîwayet kiriye ku “carek bi çavê xwe dîtîye. Carek jî bi dilê xwe.” Bi vê gotinê hemî gotinê İbnî ‘Ebbas li hev dertên. Çewa ku îbnî Xuzeyme beyan kiriye.

Mirad bi dîtina dil eve ku Xudê Te‘ala di dilê wî de dîtinek xuliqand çewa ku di çav de xuliqandîye. Lewra ji dîtinê re ne şerte çav bi tenê. Cihê xusûsî jê re ne lazim in. Gerçi li gorî ‘adetê dîtin bi çava ye.

Tu bizan: İmamê Newewî gotiye: “Aîşe gotina xwe sade ji ayetê deranîye. Tu ḥedîs di dest wê de nînin. Gotina wê qet nabe ḥuccet ji nedîtinê re.” Digel ku İbnî ‘Ebbas muxalefeta wê kiriye di rîwayeta meşhûr de. Hem İmamê Ḥenbelî gotiye: “Gotina Aîşe tê defi’kirin bi hedîsa رَاَيْتُ رَبِّي yanî min Rebbê xwe bi çavê xwe dît. Ḥedîs ji gotina wê mezintir e.[138]” Şîhab gotiye[139]:“Ev ḥedîsa Îmamê Ḥenbelî seḥîh e. Lefzê wê ev e: صَلَّيْتُ اللَّيْلَةَ مَا قَضٰى لِي ثُمَّ وَضَعْتُ جَنْبِي فَاَتَانِي رَبِّي فِي اَحْسَنِ صُورَةٍ فَقَالَ يَا مُحَمَّدُ فِيمَ يَخْتَصِمُ الْمَلَاُ الْاَعْلٰى فَقُلْتُ اَيْ رَبِّي اَنْتَ اَعْلَمُ[140] ” Emma ḥedîsa رَأَيْتُهُ بِفُؤَادِي مَرَّتَيْنِ وَ لَمْ أَرَهُ بِعَيْنِي[141] ze‘îf e.

Xatîme: Se‘îd îbnî Cubeyr gotiye: “Ez nabêjim ku pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) Xudê Te‘ala dîtîye. Ez nabêjim ku nedîtî ye, yanî teweqquf kiriye” Qurtûbî

[135] Bi sond wî ew (Cebraîl di sûretê wî yê eslî de) carekî dî di dema dahatînek dî de dît (Necm 13)

[136] Çav nikarin wî îdraq bikin. Lê bele ewçavan îdark dike. (Enam 103)

[137] Ji bil (wesîla) wehy û xeberdana pişt perdê ne mimkûne ku Ellah Te‘ala bi tu beşerî re tekellum bike biştexil e (Şûra51)

[138] Zerqanî 6/110-119

[139] 2/312

[140] Min ew roj bi qasî ku hatibû teqdîrkirin nimêj kir. Paşê min serê xwe danî û ez raketim. Rebbê min li ser sûretê herî xweştir xwe nîşanî min da û wiha kerem kir: “Ya Muhemmed mele-î e’la li ser çi nîqaş dike?”Min got: “Ya Rebbî tu çêtir dizanî”

[141] Min ne bi çavê xwe lê bi dile xwe du cara dît.

di şerḥa Muslîm de ev qewl tercih kiriye û nîsbeta wê daye bi bal cema‘etek muḥeqqîqna ve. Û teqwîye kiriye di vî babî de ku di vî babî de delîlek qet‘î tune. Delîlê herdû taîfa zahirê hinek ayetan û ḥedîsan in, hev nagrin. Te’wîl li wan dikevin Qadi ‘İyad di Şîfaê de[142] gotiye: “Dîtina Xudê Te‘ala ku caize şubhe tê de tune. Lewra tu ayetê ku bi sûretê qet‘î men‘a dîtinê bikin nînin.” Aha ev ḥeq e. Lewra ayeta لَا تُدْرِكُهُ الْأَبْصَارُ[143] û لَنْ تَرَانِي[144] û وَمَا كَانَ لِبَشَرٍ أَنْ يُكَلِّمَهُ اللهُ إِلَّا وَحْيًا[145] … îla ayet. Di tefsîra wan de îxilaf pir e. Heryekî bi hawakî te’wîl li wan daye. Xeberdan li ser wan dirêj e. Di vir hilnayê. Hem gotiye: Di herduwan de jî. Emma îsbata dîtina bi çav ji Pêyẋemberê me re (selellaahû ‘eleyhî we sellem) delîla qet‘î ji wî re jî tune. Lewra mu’temedê vê meselê du ayet in: مَا كَذَبَ الْفُؤَادُ مَا رَأَى[146] û وَلَقَدْ رَآهُ نَزْلَةً أُخْرَى[147] Di herduwan de jî nîza’ heye çewa ku buhurî. Ḥedîsa qet‘î jî ku dîtinê îsbat bike tune. Lewra hemî ḥedîsê ku anîne û kirine ḥuccet ji bo dîtinê, qencê wan ḥedîsa İmamê Henbelî ye ku vêga buhurî. Di wê de jî iztirar heye. Yanî îxtilaf heye. Lewra carek ji Mu‘az bin Cebel rîwayet kiriye, carek jî ji İbnî ‘Ebbasê Ḥedremî. Metnê wê jî rîwayetek ew bû ku buhurî, rîwayetek jî eve: “ قُمْتُ مِنَ اللَّيْلِ فَصَلَّيْتُ مَا قُدِّرَ لِي فَنَعَسْتُ فِي صَلَاتِي حَتَّى اسْتَيْقَظْتُ فَإِذَا أَنَا بِرَبِّي[148] ” Hinka gotiye: Ev ḥedîs madem ku Tîrmîzî jî seḥîh dêra ye, xelel tê de tune. Emma ḥedîsa İbnî ‘Ebbas ku dibêje: “Bi çav dîtîye” Ew xebereke ji î’tîqada xwe gotiye. İsnad nedaye bi bal pêyẋember ve (selellaahû ‘eleyhî we sellem) çewa ku Qadî ‘Iyad gotiye. Lakîn İmamê Newewî di şerḥa Muslîm de[149] ji xweyê Teḥrîrê neqil kiriye ku esil di vê meselê de ḥedîsa İbnî ‘Ebbasê ku ‘alimê vê ummetê ye. Bi bal wî ve rucu’ tê kirin di meselê hişk û zor de. Wî ḥella wan kiriye. Dema ku rîwayet jê sabit bibe lazime bê qebûlkirin. Lewra rîwayetê wiha bi ‘eqlê xwe û bi zenna xwe nabêje ancaẋ ji bihîstinê distîne. Ne duruste ku kesek zen bike ku İbnî ‘Ebbas bi zenn û îctîhada xwe di vê meselê de xeber daye. Qadî ‘Iyad gotiye: “Emma ḥedîsa Ebû Zer, ew jî wek ḥedîsa İbnî ‘Ebbas e. Yanî ne delîlek qet‘î ye

---

142 1/162

143 Çav nikarin wî bibinin.(En‘am 103)

144 Tu nikarî (li dinyayê) min bibînî (E’raf 143)

145 Ji bil wesîla wehyê ne mimkûne ku Ellah Te‘ala bi tu beşerî re bişteğil e. (Şûra 51)

146 Tiştê ku bi çav dît, dil derew nedêrand.

147 Bi sond wî Ew (Cebraîl di sûretê wî yê eslî de) carekî dî di dema dahatinek dî de dît (Necm 139

148 Ez bi şev rabûm. Bi qasî ku hat teqdîrkirin min nimêj kir, paşê ez di hengâma nimêjê de xirmaşî xewê bûm. Dema ku ez hişyar bûm mim dît ku ez di ḥuzûra Rebbê xwe de me.

149 2/92

di îsbata dîtinê de.” Ḥedîsa wî eve: سَأَلْتُهُ  هَلْ رَأَيْتَ رَبَّكَ؟ فَقَالَ: رَأَيْتُ نُورًا[150] Yanî ji nûrê pê ve min tiştekî nedît. Muḥale ku zatê Xudê Te‘ala nur be. Lewra nûr cism e. Emma ayeta اَللّٰهُ نُورُ السَّمٰوَاتِ وَالْأَرْضِ[151] ew me’wûle çewa ku buhurî. Şîhab di şerḥa şîfayê de gotiye.[152] “Piştî neqla kelamê gelek ‘aliman di vê beḥsê de gotiye: “Ev tev xeberê neqşandî ne.” Mayê ku İmamê ẋezalî pê razî bûye ev e ku ji Xudê Te‘ala re tê gotin “Nûr” ḥeqîqet e. Lewra me’na wê اَلظَّاهِرُ بِنَفْسِهِ الْمُظْهِرُ لِغَيْرِهِ[153] Eş‘arî jî muwafiqê wî ye ku gotiye: “Xudê nûrek ne wek nûra ye.” Bînaen li vîya “Xûdê nûra nûrê ye.” Xefîye jê re ya zihûr e. Eger tu fehm bikî Xudê نُورٌ عَلٰى نُورٍ[154] gotina Qadî ku “Nur cism e” em teslîm nabin jê re. Qadî ‘Iyad gotiye: Emma hedîsa Ebû Zer a dî elfazê wê muxtelef in. İḥtimala dîtin û nedîtinê tev dixwaze. Hem muşkîle lewra zatê Xudê Te‘ala gerandiye nûr. Lefzê wê eve: سَأَلْتُ رَسُولَ الله  هَلْ رَأَيْتَ رَبَّكَ؟ قَالَ: نُورٌ أَنَّى أَرَاهُ؟ [روى هذا وما قبله مسلم][155] Yanî Xudê Te‘ala nur e ez çewa wî bibînim. Yanî min nûrek dît. Bû perde li besera min. Nehişt ku ez Xudê bibinim. Ev wek ḥedîsa حِجَابُهُ النُّورُ[156] ko Buxarî û Muslîm rîwayet kirine. Temmamê wê ev e: إِنَّ اللّٰهَ لاَ يَنَامُ وَلَا يَنْبَغِي لَهُ أَنْ يَنَامَ يَخْفِضُ الْقِسْطَ وَيَرْفَعُه يَرْفَعُ عَمَلَ الَّيْلِ قَبْلَ النَّهَارِ وَعَمَلَ النَّهَارِ قَبْلَ اللَّيْلِ، حِجَابُهُ النُّورُ لَوْ كَشَفَهُ لَأَحْرَقَتْ سَبَحَاتُ وَجْهِهِ مَا انْتَهَى اِلَيْهِ بَصَرُهُ مِنْ خَلْقِهِ[157] ” Şîhab gotiye: “Qadî li gor fehma xwe ḥedîsa Ebû Zer me’ne kiriye.” Hinek pê razî nebûne. Senbatî gotiye: “Tiştê ku ji me ve xwîya dibe, li gorî ku em î’tîqada dîtinê dikin me’na

---

150 Min ji wî (s.a.w.) pirsî: “Gelo te Rebbê xwe dît.” Got: “Min nûrek dît.”

151 Allah Te‘ala nûra ‘erd û asîmana ye(Nur 35)

152 2/324

153 Ew tiştê ku bi nefsa xwe tê dîtin, ewe ku ê dî jî nişan dide.

154Nura li ser nûrê

155 Min ji Resûlûlllah (s.a.w.) pirsî: “Gelo te Rebbê xwe dît? Wî got: “Ew nûreke ka ezê çawa wî bibinim.” (Ev ḥedîs û ḥedîsa berya wê ji teref İmam Muslîm ve hatiye rîwayetkirin.)

156 Hîcaba wî nûr e. Eḥmed Ḥîlmî li ser vê hedîsê div ir de kurteşerheke bi ‘Erebî nivîsîye. Wergera wê wihareng e.

157 Eḥmed Ḥîlmî li ser vê hedîsê di vir de kurteşerheke bi ‘Erebî nivîsîye. Wergera wê wihareng e: Qist mîzan e. Ji ber ku qist edalet e jê re hatiye gotin qist, çimki bi mîzanê edalet çêdibe. Meqsed di vir de ev e: Xweda bi wezinandina emelên îbada ê ku wan bilind dikin û rizqê ku nazilê ser wan buye, mêzênê datine u bilind dike. Ev temsile ji bo wî tiştê ku nazilkirina wî hatiye teqdîrkirin. Ji ber vê hatiye şibihandin bi wezna mêzênê. Hineka jî gotiye murad bi qistê ew rizqê ku para her mexlûqî dikeve, bi feqîriyê wî datîne û bi firehiyê jî wi bilind dike.

Hicaba wî nûr e: Di heqiqet de hicab ancax ji cismên mehdûd re dibe. Xwedê Teala jî ji cism û ḥed munezzeh e. Meqsed di vir de ewê ku dibe mani‘ê ditina wî. Çewa di riwayetki de hatiye ji vî mani‘î re hatiye gotin nur yan jî nar. Çimki vana ji ber ronayi didin men‘a idraqê dikin. Mirad bi wecih zat e û mirad bi “sebehata”nur û celala wi ye. Mirad bi “cihê ku besera wî lê di qede” jî temamê mexlûqane. Çimkî besera Xweda subhanehu we teala temamê kainatê ihate dike. Lefzê “mîn” ji bo beyana cinsê ye, ne ji bo teb‘îd û teqdîrê ye. Ger ew maniê ku navê wî nûr e yan jî nar e ji ber ditina xweda rabe wê celala zatê wî temamê mexlûqa bişewitîne. Xweda çêtir zana ye. (Şerha Muslim, Newewi 2/103)

ḥedîsa Ebû Zer wiha ye: “Nûr” yanî Xudê Te‘ala xwey nûr e. Paşê pêyẋember nişan da ku dîtina Xudê Te‘ala muşaheda zatê ‘alî ye. Pir tişkî mezine got اَنّٰى يُحْيِي هٰذِهِ اللهُ بَعْدَ مَوْتِهَا[158] Ez çi bibinim. Yanî zatê ku min dît pirrî ku mezin bû ez ne di dereca dîtina wî de bûm.” Çewa ku ayeta اَنّٰى يُحْيِي هٰذِهِ اللهُ بَعْدَ مَوْتِهَا[159] wisa hatiye tefsîrkirin. Emma ḥedîsa رَأَيْتُ نُورًا[160] ew ness e di dîtinê de. İmam Newewî neqil kiriye[161] ku delil û ḥuccetê vê mesele pirin. Lakîn emê xwe bigrin bi ya qewîntir ji neqla ḥedîsa İbnî ‘Ebbas (rediyellahû ‘enha): أَتَعْجَبُونَ أَنْ تَكُونَ الْخُلَّةُ لِإِبْرَاهِيمَ وَالْكَلَامُ لِمُوسٰى وَالرُّؤْيَةُ لِمُحَمَّدٍ [162] Hem gotiye: “ İbnî ‘Ebbas û hevalên wî tiştê wiha îsbat nakin îlla bi bihîstina ji Resûlê Xudê Te‘ala.” Ev tişkî wisa ye ku ne layiqe şek tê de çê bibe. Şîhab gotiye[163]: “İmamê ẋezalî jî tesrîḥ kiriye ji musennif. Qadî ‘Iyad jî bi bal ve meşiya ye.”

#### 2.2.2.7. Ru’yet Li Ku Derê Çêbîye

19- Eger tu dibêjî li ku dî Xûda, Xudê go li nêk Sîdretul Munteha

20- Muḥeqqeq bizan wî Xudê dîtîye, we lêkîn nizanit ḥeqîqet çiye

21- Ji bo wî çunîne nezîr û şebîh, kesê wesfî kit dê çi bêjit bedih

Eger tu dibêjî: Eger bi pirsî: Pêy’xember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) li kê dere bû dema ku Xudayê xwe dît. Emê bejin: Zeḥmetî di cewaba vê pirsê de tune. Lewra Xudê Te‘ala bi xwe gotiye ku li nêk “Sîdretul Muntehê” dîtîye. “ وَلَقَدْ رَآهُ نَزْلَةً أُخْرٰى عِنْدَ سِدْرَةِ الْمُنْتَهٰى[164] ” yanî bi teḥqîq careke dî jî wî dît li nêk dara ku navê wê “Sîdretul Muntehî” ye. Şêxê Xanî mucîbê vê ayetê demîra رآه “dît”raci‘ê bi bal Xudê ve ye gotiye.

Mu ḥeqqeq bizan… îlx: Ji gotina İmam Newewî jî wisa tê îstîfadekirin. Kesê ku ḥukum dikin bi dîtinê ku du caran, di cara ewil de xîlaf kirine. Ka li kê derê bû. çewa ku

---

[158] Gelo ma wê Xwedê Te‘ala piştî mirinê vê herêmê ji nû ve dê çawa jîndar bike (Beqere 259)

[159] Gelo ma wê Xwedê Te‘ala piştî mirinê vê herêmê ji nû ve dê çawa jîndar bike (Beqere 259)

[160] Dît kû nûr e.

[161] 2/92

[162] Gelo ma bexşandina dostanîyê ji İbrahîm re, a kelamê ji Musa re, a ru’yetê (dîtina Xwedê Te‘ala) ji Muhemmed re (s.a.w.s) te ‘ecêbmayî dihêle.

[163] 2/223

[164] Bi sond wi ew (Cebraîl) di dema dahatinek dî de li nig Sîdretul-Muntehayê (li ser sûretê wî yê eslî) dît (Necm 13-14)

buhurî di seḥîfa 13a de.[165] Lê di cara dawî de xîlaf tune ku li nik "Sîdretê" bû. Loma Şêx beḥsa wê tene kir.

"Şebîye" bi me'na misl e. Ferqa misl û nezîrê di s. 3ya[166] de buhurî. Dema ku nezîr û şebîh jê re nînin. Ji xwe ḥeqîqeta wî nayê zanîn.

Dê çi bêjit bedîh: Wê çi tiştê bedîhî bibêje di wesfê Xudê Te'ala de. Yanî kes nikare wesfekî bide hê jê re îsbat bike.

Wesfê bedîhî: Wesfê ku tête naskirin bê tefekkur. Lewra bedahet naskirina bi sebeb tefekûrê ye. Wekî niha "yek nîvê duduwa ye." Dema ku ḥeqîqeta wê nayê zanîn wesfê bedîhî jê re nînin. Ancax sifetê wê têne îsbatkirin bi delîla. Ḥetta yekîtîya wî jî bi delîla ye.

### 2.2.2.8. Di Derḥeqê Mi'racê De Ji Ustad Bedi'ûzzeman

Çar Esas: Ev her çar esas me ji soza sî û yekî sitendiye, bi sûretê kurt ji kitêba Bedî'ûzzeman "Sozler Mecmû'asî"

Esas 1: Sirra ku mi'rac kiriye lazimê xwe çiye? Xudê Te'ala ji her tiştî nêztirê her tiştî ye. [167]اَقْرَبُ إِلَيْهِ مِنْ حَبْلِ الْوَرِيدِ Cism û mekan jê re nînin. Ji bo çi welayeta Eḥmedîye bûye netîca mî'raca ku sefera dûr û dirêj e. Piştî wî hê qismê welîyan miwafiq bûne ku di qelbê xwe de munacatê bikin?

El cewab: Ev sirrê ha bi du temsîla nêzî fehmê dibe.

Temsîla ewil: Suḥbet û xîtaba sultan bi du şekla ye.

Yek: Xîtaba ji dûr ve bi yekî 'amî re ji bo şuẋlekî xusûsî bi telefonê.

Ya dî: Xîtaba bi emîrekî mezin re di ḥuzûra xwe de, ji bo ku emrê wî li etrafa bela ke û meznaya wî nişan bide. Ha mî'rac ji bo nîşandana ku welayeta pêyẋember di ser hemî welayeta re ye. Ji bo muşerefbûna so'hbeta bi Rebbê kainatê [168]وَلِلّٰهِ الْـمَثَلُ الْاَعْلٰى

---

[165] Muellif di virde meselê hewaleyî şerha beytên 16-18 dike.Ş erha vê beytê di destxeta muleif de wek sehîfa 13a de cîh digre. (c)

[166] Muellif di virde meselê hewaleyî şerha beyta 5.dike.Şerha vê beytê di destxeta muleif de wek sehîfa 3ya de cih digre. (c)

[167] (Em) ji wî re ji şehdemara wî nêziktir in.Qaf 16

[168] Misal (û ewsafê) ên herî payeberz her ê Ellah Te'ala ne. Nehl 60

Temsila duduwa: ‘Eynikek li ber rojê bête danîn, ji ‘eksa rojê di ‘eynikê de tîrêjek here hundurekî tarî, însanek di hundur de bi wê tîrijê re suhbet bike, ancaẋ bi qasî qabîlîyeta ‘eynikê îstifade dibîne. Yekî dî ‘eynikê bi terikîne, derê der ve meznaya rojê bibîne, paşê here di banê xanîyê xwe de pencerekî veke, bi rohnîya rojê re suḥbet bike kare bêje: “Ya nazenîna asîman, xweşika dinyayê ku te ruyê erdê tev rohnî kir û temammê kulîlka da kenandin, te wisa xaniyê min û baxçeyê min germ kir û rohnî kir.” Emma xweyê ‘eynikê nikare wisa bêje. Di bin qeyda wê de dimîne. Ha! Sultanê roja ezel û ebed, zatê Eḥed û Semed, tecellîyatê wî bi du sureta xwîya dibin.

Yek: Tecelîya sifetê ye ku di ‘eynika qelb de xwîya dibe bi nîsbeteke Rebbanî re. Herkes dibe mezher ji bo tecelîya esma û sifetan li gorî îstî’dada xwe û seyr û sulûka xwe. Ewan kesan di bin sîha ẋalibê esma û sifeta de diçin, yanî ê ku tecelli nekin. Derecatê welayetê ji vî qismî ne.

Ya duduwa: Tecelîya zatî ye. Yanî tecelliya zatê Ḥeq Te‘ala di fêkîyê dara kaînatê de ku me’na ferdê e’zem e ji new‘ê însan re. Ku kare hemî esmaul ḥusna bi hev re di ‘eynika ruḥê xwe de nişan bide. Lewra mezherê îsmê e’zem e. Ev xwîyabûn û tecelli sirrê mî’racê ye. Welayeta pêyẋember (sellelllahû ‘eleyhî we sellem) mebde a rîsaletê ye. Ji siyê derbas bûye. Di rîsaletê de sî tune. Rasta rasta[169] li zatê zul Celal dinhêre. Mî’rac kerameta kîbrîya ye. Û merteba ‘alîya ye. Ji welayeta Eḥmedîye re înqilab bûye bi rîsaletê. Batinê mî’racê welayet e. Ji xelq çûye Ḥeq. Zahirê wê rîsalet e. Ji Ḥeq çûye xelq. Welayet sulûk e. Muḥtacê zeman û teyya meratiba ye. Rîsalet nûra e’zem e. Li inkişafa sirrê qurbîyeta İlahî dinhêre. Zemanekî hindik jê re kafî ye. Loma mîrac zû qediya. Zivirî hê nivînê wî germ bûn, sar nebibûn.

Esas 2 : Ḥeqîqeta mî’racê çiye?

El cewab: Mî’rac ‘îbaretê ji seyrû sulûka zatê Eḥmedî ye di meratibê kemalata de. Yanî cenabê Ḥeq Te‘ala di tertîba mexlûqata de tecelli kir ku her yekî navekî li wan danî. Bi ‘unwanekî wî da naskirin. Û di selteneta xwe de daîreyê tedbîrê teşkil kir. Di wan daîra de tebaqat danîn ku her yek medarê ‘erşekî rubûbîyetê û merkezekî teserrûfê ye. Di hemî tebaqata de asarê Rebbîtîyê danî, yeko yeko ji wî ‘ebdê xwe yê mexsûs re nişan da. Cenabê Ḥeq ji bo ku wî ‘ebdê xwe bi gerîne cami‘ê kemalatê însanîye û mezherê hemî tecellîyatê îlahîye û nazirê hemî tebaqatê kâinata û mubellîẋê hemî

[169] Rasta rasta: Yanî rastîya herî rast. (c)

merzîyatê îlahî ye û keşafê tilsimê kâinata, wî siwarî Bûraqê kir, wekî birqê wî di asîmana de seyr kirin. Di meratiba de derbas kir. Menzîl menzil, daîre daîre rubûbîyeta İlahî pê da temaşekirin. Enbîyayê birayê wî heryek di meqamê wan de yeka yeka pê da nişandan. Di daîreyê asîmana de ḥetta wî derxiste "Qabê Qewseyna." Û wî gerande mezherê kelam û dîtina xwe. Ev 'ebdê mexsûs ku Muḥemmed e (sellelllahû 'eleyhî we sellem) madem ku cenabê Ḥeq wî xas kiriye bi van wesfan elbette wê di nava efradê însanan de jê re seyr û silûka me'newî çê bibe. Û di 'alema cismanî de wê jê re mî'racek di sûretê seyaḥetê de bibe. Hem wê li pişt berzexa esmaa wê tecellîya sifeta û ef'ala û tebeqatê mewcûdata ku 'îbaretê ji ḥeftaê hezar perde ye di hemî meratiba de derbas bibe. Mî'rac ev e.

Sûal: Piştî mesafa ku bi hezar sala ye qedand û di ḥeftaê hezar perde de derbas bû hê bi Rebbê xwe re xeber da digel ku Xudê Te'ala ji her tiştî nêztir e?

Cewab: Erê Xudê Te'ala ji her tiştî nêztirê her tiştî ye. Feqet her tişt bê nîhayet û bê ḥîsab jê dûr e. Çewa ku eger şi'ûr û xeberdan ji rojê re hebûna wê bi wasita 'eynikê bi însan re xeber bidana. Bi kêfa xwe di însan de teşerrûf bikira di gel ku însan mesafa çar hezar sal jê dûr e, bi tu şeklî nikare nêzî wê bibe.

Sûal: İnsan ancaẋ bi wasita teyarê çend kilometre bilind dibe digel çiqa muşkîlata. Çewa însan di çend deqîqa de mesafa hezar salî diqedîne?

Cewab: Ev erda ku cismekî pir girane bi ḥereketa senewîye di deqîqekî de teqrîba mesafa sed û heştê û heşt sala di qedîne. Di salekî de teqrîba mesafa bîst û pênc hezar salî diqedîne. Madem ku wiha ye 'ecêba Qadirê Zulcelal nikare însanekî bi gihîne 'erşê xwe di çend deqîqe ê hindik de?

Esas 3 : Ḥîkmeta mîracê çiye?

El cewab: Ḥîkmeta mîracê pir kûr e. Fikra beşer na gihîjê. Feqet ḥeqaîqê wê eger neên zanîn, lê hebûna wan bi hinek îşareta dibe ku bête zanîn bi vî terzî: Xaliqê van kâinata ji bo ku nûra weḥdeta xwe û tecelîya eḥedîyeta xwe di van tebaqatê pur de nîşan bide ji muntehayê tebeqata ḥeta mebdeê weḥdetê, bi mî'racek di sûretê "طايى اتصالى[170]" de ferdekî mumtaz li ser ḥesabê hemî mexlûqa ji xwe re gerande muxatab. Bi navê hemî zî şi'ûra meqasida xwe ê îlahî pê da zanîn û fehmkirin. Cemalê sen'etê xwe û kemalê

[170](Tayê îttîsalê) Yani benikê gihandinê

rebbîtîya xwe di ‘eynika mexlûqata de pê da dîtin û muşahedekirin. Hem cemal û kemala sani‘ê ḥekîm bê ḥedd û hîsab in. Herdû bal zatê meḥbûb in. Xweyê wan jî pir ji wan ḥes dike. Ew ḥeskirin bi gelek terza di mesnû‘ata de xwîya dibe. Ji mesnû‘atê xwe ḥes dike. Lewra cemal û kemala xwe di wan de dibîne. Di nav wan de ê pir ḥeskirî ‘alî ruḥber in. Di ruḥberan de zî şi‘ûr in, di zî şi‘ûran de ê ku pir tê ḥeskirin bi î’tibar cema‘etê di nav însan de peyde dibe. Ew ferdê ku di nav însan de îsti’dada wî bi temamî înkişaf bûye, nimûna kemalata xwe nîşan daye di mesnû‘ta de menşur û mutecellî bûne.[171] Her ew e ê ku pir tê ḥeskirin ji nav însana. Sani‘ê ḥekîm ji bo ku hemî enwa‘ê tecellîya, muḥbeta xwe yê ku menşur e di hemî mewcûdata de, di yek nuqtekî de, di yek ‘eynekî de dît û ji bo ku cemala xwe bi sirrê eḥedîyetê nîşan bide, zatekî di dereca fêkîyê munewer de ji dara xulqetê[172] û qelbê wî di ḥûkmê dendika ku ḥeqaîqê esasî ye ê wê darê îstî‘ab dike, ji mebdeê ewel ku dendike, ḥeta muntehayê ku fêkî ye bire mî’racekî ku wek xeyta ittsala[173] mebde ê bi muntehayê ve. Da ku wî zatê ferîd celbî ḥizûra xwe bike, bi navê kaînatê meḥbûbîyeta wî nişan bide, bi dîtina cemala xwe muşerref bike. Ḥaletê qudsîye ê ku tê de hene di ẋeyrî wî de jî bide sîrayetkirin. Bo m’i’racê wî teltîf kir bi kelamê xwe. Da wezîfekirin bi fermana xwe. Ḥîkmeta mî’racê eve.

El ḥasil: Mî’rac ji bo dîtina netaîcê mexzenê ‘alema erdê ye. Û dîtina dezge û makîneyê asarê ku tê de ne.

Esas 4: Semerat û faîdeyê mî’racê çine?

El cewab: Fêkîyê dara Tûba ya ku mî’rac e ji pênc sedî zêde ne. Lê emê pênca zikir bikin.

Yek: Ḥeqayiqê erkanê îmanê bi çav dît. Milyaketa, cina, axretê, ḥeta zatê zulcelal jî bi çav muşahede kir. Wisa xezînekî nûrika ezelî û ebedî ji beşer û kaînata re anî û hediye kir. Vê kaînatê ji wedî‘îyeta mewhûme ku perişan û fanîye deranî. Hem ḥeqîqeta

[171] Yanî ew kemalat di mesnû‘ata de belav bûne.

[172] Dara xulqetê: Dara kaînatê. Yanî kaînatê ku di şibhîne dara Tûbayê ku koka wê li jor e şaxê wê li jêr in. Şeqekî koka wê ‘alema suflî ye ku ji hîvê berjer e. Şaxê wê ‘enasir in. Pelê wê darê nebat in. Kulîlkê wê ḥeywan in. Fêkîyê wê însan in.

[173] Xeyta îttsalî: Yanî tayê bi hevvekirinê. Murad pê munasebeta hemî mexlûqa bi hev re ye. Tev munasibê hev in. مَا تَرٰى فِي خَلْقِ الرَّحْمٰنِ مِنْ تَفَاوُتٍ yanî “ne mimkûne ku tu dijberîyê xuliqandina Xwedê Te‘ale de bibini.” (Suretê Mulk 3)

kaînatê nişan da ku di wed‘îyeta mektûbatê qudsîye ê semedanî de ye û ‘eynekî bedewe ji cemala eḥedîye re. Hemî kâinat û zî şi‘ûra kêfxweş kir.

Dido: Esasatê İslamîye ku merzîyatê sani‘ê‘alemê, ḥakimê ezel û ebed, di serî de limêj ji cin û însan re hediye anî. Ew merziyatê bê ḥîsab têne meraqkirin û erzkirin. Lewra herkes meraqdar û erzûkêş e. Ji dûr ve ji nî’metê welîkî mezin weya ji bo erzûya paşakî muḥsîn ku wê erzûyê fehm bike memnûn dibe û temennî dike ku “xwezî wasitekî muxaberê hebûya rasterast min bi wî zatî re xeber bida. Ji min çi divê min fehm bikira. Çi li xweşîya wî diçe min zanibûna.” Evana mexlûq in încar temennîya merzîyatê xaliq ji xwe naên ḥîsab.

Sisê: Defîneya se‘adeta ebedîye dît. Mifta wê girt û anî ji cin û însan re hedîye kir bi wasita mî’racê. Cennet bi çav dît. Cîlweyên baqîyê reḥmeta Reḥmanê zullcelal muşahede kir. Se‘adeta ebedîye ḥeqqel yeqîn fehm kir û mizgîna hebûna wî da cin û însana. Lewra cin û însê bê çare di dunyaya bê qerar de, mewcûdatê di nêv zelzela zewal û fîraqê de, di dema qebûlkirina fîraqa ebedî bi seylê zeman û ḥerekatê zerrata û di hengamê ku wed‘îyeta muhîmeya can feraşane de ne. Yanî ku erwaḥê wan wek minminîkê ku di firrê de ne. Cin û însê ku bi zenna xwe meḥkûmê ‘îdama ebedî ne, wê demê ku mizgîna ḥeyata ebedî li guhê wan keve çiqas qîmetdar û se‘adetawer e nayê te‘rîfkirin. Mesela yekî ku î’dam jê re hatibe qerardan paşê bête ‘efûkirin wê çiqas kêfxweş bibe.

Çar: Fêkîyê cemala Xudê girt û mumkûnbûna wî fêkîyî ji her mu’mînî re di axretê de hedîye anî ji cin û însan re. Lezzeta wî fêkîyî tê wiha zanibî: Her însan ji zatekî xweyê cemal û xweyê kemal û xweyê îḥsanê ḥes dike. Ew ḥeskirin li gorî derece ê cemal û kemal û îḥsanê zêde dibe. Muḥbetekî girê dide di dereca ku canê xwe feda bike. Ji bo dîtina yek carekî diçe dereca ku dinya xwe feda bike. Ḥal ew ḥal e cemal û kemal û îḥsana hemî mewcûdata bi nîsbet cemal û kemal û îḥsana Xudê Te‘ala wek tîrêjek biçûçik bi nîsbet rohnaya rojê naên. Ku wisa ye, layiqê muḥebet û îştîyaqa bê nihayet yek zatê zul celal û wel kemal e. Muwefeqbûna dîtina wî di ḥeyata ebedî de çiqas medarê serwerê ye ku tu însan bî tê fehm bikî.

Pênc: İnsan ku fêkîkî qimetdar e û meḥbûbê sani‘ê kâinata ye, bi mî’racê hate zanîn. İnsanê zî şi‘ûr ku mexlûqekî biçûk, ze‘îf, bê çare, wekî bi sur‘eta xiyala xwe û wis‘eta ruḥê xwe cewelana ‘eqlê xwe û hemî erzûyê qelbê xwe muwafiq bibe ji bo

tenzih û seyrana di milk û melekût de, bi yek carî di cenneta baqî de bibe mezherê reḥmeta Xudayê Reḥîm û Kerîm, di se‘aadeta ebedî de miwafiq bibe ji bo dîtina cemala wî re. İnsanê ku ji însanîyetê neketibe dema ku vîya bibhîze wê çiqas di qelbê xwe de bi surûr û kêfxweşîyê biḥese tu karî texeyul bikî.

### 2.2.3. Sifetê Seb‘e (Sibûtî)

22- Sifetê di seb‘e ji bo zul celal, bizan ḥeft in ey ‘arifê pur kemal

23- Xweşî, şîn û zanîn û vîn û kelam, bihîstin digel dîtinê bûn temam

24- Qedîm in wekî zatê cumle sifat, ne ‘eynî di zatî ne ne ẋeyrî zat

Sifetê di seb’e: Sifetê ku meşhûr in bi lefzê “sifetê seb‘e” di luẋeta ‘Erebî de “ḥeft in” li nik Eş‘arîyan, heşt in li nik Matûrîdîyan. Ew dibêjin: “Sifatê semanîye.”

“Sifatê di seb‘e” mubteda ye. Lefzê “ḥeft in” xeberê wî ye. Masedeqê herduwan yek e. Eger bigota: “Bizane ev in ey hevalê delal” weya tişkî wek wê, ji yekîtîya mubteda û xeberê xelas dibû. Ellahumme îlla ku em bejin: ‘Ewamê Kurmanca me’na sifatê seb‘e nizanin. Dema ku got “ḥeft in” da zanîn ku ḥeft sifetên Xudê Te‘ala hene. Ji wan re tê gotin “sifatê seb‘e.” Zanîna wan li herkesi wacib e.

Xweşî: Yek ji wan ḥeft sifetan xweşî ye. Yanî saẋî û ḥeyat e.

Şîn: karibûn, qudret.

Tu bizan: Qudreta Xudê Te‘ala li ser her tiştê mimkûn heye, wek îcadkirina mexlûqa û fenakirina wan. Lê li ser tiştê wacib û mu’hal tune.

Wacib: Wek zat û sifatê Xudê û ‘edema ezelî. Qudreta Xudê Te‘ala ne li ser îcada zat û sifatê wî heye ne li ser fenakirina wan heye. Wiharenge tunebûna ezelî ne îcad dibe ne fena dibe.

Mûḥal: Wek şerîkê Xudê Te‘ala û deranîna mexlûqa ji milkê wî.

Hem tu bizan: İmam Eş‘arî gotiye: “Qudreta Xudê Te‘ala xwe bi fenakirina mexlûqa ve nagre piştî wicûda wan. Dema ku Xûdê Te‘ala îrada fenakirina tişkî bike mededa xwe jê dibire bi xwe fena dibe, çewa ku dohnê fitîlê diqede bi xwe di tefe.[174]

[174] Eḥmed Hîlmî di vir de wek jêrenot kurteşerheke bi ‘Erebî nivîsîye wergera wê wihareng e: Seyyîd Mehmûd Haşîmî wiha dibê: “Eger Ellah Te‘ala mexlûqat bi xuliqandin û îstimdada ji wan a her demî re nîmetdar nekira ew dê helaq bibûna. Lewra ew her dem bi wesfê tûnebûnê ve wesifdar in.”

Hem tu bizan: Te’sîra ḥeqîqî ji zatê Xudê re ye. Ji qudretê re mecazî ye. Ḥeram e ku meriv bêje: “Qudret tişta dike.” Belkî kufr e eger qesd bike ku qudret ḥeqîqeten tişta dike. Çewa ku kafir dibe kesê î’tîqad bike: “Agir tişta di şewitîne weya kêr tişta dibire.” Ema ku qesda wî “agir sebebê şewitandinê ye û kêr sebebe birînê ye” durust e.

İblîsê le‘în ji İdrîs pirsî: “Xudê kare dinyayê têxe qaşilê bindeqê?” İdrîs çavê wî bi derzîyê dirand. Nûra çavê wî tefand. Lewra İblîs îrada tefandina nûra îmanê kiribû. Ceza ji cinsê ‘emela ye. Hem cewab da go: “Xudê Te‘ala dikare dunyayê di qula derzîyê de derbas ke. Bêwe ku qula wê fire bike û dinyayê biçûk bike.” Cewab tefsîl nekir. Lewra ḥeqê xweyê ‘înadê terk û men‘e.

Zanîn: ‘Ilm. ‘Ilmê Xudê Te‘ala zatî ye. Ji xwe heye. Ne bi kesî ye. Hem ne zerûrî ye, ne bedîhî ye. Lewra gerçi herdû jî ne mewqûfê ser delîla ne. Lê zerûrî carna tê gotin ji wî tiştî re ku zerûret pê re beraberî dike, wek bîhna gulê ku em didin ber pozê xwe derḥal bîhn dide. Bedîhî jî tê gotin ji bo zanîna ku ji nişka ve çê dibe. Ji ber wehma van herdû me’na nayê gotin: ‘Ilmê Xudê zerûrî weya bedîhî ye.

Vin: İrade.

Kelam: Xeberdana li ser kelamê lefzî û nefsî di rehberê ‘ewam de buhurî.[175]

---

İbnî ataullah wiha dibê: “Du nîmet hene ku tu mexlûqek ji wan veqetandî namîne.Ew herdû nîmet bo her her mexlûqî lazim in. Ev herd û nî’met îcad û imdad in. Xwedê Te‘ala te ewil bi nîmeta xuliqandinê paşê jî bi nî’meta îmdad û alîkarîyê nî’metdar kiriye. Aha mana peyva ku “kaînat di ewel de tune bû dê tune bibe. Her an mimkune ku ev hebûn tune bibe” ev e. .

‘Elleme Qarî jî wihareng gotiye: “Wacîb ul-Wicûd ew Xweda yê Semed û ‘Xenî ye ku muhtacê tu tiştî nine. Her tiştê mimkûn muhtacê xuliqandin û îmdada wî ne. “Qeyyûm” bi mana wî zatî ye ku xwedî ‘xina û qudreta kamil e. Hemî tiştên dî di warê îmdad û xulqiyetê de muḥtacê zat û sifatên wî ne. Lewra ew bi nefsa xwe qaîme û muhatacê kesên dî nîne. Her ewe ku ‘xeyra jî qaîm dihêle. Bê hebûna wî hebûna ‘xeyra ne mimkûn e. (Muxtasar Tuxfet-ul-Merîd R. 344)

175 Seyda vê meselê di Rehbere ‘Ewam de wihareng şîrove dike:

Ewê dî kelamê besîtê qedîm, ḥurûf û lu‘xet û ḥedîs in ey ḥekîm

Ewê dî: Ew sifetê mayî ji her heft sifetan. Kelamê besîtê qedîm:Yanî kelamê ku bi şexsê xwe me’nekî tenê ye di ezel de teqsîmkirin jê re tune. Te’dîd û jimara ḥeqîqî jê re tune. Ji cinse ḥerfan û sewta ye. Anca‘x jimarek î’tibarî jê re heye. Buwe ku tê teqsîmkirin bi bal emr û nehy û îxbar û înşa û ‘xeyrî wan ve bi î’tibara te’llûq û xwegirtinê. Yanî ew kelamê ba î‘tibar ku xwe bi tişkî ve digre bi hawakî xusûsî dibe xeber û î‘tibar te‘ellûqa wî bi tişkî dî ve bi hawakî dî dibe emr. Wihareng vanê dî jî. ḥurûf û lu‘xat Yanî ḥerfan û kelîmeyên ku bi xwendin û nivîsîna me çê dibin. ḥadis in. Yanî mexlûq in ne qedîm in. Ev mezhebê koma Eş‘arîya ne ku dibêj in: Kelamê qedîm kelamê nefsî ye.Kelamê lefzî ḥadis e. Kelamê nefsî me’nakî xwe bi zatê Xwedê Te‘ala ve digre. Ewe ku nazili ser pêy‘xember (s.a.w.s.) bû ye. Kelamê lefzî van ‘îbarat û lefzên ku murekkebe ji ḥûrûfan û sewta ne delalet dike liser kelamê ḥeqîqîyê nefsî. Tu bizan:

Qadî‘Edaeddîn ku ji Eş‘arîya ye meqalekî xusûsî te’lîf kiriye di teḥqîqa kelamê Xudê Te‘ale de, tê de îsbat kiriye ku elfaz jî qedîm in gotiye: “Eger ḥadis bin wê pur tiştên faside û xerabe lazim werin.”

Bihîstin û dîtin: Sem' û beser. Bihîstin û dîtina Xudê Te'ala ne bi guh û çav e. Çewa ku zanîna wî ne bi qelb û mêjî ye. Hemî denga dibhîze. Ḥeta dengê lingê gêrika hûrika ku dibêjinê "derre" dibhîze dema ku di meşe li ser kevirê mermerê hilû, û her tiştî dibîne. Ḥeta wehm û ḥizrê di qelb de, hem deng û sewta jî dibîne çewa ku sabite di 'ilmê 'eqaîdê de. Ji vê tê zanîn ku deng piştî ji dev dertê naçe 'edemê çewa ku sabite di nezerîyeta ḥîkmeta nû de. Loma ku li dengê Dawûd û Mûsa 'eleyhîs-selam digerin.

Qedîm in wekî zatê cumle sifat: Yanî hemî sifatê Xudê qedîm in bê xîlaf çewa ku zatê Xudê qedîm e. Çi sifatê zatîye ku sifatê seb'e ne, çi sifatê selbî ye. Lewra tev qaîm in bi zatê esma ve jê naqetin. Eger ḥadis bin lazim tê ḥadis qaîm bin bi zatê Xudê ve. Ew qet nabe. Hem esmaê wî jî tev qedîm in bê xîlaf, wek esmayê husna mesela. Emma sifatê ef'ala wek îḥya û îmate û îbade' û îfna û îşna û înbat û înma' û tuxlîq û turzîq û ẋeyrî wan li nik me 'Eş'arîya ḥadis in. Li nik Matûrîdîya Qedîm in. Ji bo wî qasî gotine sifetê zatîye heşt in. Ḥefta ê ku buhurîn ê heşta tekwîn e ku şamilê sirrê teva tê. Lewra ku xwe bi saẋkirinê bigre dibe "îḥya," bi mirandinê ve dibe "îmate," bi riziqdanê ve dibe "terzûq" û… hakeza.

Tu bizan: Sifatê zat ewin ku ji nefya wan lazim tê neqdê wan. Mesela ji nefya ḥeyatê lazim tê ziddê wê ku mirin e. Ji nefya 'ilm lazim tê cehl û… hakeza. Emma sifatê ef'ala ji nefya wan ziddê wan lazim nayê. Mesela îḥya û îmate û texlîq nefy bibin noqsanî çê nabe. Ferqa wan eve.

Ferqa îsm û sifat: "İsm" mayê ku delalet dike li ser zat yan bi nefsa xwe tenê wek Allah û Xuda weya bi 'îtbarê sifetê wek 'Alim û Qadir û Murîd û Mutekelîm mesela. "Sifet" mayê ku delalet dike li ser me'nakî zêde li ser zat wekî van sifatê seb'îye.

Ferqa zat û sifat: "Zat" mayê ku tê tesewwûrkirin bilîstîqlal. "Sifet" mayê ku nayê teserrûfkirin îlla bi tebî'eta zatî.

> Ne 'eynin: Sifatê seb'î ne 'eynî zatê Xudê ne.[176] Lewra sifet û mewsûf ne yekin. Ne ẋeyrî zatê Xudê ne. Lewra tu car jê naqetin ezela û ebeda.[177]

---

Seydayê me Şêx Muḥemmedul-'Erebkendî çewa ku di "Şezratê" de heye. Ev teḥqîqa qadî qebûl kiriye. Qebûl kiriye û îxtîyar kiriye. (Rehberê 'ewam r 8-9)

[176] Ev redda ḥekîma û mu'tezîlîya ne ku di bejin: "Sifatê Xudê 'eynî zatê wî ne." Dibêjin: "Ku ne 'eynî wî bin wê qedîm pir bibin."

[177] Ev redda ser Kerramî ya ye ku dibêjin "Sifatê Xudê 'xeyrî wî ne. û ḥedîs in. Eger qedîm bin wê qedîm pê re bin."

Tu bizan: Ji sifatê seb‘îye re tê gotin “zatîye” û “sibûtîye” û “wicûdîye.” Lewra qaîmin bi zatê Xudê ve û sabitin tê de û delalet dikin li ser selba tiştê ne layiq. Hem tê gotin “sifatê me‘anî.” Lewra evan sifatan hinek me‘anî ne zêde ne li ser zat. Qaîmin pê ve. Lazim in jê re. Bi terzekî wisa ku jê naqetin. Me’na ku ne ‘eynin ne ẋeyrin eve.

Tu bizan: Sifatê seb‘îye di te‘elîqgirtinê de wiha ne : “Heyat” xwe bi tişkî ve nagre. “Qudret û îradet” bi her tiştê mimkun ve te’lîq digrin bi te’lîqa tesîrê. Yanî di mexlûqa de tesir dikin tewra tewra. Wan ji ḥalekî dixine ḥalekî. Lê xwe bi tiştê wacib û mûḥal ve nagrin. Ne wezîfa wan e. Eger xwe bi wan ve bigrin lazime ku Xudê karibe xwe fena ke. Ḥal ew ḥal e qudreta Xudê li ser sê tişta tune. Nikare şerîk ji xwe re çêke, nikare kesî ji milkê xwe derîne, nikare di xwe de teserruf bike wekî di mexlûqa de dike. Ew nikarin; medḥ û kemal e ne noqsanî ye.

“Kelam” xwe bi her tiştî ve digre çi wacib, çi mimkun, çi mûḥal, bi te’lîqa delaletê ne bi keşfê. Xwe bi çi ve bigre dibe ‘eynê wî. Eger xwe bi emrê ve bigre dibe emr, xwe bi nehyê ve bigre dibe nehy. Xwe bi we‘dê ve bigre dibe we’d û hakeza.

“Ilm û sem’ û beser” te’lîqa wan keşfî ye. Temamê tişta bi wan keşf dibin ji Xudê re. Te’lîqa wan ne te’sîrî ye bi hawayê qudret û îradeyê. Emma “sem’ û beser” xwe bi wacib û mumkîn ve digrin. Lê xwe bi meḥal ve nagrin. Lakîn te’lîqa wan ji ya ‘ilmê zêde ye. Emma “ilm” xwe bi her tiştî ve digre çi wacib wekî zat û sifatê Xudê Te’ala, çi mumkîn wekî mexlûqa, çi muḥal wekî şerîkê Xudê Te’ala. Lewra zane ku şerîk jê re tune. ‘Ilmê Xudê bi her tiştî heye ji ezel ḥeta ebed. Çewa ku gotiye: “كُلَّ يَوْمٍ هُوَ فِي شَأْنٍ[178]” Yanî di her weqtekî de Xudê Te‘ala şe’nekî dertîne li gorî ‘ilm û îrada xweya ezelî.

Faîde: İbn eş-Şecerî li ser kursîyê we’zê tefsîra vê ayetê di xwend. Zilamek rabû di serî re sekinî û got: “Xudayê te vê gavê çi dike?” İbn eş-Şecerî sikût kir û bi meḥzûnî raza. Di xew de Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) dît û ev mesele jê pirsî. Pêyẋember got: “Ew zilam Xudr e. Wê carek dî jî were. Jê re bêje: Tiştê ku Xudê Te‘ala dike evin: شُؤُنٌ يُبْدِيهَا وَلَا يَبْتَدِيهَا يَخْفِضُ أَقْوَامًا وَيَرْفَعُ آخَرِينَ[179] yanî hinek eḥwalin dertîne û nişan dide, ne ku ‘ilmê wî nû bi wan çê dibe. Hinek qewma datîne hinka radike.” İbn ul-

[178] Ew her roj (û dem)bi karekî ve(meşxul e) Reḥman 29

[179]İşên wilo ku (gelek tişta) dertînin meydanê. Hinek qewm pê zelil dibin hinek jî bilind

Şecerî bi kêf lê bû sibe. Xudr dîsa hat û pirsî. İbn ul-Şecerî cewaba wî da. Xudr got: Selewata bide ser wîyê ku te ‘elimandî ye û zivirî[180]

25- Xudê nîne cewher ne cism û ‘erez, ne kulle ne be’d vê bizan bê ẋerez

Cewher: tiştê ku li hember ‘eredê ye. Yan tiştê ku muḥtacê bi bal valayîkî ku meşẋûl bike. Yan tiştê ku di derkî de cîh digre. Yan tiştê ku jê re cusse heye. Yan tiştê ku qebûla ‘ereda li xwe dike. “Cewherê ferd” Cuzekî la yetecezî ye. Cewher bi van me’na teva ew tişte ku dikeve cîhekî û qebûla ḥaleta li xwe dike. Wek ḥereket û sekînê bo mimkun.[181] Ji cewher re nihayet û mekan heye. Hinka gotiye: “Cewher mewcûdê ku ne ḥewceyê mekane.” Bi vê me’nayê ji Xudê Te‘ala re tê gotin “cewher” lê ne durust e. Lewra îzna şer‘î pê tune. Cewher carna ji tiştê eslî re tê gotin wekî “filan tişt cewher tê de heye, yanî qenc e, weya tê de tune, yanî xerab e.”

Cism: Tiştê ku di derkî de cîh digre û murekkebê jî du cuza ye. Weya zêdetir tê teqsîmkirin û nihayet û mekan jê re hene.

‘Ered: Tiştê ku ne qaîmê bi zatê xwe ye. Muḥtacê cîhekî ye ku wî ragre bo tabi‘ê cismî.

Ne kulle ne be’de: Kul wekî nanê saẋ.

Cuz’: Wekî parîkî.

Bizan bê ẋerez: Yanî tu bi zanibe bê ẋereza ‘înadî ku Xudê ne yek ji van tişta ye. Lewra evan tişta tev mexlûq in û ewsafê mexlûqa ne.

### 2.2.4. Xulf Ul-We’d Û Xulf Ul-We‘îyd

26- Eger bê guneh me mu‘ezzeb bikit, ji wî re heye me mueddeb dikit

27- Rewa ye bikit ew li xelqê meşaq, bi qeḥra xwe teklîfa “ma la yutaq”

28- Erê key bi zulmê tekelluf dikit, di mulkê xwe de ew teserrûf dikit

Eger bê guneh… îlx: Yanî duruste ku xaliqê ‘alemê Xudê Te‘ala me mexlûqan bide ‘ezabdan ne bi sebeb ku mexlûqan berê gunehkarî û sûc kirine û ne bi sebep ku paşê wê tobê bide wan û mukafatê li wan bike çewa ku gotiye: “Ji wî re heye. ” Yanî

[180] Bacûrî ‘Elî Es-Senûsîye.

[181] Nuxbetulealî

caize û duruste di nezera ‘eqil de ku Xudê Te‘ala vî hawa bike. Çi di dinyayê de, çi di axretê de. Yanî ‘eql durust didêre ku Xudê Te‘ala mexlûqê xwe yê me’sûmê bê guneh bide ‘ezabdan di dunyayê de bi enwa‘ê bela û mûsîbeta. Çewa ku zarok û tifala nexweş dike bi êşê giran. Hem ḥeywana nexweş dike û hinek hinka dikujin û dixwin û îzna însana li wan daye ku wan dikujin û ser jê dikin. Dîsa ‘eql durust didêre ku Xudê Te‘ala ‘ebdê xwe yê mutî’ û me’sûm bê guneh têxe cehennemê û tê de ebedî bihêle, bide ‘ezabdan. Lakîn ev tişt di nezera şerî‘etê de ne duruste. Yanî Xudê Te‘ala wisa nake. Lewra we’de daye ku mu’mîna têxe cennetê û ebedî bihêle. Lewra gotiye: اِنَّ الَّذِينَ آمَنُوا وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ كَانَتْ لَـهُمْ جَنَّاتُ الْفِرْدَوْسِ نُزُلًا خَالِدِينَ فِيهَا أَبَدًا[182] Xudê Te‘ala we’da naşkêne. Lewra gotiye: لَا يُخْلِفُ اللهُ وَعْدَهُ[183] Xîlafa di we’dê de noqsanî ye. Û wacibe ku jê bête tenzîhkirin.

Dîsa ‘eqil durust didêre ku Xudê Te‘ala kafiran û gunehkaran têxe cennetê. Tê de ebedî nî’met li wan bike. Ev jî di nezera şerî‘etê de ne duruste. Lewra Xudê Te ‘ala wan we‘îyd û tehdît kiriye ku bi cehennemê wan bide ‘ezabdan. Çewa ku gotiye: اِنَّ الَّذِينَ كَفَرُوا مِنْ أَهْلِ الْكِتَابِ وَالْمُشْرِكِينَ فِي نَارِ جَهَنَّمَ خَالِدِينَ فِيهَا[184] û gotiye: وَمَنْ يَعْصِ اللهَ وَرَسُولَهُ وَيَتَعَدَّ حُدُودَهُ يُدْخِلْهُ نَارًا خَالِدًا فِيهَا[185] û gotiye: وَمَنْ يَقْتُلْ مُؤْمِنًا مُتَعَمِّدًا فَجَزَاؤُهُ جَهَنَّمُ خَالِدًا فِيهَا[186] lakîn tenfîz û bicîhanîna we’d û tehdîdê lazime şer‘en di ḥeqqê kafira da, ne di ḥeqqê mu’mînê gunehkar de. Lewra kufra kafira ne duruste şer‘en bête ‘efûkirin. Lê gunehê mu’mîna çiqas pirin jî ‘efûkirina wan duruste. Çewa ku Xudê Te‘ala gotiye:

اِنَّ اللهَ لَا يَغْفِرُ اَنْ يُشْرَكَ بِهِ وَيَغْفِرُ مَا دُونَ ذٰلِكَ لِمَنْ يَشَاءُ[187]

اِنَّ اللهَ يَغْفِرُ الذُّنُوبَ جَمِيعًا [188]

يَاعِبَادِيَ الَّذِينَ اَسْرَفُوا عَلٰى اَنْفُسِهِمْ لَا تَقْنَطُوا مِنْ رَحْمَةِ اللهِ[189]

---

182 Bê guman ew kesên kesên ku îman tînin û ‘emelê sali’h dikin Cenneta Firdews ji bo wan bûye qonax. Ewê di wir de ebedî bimînin. (Kehf 107-18)

183 Ellah Te‘ala ji we’da xwe venager e. (Rum 6)

184 Bê gûman ehlê kitêbên kafir û muşrîk dê heta bi hetayê diagir de bin. Ha her ewin (neqenc û) xerabê mexlûqa.(Beyyine 6)

185 Herçi kesê ku dijraberîya Ellah Te‘ala û resûlê wî bikin(ji hed derkevin û) guh nedin qanûnên wî ew jî dê bikevin agir û heta bi hetayê di wir de bimînin.(Nîsa 14)

186 Kî ku mumînekî qesden bikûje cezayê wî cehenneme ku wê ebedî tê de bimîne.

187 Bê guman Ellah Te‘ala şîrka ji xwe re hîç ‘efû nake. Ji bil vê (şîrkê) kê bi xawze wî (digel gunehkarîya wî) di bexşîne. (Nîsa 48)

188 Bê gûman Ellah Te‘ala temmamê gunehan di bexşîne. (Zumer 53)

Xîlafa di we’dê ji Xudê ji Te‘ala re duruste di ḥeqqê mu’mîna de ger çiqas gunehkar bin. Lewra nabe noqsanî. Belkî kerem û îḥsan e. Çewa ku ‘adetê ‘Ereba wisa ye. Şa‘irê wan gotiye:

**وَ إِنِّيإِذَا أَوْعَـدْتُــهُأَوْ وَعَدْتُـــهُ لَـمُخْلِفُ إِيـعَادِي وَمُنْجِزُ مَوْعِدِي**[190]

Celaleddînê duwwanî gotiye: “Ev tişt qence li nig herkesi. Çewa ku Surriyê Mewsûle gotiye:

**وَ إِذَا وَعَـدَ السَّـرَّاءَ أَنْـجَزَ وَعْـدَهُ وَإِنْ أَوْعَـدَ الضَّـرَّاءَ فَالْعَـفْوُ مَانِـعُهُ**[191]

Yeḥya bin Mu‘az gotiye: We’d ku îxbara bi menfi‘etê ye. Ḥeqê ‘îbada ye li Xudê Te‘ala. Buye damin ku îta‘a bikin wê filan qencîyê bi wan bike. Kes wek Xudê wefadar tune. Lê wa‘îyd ku îxbara bi zererê ye, ḥeqê Xudê ye li ‘îbada ku ji wan re bêje: “Filan tişt nekin ezê we ceza bikim!” Wan jî kir wê demê Xudê bi kêfa xwe ye. Yan ‘efwe, yan ‘ezab e. A qenc ‘efwe lewra ẋefûr û Reḥîm e.

Tu bizan: İ’tîraz çêbûye li ser arizîya xîlafa di we’dê de. Ku lazim tê derew bikeve kelamê Xudê Te‘ala. Ḥaşa we kella. Hem lazim tê tebdîla qewlê wî ḥaşa summe ḥaşa.

Cewaba ewel. Ê kerîm ku îxbar bike bi we‘îydê layiqê bi kerema wî ew e ku îxbarê bîna bike li ser meşîetê. Gerçi tesrîḥ pê nek e. Kerîma ku bêje: “Ezê filan kesî bidim ‘ezabdan.” Niyeta wî yanî ku ez îrade bikim ezê bidim ‘ezabdan. Lê îxbara bi we’dê layîqe ku qet‘î be. Peyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) gotiye: مَنْ وَعَدَهُ اللّٰهُ عَلىٰ عَمَلِهِ ثَوَابًا فَهُوَ مُنْجِزٌ لَهُ وَمَنْ أَوْعَدَهُ عَلىٰ عَمَلِهِ عِقَابًا فَهُوَ بِالْخِيَارِ إِنْ شَاءَ عَذَّبَهُ وَإِنْ شَاءَ غَفَرَ لَهُ» [رواه الأصفهاني].[192]

---

[189] Ey ‘ebdên min ê ku di derheqê nefsa xwe de ketine îsrafê (û ji hed derketine) hêvîya xwe ji rehmeta Ellah Te‘ala nebirin. (Zumer 53)

[190] Dema ez wî tehdîd bikim weya we’dekî bidim wî, ez tehdîda xwe bi cîh naynim lê we’da xwe bi cîh tînim. Dema tiştekî qenc we’d bike we’da xwe bi cîh tîne.

[191] Dema tiştekî qenc we’d bike we’da xwe bi cîh tîne. Lê dema ku bi neqenciyekî (‘ebdê xwe) tehdîd bike (wesfê wîyê) bexşandinê dibe mani‘ê bikaranîna wê tehdîdê.

[192] Xwedê Te‘ala di gerewa ‘emelê kê de çi sewab jê re we’d kiribe bi cîh tîne. Lakîn di gerewa ‘emelê kê de ceza we’d kiribe ger bixwaze wî dide ‘ezab, ger bixwaze wî di bexşîne. (İsfehanî ev Hedîs Rîwayet kiriye.)

Cewaba didûwa: Tebdîla qewlê ne duruste bi mucîbê ayeta [193]مَا يُبَدَّلُ الْقَوْلُ لَدَيَّ lê murad bi qewlê di ayetê de we‘îyd di ḥeqqê kafira de û di ḥeqqê wan gunehakara de ye ku Xudê Te‘ala îrada ‘efwa wan nekiriye.[194]

Mueddeb dikit: Yanî ku Xudê Te‘ala tiştê ku bi me bike ne ji bo tu ‘illet û ẋereza ye belkî sade ji bo ku me bide edebkirin.

Edeb: Çewa ku Seyît Şerîf gotiye: "Naskirina wî tiştê ku meriv pê tê ḥifzkirin ji sûc û xeta." Faîda edebkirinê eve ku ‘îbadê wî qeḥr û ‘ezameta wî nas bikin ji bo ku rî‘ayeta emr û nehyê wî bikin. Wê demê diçe ber mezhebê Matûrîdiyan ve. Lewra gotina "wê mueddeb bikit" yanî li dinyayê, ema di axretê de yeqîn ḥasil dibe, gunehkarî çê nabe. ‘Ezabdana bi cehennemê nabe sebebê muḥafaza ji gunehan. Ellahumme îlla ku em bejin: Ayeta [195]وَمَا خَلَقْتُ الْجِنَّ وَالْإِنْسَ إِلَّا لِيَعْبُدُونِ divê ku herkes ‘ibadetê Xudê Te‘ala bike. Kesê ku li dinyayê neke wê di cehennemê de bike. Lewra ehlê wê tev zarîn dikin û gazî Xudê Te‘ala dikin. Ev jî zikr û ‘îbadet e çewa ku ji gotina hinek sadadatê tesewûfê tê zanîn. [196]نسيت مرجع هذا Lakîn ḥemla ‘ibaret li ser vê me'nayê durî zihnê ye.

### 2.2.4.1. Teklifa Ma La Yutaq

Rewa ye… îlx: Durust e yanî caize û duruste di nezera ‘eqil de ku Xudê Te‘ala bi qeḥra xwe û quweta cebrîye zeḥmet û meşeqqetek wisa li ‘îbadê xwe bike ku bibe "teklîfa ma la yutaq" yanî teklîfa tiştê ku taqeta însan jê re tune. Wek hilgirtina çiya û firîna bi bal asîman ve û îcadkirina tişta. Durust e ku Xudê Te‘ala însan bide ‘ezabdan li ser nekirina van tiştan. Lakîn ev teklif nekiriye, nake. Lewra gotiye: لَا يُكَلِّفُ اللهُ نَفْسًا إِلَّا وُسْعَهَا[197]

Tu bizan: "Ma la yutaq" sê qismin.

---

[193] Li nig min qewl na guhere (Qaf: 29)

[194] Tuhfetul Merîyd

[195] Min cin û însan ne ji bo tiştekî din tek ji bo ‘evdîtîyê xuliqand. (Zariyat) 56

[196] Min çavkaniya vê (îddîayê) ji bîr kir.

[197] Allah Te‘ala tu kesî barê zêdeyî taqeta wî bar nake. (Beqere 286)

#### 2.2.4.1.1. Muḥalê Zatî

Bi zatê xwe mumteni‘e. Yanî çêbûna wî di nefsa wî de qet nabe. Wek fenakirina qedîmî û îcadkirina wî, wergerandina ḥadisê ku bibe qedîm yan qedîmê ku bibe ḥadis, berhevkirina du zidda wek agir û avê weya îman û kufrê.

#### 2.2.4.1.2. Muḥalê ‘adî

Ku li gorî ‘adetê ji însan re ne mimkûn e, nikare bike. Lê çêbûna wî di nefsa wî de mimkûn e.Wek hilgirtina çiya mesela ku buhurî.

#### 2.2.4.1.3. Muḥalê ‘aridî

Ku însan kare bike lê ‘ilm û îrada Xudê Te‘ala xwe bi ‘edem û tunebûna wê ve girtiye. Wek îmananîna kafiran û ta‘etkirina gunehkaran ku daîma di guneha de ne ḥeta mirinê. Teklîfa vî qismî li nig herkesi caize hem ‘eqlen hem şer‘en. Lewra herkes dizane ku Xudê Te‘ala teklîfa Ebû Cehîl û Ebû Leheb kiriye bi îmanê digel ku di ‘ilmê ezelî de îmana wan tune. Ev qism li nik Eş‘arîya muḥal e, li nik ẋeyrî wan mimkûn e. Delîlê wan di vir de hilnayên. Ji bo wî qasî gotin çêbûye ku teklîfa muḥalê li nik Eş‘arîya hem caize, hem ‘eql û waqi’ bûye çewa ku Xeyalî û Seylkûtî gotine. İbnî Ḥemam di Musayerê[198] de gotiye: “Qewlê racih’ ji herdû qewlê Eş‘arîyan ew e ku waqi’ nebûye.” Tê zanîn ku ew qism li nik wan jî ne muḥal e. Şerbînî di ḥaşiya Cemi’ul Cewami’ê de[199] gotiye: “Hinka navê wî danî mûḥal. Eş‘arî jî wî daxilî mûḥalê kir. Da ku redda wan bike.” Emma qismê ewel, hinek ji Eş‘arîyan gotine: “Teklîfa wê ‘eqlen duruste.”Hinka jî gotine: “Na”

Delîla ku teklîfa muḥalê caize ayeta رَبَّنَا وَلَا تُحَمِّلْنَا مَا لَا طَاقَةَ لَنَا بِهِ[200] Eger caîz nebûna wê ne gotina: “Ya rebbî tu li me bar nekî.” Lewra suala defi’kirina tiştê ku nabe ne karê ‘eqilmenda ye. Faîda wê teklîfê tecrîba ‘îbada ye ka di meqamata de di xebitin ku sewab lê tertîb bike yan naxebitin ku ‘ezab tertîb bike.

Matûrîdîyan dibêjin: “Teklîfa mûḥalê ne caize bi nezera ‘eql. Lewra teklîfa kora bi nihêrtinê sefahet e.” Teḥqîyqa wê ev e. Ḥîkmeta teklîfê tecrube ye. Ew jî nayê ferd û teqdîrkirin. Lewra kesê ku îmakana wî neghîje fi’lê ew me’zûr e. Me’na tecrubê tê de

---

[198] S. 128

[199] S.107

[200] Ya Rebbî! Tu barê zêdî taqeta me li me bar nekî. (Beqere 286)

nayê teḥqîqkirin. Ancaẋ tête teḥqîqkirin di tiştê ku muyesser e ji ‘ebd re û kare bike. Wicûda fi’lê ku nayê teserrufkirin, sewab û ‘îqab xwe bi daw û terka wê ve nagrin. Ḥîkmeta teklîfê namîne. Tiştê ku xîlafa ḥîkmetê be Xudê Te‘ala wî nake. Hem dibêjin: “Eqlen ne duruste ku Xudê Te‘ala kafira ‘efû bike, têxe cennetê û mu’mîna têxe cehennemê ebedî tê de bihêle. Lewra qencîkirina bi xiraba û xerabîkirina bi qenca tişteke ku ne di cîhê xwe de ye dibe zulm. Hem lewra ku ev ne durust be tefrîqa navbeyna qenca û xeraban namîne. Ḥîkmeta İlahî jî tefrîqa wan dixwaze bi delîla ayeta اَفَنَجْعَلُ الْـمُسْلِمِينَ كَالْـمُجْرِمِينَ مَالَكُمْ كَيْفَ تَحْكُمُونَ[201] û ayeta اَمْ حَسِبَ الَّذِينَ اجْتَرَحُوا السَّيِّآتِ اَنْ نَجْعَلَهُمْ كَالَّذِينَ آمَنُوا وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ سَوَاءٌ مَحْيَاهُمْ وَمَمَاتُهُمْ سَاءَ مَا يَحْكُمُونَ[202] wekhevbûna wan xîlafa ḥîkmetê ye.” Qencîya bi xeraba, xerabîya bi qenca bêhtir xîlaf e. Emma teserufa di mulk de ku li ser cîhê ḥîkmet û sewabê caize, ku ne wisa be ne caîz e, sefahet e.[203] Bînaî ‘Alîye gotiye: “Xulfa di we’dê de jî ne duruste. Lewra dibe derew.”

Eger yek bêje: Hinek mu’mîn gunehê wanê biçûk û mezin tev têne ẋufrandin digel ku di hinek ayetan de we‘îyd ‘ûmûmî ye?

Cewab: Wana ji ḥukmê wan ayeta der in. Ancaẋ nufuza ayeta we‘îydê di mu’mînê ẋeyrî meẋfûr de ye. Bînaa li vê xîlafê ku dibêje: “Ya Reb tu bi ẋefrînî hemî gunehê hemî mu’mîna.” Duruste li nik Eş‘arîya. Ne duruste li nik Matûrîdîyan.[204] Ev îxtilaf di şûxlê axretê de ye. Emma elem û belayê dunyayê elbete ḥîkmet tê de heye bi îtifaqa Eş‘arîyan û Matûrîdîyan teva. Ew ḥîkmet carna tê zenkirin wek paqijkirina nefsê ji exlaqê xerabe ku kibr û ḥesed û ẋeyrî wan in. Carna jî qet nayê zanîn wek êşa ḥeywana û zaroka. Lazime em bejin qence û î’tîqad bikin ku ḥîkmet tê de heye, ‘eqlê me nagihêjê. Teslîm wacibe. لَهُ الْـخَلْقُ وَالْأَمْرُ[205], لَا يُسْأَلُ عَمَّا يَفْعَلُ[206]

[201] Gelo ma emê mucrîm û muslumana wek hev bigrin? Çi buye bi we ku hun wihareng hukum dikin ( Qelem 35-36 )

[202] Gelo ew kesên ku xerabîyê dikin, ma zen dikin ku emê wan û wan kesên ku îman tînin û ‘emelê salih dikin wek hev bigrin? Gelo ma (ew zen dikin ku) ewê ḥeyat û mirina wan wek hev bî? Çi ḥukmekî xerab didin. (Casîye 21)

[203] Ḥaşîyetul-Musayere.

[204] Tuḥfetul-Murîd: 81

[205] Xuliqandin û emr her layiq û babetê wî ne. E’raf: 54

[206] Ew ji kirinên xwe mesul nîne. (Enbîya: 23)

Ḥîkmet: Bi me’na mesleḥet û menfi‘eta ku tertîb dike li fi’lê. Ne me’na ẋerede ku ‘illetê ẋayê ye.[207]

Erê: Wisa ye. Yanî di nezera ‘eqil de durust e ku Xudê Te‘ala mu’mînê bê guneh, ta‘etkir bide ‘ezabdan û tu qencîyê pê neke. Lewra kes ta‘etê xwe îcad nake, ḥeta bibe musteḥeqqê mukafatê. Belkî Xudê Te‘ala dike û quwetê dide ku bike. Hem duruste ku gunehkaran têxe cennetê. Lewra kes gunehê xwe na xulqîne ḥetta ku pê bibe musteḥeqqê ‘ezab. Belkî Xaliq her Xudê ye. Hem duruste ku Xudê Te‘ala teklîfa muḥalê ku taqeta meriv jê re tune li xelqê bike. Lewra ḥekimê mutleq, dunya û axret û tiştê ku di wande ne tev mulkê wî ne. Çi teserrûfê di wan de bike nabe zulm. İ’tîraz lê nabe.

Key bi zulme tekelluf dikit: Çewa bi zulme teklif li ‘îbadê xwe dike? Ḥaşa summe ḥaşa.

Di mulkê xwe de ew teserrûf dikit: Teserrûfa di mulk de çewa be, bi çi terzî be nabe zulm. Lewra “zulm”: Teserrûfa di mulkê ẋeyra de ye. Ev me’na mûḥale di ḥeqqê Xudê Te‘ala de. Lewra tev mulk ê wî ye. Mulkîyeta ḥeqîqî ji kesî dî re tune. Yan “zulm”: Danîna tişki ne di cîhê wî de. Ev me’ne jî qet nabe. Lewra Xudê Te‘ala Eḥkam ul ḥakimîn û‘E’lem ul-‘alimîn e çi tiştê ku di cîhekî de dêyne ew cîh qencê cîha ye. Gerçê ‘illeta qencîya wî li ser me xefî ye.[208]

Tu bizan: Ev hersê beyt redda Mu’tezîlîya ne ku gotine: “Ne duruste ‘eqlen ku Xudê Te‘ala “teklîfa ma la yutaq” li xelqê bike. Lewra sefahet e. Wek emirkirina cemada bi şuẋla ye.”Hem gotine: “Ne duruste ‘eqlen ku Xudê Te‘ala êş û elem û ‘ezab bide mexlûqa, çi însan çi ḥeywan, çi di dunyayê de, çi di axretê de. İlla bi sebeb sûc û gunehê wanê pêşî û ya bi sebeb ku paşê mukâfat û sewabê bide wan.” Gotine: “Elem û ‘ezab bê sebeb zulm e.[209] Zulm jî qebîh e. Wacibe li Xudê ku neke.”

---

[207] Musayere: 181-186

[208] (Celal ‘Elel-‘Edudîye: 203

[209] Eḥmed Hîlmî di vir de kurte şerheke bi ‘Erebî nivîsîye. Wergera wê wihareng e: Wan zulm wihareng tesvîr kirine: “Zulm ew zirar e ku feydê nade, zirarê bi dûr naxe û di riyên ‘xeyrîteb‘î de pêk tê.” Li gorî vê tarîfê êş û elemên ku pêdivî bi kişandina wan heye zulm nîne. Wek mînak nexweşîn, meşaqeta di rêwîtiya fêddedar de, elema hacamatê ku ji bo berterefkirina nexweşînek tê kişandin, defkirina kesê zulumkarê ku zirara wî mu‘eyyen e.Şewata wî zarokê ku dikeve nav agir tiştek teb‘î ye. Lewra neşewitandina agir ya hîç pêk nehatiye yan jî nadiren pêk hatiye. Ji lew eger elem di cîhê mafdar de weyaxud ji bo menfi‘eta kesê elemdar, an ji bo berterefkirina zirarekî yan jî bi awayeke teb‘î pêk bên ne

Tu bizan: Van mesela tev firû‘ê du esla ne ku îxtilafa Ehlê Sunnetê û Mu’tezîlîyan di wan de waqi’ bû ye.

Yek: Ḥusn û qebḥa ef‘ala bi ‘eql tê zanîn. Yan bi şer‘ê. Beyana wê di beyta 36 de ye.

Ya duduya: Tiştek li ser Xudê Wacib heye yan na. Beyana wê di vê beyta 29a de ye.

### 2.2.5. Tiştek Li Ser Xudê Te‘ala Wacib Tune

29- Li me ferz e herçî ji bo wî bi kêr, ne ferz e li wî ya ji bo me bi xêr

Bikêr: Murad bi kêrhatinê di vir de, layîqî û musteḥeqqî ye. Yanî herçî tiştê ku layiqê meznaya ji bo wî qasî em anîne wicûdê. wicûdê. [210]وَمَا خَلَقْتُ الْجِنَّ وَالْإِنْسَ إِلَّا لِيَعْبُدُونِ

Ne ferze li wî ya ji bo me bi xêr: Li ser Xudê ne wacibe ku qencîyê bi ‘îbadê xwe bike. Ev redda ser mu’tezîlîya ye ku dibêjin: “Wacibe.” İbnî Ebî şerif di şerḥa Musayerê de gotiye: “Meşhûre ji wan ku pênc tişt li Xudê Te‘ala wacib in. Lutf û îḥsan, sewabdana ser ta‘et, ‘ezabdana ser guneha, rî‘ayeta tiştê ku çêtir e ji ‘îbada re. Mukafata di bedêla elema de.” Murada wan bi wacibê: Fi’la noqsanî bi terka wê sabit dibe di gel ku mani‘ê wê tune û da‘î wê bi xwaze terka wê ne mimkûn e. Li ser gotina wan lazim tê ku çi tiştê di dinya û axretê bibe ya qenc her ewe ji ‘îbada re. Mesela ya qenc ji kafira re ku ebedî di cehennemê de bimînin, ji gunahkâra re ku di dunyayê de le’net li wan bibe û ‘emelê wan betal bibe çewa ku mezhebê wan wisa ye. Lewra ku ya qenc her ne ev be wê bexîlî çê bibe. Lewra men‘a ji islaḥê di gel ku quwet li ser heye bexle. Lazimê wan tê xetake salis û pê qerar jî dane. Ew jî eve ku qudreta Xudê li ser islaḥ û hîdayeta wan tune. Lewra texlîda wan di agir de me’lûmê wî bû. Waqi’bûna xîlafa me’lûmî mûḥal e. Qudreta xwe pê ve nagre. Ev tev gotinê wan in. Ayeta وَلَوْ شَاءَ رَبُّكَ لَآمَنَ مَنْ فِي الْأَرْضِكُلُّهُمْ جَمِيعًا redda wan dike.

Delîlê Ehlê Sunnnetê ku qencîkirina bi ‘îbada li ser Xudê ne wacib e eve: Eger wacibbuna Xudê Te‘ala kafirê feqîrḥal ne di xuliqand. Lewra tunebuna wî çêtire da ku derdê dinyayê û ‘ezabê axretê nebine. Hem wê ji Xudê Te‘ala re minneta ser ‘îbada

---

zulme belkî qencî ye. Caîze ku bê bedêl ji teref Xwedê Te‘ala ve bên.Çewa ku di Şerhul-Meqasidê de hatiye gotin. (Gelenbewî ‘Elî el-Celal)

[210] Min cin û însan ji bo ku ‘evdîtîyê hew ji min re bikin xuliqand.(Zarîyat 56)

tunebûna û nedibû musteḥeqqê şukrê. Lewra di edakirina wacibê de minnet tune çewa ku di edakirina deyna de minnet tune. Hem wê minneta Xudê Te'ala li pêyẋember (selellaahû 'eleyhî we sellem) ne zêdetir buna ji minneta wî ya li Ebû Cehîl mesela. Lewra ji wî re wisa qenc bû, ji wî re wisa qenc bû li mezhebê wan. Hem wê du'a bê feyde buna. Wekî ku meriv bêje: "Ya Reb tu min muḥafeze bikî. Tewfîqa min bidî. Min ji tengîyê derîni." Lewra evana ji xwe wacib in ku Xudê bike li nik wan. Eger neke zirarê li xelqê dike ne caize. Hem lazime ku Xudê Te'ala enbîya û ewlîya nemranda. İblîs û zurrîyeta wî saẋ nehişta.

Welḥasil: Em teslîm nabin ku terka qencîyê bexîlî ye. Lewra qencî ne ḥeqqê kesî ye. Ji ẋeyrî Xudê kes nikare de'we bike. Û sadiq û muḥeqqeq e ku Xudê Te'ala xweyê kerem û ḥîkmet e. Bi 'eqîbeta her tiştî zane. Tiştê ku bike ne xalîye ji mesleḥetê gerçi di ḥeqqê meriv de ne qencî be. Lewra hemî ef'alê Xudê Te'ala munasibê 'eqlê 'eqilmenda ne. Çewa ku layiqin wisa dike. Gerçê ḥîkmeta hinka xefî ye em pê nizanin. Tiştê ku li gorî ḥalê 'ebdekî qenc be û Xudê wî tiştî neke muḥeqqeq di wê nekirinê de ḥîkmet û 'eqîbetek baş heye ne ku qusûr di kerem û 'edaleta wî de heye. Lewra ḥeqê kesî winda nake. Lewra ḥeqê kesî li Xudê tune. Eger qencî neke 'edalet e, ne bexîlî ye, ne zulme belkî mesleḥet tê de heye.

Xulase: Tiştê wacib bi tu hawayî li ser Xudê tune.[211]

Tu bizan: Ev mesele bu sebebê qetandina İmam Eş'arî ji seydayê xwe Ebû 'Elîyê Cebaîyê Mu'tezîlî. Eş 'arî got:

-Ti çi dibêjî di sê bira de. Yek saliḥ, yek gunehkar, yek jî bi zarûtî mir? Cebaîr got:

-Wê saliḥ here cennetê. Gunehkar here agir. Ê zarok cennet û cehennem jê re nînin. Eş'arî got:

-Eger ê piçûk bê je: "Ya Reb! Te çima min mezin nekir ku ez biçûma cennetê." Cebaî got:

-Wê Xudê Te'ala beje: Tê mezin bibûna, tê gunehkar bibûna. Eş'arî got:

[211] Şerḥul-'Eqaîd, Xeyalî, Seylekûtî, Kestelî

-Eger gunehkar bêje: “Ya Reb! Te çima min bi zarotî nemirand ji bo ez neçûma agir? Wê Xudê Te‘ala çi bêje? Cebaî ḥeyirî cewab neda. Ancaẋ go:

-Na. Welakîn kerê şêx di pala çiya de sekinî. Eş‘arî terka wî kir û bû ehlê sunnet û cema‘etê. Yanî ehlê riya pêyẋember û esḥaba.

### 2.2.6. İrade Û Riza Xudê Te‘ala

30- İrade dikit ew bi xêr û şerran, riza nîne emma bi fi’la şerran

İşaret dike ku îrade û razîbûna Xudê Te‘ala ne yek in. Belkî ji hev ferq in. Lewra îrade carna te’lîq digre bi tiştê ku Xudê pê ne razî ye wekî kufr û gunehkarîyê. “Razîbûn” bi me’na qebûlkirina tişt û qencîkirina ji bo wî.

İrade ji emrê jî ferq e. Lewra Xudê Te‘ala carna îrade dike lê emr nake. Wekî kufra kafira û gunehkarîya mu’mîna. Carna emr dike lê îrade nake, wekî îmana kafira Xudê Te‘ala emrê wan dike bi îmanê lê îrade nake. Lewra ḥîkmet û mesleḥet tê de hene di ‘ilmê Xudê de em nizanin. Yanî îrade ‘am e. Xudê Te‘ala çewa îrada qencîyê dike wisa îrada xerabîyê jî dike, wekî kufr û guneha. Lewra ku îrada wî neke gerek waqi’ nebe. Lazime em bawer bin ku Xudê Te‘ala xaliqê her tiştî ye. Lê ne duruste ku em bejin: “Xaliqê tiştê pîse kû xaliqê meymûn û xinzîra” îlla ji bo te’lîmê. Tê zanîn ku gotina ‘amîya: “Neqşê xudê mozê belek in” ne durst e.[212] وَاللّٰهُ لَا يُحِبُّ الْفَسَادَ

Mu’tezîlyiya dibêjin: “Tiştê qebî‘îh wek kufr û gunehan ne bi îrada Xudê ne. Ji wan di kerihîne. Belkî bi îrada ‘îbada ne.” Dibêjin: “Xudê îrada îmanê ji kafira re dike û îrada ta‘etê ji fasiqan re dike gerçi waqi’ nebin. İrada kufr û fisqê nake gerçi dibin.” Delîla wan hinek ayet in. Li gorî fehma xwe me’na dikin. Wekî ayeta وَمَا اللّٰهُ يُرِيدُ ظُلْمًا لِلْعَالَمِينَ[213] . وَلَا يَرْضٰى لِعِبَادِهِ الْكُفْرَ[214] . اِنَّ اللّٰهَ لَا يَاْمُرُ بِالْفَحْشَاءِ[215] ev delîlanîna wan bîna ye li ser ku îrade û meḥebbet û emr û razîbûn tev lazimî hev in. Yek bê yekî nabe. Dibêjin: “Emirkirina bi tiştê ku meriv pê nerazî ye sefahet e.” Delîla wanî ‘eqlî li ser de’wa wan ku tiştê qebîḥ ne bi îrada Xudê ne. Eve ku îrada qencîyê qencî ye. Emir di wan de dikin.

[212] Ellah Te‘ala ji fesadîyê ḥes nake. (Beqera 205)

[213] Ellah Te ‘ala hîç naxwaze ku li ‘aleman zulm bike. (‘Alî îmran 108)

[214] Riza a wî bi kufra ‘îbadên wî nîne.( Zumer 7)

[215] Bê gûman Ellah Te‘ala bi fuhşîyatê (tiştên nebaş û kerîh) emir nake.E’raf 28

Ewwela: Ku hemî kâinata bi îrada Xudê ne bi gotina selefê saliḥîn. مَا شَاءَ اللّٰهُ كَانَ وَ مَا لَمْ يَشَأْ لَمْ يَكُنْ[216] yanî tiştê ku Xudê bivê dibe, tiştê ku nevê nabe. Û bi van ayeta فَلَوْ شَاءَ لَهَدَاكُمْ أَجْمَعِينَ[217], وَلَوْشِئْنَا لَأتَيْنَا كُلَّ نَفْسٍ هُدَاهَا[218], وَمَا تَشَاؤُونَ إِلَّا أَنْ يَشَاءَ اللّٰهُ[219] yanî hûn nabên îlla ku Xudê bivê. Yanî ku Xudê Te'ala îrade neke hûn nikarin îrade bikin.

Ya duduwa: Ku razîbûn û îrade ne lazimê hevin. Bi delîla ku em carna îrada tişkî dikin û jê di kerihin wek nexweşê ku derman dixwe û jê di kerihîne ji ber te'ma wî ne xweş e.

Ya sisiya: Ku emr û îrade ne lazimê hevin: Delîla me eve ku seyid carna emrê 'ebdê xwe bi tişkî dike û îrade nake ku 'ebd bi xebera wî bike li hizûra yekî ku lome li seyid kiriye di lêdana 'ebd de. ẋaya seyîd ku ḥeqiya xwe nişan bide. Emr û îrade ji hev qetiyan. Gunehkarî bi îrada Xudê ne, ne bi emrê wî ne.

Ya çara: Ku îradekirina tiştê qebîḥ ne zulm e, ne qebîḥ e. Lewra teserrûfa di mulkê xwe de ye. Çewa be ne zulm e. Zêdeyê wî qasî Xudê te'ala nayê sualkirin. لَايُسْأَلُ عَمَّا يَفْعَلُ وَهُمْ يُسْأَلُونَ[220], يَفْعَلُ مَا يَشَاءُ[221], يَحْكُمُ مَا يُرِيدُ[222] Ancaẋ kesê qebîḥ û wesfkirina bi qebîḥê qebîḥ in. Ev herdû ji mexlûqata re hene ji Xaliq re nînin. Tiştê ku em navê wan datînin qebîḥ ji bo ku ji mexlûqa sadir dibe û xwe bi xwe pê zirar li hev dikin. Emma xuliqandina qebîḥê ku ji Xaliq sadir dibe ne qebîḥ e.

Sûal: Dema ku her wê murada Xudê waqi' bibe û emre 'îbada kiriye bi hinik tişta û îrada wuqû'a wan nekiriye, bi "teklîfa ma la yûtaq" ku 'îbad wan tişta nekin û 'ezab bide wan ne layiq e?

Cewab: Teklîfa "ma la yûtaq" caize lê waqi' nabe. Eger ku Xudê 'ebdê xwe ceza ke, ew ceza ji bo ku bê emrî kiriye bi îxtiyara xwe. Lewra te'lîqa îradê bi gunehê wî ve wî mecbûrî gunehkarîyê nake. Û îxtiyara wî jê nastîne. Tu esera îradê di wî tiştî de tune. Çewa ku esera 'ilm di îcadê de tune di ḥeqqê wî kesî de ku teklîfa wî kiriye bi îmanê û

---

[216] Jiber ku tercuma vê îbarê di nav metne de buhrî me ev îbare tercume nekir.

[217] Eger wî bi xwesta dê wan tev de bianîya ser hîdayetê (En'am 149)

[218] Eger me bixwesta, meyê hîdayeta nefsê bida wî (Secde 13)

[219] Eger Ellah Te'ala nexwaze hun nikarin bixwazin. (Tekwîr 29)

[220] Ew ji kirinên xwe mesul nîne lê hun mesûlin. (Enbîya 23)

[221] Ew çi bixwaze wî dike (ḥec 18)

[222] Ew çawa bixwaze wisa hukum dike. (Maîde 1)

zane ku îmanê nayne. Zanîn tesir nake di kufrê de. Tesîr xesyeta qudretê ye. İrade sifeteke wicûda meqdûrê xas dike bi weqtekî mu‘yyen ve ku ew meqdûr her di wê weqtê de tê wicûdê. Ji vê pê ve şanê îradê tune. Lakîn quwet ancaẋ li gor wiqûfa îradê tesir dike. Yanî di wî weqtê ku îrade te’lîq girtiye bi wicûda wî tê de. ‘İlm jî xwe bi vê tewfîqa qudret û îradê ve digre. Paşê tiştê ku tê wicûdê bi îxtiyariya mukellefî li gor wê ‘ilm û îradê ew bi te’sîra wê qudreta îlahî ye di wicûda wî de tê wicûdê.

Bi vê teqrîrê me’na ماشاء الله كان وما لم يشأ لم يكن[223] beyan bû. Yanî tiştê ku meşiye, îrada îlahî xwe bi wicûda wî ve girtibe wê bê wicûdê. Mesela eger tu bi terîqa ḥesabê zanibî wê çi rojê kesûf çê bibe, dema ku ew roj hat û kesûf çê bû tê zen bikî ku zanîna te ya pêşî te’sîr kiriye di wiqûa’ kesûfê de? Na xêr. A de tiştê ku li wifqa ‘ilmê qedîm jî waqi’ dibe ancaẋ bi kesb û îxtiyara ‘ebd e. Ne bi te’sîra ‘ilm e. Lewra sabite ku ji ‘ebda re meyl û îxtîyar heye. Û qesda semîmî û teweccuha bi bal fi’lê ve heye.

Bi vê teqrîrê delîla fasiqa betal dibe ku dema xerabî dikin dibêjin:“Bi qedera Xudê bû.” Lewra “qeza û qeder” selba ‘ezm û îxtiyarê nakin, ḥetta ku bibe cebr û delîla wan seḥîḥ be. Lewra murad bi qeza û qederê yan xulqandina fi’la ye, ew selba ‘ezm û kesbê nake. Yan jî ḥukmê raci‘ê bi bal sifetê yan sifetê ‘ilm ve ye. Ew bi terîqa ewelê selb nake. Ya qenc rucû‘a qezayê bi bal sifetê ‘ilm ve ye. Çewa ku Bedreddîn Testerî gotiye.

Qeza: ‘İlmê Xudê bi eşya a di ezel de bi ‘ilmê qedîm.

Qeder: İzhar û îcada Xudê bi qudreta ezelî wê mayî ku ‘ilmê Xudê xwe bi wicûda wî ve digre li wechê ku mutabiqe ji te’lîqa ‘ilm re bi wicûda wî ve. Seyyîd Şerif di “Şerḥa El Mewaqifê” de qeza û qederê wiha Te’rîf kiriye: قضاء الله عند الأشاعرة هو إرادته الأزلية المتعلقة بالاشارة على ما هي عليه فيما لا يزال[224] yanî di musteqbelê mute‘aqib de وقدره إيجاده إياها على قدر مخصوص وتقدير معين في ذواتها وأحوالها[225] duruste di te’rîfa qezaê de tu bibêjî “îlmûllah” di bedêla “îradetullah” de. Ema ḥedîsa فَحَجَّ آدَمُ مُوسىٰ[226] lewra Adem gotiye: أَتَلُومُنِي عَلىٰ أَمْرٍ كَتَبَهُ اللّٰهُ عَلَيَّ قَبْلَ أَنْ أُخْلَقَ[227] mûrad pê Adem di ḥucceta xwe de ẋalib geriya, di

---

[223] Xwedê Te‘ala çi bixwaze dibe çi nexwaze nabe.

[224] Li nêk Eş‘arîya qeza: Bi serê xwe pêkhatina wê bûyerê ye ku Xwedê Te‘ala di heqê (pêkhatina) wê de hukum daye.

[225] Qeder jî ewe ku bi hal eslê xwe ji teref Xwedê Te‘ala ve derkevit holê.

[226] Adem di nîqaşê de Musa têk bir.

[227] Gelo ma tu min bi sedem wê nivîsa eniyê ku beriya welidandina min ji teref Xwedê Te‘ala ve hatiye teqdîrkirin loma li min dikî.

def‘a loma piştî tobê de. Lewra mirad ji ḥedîsê أَ تَلُومُنِي بَعْدَ التَّوْبَةِ عَلىٰ أَمْرٍ قَدْ قُضِيَ عَلَيَّ قَبْلَ أَنْ أُخْلَقَ[228] Lewra îcma’ waqi‘e ku loma li ser guneha berya tobê ye. Ema piştî tobê lome tune. Gotina Adem “ketebehûllah” ḥîkyata waqi‘ê ye, ne ku delîl aniye bi qederê ji bo def‘a ser guneha mutleqa.

S: Razîbûna bi qeza Xudê wacib e. Temmamê guneha jî bi qeza û qederê ne. Lazim tê razîbûna bi guneha di gel ku razîbûna kufrê kufr e?

C: Ev lazimhatin memnu‘e. Belkî wacibe razîbûna bi qeza a ku ḥukmê Xudê ye. Lewra sifetê wî ye. Emma razîbûna bi meqdê ku gunehkarîya sadirî ji însan e ne wacib e. Lewra mutleqê wî sifetî ye bûye mani’. Paşê bi mutabeqeta qezayê hate wicûdê li xîlafa razîbûna Xudê Te‘ala. Ev cewabek meşhûr e. Lê î’tîraz li ser heye. Ku tu me’na ji bo razîbûna sifetê Xudê tune. Ancax razîbûn bi muqtedayê wî sifetê ku “meqdî”ye wê demê cewaba layiq ev e ku razîbûna bi kufrê ne ji ḥeysîyet zatê wî ye belkî ji ḥeysîyet ku muqteda ye. Yanî bi qeza û qederê çê bû ye. Seyîd Şerîf di şerḥa El Mewaqifê de beyana vê cewabê kiriye gotiye: “Ji kufrê re nîsbetek bi bal Xudê ve heye bi î’tbar ku fa‘ilê wî ye û îcada wî kiriye. Nîsbetek jî bi bal ‘ebd ve heye bi î’tbar ku meḥellê wî ye û pê tê wesifkirin. İnkara wî bi î’tbar nîsbeta duduwa ye. Razîbûna pê bi î’tbar nîsbeta ewel e. Ferqa wan zahir e. Lewra lazim nayê ji wacibiya razîbûna bi tişkî bi î’tbar ku ji fa‘ilê xwe sadir dibe wacibiya razîbûna pê bi î’tbar ku bûye sifetê tişkî dî. Lewra ku ev seḥîḥ be wê wacib be razîbûna bi mirina pêyẋembera ji ḥeysîyet ku bûye sifetê wan. Ev betal e. İcma‘en[229]”

Hîkayet: İblîsê mel‘ûn xwe ji İmamê Şafi‘î re îzhar kir û got: “”Ya îmam tu çi dibêjî di wî yê ku min xuliqandiye ji bo miradekî xwe û min da şiẋulandin di miradkî xwe de. Paşê eger bivê wê min têxe cennetê û eger bivê wê min têxe agir. Ew ‘edlê dike yan zulmê dike?” İmam got: “Eger te xuliqandibe ji bo murada te ew zulmê li te dike. Eger te xuliqandibe ji bo murada xwe ew ne mesu’le mexlûq mesû’l in.” İblîs ḥeliya ji hev ket. Paşê got: “Wellahî ya Şafi‘î min bi vê meselê ḥeftê ‘îbad ji ‘abidiyê wergerandin û min wan kire zindîq.[230]”

---

228 Gelo tu min piştî wê tobeya ku berya welidandina min hatiye teqdîrkirin di lomînî.

229 Musayere we şerḥuhu.

230 Tuhfetul Murid

Şêx ‘Efîyf ed-Dîn li Misrê bû bihîst ku qetli‘am ketiye Beẋdayê, di rojkî de milyonek hatine kuştin û fileha musḥefa bi situyê kuçikan ve kirin û camîyan gerandin dêr û kitêbê ‘aliman avêtin çemê dîcle ḥeta bû wekî pirê hesb di ser de derbas dibûn. Şêx ‘Efîfed-dîn vî tişta înkar kir got: Ya Reb! Ev çiye? Di wan de bê guneh û zarok hene. Paşê di xew de zilamek dît ku di destê wî de kitêbek heye. Rahiştê dît ku tê de ev beyt hene.

**دَعِ الْاِعْتِرَاضَ فَمَـا الْاَمْرُلَكْوَلَاالْـحُكْمُفِي حَرَكَاتِ الْفَلَكْ**

**وَلَا تَسْـأَلِاللَّـهَ عَنْفِعْلِـهِ فَمَنْ خَـاضَ لُـجَّةَ بَحْرٍ هَلَكْ**[231]

### 2.2.7. Cuzî’ Îxtiyar

31- Bizan bende muxtarê fi’la xwe ye, ne Xaliq ne mecbûrê fi’la xwe ye.

Bende: ‘Ebd. Yanî ‘ebd di ekserê ef‘alê xwe de muxtar e. Yanî serbest e. Eger bivê dike, nevê nake. Lê di hinka de mecbur e wekî ku di şemite weya di xewê de mîz dike. Hinka jî tesadufî dike wekî ku tivingê berde nêçîrê li însankî bikeve. Weya bivir li dar xe serê wî bi peke li însanekî bikeve. ‘Ebd bi van fi’la ne mesû’le çewa ku Xadimî dibêje.

Ne xaliq: ‘Ebd ne xaliqê fi’la xwe ye. Ancaẋ xaliqê hemî ef‘ala Xudê ye. ‘Ebd sebeb e, kesba fi’lê dike. Ev redda ser Mu’tezîlîya ye ku dibêjin: “Ebd fi’la xwe ya îxtiyarî di xuliqîne.”

Ne mecbur e: Ev redda ser Cebrîya ye ku dibêjin : “Hereketa ‘ebda wek ḥereketa dar û bera ye. Çi bikin ji mecbûrî dikin. Tu qudreta ‘ebd û îxtiyara wî ji ef’ala re tune.” Ev betalekî ‘eyan e. Lewra em qenc dizanin ku ḥereketa destê saẋ îxtiyarî ye, ew ḥereketa destê lerzok mecbûrî ye. Mezhebê wan di meşe bi bal înkara gelek ayet û ḥedîsa. Ji wî qasî wan kafir dêrane. Çewa ku şerḥa nûnî ya Xidir Beg dibêj e. Xeyalî di şerḥa wê de gotiye: “Eger ji ‘îbada re ceza ê axretê tune be wê ferqa kufr û îmanê, qencî û xerabîyê tune be. Wê teklîfa wan bi emr û nehya ne seḥîḥ be. Wê nebin musteḥeqê sewab û ‘îqab. Hem wê ferq tune be di nebeyna Filankes limêj kir û rojî girt û filankes sor bû, dirêj bû lewra tev bi îrada Xudê ne.”

---

[231] Dev ji îtîrazê berde emr ne di dest ê te de ye, ḥukmê ḥereketa felekê jî di dest te de nîne
Meke sual (nenirxîne) ji ef‘alên Xweda, kesê ku xwe noqî kurahîya behrê bike helak dibe.

Bedî‘ûzeman gotiye: “Ceza ê îxtiyarî ji bo kê bibe merci‘ê seyyiata, nefsê ji tunebûna mes’ûliyetê xelas dike. Qeder jî wî ji fexr ûẋurûrê xelas dike. Qeder û ceza a îxtiyarî ḥudûdê İslam û îmanê nişan didin. Lewra mu’mîn her tiştî ḥeta fi’la xwe û nefsa xwe tedrîcen dide xwedayê xwe. Ḥeta paşê ku ji teklif û mes’ûlîyetê xelas nebe ceza ê îxtiyarî dertê pêşiya wî jê re dibêje: Tu mes’ûl û mukellefî. Paşê ji bo ku meẋrûr nebe bi qencîw kemalatê ku jê sadir dibin, qeder li hember wî der tê dibêje: Hudûdê xwe nas bike ê ku dike ne tuyî. Erê însan bi ḥukmê Qur’anê ji hemî seyiatê xwe mes’ûle. Lewra ê ku seyîata dike ew bi xwe ye. Bi yek seyîekî kare pir texrîbata bike. Dibe musteḥeqê cezaê giran. Wekî ku bi neftikekî xanîyekî bi şewitîne. Lê ḥeq tune ku bi ḥesenatê xwe îftîxar bike. Lewra ê ku ḥesenata dixwaze Reḥmeta İlahî ye. Ê ku wan îcad dike Qudreta Rebbanî ye. Sûal û cewab da‘î û sebeb herdû jî Xudê ne. Însan ancaẋ bi du‘a û îmanê dibe saḥib. Emma ê ku seyîata dixwaze nefsa însanîye ye, yan bi îstî’dada xwe yan bi îxtiyara xwe. Çewa ku li ber tava xweşik û sipî hinek madde reş dibin. Ew reşayî ‘aîdê îstî’dada wî ye. Sebebiyet û sual ji nefsê ye da ku mes’ûlîyetê bikşîne. Xulqandin û îcada wan ku ‘aîdê Xudê ne ji ber ku hinek qenciya netîce didin qenc in. Ji vê sirrê heye ku kesba şerê şer e. Xulqandina şerê ne şer e. Çewa ku baran mesleḥetê wê pir in. Ku zirarekî bide însanê sist, nikare beje: Baran ne reḥmet e. Xulq û îcada wê baranê xêra pire. Digel şerekî cuz’î, terka xêrekî pir ji bo şerekî cuz’î, dibe şerê pir. Ji bo wî qasî şerrê cuz’î yê wê baranê dikeve ḥukmê xêrê. Di îcada İlahî de şer û xerabî tune. Belkî ‘aîdê kesb û îstî’dada ‘ebd e.

Hem qeder muqeddes e ji zulm û qubḥê jî. Lewra qeder li ‘illetê ḥeqîqî diner e, ‘edaletê dike. İnsan ḥukmê xwe bîna dike li ‘illetê zahir yê ku dibîne, dikeve zulmê. Mesela ḥakim li ser diziyê te ḥebs dike digel ku tu ne dizî lê kes nizane ku qetlekî teya xefî heye. Qederê ji bo wî te ḥebs kir ‘edalet kir. Ema ḥakim wî zulm kir. Lewra tu me’sûmî ji diziyê. ‘Edaleta qederê û îcada İlahî û zulma kesba însana bi du cîheta di yek tişkî de tê dîtin. Her tiştî li vê qiyas bike. Qeder û îcada İlahî bi î’tîbarê mebde û munteha ye, esl û fer‘a, ‘illet û netîceya, munezzeh e ji zulm û qubḥê”[232]

Mustefa Sebrî gotiye: “Ji însan re qudret heye lê tesir nake. Jê re îrade heye. Jê re îxtîyar heye di te’ellûqa îrada wî bi ef‘alê wî ve. İxtîyar û te‘ellûqa îradê di deste wî de ye.”

---

[232] Buyük Suzler, Soz 26, mebḥesa yekî.

Matûrîdî dibêjin: “İrade “kullîye” heye û “cuzîye.” “İrada kullîye” sifetekî mexlûq e tercîḥa yek ji herdû mîqdara dike. Yanî kirin û nekirin. Bi yekî ji wan ve tee’luq digre. La‘elette’yîn. “İrada cuzîye” ne mexlûq e.[233] Wek ḥalê ku mutewessite di navbeyna mewcûd û me’dûmê de. Emrê wî bi destê însan e. Medarê teklif û mes’ûlîyetê ye. ‘İbaretê ji te‘ellûqa wî sifetî ye, bi terefkî mu‘eyyen ve ji fi’l û terkê.” Carna dibêjin: “İrada cuzîye îstî’malkirina îrada kullîye ye di terefkî mu‘eyyen de.”

Eş‘arîyan dibêjin: “Herdû qismê îrade ê te‘ellûqa wî û mute‘ellîqê wî ku fi‘le yan terke tev mexlûq in.” Û dibêjin: Ef’alê însan du senedin bi bal îxtiyara wî ve. Loma tê gotin: Di mezhebê wan de însan muxtar e di ef‘alê xwe de. Mecbûre di îxtîyara xwe de.[234]Sebebê ku ef‘alê wî îxtîyarî ne lewra sipartine bi bal îxtîyara wî ve û ew îxtîyar ne sipartine bi bal îxtîyarek dî ve. Me’na ku însan muxtare di ef‘alê xwe de ev e. Gerçê ev îxtîyar iztirarî ye ne di deste wî de ye. Ef‘alê ku sipartina bi bal îxtîyara iztirarî ve ew jî iztirarî ne, Lakîn bilwasite, lewra iztirara wan bi wasita ku îxtîyara wan iztirarî ye.[235]Ji ber vî qasî navê mezhebê eş‘arî danîne “cebra mutewesit” yanî cebra bilwasite. Ne cebra mu’tedîl. Belkî gotine tam e. Murada Eş‘arîya bi cebrê eve ku îxtîyar wasita navbeyna cebr û fi’lê ye. İxtîyar neqla cebrê dike bi bal fi’lê ve. Cebrê li ser cebrîtî

[233] Eḥmed Hîlmî di vir de meselê bi kurteşerheke ‘Erebî vedike. Wergera wê wihareng e: Ev bixwe xeta ye. Naxwe ya rast bîlekîs e. Lewra kullîyat ancax di zimmîyeta hebûna cuzîyatê de heye. Mesela bi gelemperî hebûnek însan a kullî û xaricî nine. Tiştê ku heye efradên wî ne. Wek Zeyd, Emr, Bekir û..hwd. Tu dikarî îradê jî bi vê re qiyas bikî. Yanî tiştê ku heye îrada cuzî ye. Ev ayet jî ‘eyn tiştî îsbat dikin.“Beje ku emir bi temmamî ê Xweda ne.” “Temmamê emra her ê Xwedê Te ‘ala ne.” Di vir de peyva “emir” vê yekê beyan dike.Peyva “ma” a di vê hedîsê de jî tê vê wateyê. “Tiştê ku Xwedê bibê dibe ê nebê nabe.”

[234] Çewa ku ayeta وَلَوْ شَاءَ اللهُ لَجَعَلَكُمْ أُمَّةً وَاحِدَةً وَلَكِنْ يُضِلُّ مَنْ يَشَاءُ وَيَهْدِي مَنْ يَشَاءُ وَلَتُسْئَلُنَّ عَمَّا كُنْتُمْ (Neḥl 39) seraḥeta nutqê dike bi mecbûrîyet û mesûlîyetê û qebûla te’wîlê jî nake. Mealê ayete eve ku xêr û şerê’îbada tev bi meşîeta Xudê ne. Û wê werin sûalkirin ji ‘emelê xwe. Ayet cem‘a herdûwa dike û mesû’lîyet ne zulm e. Lewra teserûfa di mulk de ye. Hem mesû’lîyet di hemî qanûnê dinayê de heye. Eger milletekî ku î’tîqada cebra meḥd dike eger di welatekî te’sîs bike, wê meḥkema ‘edlîyê deyne da ku xweyê sûca ceza bike. Ev ḥalê ku xweyê her mezheb û î’tîqadê tê de muşterek in kafîye di mukellefbûna însan de bi teklîfa dinya û axretê. Dîsa cebra ku bi me’na ( însan tabi‘ê îrada xwedê ye jî mûxalif nake. Ji ber ku cebra me’newî ye. Û na şibhe cebra bi me’na îkrah.) Ew men‘a îxtîyara ‘îbada nake. Û mesû’lîyet pê re seḥîḥ e. Dema ku îrada Xudê îrada wan dike meylkirin bi bal fi’lê ve bê tezyîq û îrhaq belkî bi terîqa îqna’ û razîbûna bo fi’lê û tezyîna wê ji wan re. İnsan jî li gor ûfqa îrade û qena‘eta xwe ‘emel dike. Cebir li wir namîne. Xulasiya ji mesû’lîyetê jî tune. (Mûqiful-Beşer)

[235]Eger tu bêjî: İxtîyar çewa iztirardîye? Emê bejin: (Murad pê wûqu’a îxtîyarê ye.) Bêwe ku Xudê Te’ala wî di xulqîne. Bîl mubaşere. Weya peyda dibe ji sebeb û murecciḥan. Ne mumkine ku îxtiyara ef’alê îxtiyarî îxtiyarî be. Lewra lazim tê teselsul. Û ne mimkûne ku îkrahî be. Lewra îkrah îxtîyarê di fesidîne. Beyan bû ku cebir ne bi wê me’na ku mute‘arif e. Û te’bîra bi cebra muewesit ne rast e. Belkî cebra xefî û ya me’newîyû şubhul xeber çêtir in. Dema ku îxtîyar kete navbeyna cebr û fi’lê nebû ji cinsê cebr û îkrahê gerçê qewîntir e ji ḥukmê mukrehê li ser mukrehê. Lewra mukreh kare muxalefeta mukrehê bike ku bi mirinê razî bibe. Lê muxalefeta îrada Xudê nayê kirin. Selteneta Xudê mutleqa tenfîz dibe.

nahêl e. Belkî tebdil dike bi muqtedaê tebî‘etê xwe. Di mebdeê de cebr hebû lê ku îxtîyar kete wê navê li ser tebî‘etê xwe geriya, cebir nema.

Matûrîdîyan ji bo ku xwe ji cebrê xelas kin dibêjin: “İnsan muxtar e di te‘ellûqa îradê de bi ef‘alan ve weya di serfkirina wê di wan de.” Me’na kesba ‘îbada ku ew te‘elûqe bi sehalî tê fêmkirin. Ema di mezhebê Eş‘arî de dexla însan di fi’lê de bi me’na ku însan meḥellê fi’la ye û meḥellê îxtîyara fi’la ye, wê demê me’na kesbê di ẋayetê xifaê de ye.[236] Ev sebebkî tercîḥa mezhebê Eş‘erî ye. Lewra qeder sirrekî ji esrarê Xudê Te‘ala ye.[237] Kîjan mezheb munasibê wî be di ẋumûdê de ew nêztirî waqi‘ê ye. Mezhebê matûrîdîyan besît e.

Delîleke cebrê ‘ilmê Xudê yê ezelî mûḥîte bi hemî ef‘alê ‘îbada di “ma la yezal” de. Yanî di musteqbel de. Eger ‘îbad di ef‘alê xwe de derkevin ji mayê ku ‘ilmê Xudê pê heye wê ‘alim bibe cahil. İnsan bû mecbur ku ef‘alê wî li ûfqa ‘ilmê Xûdê bin. Delîlek jî ayeta وَمَا تَشَاؤُنَ اِلَّا اَنْ يَشَاءَ اللّٰهُ[238] Yanî hûn îrada tişkî nakin îlla bi meşîeta Xudê ya ku di we de xuliqandî ye. Û we gerandîye mutesif pê. Dema ku îrada meşîeta we kir û wê da we, we bi wê îrada “ma teşaûn” kir. Eger ne wisabûna hûnê bibûna wek cemada. Ne mimkûn bû ku hûn îrada tişkî bikin. Meşîet bi me’na îrade ye.

### 2.2.8. İman Besîte Yan Murekeb e

32- Muwafiq nebit qewl û niyet ‘emel, li ba me dibêtin di îman xelel

Muwafiq nebit: Eger nebe li gor qanûn û nizama şerî‘etê,

Qewl: İqrara bi kelîma şehadetê bi ziman

Û nîyet: Tesdîqkirina me’na kelîma şehadetê bi qelb

---

[236] ḥeta ku derbû mesel li ser anîne di wan umûrê ku eser ji wucûda wan re tune. Dibêjin (Exfa mîn kesbîl Eş‘erî.) Yanî filan tişt xefîtire ji wî mayê ku tê nîsbetdan bi bal însan ve li mezhebê Eş ‘arî û jê re dibêjin kesb.(Mûqîful-Beşer)

[237] Eḥmed Hîlmi li vir jî bi kurteşerheke ‘Eerbî mesele şîrovekiriye. Wergera wê wihareng e: “Qeder” sirrek wisaye ku tu Melaîket û nebîyekî nikaribûne bi ser ve biçin. Ji lew behskirina ji wê caiz nîne. Ji ber vê yekê ye wexta ku ji Hezretî ‘Elî pirsa qederê hatiye kirin wî ji kesê sualkirox re gotiye ku “ew riyek tarî ye. Di wê rê de nemeşe.”Di dubarekirina suale de wek besrsîv gotiye “ew behreke kûr e. Xwe nôqî wê neke.” Dema ku dîsa jê pir kiriye wî gotiye “ew sirrê Xweda ye ku ji te veşartî ye, li şopa wê negere.” Xwedê Te‘ala ecra wî kesî bide ku ev beyta jêrîn nuhurandiye:

Tebarek e ew zatê ku ecra her karî bi ḥîkmet dişine. Wilo îrade dike ev zulm û niheqî nîne. Ji bil wî tiştê ku Ellah dibê hîç tiştek te nîne. Ji lew ger dixwazî nefsa xwe rabigre. Naxwazî ji qehra xwe bi teqîn e. (Şerhut-Taftazanî ‘Elel-Erba’înî Newewîye R.107)

[238] Heta ku Ellah Te‘ala nexwaze hun nikarin bixwazin. (İnsan 30)

‘Emel: ‘emelkirina bi ‘ezayan. Yanî eger yek ji van hersiya nebe muwafiqê şer‘ê bi rastî û durustî bêwe ku noqsanîyekî têxe yekî ji wan “li ba me” ehlê sunnet û cema‘etê

Dibêtin di îman xelel: Noqsanî dikeve îmanê. Ya ze‘îf dibe, ya di feside. Lewra eger noqsanî têxe îqrarê kafir e. Eger têxe tesdîqê munafiq e. Eger têxe ‘emel fasiq e. Çewa ku Xudê gotiye. Murad bi ‘emel ferz û wacib in. Ne sunnet û newafîl in. Ev gotina şêx wekî tercumekî ye ji bo gotina İbnû Rislan di “Zubedê” de

**وَ نِيَّةٌ وَالْقَوْلُ ثُمَّ الْعَمَلُ بِغَيْرِ وُفْقِ سُنَّةٍ لَا تَكْمُلُ**[239]

Mirad ji sunnetê: Şerî‘eta Pêyẋember e (selellaahû ‘eleyhî we sellem) “la tekmûl” yanî ne mu’teber e. Lewra gunehkarîye yan nêzî gunehkarîyê ye. Lewra Xudê gotiye: وَمَا آتَاكُمُ الرَّسُولُ فَخُذُوهُ وَمَا نَهَاكُمْ عَنْهُ فَانْتَهُوا[240] (Ẋayetul Beyan)

Tu bizan: İman ka besîte yan murekkebe ji du cuza weya ji sê cuza xîlaf tê heye. İmam Eş‘erî û Matûrîdî û tabi‘ê wan gotine: “Besite, yek tişteke ku tesdîq e.” Se’d ed-Dînê Teftazanî gotiye: “Ev mezhebê cumhûrê muḥeqîqna ye. İqrar bi ziman şert e ji bo eḥkaman.” Geleka gotine murekeb e. İmamê Ḥenîfî gotiye: “İman tesdîq û îqrar e.” Nesefî gotiye: “Ev mezhebê pirê ehlê sunnetê ye.” Se’d gotiye: “Lakîn tesdîq rukneke qet saqit nabe. Lê îqrar carna saqit dibe wekî ku yek bi quweta cebrîye nehêle meriv îqrar bike.” Ema di ẋeflet û xewê de tesdîq di qelb de heye lê xefîye. Lewra tiştê ku muḥeqqeq be û ziddê wî lê peyda nebe ew baqî ye di ḥukm û şer‘ê de. Ḥeta ku mu’mîn navê wî kesîye ku îman anîye û ‘elametê bê îmanîyê tê de xwîya nebe. Dawûdul Qersî di Şerḥa Nûnîya Xidir Beg de gotiye: “İman li nik cumhûrê xîlafê tesdîq û îqrar e. Lewra pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) û seḥaban bi tesdîqê tenê kafî ne didêran belkî teleba îqrarê dikirin.” Geleka gotiye: “İman tesdîq û îqrar û ‘emel e.” Se’d gotiye: “Ev mezhebê cûmhûrê ehlê ‘eqîdê û ḥedîsê û fiqhê ye. Pirê selefa jî li ser in.”Xadimî gotiye: “Li nik muḥeqiqînê wan ‘emel cuzek ji ḥeqîqeta îmanê ye.”Se’d gotiye: “Mezhebê şafi‘î wisa ye. Kesê ku qet ‘emel neke jî ji ḥeqîqeta îmanê dernayê.”Xaricîyan dibêjin: “Kesê ku ‘emel neke kafir e.”

Mu’tezîlîyan dibêjin: Ta’et ruknekî ji ḥeqîqeta îmanê ye. Kesê Ta‘et neke ne mu’mîn e, ne kafir e. Di navbeyna kufr û îmanê de ye. Yanî îmana wî ne kamil e wê

---

[239] Niyet û qewl û ‘emel, bê peyrewîya sunnetê kamil nabin.

[240] Pêxember çi dabe we wî bigrin. Men‘a we jî ji çi kiribe dev jê berdin.(ḥeşr: 7)

ebedî di cehennemê de be. Lê ‘ezabê wî hindike. Lewra îman tenê li nik wan ne kafî ye ji bo çûna cennetê. Belkî lazim e ‘emelê saliḥ hebe û gunehkarî tune be, bi tobekirinê hê here cennetê.

### 2.2.9. Mum’înê Gunehkar Di Cehennemê De Ebedî Namînin

33- Mirovê bi îman di dojê muqîm , bizane ku namînin ey ḥekîm

34- Musluman bi qetl û zînayê çu car, ne kafir dibe ne muxelled di nar

Doj: Cehennem. Ev cewabe ji bo sualeke muqeder ku peyda bûye ji beyta pêşîya wê. Bêwe ku yek bêje: “Eger xelel kete îmana kesekî bi sebeb ku qet ta‘et nekir lê tesdîq kiribû bi wî tiştê ku tesdîqa wê wacib e, çewa di ewelê Rehberê ‘Ewam de buhurî. Ew kes ḥalê wî çewa ye?

Şêxê nazim cewab da go: “Eger ew kes bikeve cehennemê çiqas tê de bimîne jî hema ku îmana wî heye wê derkeve. Ew ebedî di agir de namîne.” Çewa ku Muslîm û Bûxarî ji Ebû Se’îd rîwayet kirine. Ku pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) gotiye: “Kesê bêje la îlahe illallah û di qelbê wî de wezna zerrekî ji îmanê hebe wê ji agir derkeve.” Ebû Se‘îd gotiye: “Eger şek çê bibê ji yekî re bira ayeta إِنَّ اللهَ لَا يَظْلِمُ مِثْقَالَ ذَرَّةٍ[241] bixwîne.”

Ev beyt redda Mu’tezîlîya dike. Lewra dibêjin: “Kesê ku bikeve cehenneme dernayê. Lewra yan kafir e. Yan gunehê kebaîr kirine û bê tobe mirine.” Li nik wan kesê gunehê kebaîr neke, yan bike lê tobe bike ew nakeve agir. Çewa ku Şerḥ ul-Eqaîd dibe je.

Qetl û zina: Yanî gunehê kebaîr kîjan dibe bira bibe, hema ku ne ‘elametê kufr û tekzîbê bin.

Muxelled: Ebedî. Ev beyt redda Mu’tezîlîyan û Xarîcîyan tevde ye çewa ku di ḥedîsa Muslîm û Buxarîde ye. Ku pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) gotiye: “Kesê ku şerîka ji Xudê Te‘ala re çê neke wê bikeve cennetê. Gerçi zina û diziyê bike”[242] Yanî însan çiqas gunehê kebaîr bike û bê tobe bimre di bin meşîeta Xudê de ye. Ku bivê wê wî ‘efû bike bê ‘ezab têxe cennetê. Eger bivê wê têxe agir, paşê wî derîne.

[241] Bê guman Allah Te‘ala bi qasî misqalê zerrekî jî (li tu kesî) zulme neke. (Nîsa 40)

[242] Tac 31/1

Tu bizan: Mayîna ebedî mezintir e ji her ‘ezabî, bûye cezayê kufrê ku mezintir e ji her sûcî.[243] Eger bibe ceza ji ẋeyrî kafira re ceza dibe zêdetir ji sûc, nabe ‘edalet. Li nik mu’tezîlîyan dibe ceza ji bo gunehkarê bê tobe. Li nik wan gunehkar ‘ezabê xwe li ser Xudê wacib dike li gorî ‘edaletê. Çewa ku mu’mînê mutî’ mukafatê li ser Xudê wacib dike. Terka wê ne seḥîh e li gorî ‘eql. Ev wacibî li nik ehlê sunnetê tune. Ancaẋ mukâfat fedl e ‘ezab ‘edl e. Delîla wan a neqlî jî ayeta وَمَنْ يَقْتُلْ مُؤْمِنًا مُتَعَمِّدًا فَجَزَاؤُهُ جَهَنَّمُ خَالِدًا فِيهَا[244] û ayeta وَمَنْ يَعْصِ اللّٰهَ وَرَسُولَهُ وَيَتَعَدَّ حُدُودَهُ يُدْخِلْهُ نَارًا خَالِدًا فِيهَا[245] û ayeta مَنْ كَسَبَ سَيِّئَةً وَاَحَاطَتْ بِهِ خَطِيئَتُهُ فَأُولَئِكَ اَصْحَابُ النَّارِ هُمْ فِيهَا خَالِدُونَ[246] cewaba Ehlê Sunnetê ev e. Di ayeta ewil de mexzê îştîqaqê ‘illetê ḥîkmetê ye. Yanî kesê ku mu’mînkî bikuje ji bo ku mu’mîn e ne ji tu dînê dî ye, yanî ku qetla wî ḥelal didêre wê demê kafir dibe. Wê ebedî di cehennemê de be. Herdû ayetê dî di ḥeqqê kafira de ne. Ema ku em bejin di ḥeqqê mu’mîna de ne wê xulûd bi me’na sekna dirêj be. Yanî wê di agir de pir bimînin hê derkevin. Eger em wiha cewab nedin wê van ayetan mu‘areze bikin bi ayet û ḥedîsê ku delalet dikin li ser ‘ef û meẋfîretê. Ayet evin:

وَهُوَ الَّذِي يَقْبَلُ التَّوْبَةَ عَنْ عِبَادِهِ ويَعْفُو عَنْ السَّيِّئَاتِ[247]

اِنَّ اللّٰهَ يَغْفِرُ الذُّنُوب جَمِيعًا[248]

اِنَّ اللّٰهَ لَا يَغْفِرُ اَنْ يُشْرَكَ بِهِ وَيَغْفِرُ مَا دُونَ ذَلِكَ لِمَنْ يَشَاءُ[249]

Ḥedîs ev in:

سَتَرْتُهَا عَلَيْكَ فِي الدُّنْيَا وَاَنَا اَغْفِرُهَا لَكَ الْيَوْمَ[250]

---

[243] Kufr û ‘isyan ji ber ku ji new‘ê texrîb û ‘edemê ne, texrîbatên mezin li wan tertîb dikin. Çewa ku dema wezîfa gemîajo bikeve ‘edemê wê gemî ‘xerq bibe. Se’ya hemî xizmetkara betal dibe. Lewra kufir gerçê yek seyîekî tenê ye lê dibe sebeb ji bo bê qîmetî û teḥqîra kâinata ku delîlê weḥdanîyetê ne. Û tezyîfa hemî tecellîya esma û sifata. Ji wi qasî tehdîdatê Qura’aniye bi dehşet û ‘ezabê ebedî ji kafira re ‘eynî ḥîkmet û ‘edaletê ne. (Buyuk sözler 93/2)

[244] Herçî kesê ku mu’mînekî bi qesdî bikuje, cezaê wî cehenneme ku di wir de heta bi hetayê bimine. (Nîsa 93)

[245] Herçî kesê ku dijraberîya Ellah Te‘ala û resûlê wî bike û ji hudûdê (emr û nehyên) wî derkeve, Ellah Te’ala dê wî biavêje agir û ew dê di wir de heta bi hetayê bimîne.(Nîsa 14)

[246] Kî ku gunehek bike û gunehê wî wî rapêçe, aha îdî ew ehlê agirin. Ew dê di wir de heta bi hetayê bi mînin. (Beqere: 81)

[247]Ew her ewe ku ji ‘îbadê xwe tobê qebûl dike û gunehan di bexşîne. (Şura 25)

[248] Bê gûman Ellah Te‘ala temmamê gunehan di bexşîne. (Zumer 53)

[249] Bê gûman Ellah te ‘ala şîrka ji xwe re na bexşîne. Ji bil vê (şîrkê) kê bixwaze ji wî re di bexşîne. (Nîsa 48)

[250] Bûxarî, İbnî Maceh, Eḥmed

مَنْ لَقِيَنِي بِقُرَاب الْأَرْضِ خَطِيئَةً لَايُشْرِكُ بِي شَيْئًا لَقِيتُهُ بِمِثْلِهَا مَغْفِرَةً[251]

فَأُشْهِدُكُمْ أَنِّي قَدْ غَفَرْتُ لَهُمْ وَأَعْطَيْتُهُمْ مَاسَأَلُوا وَاَجَرْتُهُمْ مِمَّا اسْتَجَارُوا[252]

فَأُشْهِدُكُمْ أَنِّي قَدْ [253]

### 2.2.10. Tobe

35- Ji me’sîyetan lazime tewbe zû, guneh nîne tewbe nebêtin li dû

Me’sîyet: Guneh, bê emrîya Xudê Te‘ala.

Lazim e: Wacibe û ferz e.

Tewbe: Di luẋet de ricû’ û veger e. Di şerî‘et de vegera ji ef‘alê pîs bi bal ê qenc ve. Ew jî bi berhevkirina sê tişta tê meydanê: Qel‘andina guneha yanî terka wan. Poşmanîya li guneha ji bo Xudê ne ji bo ku mûsîbet pêda hatiye, nîyeta qewîn ku êdî guneha neke. Eger zulum li hinka kiribe lazime yan wî ‘efû bikin yan jî ḩeyfa xwe jê hilînin, hê tobe qebûl dibe. Eger imkan nebû, bêwe ku pir cara zulmê kiriye, bira ‘emelê saliḩ bike û zarîn bike bi bal Xudê ve hêvî heye ku Xudê Te‘ala xesmê wî bide razîkirin.

Toba nesûḩ: Ewe ku ḩeqîqî tobe bike. Şirûtê tobê bi cîh bîne. Dîsa ji şirûtê tobê ye, lazime ku berya ẋerẋerê be. Çewa ku ḩedîs dibêje [254]اِنَّ اللهَ يَقْبَلُ تَوْبَةَ الْعَبْدِ مَا لَمْ يُغَرْغِرْ

Ẋerẋere: Ewe ku ruḩ bi gihîje kûrîyê. ‘Elametê wê ku nikaribe avê daqurtîne. Çewa ku Xazîn goiye:“Eger rûḩ bigehîje ẋerẋerê tobe qebûl nabe. Lewra melekul mewt dibîne. Ji ḩeyatê bê hêvî dibe.” Şertekî tobê jî ‘ezma ser terka guneha ye. Ew jî ancaẋ sabit dibe ku tobedar karibe bike û zemanê îxtîyarê jî jê re hebe[255].

Maturîdîyan dibêjin: Toba mu’mîna di ẋerẋerê de qebûl dibe. Ya kafira qebûl nabe.

Tu bizan: İmam Eş‘arî gotiye: “Qebûla tobê muḩeqeq e eger şertê wê li cî bin bi delîla ayeta [256]وَهُوَ الَّذِي يَقْبَلُ التَّوْبَةَ عَنْ عِبَادِهِ ” Lê ku meriv du‘a dike: Ya Rebbî tu toba min

---

[251] Muslîm, İbnî Maceh, Taberanî, Beyḩeqî

[252] Şerḩul ‘Eqaîd û Kestelî

[253] Şerḩul ‘Eqaîd û Kestelî

[254] Heta wexta sekeratê Xwedê Te‘ala toba ‘ebdê xwe qebûl dike. (Tîrmîzî, İbnî Mace,Eḩmed.)

[255] Menawî 2/306

[256]Ew ewe ku ji ‘îbadên xwe tobê qebûl dike.(Şura: 25)

qebûl bikî lewra meriv nizane ka şertê wê li cîh in yan na. İmamul Ḥeremeyn û Qadî ‘İyad gotine: “Qebûla tobê zennî ye. Lê nêzî muḥeqeqê ye.” Lewra îḥtîmale ku me’na ayetê يَقْبَلُهَا اِنْ شَاءَ[257] ev xîlaf di toba mu’mînê gunehkar de ye. Ema toba kafira her qebûl dibe bê xîlaf bi delîla ayeta قُلْ لِلَّذِينَ كَفَرُوا اِنْ يَنْتَهُوا يُغْفَرْ لَهُمْ مَا قَدْ سَلَفَ[258]

Tu bizan: Eger yekî ji gunehekî tobe kir û dîsa kir, gunehê ewil nazvire. Ehlê tesewufê dibejin: “Guneh nîne tobe nebitin li dû.” Gunehê ku tobe jê re tunebe tune. Ji her gunehî re tobe heye ji ẋeyrî meksê. Toba mekkasî qebûl nabe.[259]

Meks : Ḥeqê ‘erd e. Ḥeqa ‘erd: Mekas ê ku ḥeqê ‘erdê distîne. Li kullî ḥal tobe wacib e. Texîra wê ḥeram e. Guneh pê mezin dibin. Bi tobê meḥû dibin. Bi delîla ḥedîsa اَلتَّائِبُ مِنَ الذَّنْبِ كَمَنْ لَا ذَنْبَ لَهُ[260] Xudê Te‘ala ji tobedara ḥes dike. Lewra gotiye: اِنَّ اللهَ يُحِبُّ التَّوَّابِينَ[261]

### 2.2.11. Ḥalê Kesê Cahil

36- Ne me’zûr e cahil ku ‘aqil bitin, ji Xaliq bi cehla Xu ẋafil bitin

Cahil: Nezan. Mirad bi nezanîyê ku hayê wî ji pêyẋembera tunebe, dengê İslamê qet ne bihîstibe. Wekî kesê ku di çiyayê xalî de dijî û wekî ehlê fetretê.[262] Yanî kesê ku xweyê ‘eqil be, ne dîn be ne zarok be gerçi nezan be ji İslamîyetê re, tişkî jê ne bihîstibe. Eger bi sebeb wê nezanîyê ji Xaliqê xu ẋafil be, Xudê nas neke, ew ne me’zûr

[257] Bixwaze dê qebûl ke

[258] (Ya Muhemmed) ji wan kafiran re beje: Eger îmanê bînin û vegerin (dev ji neyartîya we û İslamê berdin) wê gunehê wan ê kevn bê bexşandin. (Enfal: 38)

[259] İbnî Mace, Eḥmed.

[260] Kesê ku ji gunehan tobe bike wek hawê ku qet gunehên wî tunebin. ( (İbnî Maceh, Eḥmed

[261] Bê gûman Ellah Te‘ala ji tobedaran ḥes dike. (Beqere: 222, Tuhfetul Merîyd bi tesrîf,)

[262] Fetret: Sikûneta piştî şiddetê ye. Mirad pê sikûneta ḥalê de’wa pêy‘xembera ye ku de’wa li xelqê dikin bi îman û tetbîqa eḥkama. Dema ku resûlek wefat dibe şer‘a wî nesx dibe. Yekî dî jî hê nehatiye şandin. ḥal di sekine dibe fetret. Ev fetret di navneyna İdrîs û Nûḥ de, di navbeyna ‘İsa û Muḥemmed de (selleallhû ‘eleyhî wessellem) çêbûye.

Şerbînî di ḥaşiya Cem‘ul Cewami’ê de gotiye: Navbeyna du resûla fetret e. Ji çi milletî dibin bira bibin. Bennanî zikir kiriye ku navbeyna İsma‘îl û pêy‘xemberê me sellelallahû ‘eleyhî wes-sellam ji ‘Ereba re fetret e. Lewra di navbêna wan de resûlê ‘Ereba tune bûn. Gerçi ji ‘xeyrî wan hebûn. Wek Mûsa û Harûn û Suleyman û Dawûd û ‘xeyrî wan ‘eleyhîmûs-selam. ‘Erebê ku di wî zemanî de bûn nayên ‘ezabdan li nik Eş‘arîyan ger çi ‘ibadet ji senema re dikirin. Lê İmamê Newewî qebûl nekiriye, wek Matûrîdîyan gotiye:

‘Erebê wê demê ku putperest bin ew ehlê agir in. Lewra de’wa İbrahîm û ‘xeyrî wî gihîştibû wan. Eş‘arîyan cewab dane digel delîlê, binhêre Bennanê (S/63). Şêx Muḥyeddînê ‘Erebî ehê fetrete li ser sêzde qisma teqsîm kiriye: Şeş se‘îd in, çar şeqî ne, sisê di meşyeta Xudê de ne. Da û babê pêy‘xember ji eşrefê wan in. Tefsîl di Yewaqît û Cewahira İmamê Şe’ranî de ye. (S/58)

e. Yanî ew nezanî jê re ne ‘uzr e. Lewra ‘eqlê wî kafî ye ku pê bi fikre di mexlûqata de û bizanibe ku tev delalet dikin li ser Xaliqê qedîm û Sain‘êḥekîm. Ew kes digel wî qasî ku Xudê nas neke kafir e. Ev mezhebê Matûrîdîyan e. Şêxê Xanî di vir de wek wan meşiya ye. Seneda wan, gotina İmamê Ḥenîfî ye. Gotiye: ‘Uzr ji kesî re tune ku Xudê nas neke lewra xulqîyeta asîmana û erdê dibîne. Hem gotiye: Eger Xudê Te‘ala Resûla ne şandibana jî wacib bû li xelqê ku Xudê nas bikin bi ‘eqlê xwe. Delîlê Matûrîdîyan ev in. اَوَلَمْ يَنْظُرُوا فِي مَلَكُوتِ السَّمٰوَاتِ وَالْاَرْضِ[263] Yekî ji ‘arifîna gotiye:

**أَيَا عَجَبًا كَيْفَ يُعْصَى الْإِلٰـهُ أَمْ كَيْفَ يَجْحَدُهُ الْـجَاحِدُ**

**وَ لِلّٰهِ فِي كُـلِّ تَـحْرِكَـةٍ وَ تَسْـكِنَةٍ أَبَـدًا شَـاهِدُ**

**وَ فِي كُـلِّ شَـيْءٍ لَـهُ آيَـةٌ تَـدُلُّ عَـلىٰ أَنَّـهُ وَاحِـدُ**[264]

İsbata Xaliq di eslê xulqa însan de heye. Beyana فِطْرَةَ اللّٰهِ الَّتِي فَطَرَ النَّاسَ عَلَيْهَا[265] Yanî xwe lazimê fitreta Xudê bikin. Û bi ḥedîsa كُلُّ مَوْلُودٍ يُولَدُ عَلىٰ الْفِطْرَةِ فَأَبَوَاهُ يُهَوِّدَانِهِ اَوْ يُنَصِّرَانِهِ اَوْ يُمَجِّسَانِهِ[266] Şêx Ebul Ḥesen Eş‘arî gotiye: “Eql bi tenê ne kafî ye di naskirina Xudê Te‘ala de û naskirina sifetê wî yê kemalîye de. Kesê ku dengê İslamê ne gihîştibê ew mu’mîne gerçê Xudê nas neke. Lewra me’zûr e. Berya ku resûlên Xudê Te‘ala tebliẋa eḥkamên İslamê bikin tişkî wacib tunebû. İman ne wacib bû. Kufr ne ḥeram bû. Bi delîla ayeta وَمَا كُنَّا مُعَذِّبِينَ حَتَّى نَبْعَثَ رَسُولًا[267] û ayeta اَلَمْ يَاْتِكُمْ رُسُلٌ مِنْكُمْ[268] û ayeta سَئَلَهُمْ خَزَنَتُهَا اَلَمْ يَاْتِكُمْ نَذِيرٌ[269] Ancaẋ wacibî û ḥeramî bi şer‘ê têne zanîn.” Li nik wan ehlê fetretê wê tev xelas bibin. ẋalibê Ḥenîfîyan gotine: “Kesê ku denge İslamê negihîştibê mu’mîne çi tesdîq bike, çi neke. Lê bi şertê ku ewsafê kufra serîḥ tê de tune bin. Eger hebin ew kafir e.” Zahir eve çewa ku telwîḥ û mîrat dibêjin. Wellahû e’lem.[270] Xeyalî di Şerḥa Nûnîye de gotiye: “Eger ew kes ji kufr û îmanê ne peyve û î’tîqada herdûwa jî neke, ne ji ehlê agir e. Eger ji eḥwalê kufrê bi peyve ji ehlê agir e. Lewra delalet dike li ser zeman, firset û tecrube ê.

[263]Gelo ma ew qet li melekût (hukumranîya Ellah Te‘ala) a di erd û asîman de nanêrin. (E’raf 185)

[264] Heyret! Gelo çewa ji Xwedê Te‘ala re îsyan tê kirin, gelo çawa ew tê înkarkirin, Hal ewe ku her hereket û bêhereketî şahide Xwedê Te‘ala ne ta ebedDi her tiştî de di derheqê wehdanîyeta wî de ayetek heye

[265] Fitreta Ellah te‘ala ku însan li ser wê fitretê (xulqandî) ne.(Rûm 30)

[266] Wî dikin xiristiyan yan jî mecûsî (Buxarî,Eḥmed) (

[267] Heta ku em (ji însan re) resûlek neşînin em wî ‘ezab nakin. (İsra 15)

[268] Gelo ma ji we re resûlek ji nav we nehat. (En‘am 130)

[269] Dê notirvanên wê (cehennemê)ji wan bipirsin (û bejin:) Gelo ma hişyarkerek ji we re nehat. (Mulk 8)

[270] Şerḥul-Nûnîye.

Ew kes wê demê ne me’zûr e. Eger ew zeman nehate destê wî ew me’zûr e.” Eve mirada İmamê Ḥenîfî ji gotina wî ya ku buhurî.

### 2.2.12. Ḥusn Û Qebḥ

Tu bizan: İxtîlafa Eş‘erîyan û Matûrîdîyan di vê mesele de fer‘ê îxtîlaf a wan e di teḥsîn û teqbîḥa ef‘ala de[271] ka ‘eqlî ne ya şer‘î ne. Eş‘erî dibêjin: “Ef‘alê ‘îbada di nefsa xwe de naên wesifkirin bi ḥusn û qubḥê bi wesita ‘eql.” Yanî nayê gotin: Filan fi’l bi ḥukmê ‘eql ḥesen e yan qebîḥe. İnca’ fi’la ḥesen û qebîḥ bi şer‘ê tê zanîn. Filan fi’l şer‘en qenc e.Yanî medḥ û sewab lê tertîb dike. Eger şari’ fi’la ku qenc dêraye bi gerîne xerab, fi’la ku xerab dêra ye bigerîne qenc duruste. ‘Eqlen duruste ku Xudê Te‘ala emrê kesî neke bi îmanê, kesî xweyê sewab neke ji bo wî, gerçi qenc e. Û duruste ku nehya kesî ji kufrê neke ji bo wî kesî ‘ezab nede, gerçi qebîḥ e.

Welḥasil: Ne memnû‘e di ‘eqil de ku kesî teklîf neke. Lewra dilriḥetîya bi ta‘et û şukrê ‘îbada û zerer û bîhntengîya bi gunehkarîyan jê re çê nabin. Belkî di ‘eqil de caize ku ‘ezab bide wî kesî ku zikra navê wî dike ji bo şukrê wî. Lewra şukur bê îzna Xudê teserrufe di mulkê ẋeyrê de bê îzn, wê demê ‘ezab dixwaze. Eger bi fedla xwe teleba zikra navê xwe nekira bi ayet û ḥedîsa wê însan ji qubḥê bi tirsiya. Lewra xwe dibîne ku pir ḥeqîr e û zikra navê Xudê carî dike li ser zimanê xwe digel ‘ezemet û celaleta wî. Ḥukumkirina bi ḥusn û qebḥê nabe îlla bi seḥkirina ji enbîya. Belkî ‘eql illetê fehmkirina xîtabê û naskirina rastîya fa‘ilê ye.

Maturîdîyan dibêjin: “Husn û qubḥa hinek ef‘alan bi ‘eql tê zanîn welew şer’en tune be. Wek husna îmana bi Xudê û te’zîma wî û tesdîqa resûla. Hem wek qubḥa nîsbeta tiştê neqenc bi bal Xudê ve. Hem wek husna gotina rast û derewa bi menfe‘et.” Yanî ‘eql îsbat dike ku fi’la ku Xudê li me wacib kiriye ḥusne. Lewra sewab lê tertîb dike. Fi’la ku men‘a me jê kiriye qubḥ e. Lewra ‘ezab lê tertîb dike. Yanî kesê

---

[271] Meellîf li vir kurteşerek bi ‘Erebî nivîsîye. Wergera wê wihareng e: Dibêjin husn û qubh li ser sê mana hatiye.

Yek: Sifetê Kemal u nuqsaniyê. Tê gotin ‘ilm yan ji ‘edalet husn e, çimki vana sifetê Kemal in. Cehl u zulm ji qebih in, çimki vana sifetê nuqsaniyêne

Dido: Munasibbuna ji bo meqsedê û ziddiyeta ji meqsedê re. Bi vê me’nayê ji van herduyan re tê gotin “meslehet û mefsedet”. Ê ku muwafiqî meqsedê bin ew ḥesen e, ê ku muxalif bin ew ji qebih e, çimki tê de mefsedet heye. Ev qismê duduya li gora şexsa tê guhertin. Mesela kuştina zilamki bi nisbet dujminê wî husn e, bi nisbet eqrebayên wî qubh e. ev herdu me’ne ancax aqil wan idrak dike, şerî’et pê re ‘elaqe nake. Herduyan di vir de ittifaq kirine. Mutezili ji wiha dibêjin.

‘eqilmend bi ‘eqlê xwe zane ku ḥukmê Xudê di van de ev e, gerçi şer’ warid nebe. ‘Eql îlleta naskirina ḥusn û qebḥê ye, ne îlleta fehma xîtabê ye. Ḥakimê bi ḥusn ‘u qubḥê her Xuda ye.

Mu’tezîlîyan dibêjin: Ḥakimê bi husn û qubḥa ef‘ala ‘eql e. Şerî‘et keşfa wan dike ne ku îsbat dike. Ancax îsbata wan bi ‘eql e. İlla hinek ef‘alê hindik, îsbata wan bi şer‘ê ye. Wek ḥusna rojîgirtina roja paşî ji Remezanê, û wek qubḥa rojîgirtina roja ewil ji Şewalê.

Ferqa Mu’tezîlîyan û Matûrîdîyan ev e: Mesela sewabdana ser ta‘et û ‘ezabdana ser gunehan li nik Mu’tezîlîyan wacibe ku Xudê bike. Eger neke qebîḥ e. Lewra zulm e. Li nik Matûrîdîyan lazime ku Xudê wisa bike. Lewra we’de daye. We’da xwe naşkêne. Ne ku wacib e. Eger we’de nedabûna û nekira ‘edalet bû. Emma li nik Mu’tezîlîyan eger we’de nedabûna jî dîsa wacib bû ku bike.

### 2.2.13. İmana Teqlîdî

37- Mirovê nezan bit û nadan û sist, dibtin bi teqlîdê îman durust

Nadan: Farisî ye bi me’na nezan e. Zikra wê tekrar e lê beyt pê saz dibe.

Sist: Yanî bi kêr nayê ku weḥdanîyeta Xudê Te‘ala bi delîla îsbat bike.

Teqlîd: Wergirtina qilade ê di sitû de. Di istilaḥ de eve ku gotina yekî qebûl bike û delîla wî nas neke. Wekî ku wê gotinê gerande qilade û di sitûyê xwe de danî. “Muqellîd” kesê ku erkanê İslamê teva î’tîqad dike bê delil. “Qilade” Xişrê gerdenê ye.[272]

İman durust: İman bi teqlîdê duruste li nik koma ‘alimê İslamê ku cumhûrê ehlê sunnetê ne bi delîla ayeta وَلَا تَقُولُوا لِـمَنْ اَلْقىٰ اِلَيْكُمُ السَّلَامَ لَسْتَ مُؤْمَنًا[273] û ḥedîsa مَنْ صَلىّٰ صَلَاتَنَا وَدَخَلَ مَسْجِدَنَا وَاسْتَقْبَلَ قِبْلَتَنَا فَهُوَ مُؤْمِنٌ[274]

İman sirf tesdîq e. Ne tesdîqa ku çê dibe bi anîna delîlê. Lewra pêyẋember û seḥabîyan îqrara bi iman û kelîma şehadetê kafî diddêran di muslumanîyê de. Teleba

[272] Tuhfetul Murîd, ‘Elîyê Qarî, Xadimî

[273] Ji wî kesê ku (li gorî ‘urf û ‘adetên islamê) silavê lê dikin re nebijin tu mu’mîn nînî.(Nîsa 94)

[274] Heyret! Gelo çewa ji Xwedê Te‘ala re îsyan tê kirin, gelo çawa ew tê înkarkirin. Hal ew e ku her hereket û bêhereketî şahide Xwedê Te‘ala ne ta ebed. Di her tiştî de di derheqê wehdanîyeta wî de ayetek heye

delîlê ji kesî nedikirin. Ema kesê ku gotine: “İman bi teqlîdê ne seḥîḥ e” wek Baqilanî û İsferainî û İmamul-Ḥeremeyn, hinka gotine İmam Malîk jî, loma hinka gotine: “Muqellîd ne mu’mîn e.”Qadî ‘İyad jî gotiye: “Teqlîd di ‘eqîdê de nayê tesewûrkirin.” İbnî ‘Etîye gotiye: “Ayeta [275]اَوَلَوْ كَانَ آبَاؤُهُمْ لَا يَعْقِلُونَ dixwaze ku teqlîd betal be.” Mirada wan wellahû e’lem: Yanî ne seḥîḥê kamil e belkî seḥîḥê ze‘îf e. Lewra ku ne wisa be wê bibe seḥîh û ne seḥîḥ li nik cimhûr, ev nabe. Eger em bejin: “Ne seḥîḥ e,” lazime em hemî ‘amîyan kafir bidêr in. Ev qet nabe.[276]

Xulase: İmana muqelîdî seḥîḥ e li nik her çar îmaman[277] İbnî Ḥecer neqil kiriye ku naskirina bi eslê fitretê ye. Bi delîla ayet û ḥedîsa ku buhurîn. Ji wî qasî îmam Ebû Mensûrê Matûrîdî gotiye: “Hemî hevalên me îttîfaq kirine ku ‘amî tev mu’mîn in, xudênas in di nêv cennetê de ne.” Çewa ḥedîs pê hene. İcma’ li ser e. Taceddîn Subkî te’hqîq kiriye ku muqellîd eger xwe bi gotina ‘alimekî girtibe bi girtinek qewîn, bi hawakî wisa u ku ew ‘alim ji gotina xwe vegere jî muqellîd venegere îmana wî seḥîḥ e li nik Eş‘arî û ẋeyrî wî di eḥkamê dînî û dinyewî tev de. Eger ne wisa be bêwe ku ew ‘alim vegere û meqllîd jî vegere îmana wî ne seḥîḥ e. Lewra ku tereddudek hindik jî bikeve tesdîqê îman tune. Gotina ḥeq ev e.[278] İmana muqelîdî li nik Eş‘arî seḥîḥ e, bi şertê ku hemî meselê ‘eqîdê bi delîlê ‘eqlî nas bike di qelbê xwe de. Ne lazime ku karibe bi ziman bêje. Muqellîd li nik wî ne mu’mînê kamil e. Lewra gunehkar e ku delîla nayne. Lê ‘eqîbeta wî ehlê cennete ye. Lewra anîna delîlê wacib e. Çewa ‘İzzed-Dîn di Mewaqifê de gotiye: “Nezer yanî fikr û anîna delîlê wacib e şer‘en bi ittifaqa Ehlê Sunnetê û Cema‘etê.” Dewwanî gotiye: “Lewra Xudê Te‘ala gotiye فَانْظُرْ إِلىٰ آثَارِ رَحْمَةِ اللهِ[279] “Yanî tu binhêre û bi fikre reḥmet û nî’metên Xudê Te‘ala ku bi baranê ḥasil dibin.” Û gotiye: [280]قُلِ انْظُرُوا مَا ذَا فِي السَّمٰوَاتِ وَالْأَرْضِ nezer du qism in:

Yek: Nezera tefsîlî ye ku beyana ‘îbaretê ye di anîna delîlê de bi tertîba muqeddemata û bicîhanîna şertê nezera seḥîḥ e. Mesela ku delîlê bîne li ser hebûna

[275] Welew ku bav û bapîrên wan bê fehm û idrak bin jî (Beqere: 170)

[276] Xadimî

[277] ‘Elîyê Qarî.

[278]Bacûrî û ‘Elîyê Qarî.

[279] (Çavên xwe veke ) li eserên rehmeta Ellah Te‘ala (baş) mêze ke. (Rûm: 50)

[280] (Ya Mu ḥemmed! Ji wan re) beje: Binhêrin bê ka di erd û asîman de çi heye. (Yûnûs: 101)

Xudê Te‘ala û bêje: “ ‘Alem ḥadis e, ji ḥadisa teva re muḥeddîsek lazim e. Netîce dide ku muḥedîsek lazim e.”

A duduwa: Nezera îcmalî ye ku zanîna meale vê delîlê ye. Bêwe ku zanibe ji erd û asîman re xudakî heye gerçi nizanibe ‘îbareta beyan ke. Ev ji pirê ‘amîyan re heye, ḥeta ji zaroka re[281]

‘Ellamaê Newbî gotiye: “Fikra di mexlûqa de û tesbîḥa weqtê birûska new‘û delil e.Xeberdanê ‘amîyan tije delil in. Delalet dikin ku Xudê qedîm e. Sifetê wî hene û ‘alem ḥadis e. Wekî niha dibêjin: Xudê Te‘ala asîman bê sitûn xuliqandîye.”

Sekbanî gotiye: Di wan de muqellîd hene bê şubhe[282]

Tatarxanîye gotiye: “İmana bi tefsîl ne wacib e.” Çewa ku wisa ji İmamê ẋezalî û Quşeyrî û ẋeyrî wan jî hatiye neqilkirin. Lewra ne şertê siḥeta îmanê ye. Belkî şertê kemalîyeta wê ye. İmana îcmalî li nik wan kafî ye. Û gotiye: “Yekî ku nizanibe ‘ibaret sipeḥî bêje, lê dema ku ‘eqîda wî jê pirs kin bêje: Ez zanim ku wiha ye. Ew mu’mîn e. Eger bêje: Ez nizanaim, weya ez nizanim kelîmeyên îmanê beyan kim dînê wî tune. Lazime ji nû ve musluman bibe. Eger zarok baliẋ bû kelîmeyên îmanê zanibe lê nizanibe beyan û me’na wan û tedbîra me‘aş û îdara xwe zanibe ew wekî murteda ye, ne mu’mîne. Hem neqil kiriye ku ne seḥîḥ e nîkaḥa qîza baliẋ ku nizanibe ruknê îmanê çi û çi ne.” Ev belakî mezin e. Xelq jê ẋafil in.

Welḥasil: İmana teqlîdê gerçi caize lê tehlûke ye. Lewra eger hinik jê re şubhekî çêkin îḥtîmal e ku here. Nexasim wexta ‘eql ze‘îf dibe bi sikratê û muselletbûna şeytana wê demê meriv di tirse ku îman zail bibe. Ne‘ûzûbîllah[283]

### 2.2.14. Tobe Û İmana Di Weqtê Sekeratê De

38- Di weqtê ‘ezabê Xudê kit nuzûl, li ser kafiran nîne îman qebûl

Murad bi “nuzûla ‘ezab” ketina di sekeratê de û dîtina Melek ul-Mewt e. Lewra wê demê kafir cîhê xwe di agir de dibînin çewa ku mu’mîn cîhê xwe di cennetê de

281 Xadimî

282 Tuhfetul-E‘alî.

283 Xadimî bi tesrîf

dibînin. Bi delîla ḥedîsa Bûxarî. [284]مَنْ اَحَبَّ لِقَاءَ اللّٰهِ اَحَبَّ اللهُ لِقَاءَهُ وَمَنْ كَرِهَ لِقَاءَ اللّٰهِ كَرِهَ اللهُ لِقَاءَهُ ‘Aîşe (rediyellahû ‘enha) gotiye: “Em tev ji mirinê di kerihînin. Pêyẋember got: Lîqa a Xudê ne mirin e. Lakîn mu’mîn di ber mirinê de tê mizgîndan bi razîbûn û kerameta Xudê. Kafir di ber mirinê de tê mizgîndan bi ‘ezab û ‘eqîbeta Xudê Te‘ala.” Di ḥedîsa ‘Aîşe de: Mu’mîn di ber mirinê de toba xwe dibîne ji lîqa a Xudê ḥes dike. Kafir ‘ezabê xwe dibîne ji lîqa ê di kerihîn e.[285]

“Nîne” xeber e. “İman qebûl” mubteda ye. Yanî qebûla îmanê tune di wê demê de bi delîla ayeta [286]فَلَمْ يَكُ يَنْفَعُهُمْ اِيمَانُهُمْ لَمَّا رَاَوْا بَاْسَنَا سُنَّتَ اللّٰهِ الَّتِي خَلَتْ فِي عِبَادِهِ “Be’s” şiddet e. “Sunnet” ‘adet e.[287] Yanî Xudê Te‘ala gerandiye ‘adet ku îmana ḥalê be’sê ku weqta dîtina ‘ezab e qebûl nabe.[288]

Tu bizan: Dîtina ‘ezab ancaẋ di ḥalê ẋerẋerê de ye ku ji ḥeyatê bê hêvî dibe. Wê demê çewa îmana kafira qebûl nabe, wisa toba gunehkarê mu’mîna jî qebûl nabe bi delîla ayeta وَلَيْسَتِ التَّوْبَةُ لِلَّذِينَ يَعْمَلُونَ السَّيِّئَاتِ حَتَّى اِذَا حَضَرَ اَحَدَهُمُ الْمَوْتُ قَالَ اِنِّى تُبْتُ الْاٰنَ وَلَا الَّذِينَ [289]يَمُوتُونَ وَهُمْ كُفَّارٌ Beẋewî di tefsîra ayetê de gotiye: “Toba gunehkaran û îmana kafiran qebûl nabe dema ku mirinê yeqîn bikin. Bêwe ku ketin sikratê û Melekul-Mewt ditin. Lewra ew dem paşiya zemanê dinyayê û ewelê zemanê axretê ye. Lê berya wê demê welew bi zemankî hindik jî qebûl dibe. Lewra reḥma Xudê Te‘ala pir e.” Nêzbûna mirinê ne mani’ê qebûla tobê ye. Gerçê ‘elametê wê xwîya bin. Wek nexweşîya bêçare û qutbûna ḥereketa çewa ‘ûlemaê teḥqîqê gotine.

‘Elîyê Qarî gotiye: Gotina Beẋewî qewîne bi sê wecha.

Yek: Şertê qebûlê eve ku niyeta xwe qewîn bike ku nema wî gunehî dike. Ew niyet ancaẋ mu’teber e ku zen bike kare dîsa wî gunehî bike lê neke. Dema ku mirinê yeqîn bike zane nema kare bike. Loma toba wî qebûl nabe.

---

[284] Herçi kesê ku dixwaze leqayî Xwedê Te‘ala bê Xwedê Te‘la jî dixwaze ku leqayî wî bê. Herçî kesê ku naxwaze leqayî Xwedê Teala bê Xwedê Te‘ala jî naxwaze ku leqayî wî bê. (Bûxarî 6507)

[285]Qestelanî 9/296

[286] Lê belê dema ku ew ‘ezabê me bibînin îdî îmana wan hew fêde didit wan. Ev sunetullahekî qedîm e ku (ji mêj de) li ser ‘îbadê wî pêk tê. (‘Xafir/Mu’mîn: 85)

[287] Muellif di vir de peyva “be’s û sunneta” ku di nav hedîsê de derbas dibe şîirove dike.(c)

[288] Rûḥul Beyan

[289]Naxwe toba (meqbûl) ne toba wan kesa ye ku heta mirin tê wan radipêçe hê dibên me nuho tobe kir, hem ne (toba wan kesaye) kubi kafirî dimrin. (Nîsa: 18)

Dudu: Gunehkar ku ji ḥeyatê bê hêvî bibin tev poşman dibin. Poşmanî jî tobe ye. Ḥedîs dibêje: اَلتَّائِبُ مِنَ الذَّنْبِ كَمَنْ لَا ذَنْبَ لَهُ[290] Lazim tê kesê mu’mîn qet nekeve agir. Di gel ku bi ayet û ḥedîsa sabit e û muḥeqqeq e ku wê hinek bikevinê.

Sisê: Em mukellef in bi îmananîna bi ẋeybê. Lewra Xudê Te‘ala gotiye الَّذِينَ يُؤْمِنُونَ بِالْغَيْبِ[291] Murad bi ẋeybê tiştê ku ne ‘eyan e û îsbat dibe bi delîlê. Wek hebûna zat û sifatên Xudê Te‘ala û hebûna pêyẋemberan û şer‘a wan û rabûna qiyametê. Ku mirin bibe yeqînî, îman dibe ‘eyanî ne seḥîḥ e. Emma ayeta وَهُوَ الَّذِي يَقْبَلُ التَّوْبَةَ عَنْ عِبَادِهِ[292] Girêdaî ye bi ayeta وَلَيْسَتِ التَّوْبَةُ ...الآية[293] û bi ḥedîsa اِنَّ اللهَ يَقْبَلُ تَوْبَةَ الْعَبْدِ مَالَمْ يُغَرْغِر[294] çewa ku Rûhul Beyan dibêje.

Gelek ji ‘ulemaê Şafi‘îyan û Ḥenîfîyan wek Subkî û Belqînî û İbnî Cema‘e û Qudsî û Tûnûsî gotine: “Di ḥalê yeqînkirina mirinê û dîtina ‘ezab de îmana kafira qebûl nabe lê toba mu’mîna qebûl dibe. Lewra hê reca heye. Poşmanî û ‘ezma terka guneha bi recaê re seḥîḥin.” Hem lewra kafiran Xudênenas in, ecnebi ne nû dest bi îmanê dikin. Lê mu’mînê gunehkar Xudênas e. Ḥalê wî ḥalê mayîna ser îmana kamil e. Mayîn ji destpêkirinê sehltir e. Delîla qebûlê ayeta وَهُوَ الَّذِي يَقْبَلُ...[295] di Bezazî de gotine qewlê seḥîh ev e.[296] Ji nezmê tê zanîn ku Şêxê Xanî gotina vana qebûl kiriye. Lewra ji toba gunehkara xeber neda ye.

### 2.2.15. Pêyẋemberî

39- Ji ‘ezl û gunahan nebî bûn berî, ji bo qismê jin nîne pêyẋemberî

Hemî pêyẋemberan bêrîne ji ‘ezlê, bi tifaqa hemî ‘aliman. Tu kes ji wan ji pêyẋemberîyê ‘ezil nebû ye qet‘a. Di dunya û axretê de tev pêy’xember in. Nebîtî û resûltî bi mirinê betal nabe. Lewra welîtîya welîyan bi mirinê betal nabe. Nebîtî hemin betal nabe. Hem temmamê nebîya bêrîne ji hemî gunehên mezin û biçûk. Çi berya nebîtîyê çi piştî wê. Welew di ḥalê zarotîya wan de. Ne bi qesdî guneh kirine, ne bi

[290] Herçî kesê ku ji gunehkariyê tobe bike her wekî wî kesî ye ku hîç guneh nekiriye. (İbnî Mace: 4250)

[291] Ew her ew kesin ku îmanê bi ‘xeybê tînin. (Beqere 3)

[292] Ew (Ellah) her ewe ku ji ‘îbadên xwe tobê qebûl dike. (Şûra 25)

[293] Ne ew tobe ye… û ayet berdewam e.

[294] İbnî Mace: 4253

[295] Ew ewe ku (toba) qebûl dike. (Şûra 25)

[296] Tuhfetul-E‘alî û Ruhul-Me‘anî

sehwî. Lewra Xudê Te‘ala zahir û batinê wan tev muḥafeze kiriye ji hemî menhiyata. Gunehê zahirî wek zina û araq û derew û ẋeyrî wan, gunehê batinî wek kibr û ḥesed û riya û ẋeyrî wan, tiştê ḥeram qet nekirine bi îtifaqa hemî ‘aliman. Ḥeta mekrûh û xîlafa ewla û mubaḥ jî nekirine. Eger tu bêjî: Carna waqi’ bûne. Wekî ku pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) li piya av vexwariye û li piya mîz kiriye û di desmêjê de du cara av li ‘ezayê xwe kiriye. Emê bejin: Wisa kiriye ji bo ku beyan bibe ku ew tişt caîz e, ne ḥeram e. Yan ji bo ‘uzrekî ye. Mub‘ah ji bo wî qasî ye. Yan ji bo quweta ser ‘îbadet e. Yan mesleḥet tê de heye. Lewra li ser pêyẋembera wacibe ku ‘ehkama beyan kin. Ku wacib û caîz û ẋeyrî wan in. Hem em zanin ku hinek ewlîya van tişta nekirine îlla ji bo mesleḥetê. Wê çewa enbîya bê sebeb bikin.[297]

Ji bo qismê jin nîne pêyẋemberî: İbnû Cema‘et Gotiye: “Mêrantî şertê pêyẋembertîyê ye di mezhebê ehlê teḥqîqê de.” Lê İmamê Eş‘arî û Qurtûbî gotine: “Na.”[298]

Sebebê ku jin nabin pêyẋember: Lewra jinanî sifetê noqsanîyê ye, ne layiqê meqamê pêyẋemberîyê ye. Lewra jin na seliḥin ku bibin sultan û qadî di ḥed û qisasiyetê de. Hem lewra Xudê Te‘ala jina qetandiya ji ayeta وَمَا اَرْسَلْنَا مِنْ قَبْلِكَ اِلَّا رِجَالًا[299] lewra resul divê ku eşkere de’wa resûltîyê bikin. Jin jî lazime ku setirkirî bin, di hundur de bin, eşkere ne pêyivin, neçin cem zilama. Tuḥfetul ‘E‘alî wiha neqilkiriye ji Newbî. Li ser her dû ‘illetê paşî ‘î’tîraz hene. Teḥrîra wan kelamê dirêj dixwaz e.

### 2.2.15.1. Kerametê Ewliya

40- Welîyan keramet dikin jê zuhur, dikin xerqê ‘adet gelek jê sudur

Yanî keramet ji welîyan zahir dibin. Kerametê wan ḥeq in. Lewra gelek tiştên xarîqul ‘adet ji wan sadir dibin.

Welî di luẋat de: 1 Muḥîb. 2 alîkar, 3 nêz, 4 azadkirox, 5 seremîr, 6 tesrîfkrox e. Di şerî‘et de: Kesê Xudênas e digel sifetê wî û şuẋlê lazimê di dîn de li gorî îmkana wî li ser ta‘et dewam dike. Xwe di parêze ji hemî sûc û guneha ḥeta ji mubaḥan. Xwe ji dunyayê vedigre, berê xwe dide axretê.

---

[297] Tuhfetul-Murîd

[298] ‘Elîyê Qarî.

[299] Me berya te ji bil meran kes bi pêy‘xembertî neşand. (Yûsûs 109)

Keramet: Tiştê ji ‘adetê der e. Peyda dibe bi sebebê ta‘etê pir û naskirina Xudê Te‘ala di gel sifetê wî, xalîye ji de’wa nebîtîyê. Wekî ku di sa‘et kî de ji Şamê here Mekkê û fêkiyê havînê di zivistanê de ḥazir bike û li ser avê bi meşe û bifire wekî teyran û ẋeyrî wan.

Mu’cîze: Tiştê ji ‘adetê der. Zahir dibe li ser destê wî kesê ku de’wa pêyẋemberîyê dike digel teḥdîya munkîra. Murad bi teḥdîyê sewqa bi bal îmana bi Xudê ye ku de’wa rîsaletê ye. Mu’cîze ji kerametê ferq nabe îlla bi teḥdîyê. Tiştê ku duruste bibe mu’cîze ji nebî re duruste ku bibe keramet ji welî re. Lê gelek ‘aliman qebûl nekirine gotine: “Her mu’cîze nabe keramet. Çewa ku İbnî Rislan Gotiye:

وَالْاَوْلِـيَا ذَوُوا كَـرَامَـاتٍ رُتَبْ وَمَا انْـتَهَوْا لِـوَلَدٍ مِنْ غَيْرِ اَبْ[300]

Yanî ewlîya xweyê kerametên muxtelîfe ne. Lakîn negihîştine dereca ku weledkî bê bav çekin, weya kevirkî bikin ḥeywan mesela. Çewa ku îmam Quşeyrî gotiye.[301] “Meqsûd ji kerametê xarîqul ‘adetkî wisa ye ku munkîr nikare tiştkî wek wî derîne.”

Mu’tezîlîyan keramet înkar dikin dibêjin: “Ku ḥeq bin wê mu’cîzat neêne naskirin. Cewaba wan sehle bi ferqa navbeyna kerameta û mu’cîzeyan ku vê gavê buhurî.

Tenbîh: Bibe talibe îstiqametê, nebe talibe kerametê. Nefsa te kerametê divê, Rebbê te îstiqametê divê. Eslê mezin, rahê sadiqan îstîqamet e. Kullê kerametan jî ew e. Emma sebebê ku hinek ‘abidê muctehîd xwestine ku tişkî ji kerametan bibe nesîbê wan da ku yeqîna wan zêde bibe û qesda ser zûhdê û derketina ji de’wayên nefsî qewîn bibe[302]

Xerqê ‘adet: “Xerq” mesder e, bi me’na îsmûfa‘il e. Yanî xarîqul ‘adet. Yanî tiştê ji ‘adetê der. Xarîqul ‘adet şeş in:

---

[300] Ji ber ku wergera îbarê di metne de bû. Me ev îbare wernegerand.(c)

[301] Eḥmed Ḥîlmî li vir kurteşerheke bi zimanê ‘Erebî nivîsîye. Wergera wê wihareng e: Taceddîn-î Subkî dibê ku ev heqe û ji vê peyva ku ‘aydê kesekî dine bêtir şayanî tercîhê ye. “Tiştê ku mimkûne ji pêxemberekî re bibe mucîze mimkûne ku ji welîkî re jî bibe keramet. Ji bil teḥaddîyê di navbeyna wan de ferq nîne.” Zerkeşî peyvên Quşeyrî ze‘îf dîtîye û wiha gotiye: “Cûmhûr dijberê vê yeke ye û ev dîtina Quşeyrî red kiriye. ḥetta lawê wî Ebû Nasr jî di kitêba xwe ya bi navê El-Murşîd de li dij dîtîna wî fikra xwe beyan kiriye.” İmamul-Heremeyn û Newewî jî di şerha “Muslîm” Şerhî Kîtabûl-Bîrr Wes-Sila de de gotine: “Mimkûne ku ji enwaên xarîquladeyên muxtelîf keramet peyda bibin. En nihayet kermaet ji veguherîna tiştên ku tên dîtin peyda dibin. Di vî warî de peyva Eḥmedê Xanî şayanî tercîhê ye. (Mevahîbus-Sammed)

[302] Tuxfetul-E‘alî.

Mu’cîze.

Keramet.

İrhas: Yanî peydabûna tiştê xarîqul ‘adet ku delalet dike li ser bî’seta pêyẋember berya nebîtîya Wî. Wek nûra ku xwîya dibû di eniya abaê peyẋember de (selellaahû ‘eleyhî we sellem.) Hem wek ‘elametê ku li nik wîladet û şîrdarîya wî peyda dibûn. Çewa kitêbên siyerê dibêjin.

İ‘ane: Ku peyda bibe ji yekî saliḥ

İstîdrac: Nêzbûna bi bal ‘ezabê Xudê Te‘ala ve ye tedrîcen. Yanî hin bi hin. Ku Xudê her îḥtîyacîyê yekî diqedîne zen dike ku ji qencîya Wî ye. Wek Fîr‘ewn û Deccal û ẋeyrî wan. Kî dibe bira bibe.

İhanet: Yanî rezilkirin. Ku xarîqul ‘adet muxalifê de’wayê be. Wekî Museylemetul Kuzzab got: Mu’cîzata min eve ku bizin bi pêyve. Bizinê got: Tu kezzabî ya mel‘ûn. Bizin peyivî lê muxalifê de’wayê. Tuf kir çavê yekî kor ji bo reḥet bibe. Çavê saẋ jî kor bû. Du‘a kir ku ava bîrê zêde bibe, ava kû bere tê de hebû çikiya zuwa bû. Dema ku wisa bû got: Ez pêyẋemberê îfsadê me. Muḥemmed pêyẋemberê islaḥê ye.

Hinka gotine: Xarîqul ‘adet heşt in. Ê ḥeftaa siḥr e. Ê heşta îbtila ye. Wekî ku yek bi nexweşîya pir giran bikeve ji ‘adeta wî der be.

Dawûdê Qersî gotiye: Siḥr, li nik‘ulemaê teḥqîqê tişkî ‘adetî ye. Ne xarîqul ‘adet e. Eger yek şirût û esbabê wê pêk bîne wê Xudê Te‘ala li ser destê wî çêke. Em bi esbabê wê nizanin li nik me ẋerîb e.

Alûsî gotiye: Siḥr ne xarîqul ‘adet e. Lê di şibhe wê. Lewra bi te’lîmê tê meydanê. Teḥsîla wê bi îrtikaba qebaîḥa ye. Wek elfazê şirkê û medḥê şeytana û ‘îbadetê ji sitêra re û enwa‘ê fasiqîyan. Kesê ku van tişta bike dibe munasibê şeytana, alîkarîya wî dikin. Lewra tenasub şertê alîkarîyê ye. Lewra şeytan ancaẋ alîkarîya wî kesî dikin ku dişibhe wan di necaset û xebîsîyê de bi qewl û fi’l û î’tîqadê. Çewa ku melaîket ancaẋ alîkarîya wî kesî dikin ku di şibhe wan di dewama ser ‘îbadet û teqerrûba bi bal Xudê Te‘ala ve bi qewl û fi’lê. Bi vî tiştî siḥirbaz vediqete ji nebî û welîyan. Li nik cumhur ji siḥrê re ḥeqîqet heye. Siḥirbaz digîje dereca ku bi fire di hewa de û li ser avê bi meşe û nefsa bikuje û însana bigerîne ker. Fa‘ilê ḥeqîqî her Xudê Te‘ala ye. Lakîn nikare beḥrê bike

şeq û miriya saẋ bike û ḥeywana bide peyvandin û ẋeyrî wan ji ‘elametê pêyẋemberan.[303]

Sebebê ku keramet di dewra esḥaban de hindik bûn lewra ‘eqîda wan li gorî mêzîne şer‘ê bû. Ema ‘eqîda milletê piştî wan ze‘îf bû. Welîyan keramet nîşanî wan didan da ku ‘eqîda wan di ḥeqê saliḥa de hebe û hogirê qenca bin. Da ku İslamîyet xera nebe[304]

### 2.2.16. Dîtina Xudê Te‘ala Di Cennetê De

41- Xudê dê bibînin Musluman bi çav, weki sahî bêtin heyîva tevav

42- Ji bîr dê bikin nî’meta cennetê, wekî dest bidin dewleta ru’yetê

Tevav: Em rastî me’na wê nehatine. Lê meqam dixwaze ku bi me’na geş yanî temam be. Yanî wê di axretê de Musluman Xudê Te‘ala bibînin bi çavê serê xwe wekî ku heyva geş di sahîya safî de dertê û xweş tê dîtin. Bi delaleta ayeta وُجُوهٌ يَوْمَئِذٍ نَاضِرَةٌإِلَى رَبِّهَا نَاظِرَةٌ[305] û ḥedîsa فَإِنَّكُمْ سَتَرَوْنَ رَبَّكُمْ كَمَا تَرَوْنَ الْقَمَرَ لَيْلَةَ الْبَدْرِ لَا تُضَامُّونَ فِي رُؤْيَتِهِ[306] Yanî hun bi şek nakevin, hunê muḥeqqeq zanibin ku we Xudê Te‘ala dît. Lakîn bê keyfîyet. Yanî ne di tu mekana de û bê cihet û mesafe di navbeyna raî û muraî de, naşibhe tişkî û reng jê re nînin. Wê wiha bibinin.

Ji bîr dê bikin… îlx: Yanî weqta ku musluman dest bi wê dewleta mezin bikin ku dîtina Xudê Te‘ala ye, wê lezzetê nî’meta cennetê digel ḥûr û qusûra tev ji bîr bikin çewa ku Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) gotiye: إِنَّ اللّٰهَ عَزَّ وَجَلَّ يَتَجَلَّى لِأَهْلِ الْجَنَّةِ فَإِذَا رَأَوْهُ يَنْسَوْنَ نَعِيمَ الْجَنَّةِ[307] Lewra temmamê nî’meta li gorî lîqaya Xudayê Kerîm wek ḥeba xerdelê li gor xizna mezin e.

Mu’tezîlîyan înkara dîtina Xudê Te‘ala dikin. Delîla wan ayeta لَاتُدْرِكُهُ الْأَبْصَارُ وَهُوَ يُدْرِكُ الْأَبْصَارَ[308] û ayeta لَنْ تَرَانِي..[309] ye. Ehlê sunnetê cewaba wan dane ku me’na لَا تُدْرِكُهُ الْأَبْصَارُ yanî ebsarê mexlûqa îḥate nakin bi ‘ezemet û celaleta Xudê Te‘ala.

---

[303] Rûhul-Me‘anî 1/388

[304] Tuhfetul-Murîd.

[305] Wê rojê hinek rû (hene) ku di biriqin (bi rûgeşî) li (husna) Rebbê xwe mêze dikin. (Qiyamet 22-23)

[306] Bê gûman çawa ku hun hîva çerderojî dibinin hunê Xwedê Te‘ala jî bê îzdîham wilo bibînin. (Tîrmîzî)

[307] Bê gûman Xwedê Te‘ala bi (ru’yeta xwe) li ser ehlê cennete tecelli dike. Piştî ku ew wî dibinin îdî temmamî nî’metên cennetê ji bîr dikin.

[308] Ne mimkune ku çav wî îdrak bikin lê ew çava îdrak dike.(En‘am 103)

İḥate: Yanî îdrak û zanîna bi zahir û batinê tişta ye bi temamî. Yanî murad bi ayetê nefya ‘umûmî ye. Yanî temamê besera nabinin belkî hinek dibinin ku beserê mu’mîna ne. Lê beserê kafiran wî nabînin. Piştî ku van te’wîla li ayetê dikevin ayet delalet nake li ser nedîtinê. لَنْ تَرَانِي murad pê yanî “Ya Mûsê teḥemmula te û taqeta te di ḥalê ḥazir de li ser dîtinê tune.” Emma [310]لن ew ji bo te’kîda nefyê ye. Ne ji bo te’bîda nefyê ye. Paşê Xudê Te‘ala ji Musê re meselek beyan kir bi çiya, yanî xulqîyeta çiya ji xulqîyeta însan pir qewîntir e, jê sabittir, bêhtir qerar digre digel wî qasî taqeta wî ji dîtinê re tune çewa ku Xudê got: [311]وَلَكِنِ انْظُرْ إِلَى الْجَبَلِ فَإِنِ اسْتَقَرَّ مَكَانَهُ فَسَوْفَ تَرَانِي Paşê got: [312]فَلَمَّا تَجَلَّى رَبُّهُ لِلْجَبَلِ جَعَلَهُ دَكًّا Yanî dema ku Xudê Te‘ala nûra xwe ji çiya re zahir kir û wî gerand medkûk, yanî hedimî ḥeta bû ax ji heybeta Xudê Te‘ala. Ew çiya navê wî Zîber e.Ne Tûrî Sina ye. Ev ayeta لَنْ تَرَانِي jî delalet nake li ser nedîtinê.

Piştî ku te van teva bihîst, tu zanibe ku dîtina Xudê Te‘ala di dunyayê de jî duruste ‘eqlen. Di ‘eqil de mani‘ê caîzîyê tune. Belkî delîla neqlî heye teqwîya ‘eqil dike. Delîla neqlî li ser caîzîya dîtina Xudê di dunyayê de suala Musê ye ku got: رَبِّ اَرِنِي اَنْظُرْ اِلَيْكَ[313] Lewra ji “ûlûl-‘ezma” ye. Tiştê ne caiz naxwaze. Nabe ku ji tiştê wiha re cahil be. Bi hemî ‘eḥwalê rubûbîyetê zanibû. Lewra ji mezinê resûla bû. Ku dîtina Xudê Te‘ala ne caizbûna ne dixwest. Erê dîtina Xudê Te‘ala di dinyayê de caîz e lê kesî nedîye ji ẋeyrî pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem.) Lewra quweta beşerî ze‘îf e, muẋeyyer dibe, qabîlê fena yê ye. Ne mimkûne ehlê fenayê Xudayê Baqî bibinin. Weqta ku qiyamet rabe wê Xudê Te‘ala xulq’iyetek dî bide wan û quwetek baqî bike rizqê wan û nûra beser û qelbê wan temam bike. Ji ẋeyrî pêyẋemberê me. (selellaahû ‘eleyhî we sellem.)

Qadî ‘Iyad gotiye: Diye Musê jî (‘eleyhîs-selam.)

Qadî Ebû Bekrê Baqilanî û Ce’fer es-Sadiq gotine: “Mûsa Xudê Te‘ala dît dema ku tecelli kir ji çiya re loma bê hiş ket.” Ema ẋêyrî van herdû pêyẋemberan

---

Gelek mutercima kelima îdrakê wek dîtin wergerandin e. Lê bi qena ‘eta min mana dîtînê di nav îdrakê de heye lê bele îdrak ji dîtînê berfirehtir û maneyên wê yê dî jî hene. Ji lew me di wergerê de peyva îdrakê wek orjîna wê bikar anî. (c)

[309] Ne mimkûne ku tu min (bi çavê dinyayê) bibînî. (E’raf: 143

[310] Ne mimkûne

[311] Lê belê li (wî) çiyayî mêze ke, eger ew li cîhê xwe bimîne tu jî dê min bibînî. (E’raf :143)

[312] Dema ku Rebbê wî li çiya tecelli kir, çiya perçe werçe kir. (E’raf143)

[313] Ya Rebbî (xwe) nîşanî min de da ku ez li te mêze kim. (E’raf 143)

(‘eleyhaselatûs-selam) kesê ku de’wa dîtinê bike gelek ‘aliman gotine ku kafir e. Geleka jî gotine fasiq e û ehlê delaletê ye.[314] Emma dîtina Xudê di xew de ew durust e di qewlê seḥîḥ de welew li ser sûretê xusûsî be. Lewra xew ji tesrîfatê xalî ye, munfek nabe ji sûretê mutexeyyile ê di ‘alema mîsala de. Evqas bese. Eger tu tefsîla zêde divê binhêre Şîfaê û şerḥa wê Şîhab C. 2 û Tuhfet ûl-E‘alî Şerḥu Bed’il-Emalî 40

### 2.2.17. Tenasux Û Ḥulûl

43- Betale tenasux mûḥale ḥulûl, meke îttîḥada du tiştan qebûl

“Tenassux”ji nesxê ye. Bi me’na neql û îzale ye. Mezhebê nesxî: Neqilbûna ruḥa ye di cesed de ji şexsekî ku derdikeve dikeve yekî dî. Eger ruḥ qenc û paqij be dikeve cesedkî xweşik û bi lezzet tê de xweyê nî’met dibe. Eger pîs be dikeve cesedkî pîs û qebîḥ tê de ‘ezab dibîne. Wek sûretê seh yan ker yan gayê cot[315]

‘Eqîda ehlê tenasûxê ev e: Ku mirin ne bi me’na fenabûna temamî ye. Ancax me’na mirinê eve ku ruḥê cesetki bedel dike bi cestkî. Dibêjin: “Dema ku ruḥ ji cesetkî diqete neqil dibe bi bal cestkî dî ve di vê dinyayê de. Cesedê sanî ji ê ewil re ne muxalif e.” Yanî muttefîq e digel wê ḥeyata ku însan ji xwe re ḥazir kiriye bi ‘emel û efkarê ku di ḥeyata ewil de hebûn. Ku ‘emel û fikrê wî pîs bin ruḥê wî neqlî tebeqî qirêjokî dibe wek tebeqa ḥeywana û nebata. Lê ku ‘emel û efkarê wî saliḥ bin ru ḥê wî tereqqî dike bi bal tebeqekî qenc û bilind ve. Xulasa vê ‘eqîdê eve ku mukâfat û ‘ezab di dunyayê de ne. Goya erwaḥ ancaẋ têne dunyayê carekî, Piştî carekî di ceseda de diçin û tên ji bo bighêjin mukâfat weya ‘ezab. Yanî axret tune.[316]Ev ‘eqîda tenasuxê kufre bê şubhe.[317]

Ḥulûl: Ketina tişkî di tişkî de ye ku jê re dibe tabi’. Mezhebê ḥulûlê ev e: Ku Xudê Te‘ala bikeve bedena hinek însana li gor ze’ma wan. Wê demê hebûna wî nabe wacib. Lewra dibe tabi’. Hem dibe muḥtac bi bal cîhekî ve. Lewma ehlê ḥulûlê kafir bûne. Wek filehan ku dibêjin: “Zatê Xudê ketiye bedena ‘İsa.”Hem wek İs’haqî û Nesranîyan ku du taife ne ji rafizîyan dibêjin: “Ruḥê Xudê Te‘ala ketiye bedena her duwazde îmaman.” Ku ḥezretî ‘Elî û ewladê wî ne. Navê wan ev in: Ḥesen, Ḥuseyîn, ‘Elî Zeynul‘Abidîn, Muḥemmed el-Baqir, Ce’fer es-Sadiq, Mûsa el- Kazim, ‘Elîyurrida,

[314] Kelamê sofîya ku dîtinê divê lazime bête te’wîlkirin. (muelîf)

[315] Şihab ‘Eleş-Şîfa

[316] El İslam Se‘îd Hewwa

[317] Şîfa

Muḥemmed Taqî, ‘Elî bîn Muḥemmed Taqî, El Ḥesen ul-‘Eskerî, Mu ḥemmed el-Muntezer el-Mehdî. Li nik wan rafizîyan ev her duwazde îmam îlah in.

İttîḥad: Bi me’na yekbûna du tişta ye yan zêde ê duduwa. İttîḥada du zata muḥal e. Welew herdû zat mexlûq bin. Dema ku wisa ye wê çewa zatê qedîm û zatê mexlûq bibin yek.

Meke îttîhada… îlax: Ev de’wakî salise di vê beytê de, ne ku delile ji bo îbtala ḥulûlê. Gerçi îttîḥad û ḥulûl nêzî hevin. İttîḥad sê qism in:

1. Ku tişkî bi ‘eynê xwe bibe tişkî dî. Ev muḥale qet‘en herdû tiştê mutteḥîd ku baqî bimînin ew dudu ne. İttîḥad tune. Eger fena bibin ew me’d’ûm in, dîsa îttihad tune. Eger yek fena bibe û yek baqî bimîne dîsa ne îttîhad e, belkî yek heye yek tune. Mudde’ayê me jî ku herdû jî mewcûd bin piştî îttîhadê.
2. Ku tişteki demm bibe bi bal tiştekî dî ve ku ḥeqîqetek ji wan ḥasil bibe, wek axê ku bi demma avê dibe herî.
3. Ku tiştekî bibe tiştekî dî bi wergerandinê. Wekî ku av dibe hewa. Weya tiştê sipî bibe tiştê reş. Ev tev di ḥeqê Xudê Te‘ala da muḥal in.

İttîḥada ḥeqîqî ji hersiya a ewil e. Herduwê dî îttîḥada wan mecazî ye. Lewra ax ku dibe herî ancaẋ bi zemma avê çê dibe. Av jî ku dibe hewa bi zewala avîtîyê ye. Sipî ku dibe reş bi zewala sipîtîyê ye. Şertê îttîḥada ḥeqîqî jî ku zem û zewal tunebin, ew jî muḥal e. Lewra bedîhîye ku Zeyd û ‘Emr nabin yek însan mesela. [318]

Hinek şuẋl û kelamê sofiyan ku ḥulûl û îttîḥadê dixwazin, lazime te’wil bibin bi ḥeqîqetê. Lewra meşayîx û mezin bêrîne ji van tişta.[319]

Tu bizan: Filehên ku de’wa îttîḥadê dikin bêhtirin ji fillehên ku de’wa hûlûlê dikin. Redda teva ancaẋ bi îbtala ḥulûl û îttîḥadê tê meydanê.

[318] Celal ‘Elel-‘Edûdîye. (İbtala hersê qismê îttîḥadê digel delîlan, mufessele tê de digel ḥaşiya wê İsma‘îlê Gelenbewî)

[319] Şihab

### 2.2.18. Cuz Ê La Yetecezî

44- Eger tiştikî pur mucezza bikî, qebûl nakit îdî mucezza bikî

Mucezza: Kerkirî, hatiye qetkirin. Yanî eger tu tişkî pur ker bikî û hûr bikî wê bighêje ḥalê ku êdî qebûla kerkirinê li xwe nake. Yanî wê bibe “cuz ê la yetecezî” yanî “pare ê napar.” Jê re tê gotin “noqte” û “cewherê ferd.” Şêxê nazim îsbat dike ku cuz ê la yeteceza heye da ku redda feylesofan bike ku dibêjin: “Pare ê napar tune.” Hemî cisman li nik wan ji heyûla û sûretê ne. Ne ji pare ê napar in.

Heyûla: Madde ye. Cisim jê çê dibin. Wek ḥerîyê li gor kûz.

Suret: Cewher e, dikeve ẋeyra. Wek kûzîtîyê ku dikeve ḥerîyê. Sûret li nik me muslumana ‘erede ne cewher e. Li ser gotina wan ‘alem qedîm e. Lewra esl jê re heye ku heyûla ye. Ema li nik me muslumana cuzê la yeteceza heye û sabite. Ji tune çêbûye. Temmamê cisman ji wî ne. Bêwe ku bi milyon û milyara par ê napar dighêje hev dibin cism. Li nik me ‘alem bû ḥadis. Yanî peyda ye ji tune.

Dema Xudê Te‘ala îrade kir ku erd û asîman îcad ke, ewwela mîqdarekî pir pare ê napar îcad kir ji tune. Paşê wan civand hev. Erd û asîman ji wan çêkir. Gotina ḥeq ev e. Çewa ku Alûsî di tefsîra xwe de gotiye: “Li nik ehlê ḥeq cisim murekeb e ji cewherên ferd.” Di gel ku ew bi xwe înkara cewherê ferd dike. Çewa ku di (102/24) de gotiye. We gotiye: “Lewra delîlên qewîn li ser nefya wî hene û zirar di nefya wî de tune.”

Erê, lakîn beyanatê ehlê şer‘ê hem ehlê fennê ‘esrî di beḥsa îcada ‘alemê de teqwîya îsbata cewherê ferd dikin ku pare ê napare ye. Ustad Bedî‘ûz-Zemman jî îxtiyar kiriye çewa ku wê were tefsîlkirin di beyana heyûlayê de. Şêxê nazim redda Mu’tezîlîyan û feylesofan dike ku dibêjin: “Cewherê ferd tune. Pare çiqas hûr be jî di ‘eqil de tê kerkerkirin bê nihayet.” Ev gotina wan fasid e. Lewra dide fehmkirin ku ḥeba xerdelê ji çiya ne biçûktir be. Çi ku pare ê herdûwan jî naqedin. Hem em karin wesfê Xwedê Te‘ala bikin ku qudreta wî li ser îcada pare ê napar heye. Lê wana nikarin. Lewra cuz ê la yeteceza li nik wan muḥal e. Faîda îsbata par ê napar ev e ku heyûla îbtal bibe.[320] Tefsîl wê were

45- Heyûla çu nîne ‘edîm e ‘edîm, dinê kafir e ê dibêjit qedîm

---

[320] Tuhfet-ul E‘alî we Nuxbetul-ealî.

Heyûla: Pembû ye. Ḥukemayê pêşîn esl û madda ‘alemê pê teşbih kirine. Lewra ji wî madeyî ecsamê muxtelîfe çê dibin. Çewa ku ji pembû çê dibin. Yan heyûla di istilaḥa wan de hatiye wesifkirin bi hinik wesfan ku ehlê ‘eqîdê bi wana wesfê Xudê Te‘ala dikin ku evin: Mewcûd e, bê kemîyet û bê keyfîyet e, yanî jimar jê re tune û çewabûn lê peyde nabe. Lewra ne wek tişkî ye. Dibêjin: Paşê sifet û ‘erez lê peyda bûn, ‘alem jê çê bû.[321]

Feylesofan gotine: Cisim di nefsa xwe de muttesel e. Qebûla înfîsal û înqisama li xwe dike bê nihayet. Evê ku qebûla înqisamê dike ne îttîsal e, tişkî dine. Ew bi xwe qebûla îtsalê li xwe dike û jêre tê gotin “heyûla û madde.” Ji îttîsalê re jî tê gotin “sûret.”[322] Sûret di vir de navê îttîsala cewherê ye ku bi hev ve be di nefsa xwe de. Lê ew “cewher” temamî ḥeqîqeta cismî ye. Belkî tişkî dî heye îttsal xwe pê ve digre. Yanî cweherê mufesel navê wî tiştî ye ku heyûlê ewil e ku sûretê cismîye dikevê. Navê sûretê danîn “îttsal.” Navê wî tiştî danîn “madde.” Navê murekebê ji herdûkan danîn “cism.”[323]

Heyûla Çar Qismin:

Heyûla ewil: Cewherekî besît e. Û wicûda wî bê wicûda sûretê ne temam e. Ew cîhê sûretê ye. Lê sûret wî radigre çewa ku cewher ‘eredê radigre. Dema ku sûret lê peyda bibe bi hev re dibe cism. Çewa ku ji Kullîyatê Ebûl- Beqa tê zanîn.

Erîstatalîs gotiye: Çewa ku Mîlel Nîḥel dibêje: “Ewwelê sureta ku di sebiqe bi bal heyûlayê ve eb‘adê selase ne.” Wê demê heyûla dibe xweyê dirêjî û firehî û kûrîyê. Lê tu ḥal jê re nîne. Dibe heyûla duduwa. Paşê her çar tebî‘et lê peyda dibin. Ku germ û serma û rutubet û ziwayî ne. Wê demê heyûla di gel vana dibine her çar ‘enasir: Ku av û ax û ba û agir in, dibe heyûla sisiya. Paşê murekkebat ji wan çê dibin: Ku dar û ber û me’den û ẋeyrî wan in, ew jî hinek ji hinka re heyûla ne. Wekî hesin heyûla ye ji bo şûr û kêr û bêr û tevrik û ẋeyrî wan.

Heyûla çu nînê: Yanî eslê dunyayê ku heyûla ye li nik feylesofan tune. Yanî ev heyûla ku feylesofan beyan kirine çewa ku buhurî ne sabit e

---

[321] Qamus

[322] Tewalî‘ Lil-Beydawî

[323] Şerḥul-Mewaqif

‘Edîm e ‘edîm: Tune, tune. Ev te’kîd in ji bo xeberê ku“çu nîne.” Wê demê “dinê” mubteda ye. Xeberê wî “kafire yê dibêjit qedîm” Yanî kesê ku bibêje: Dunya qedîm e kafir dibe. Duruste ku “edîm” mubteda be, muekked be “dinê” xeber be. Cumle ê (kafire… îlx) îbtîdaî be çewa ku muwafiqî gotina “Bed‘ul Emalî” ye.

**وَدُنْيَانَا حَدِيثٌ وَالْهَيُولَىعَدِيمُ الْكَوْنِ فَاسْمَعْ بِاجْتِذَالِ**[324]

Dunya: Muennesê edna ye. Yanî nêztir. Lewra berya axretê ye. Hinka gotine: “Dunya ‘îbaretê ji erd û hewayê ye. Hinka jî gotine: Dunya hemî mexlûqên berya axretê ne. Murada me eva paşîye.[325]

Qedîm: Yanî her hebû. Tunebûn di serî de ne buhurî ye. Feylesofan û ḥukemayên pêşîn gotine: “Heyûla madde ye, qedîm e. Madde bê sûret nabe. Sûret jî bû qedîm. Temmamê cisma ji madde û sûretê ne. Ew jî bûne qedîm.” Li nik wan ‘alem qedîm e. Fena nabe. Yanî heşir tune. Qiyamet ranabe. Ji wî qasî kafir bûne bi îtifaqa hemî ehlê İslamê. Çewa gotiye:

**بِثَلَاثَةٍ كَفَرَ الْفَلَاسِفَةُالْعِدَااِذْ اَنْكَرُوهَا وَهْيَ حَقًّا مُثْبَتَة**

**عِلْمٌبِجُزْئِيٍّ حُدُوثُ عَوَالِمٍالمَحْشَرٌ لِأَجْسَادٍ وَكَانَتْ مَيِّتَة**[326]

Ehlê sunnetê redda wan kirine ku îbtala heyûlayê kirine bi îsbata cuzê la yetecezza, çewa ku buhurî. Lewra îsbata wî dixwaze ku cism murekebê wî be. ‘Alem jî ‘îbaretê ji cisma ye. Xulase, temmamê ‘alemê ji cewherê ferd çêbûye. Ew jî ḥadis e. ‘Alem bû ḥadis. Hemî ‘aleman ku ẋeyrî Xudê ne. Çi erd û çi asîman û çi ẋeyrî wan mexlûqê Xudê Te‘ala ne. Wan ji tune îcad kirine. Xude Te‘ala hebû tiştek pê re tunebû. Mezhebê ḥeq ev e. Li nik hemî etba‘ê pêyẋemberan ji Musluman û Fillehan û Cihuyan û ẋeyrî wan.[327] Li ser ḥudûsa ‘alemê delil pirin di vir de hilnayên.

Piştî ku îsbat bû ku ‘alem ḥades e. Tiştê ḥadis her wê fena be. İsbat bû ku wê ‘alem fena bibe, bêwe ku wê Xudê Te‘ala wî ji hev bixe bike cewherê ferd, bibe “hebaen mensûra”, çewa ku eslê wê jî cewherê ferd bû. Lewra ehlê ḥîkmeta nû îsbat kirine ku ‘alem ji sedîmê çê bûye.

[324] Guh bidêre dunya ḥadis e (paşê çê bûye), heyula jî tunebûna hebûna ye.

[325] Tuxfetul E‘alî

[326] Ehlê felsefe bi sê tişta kafir bûne. Çimkî van her sê tişta hene, heqq in û sabit in, wan jî vana înkar kirine. Ew tişt ev in: 1- ‘Ilmê bi cuzîyê. 2-Hudûsa ‘aleman. 3-Heşra cesedên mirî

[327] ‘Elîyê Qarî

“Sedîm” mij e, ‘ewr e. Li nik feylsofên ‘esrî sedîm bi me’na koma pare û zerreê hûrikin ku di civin dibin wek ‘ewr û dayîse.

‘Ulema ê ‘esrî gotine: “Ev nezeriya ha mutabiq e ji bo ayeta ثُمَّ اسْتَوَى إِلَى السَّمَاءِ وَهِيَ دُخَانٌ[328] murad bi dûxanê ẋazek narî ye di şibihe dûxanê. Jê re tê gotin “alemus-sedîm” ku eslê hemî ‘alema ye.” Gotine: “Qur‘an li gor fehma ‘Erebê wî zemanî hatiye. Te’bîr daye bi dûxanê. Temmamê cemad û nebat û ḥeywana di sedîmê de wekî ku nutfe ḥawî ye ji bo hemî ‘ezayan.” Qadî Beydawî dûxan tefsir kiriye bi emrekî zulmanî. Yanî tiştê wek dûxanê. Û gotiye: “Murad bi dûxanê madda aşina ye ku heyûla ye. Yan tişkî wek wî, yan eczaê hûrik in, yan cewherê ferd.” Hem îsbat kirine ku sedîm ji esîrê çêbûye. Piştî ku geriyaye komek cewherê ferd kesafet lê peyda bû, wê demê mecerrekî jê tewellud kir yanî ‘ewrekî nûranî, hate navdan bi sedîmê. Çewa ku tefsîra Tentawî dibêje.

Ustad Bedî‘uzzeman gotiye: Neqliyatê şer‘î delalet dikin ku Xudê Te‘ala ewela cewherek îcad kiriye. Yanî maddekî, paşê lê tecelli kir bû du qisma, yek bûxar, yek maî’. Yanî tişkî ron wek avê. Paşê li qismê maî’ tecelî kir geriya kesîf û kef da, ji kefê erd çêkir. Paşê madda bûxarîye fireh kir asîman jê çêkir û setîra tê de çand[329] Ew nezerîya ḥîkmeta nû ḥukum dikin ku menzûma şemsîye digel asîmanê ku tê de sobayî dikin cewherekî besît bû. İnqilab lê çêbû geriya new‘ê buxarekî. Paşê ma‘îekî narî jê

---

[328] Paşê bi bal asîmanê ku ji duxanê pêkhatibû ve vegerî. (Fûsîlet: 11)

[329] Eḥmed Ḥîlmî bo zelalkirina meselê li vir kurteşerheke bi zimanê ‘Eerbî nivîsîye. Wergera wê ya Kurmancî wihareng e: Di berheman de warid bûye ku ‘erş li ser avê bû. Paşê Xwedê Te‘ala di avê de çelq pêk anî, avê kef da, dûxan jê hilkişiya û kef li ser avê ma. Piştî kefê zuhayî, ji zuhayîyê jî rukê erdê çêbû. Ji duxanê jî asîmanan çêkir. Ayeta“paşê piştî duxanê li asîman îstîwa kir” bi bal vê yekê ve îşaret dike. (Alûsî 12/8) Yanî di şibhe wê dûxanê ku îmkana temasa wê ne mimkûne û wek tiştekî tarî ye.Jî bo heyyûla û sûretên cismanî ku maddeya asîmanin an jî ji perçeyên wanê biçûk re yanî ji perçeyên ku nayên perçekirin re peyva“dûxan” hatiye bikaranîn. Tarîtîya dûxanê jî tarîtîya tevlihevîya berya gîhîştina ronahîyê ye.Lewra wek dûxanê perçeyên bê nûr û jihevveqetandî ne.

Hineka jî wiha gotine: Ayeta “ew dûxanek bû” tê wê maneyê ku asîman wek dûxanê ji bûxara avê bû.Hatiye rîwayetkirin ku Xwedê Te‘ala av ji cewherek hêşîn û sipî dawerivand. Paşê agirek xiste nava wî, avê kef da û Xwedê Te‘ala dinya ji wê kefê xuliqand. Paşê bi îrada xwe li wê dûxana ku ji avê peydabûbû îstîwa kir (vegerî)û ew kir asîman. Paşê rûkê erdê raxist û rast kir. (Ruhul-Beyan)

Hineka wiha gotine: Ava ku di ayetê de behsa wê hatiye kirin ne ew av e ku unsûrek ji çar unsura ye. Lewra ji ber ku ev av piştî xuliqndina erdê hatiye xuliqandin dûrî eql e ku erd û asîman li ser wê bin. Ev encax ew ava teb‘î ya bi nûr û bi ‘ewr e ku ‘erş jê hatiye xuliqandin” (Alûsî 12/9)

Alûsî wiha gotite: “Ava ku di ayetê de hatiye zikirkirin şubhe nîne ku ava ûnsûrî ye. Ev ne delile ku av piştî ‘erşê hedîsa yekemin e.Kesê ku di vê babetê de muracaatî rîwayetên eleqedar bike dê di vî warî de hinek rîwayeta bibîne. Wek mînak rîwayeta Ebû Rezzî ya ku “av berya agir e” yek ji wan e. Ev rîwayet ji teref Tîrmîzî ve zahîren wek ḥesen hatiye dîtin.(Ruhul-Me‘anî, Suretê Hûd)

ḥahsil bû. Paşê qismek jê sar bû, hişk bû, paşê ku ḥereket li wî ma‘îî ketin çirusk û qit‘e jê qetiyan bûne kesîf û geriyan seyarat. Ev erda me yek ji wan e.

Dema te ev bihîst, duruste tu tetbîqa herdû mesleka li hev bikî. Lewra mimkune ku ayeta كَانَتَا رَتْقًا فَفَتَقْنَاهُمَا[330] îşaret bike ku erd digel menzûma şemsîye wek hevîrekî bû. Destê qudretê wê ‘ecinand ji cewherekî besît, yanî ji mada esîrê ku wek ava seyale nifûz dike bi ceryana di navbeyna hemî mewcûdatan de. Weya وَكَانَ عَرْشُهُ عَلَى الْمَاءِ[331] îşaret be bi bal vê mada ku wek avê ye. “Esîr” piştî ku xuliqî bû merkez ji bo ewelê teceliya sani‘ê ḥekîm bi îcadê. Yanî Xudê Te‘ala ewwela esîr xuliqand. Paşê wî gerand koma cewherê ferd. Paşê qismek jê gerand kesîf û ḥefta kureê meskûne jê xuliqand. Erda me yek ji wan e[332]

Tu bizan. ‘Esrîyan gotine: “Esîr” madda eslî ye ji hemî ‘aleman re Dinyewî-uxrewî. Pêl û ḥereket lê ketin kesafet tê de peyda bû. Ev qismê kesîf geriya (sedîm.) Ku jê re bi zimanê ‘esrî tê gotin “Galaksî û Nebûla”

Di te’rîfa esîrê de îxtilaf kirine. Lê qencê te’rîfa çewa ku ji “İşarat ul-İ’caz” û “Tefsîra Tentewî” tê zanîn eve. Cewherekî besîte ne murekeb e. Seyyal e wek avê. Valaîya bê ḥidûd tije dike. Di hemî ecramê kaînatê de nifûz dike. Teniktir û letîftir e ji nûrê. Ji her tiştî nêztir e ku bibe tişkî rûḥî. Tentewî gotiye: “Li ser gotina feylesofên ‘esrî tişkî mewcûd e. Ne madde ye belkî made jê çêbûye.” Tê zanîn ji gotina wî di vir de û di hinek cîhên dî de ku esîr esle ji bo heyûlîya ku ḥukema ê pêşîn îsbat kiribûn. Lewra ewsafê ku ji maddeê re sabit kirine wek ewsafê heyûlayê ne. Lakîn Ustad Bedî‘uzzeman di “Lem‘e ya sihî” de gotiye: “Esîr maddesî maddîyûnlerî bû ẋedran zerrat maddesinden daha letîf ve eskî ḥukemanin saplandiẋi heyûla fîhrîstesînden daha kesîf, îxtîyarsiz, şû‘ursûz camîd bî maddedir Hinek ji ‘ulema ê ‘esrî înkara esîrê kirine gotine: “Tişkî ferezî ye yanî ḥeqîqet jê re tune.” Lê Ustad di “Lem‘aya duwazda” de îsbat kiriye bi delîlan.

Xatîme: İsbata cewherê ferd ji fewaîda ye. Ne ji zerûriyatê ‘eqaîda ye. Çewa ku ‘Elîyê Qarî gotiye. Wiharenge îbtala heyûla ne zirare ku heyûla hebe û ‘alem jê çê bûbe. Ancaẋ zirare ku bête gotin: “Heyûla qedîm e.” Çewa ku feylesofan gotine Ehlê sunnetê

[330] (Erd û asîman) bi hev ve zeliqandî bûn (wî) ew ji hev veqtandin (enbîya30)

[331] Hê ku ‘erşê wî li ser avê bû. (Hûd 7)

[332] İşaratul İcaz 110-111

şidandîne di îbtala wê de. Lewra ku hebûna wê bête qebûlkirin wê gelek muslumanê nezan zen bikin ku mezhebê feylesofan ḥeq e.Çi ku ferq nakin di navbeyna heyûla digel sifetê hudûsî ku mezhebê ehlê sunnetê ye û heyûla digel sifetê qedîmî mezhebê feylesofa ye.

Duruste di ‘eqil de ku Xudê Te‘ala ‘alemê ji cewherê ferd çê kiriye. Weya heyûla îcad kiribe û ‘alemê jê çê kiribe. Weya ji tune çê kiribe ne ji tişkî çewa ku gotiye: اِنَّمَا اَمْرُهُ اِذَا اَرَادَ شَيْئًا اَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ[333]

### 2.2.19. Beḥsa Loqmanê Ḥekîm Û İskender

46- Meke lec di Loqman û İskenderî, ji bo wan ne me’lûm e pêyẋemberî

Meke lec: Mucadela bi qireqir neke di beḥsa Loqmanê Ḥekîm û İskenderê Zulqerneyn de, yanî di îsbata pêyẋemberîya wan de. Lewra pêyẋemberîya wan nehatiye zanîn bi delîla qet‘î. Di qewlê seḥîḥ de. “Loqman” navê du ḥeb namdara ye.

Yek: Loqmanê Ḥekîmê meşhûr e. Murada me ew e. Eslê wî jî Yûnan e. Eseḥ ewe ku bavê wî Ba‘ûrê Kurê Naxûr e. Şîhab Gotiye: “Eseḥ ewe ku Loqman Xwarziyê Dawûd e. Ḥîkmeta xwe ji wî girtiye. Bi deh sala piştî paşatiya wî welidiye. Rengê wî reş bû bi sebeb reha pîrika wî. Ne ku ‘ebdekî Ḥebeşî weya Nûbî bû. Ḥîkmet li ser zimanê wî carî dibû. Lewra Xudê Te ‘ala ‘ilm û nefsa paqij dabûyê.

Hîkmet: We’za ku lefz û me’na wê tev delal in. Ḥîkmet di ‘urfa ‘alima de: “Tekmîlkirina nefsê ye bi kesba ‘ulûm û melkûta tam û dewama li ser ef‘alê qenc li gorî taqeta wî.” Yek ji ḥîkmeta Loqman eve ku aẋayê wî got: “Here pezkî ser jê ke. Du pariya jê bîne. Ku ji tevê xweştir bin.” Çu dil û ziman anî. Piştî çend roja got: “Pezkî ser jê ke du pariya ji tevê nexweştir bîne.” Dîsa dil û ziman anî û got: “Ku herdû qenc bin ji her tiştî qenctir in. Ku pîs bin ji her tiştî pîstir in”[334] Hatiye gotin: Ku loqman gotiye: Min xizmeta gelek pêyẋembera kiriye. Min heşt kelîme ji wan hilanîye:

1- Ḥifza dil di limêjê de.

2- Ḥifza gewrîyê di xwarinê de

3- Ḥifza çav di mala xelqê de.

---

[333] İrada wî bûyîna çi bixwaze, dibê: Bibe. Ew jî dbe. (Yasîn 82)

[334] Ebû Si‘ûd.

4- Ḥifza ziman di nav xelqêde.

5-6.Zikra du tişta: Xudê Te‘ala û mirin

7-8. Jibîrkirina du tişta: Qencîya meriv li xelqê û xerabîya xelqê li meriv[335]

Loqmanê dî: Kur’e ‘Ad e ku dibêjinê “Loqmanê Ekber.” Lewra Loqmanê Seẋîr jî heye. Me şuẋul pê nîne. Loqmanê Ekber di weqta Hûd de bû, İman anî bû. Wê demê ḥukum di destê wî û Xelcan de bû. Kes ji qewmê ‘Ad musluman nebû ji ẋeyrî Loqman û hinek ezbeta wî. Ẋela li qewm rabû, hinek ji wan hatin Mekkê bo du‘aya baranê. Loqman jî bi wan re bû. Du‘aya xwe kirin û zivirîn malê. Loqman ma di ḥeremê de neçû. Xudê Qewmê ‘Ad bir helakê. Loqman filitî xelas bû. Paşê ḥukum kete destê wî bû padîşah. Dibêjin hezar sal ‘umur kiriye. Lewra di ḥeremê de du‘a kir ku Xudê ‘umrê wî dirêj bike.

İskender: Navê du ḥeb namdara ye: İskenderê Kebîr ku beḥsa wî di Quranê de ye bi navê “Zulqerneyn” yanî xweyê du qiloça. Lewra milkê wî gihîştibû herdû qirnê rojê. Yanî şerq û ẋerbê erdê tev zeft kiribû. Ewe ku sedda meşhûr ava kiriye ji bo def‘a şerrê Yecûc û Macûca.

Ustad Bedî‘uzzeman gotiye: “Sedda Quranê sedda Çîn e. Bi pir fersaxa dirêj e. Di Muncidê de nivîsîye ku sedd hatiye avakirin ji bo def‘a hicuma Moẋol ji çîn bibe. 3000 km dirêje, 15 metre bilinde, 90 metre fire ye… Îlaaxirih.” Suretê wî resim kirî ye. Ustad gotiye: “Sedd ji bo emîntîya medenîya ji şerrê bedewîya ye. Erê qebîla Hûn û Qebîla Moẋola ji wan weḥşîya ne. Hinka gotine Yacûc û Macûc Moẋol û Mançûr in.”[336]

İsabe û Bîdaye ji İbnî ‘Esakîr neqil kirine ku dosteki Zulqerneyn ji melaîketa hebû navê wî Refaîl bû. Rojkî suḥbet kirin Zulqerneyn got: “Ez dixwazim ‘umir bikim da ku ta‘etê Xûda bi ḥeqqî bikim.” Refaîl got: “Ku tu wisa ḥes dikî di ‘erdê zulûmatê de kanîya ava ḥeyatê heye kî jê vexwe namre ḥeta ku du‘a mirinê neke.” Zulqerneyn duwazde hezar ‘esker hilanî û çû, ḥeta gihîşt terefê tarîstanê li nikqirnê rojê, li wir şeş hezar ‘esker neqand, du hezar gerand muqeddîme yanî peşkêş. Xizir gerand amirê wan, meşîyan newalekî kete pêşîya wan, Xizir hevalê xwe sekinand û çû kanî dît ku ava wê ji

335 Ruḥul-Beyan

336 Muhakemat

şîr sipîtir e ji hingiv şîrîntir e. Jê vexwar û desmêj girt û cilê xwe tê de şûşt. Zulqerneyn derbas bû kanî nedît.

Meşhûre ku zulqerneyn İskenderê Rûmî ye. Di weqta İbrahîm Xelîl de bû. Pir Ke’be tewaf kiriye di gel İsma‘îl. İbrahîm jê re du‘a kiriye. Xizir wezîrê wî bû. Hatiye gotin: Kurê xatiya wî bû. İbrahîm mizgîna paşatiyê dayê dema peyatî çû ḥecê û got: “Ez siwar nabim li bajarê ku Xelîl têde ye. Di navê wî de xîlafek qewîn heye. İskender bîn Fîlqûsê Rûmî, Weya Se’b bîn Zîmirasedê Ḥîmyerî, weya Mus’eb bîn ‘Ebdûllah Qeḥtanî.[337] weya Merzîban bîn Mudrîke, weya Ebû Kerb şems bîn ‘Ebîr bîn ‘Ubeyr bin Efreyqiş yê Ḥîmeyrî, Tubbe‘ê Yemenî pê îftîxar kiriye. Gotiye:

قَدْ كَانَذُو الْقَـرْنَيْنِ جَدِّيمُسـْلِمًامَلِـكًا عَلَا فِي الْاَرْضِ غَيْرَ مُفْنَـدِ

بَلَغَ الْـمَشَارِقَ وَ الْـمَغَارِبِيَبْتَغِيَاسـْبَابَ مُـلْكٍمِنْ كَـرِيمٍ سَيِّـدِ[338]

Di te’lîqatê de evê ku vê şi’rê gotiye Ebû Kerîbe ku Tubbe‘ê Yemenî ye. Di Xutbeya Qus bîn Se‘îde de يا معشر إِياد بن الصعب ذو القرنين، ملك الخافقين، وأذل الثقلين، وملك ألفين، ثم كان ذلك كلحظة عين[339] Îbnî Ḥaşim şi’ra ‘Aîşê gerande delil.

وَالصَّعْبُ ذُو الْقَرْنَيْنِ اَصْبَحَ ثَاوِيًا بِالْـجَثْوِ فِي جَـدَثٍ اَشَـمَّ مُقِيمًـا[340]

Tarîxa Muxteser dibêje: Zulqerneyn ku di Qur‘anê de ye Se’b bîn el Ḥaris er-Raîş e, çewa ku İbnî ‘Ebbas gotiye, ne İskenderê Rûmî ye. Ji vê xîlafê tê zanîn ku qewlê qewîn eve ku ji ‘Erebê Yemenê ye. Lefzê “Zulqerneyn” jî teqwîya vî qewlî dike. Lewra “Ezwa” ‘Erebê Yemenê ne. “Ezwa” wanê ku di serê navê wan de de lefzê “zu” heye wek “Zul-‘ezar, Zul Menar û ẋeyrî wan. Şêx Muḥyîddînê ‘Erebî jî ev qewl tercîḥ kiriye di muḥaderatê de. Tentawî jî îxtîyar kiriye. Ema ‘emrê wî geleka gotine hezar û şes sed sal e. Lê te ji gotina Qus zanî ku du hezar e.

Îskenderê Seẋîr: Yunanî ye. Kurê Fîlbîs e. Ji ewladê ‘Îs bîn İs’haq e. İskenderîye ava kiriye. Mulkê Fars sitendi ye. “Dara” Paşayê Faris kuştiye. Eristatalîs seydayê wî bû. Paşê bû wezîrê wî. ‘Emrê wî sî û şeş sal bû. Lê İbnî Xeldûn gotiye: “Çil û du sal

---

337 Bîdayet

338 Bê gûman bapîrê min “Zulqerneyn” qiralek musluman bû ku hukmê wî li ser erdê carî bû. Bi alîkariya zatek xwedî kerem hukumranîya şerq û ‘xerbê ket deste wî.

339 Tercüme

340 Se’bê (ku jê re dibêjin) Zulqerneyn, di koma axê de, di qebrekê de iqamet dike. (tercüme eksiktir)

bû.” Tarîxa Rûmî ji zemanê wîladeta wî, weya mirina wî, weya derketina wî ya ser bajara tê ḥesabkirin. Hinka gotiye: Tarîxa Rûmî ya “Sûlû ne.”

Gelek însana ‘i’tîqad kirine ku herdû İskender yek in. Alûsî yek ji wan e. İbnî Kesîr gotiye: “Ev xetakî mezin e. Lewra ê ewil mu’mînekî saliḥ bû. Wezîrê wî Xizir bû. Ê paşî wezîrê wî Eristetalisê feylesof bû. Di navbeyna wan de zêde yî du hezar sal heye. Lewra İskenderê biçûk berya milada ‘İsê bû mîqdarê sê hezar salî. Ev li ku ew li ku.” Payîtexta wî Meqedûnya bû ku li ẋerbê İstenbolê ye. Texmîna 15 roja jê dûr e. Çewa ku Ebû Si‘ud gotiye: “Meqedunya İro xerabe ye. Lakîn tê de ‘elamet hene didine zanîn ku di weqta avayîya wê de pir mezin û kamil bû. Paşayê wê qewîn û zor bû. Ez tê de buhurîm. Min asarê ‘ecêb dîtin ku di wan de ‘îbret hene.”

### 2.2.20. Melaiket Û Cin Û Şeytan

47- Melaîk şeyatîn û cinan wicûd, heye da nekî bûyîna wan ciḥûd

Wicûd: Wicûda van hersê cinsa sabite û muḥeqeqe bi ḥukmê ayet û ḥedîsên seḥî’h. ẋafil nebe da tu hebûna wan ciḥûd nekî. Yanî înkar nekî. Lewra înkara wan kufr e. İbnî Ḥecer di Fetewayî Ḥedîsîye de gotiye: “Mu’tezîlîyan ku înkara hebûna cina kirine kafir bûne. Lewra înkara wan muxalifê ayeta û ḥedîsan û îcma‘ê ye.” Û gotiye taîfekî înkara milyaketa kirine û gotine: “Ji ẋeyrî herdûwê ser milê însana milyaket nînin. Ew jî kafir in ji ber wê muxalefetê.” Qezwînî di ‘Ecaîbul Mexlûqatê de gotiye: “Qewmek ji Mu’tezîlîyan gotine: Cin û Şeytan, însanê xerabê xweyê ‘înad in. Tu nesîḥeta qebûl nakin. Li nik wan cin û şeytanê nedîtî nînin.” Şîhab di Şerḥa Şîfayê de[341] gotiye: “Pêşîyên Mu’tezîlîyan û feylesofan înkara melaîketa nakin. Dibêjin: Cewherên ruḥanîye ê ẋeyrî cismaniye sabitin. Navê wan danîne “eqûl.”[342] Ehlê şer‘ê navê wan danîne “melaîket.” İsbat kirine ku di ‘alemê de teserrûf dikin wihirenge cin jî.”

[341] 4/512

[342] Wergera kurtşerha muelîf a li vir wihareng e: Hinek fîlozofan bi aşîkarî beyan kirine ku melaîket ew nefsên felekî ne ku ûqûl-u ‘aşere û feleka tînin hereketê. İca li gorî bawerîya me melek du qism in. Qismekî wan ji masîwayê dûr in û ‘xerqî me’rîfeta Heq bûne. Bê sekn û hedan û ‘acizî bi şev û roj Xwedê Te‘ala tesbîh dikin. Ji vana re “İllyyûn û Muqerrebûn” tê gotin Qismek ji wan jî li gorî teqdîra qeza û nivîsa qelemê ji asîman bigre ta erdê temmamê îşa îdare dikin.Di tu emrî de bêemrîya Xwedê Te‘ala nakin. Bi çi hatibin emirkirin wî emrî bi cîh tînin. Qismekî vana “semawîye” qismekî jî “edîye” ne.(Ruhul-Me‘anî)

Şaranî ji şêxê xwe ‘Elî Xaras neqil kiriye ku temmamê melaîketa masûm in. Lewra ew aqilên soyûtên bê qewxa û şehwet in. Bîzzat îta‘et dikin û nizanin muxalefet çiye. İca melekên ‘erzî yên ku ber bi aşiman ve hilnakşên ne masûm in.Ji ber vê yeke ye ku İblîs ketiye wî halê malûm. Lewra ew ji wan melekan bû ku li alî rojhilat li kêleka Ekvatorê li Ceyl-î Yaqût niştecîh bûn. Cenneta Berzaha ku Adem jê hatiye avêtin li

Feylesofan û hinek mu’tezîlîyan înkar kirine melaîket û cin bi hawê ku ehlê kelamê te’rîf kirine ku cismên nûranî ne weya hewaî ne, li şeklan qadir in. Û gotine: “Cin erwaḥê beşerîye ê xerab in ji bedena derketine.” Yanî înkar nakin bi temamî çewa ku be’dekî wehm kiriye û gotiye muxalifê nessa ayet û ḥedîsîye.

Melaîk: Cem‘ê “melek e.” Eslê wê “melaîk e” Meqlûbê “me lek” e ji “elûketî” ye bi me’na rîsalat e. Melaîk cismên letîf in. Nûranî ne. Karin xwe têxin şiklê her mexlûqî. Lê nakevin şiklê xerab wek mar û mûra mesela. Feylesofan û hinek ehlê sunnetê wek İmamê Ẋezalî û Raẋib gotine: “Cewherên mucerred in ji madde ê.” Şîhab di şerḥa Şîfaê de [343] ev qewl îxtîyar kiriye. Lakîn Seydayê Mele Xelîl ḥukum kiriye ku murekkeb in ji ‘enasira. Ne besîtin lê madda nûranî di wan de bêhtir e. Çewa ku gotiye: “Enasir çar in ji wanin melaîk… ilx.”

Ustad Bedî‘uzzeman di Muḥakematê de gotiye: “Gotina wî zatê neqad yanî seydayê Mele Xelîl tesrîḥ dike bi redda ḥukema. Murada wî ne ewe ku îsbata çar ‘enasira ji eslê İslamîyetê ye çewa ku hinek nezanan fehm kirine. Lewra çarbûn û ‘unsûrîyet û besatet ji istilaḥê ḥukema û esasên ‘ulûmê tebî‘îye ne. ‘Elaqa wan bi usûlê İslamîye tune qet‘a.”

Şeyatîn: Cem‘a “şeytan e.” Ji “şate” ye yanî “heleke” yan ji “şetene” ye. Yanî “xalefe” ew “eb‘ede” ew “be‘ude.”

Şeyatîn: Cismên lettîf in, narîye ne, nayên dîtin. Ji ewaldê İblîs in. Cinsîyeta cin û şeytana yek e yan na xîlaf tê heye. İblîs ji melaîketa ye yan ji cina ye, mesele xîlafi ye. Ayeta كَانَ مِنَ الْجِنِّ[344] divê ku ji cina be. Lê kesên ku dibêjin ji melaîketa ye dibêjin: “Taîfekî ji melaîketa heye ji wan re dibêjin cin.” Û dibêjin: “Mesela îsmeta melaîketa xîlafî ye.” Lê ayet û asarên mezinan de’wa wan men’ dikin. Wiharenge de’wa wan ne sabite ku mezhebê hinek ehlê tesewûfê qebûl bikin bejin melaîketê ‘erdîye ne, me’sûm in, İblîs ji wan e.”[345] Lê di tefsîra sûretul Beqare de gotiye: “Cumhûrê Seḥabîyan û tabi‘îyan gotine: Ji melaîketa ye bi delîla zahirê îstîsnayê. Piştî ku bê emrî kir mesix bû,

vê derê ye. Ev cennet ew cennete ku nuha kesên ‘arif ne bi ceset lê bi ruh dikevinê. Hat fêmkirin ku melaîketên erdê jî wek cin û însanan mukellefê bi emr û nehya ne.Ji lew ecra emr û xweparastina ji nehyê digrin. Lê melaîketên asîman ji bil ecra pêkanîna emir tu ecrekî wan nîne. (Hamîşel-İbrîz R187)

[343] 1/464

[344] Ew (İblîs) ji cina bû. (Kehf 50)

[345] Rûḥul-Me‘anî 15/293

geriya cinnî.” Weya emê bejin kewna wî cinnî weya melek ne munafîyê hevin. Lewra new‘ê milyaketa heye ji wan re tê gotin “cin.” Emma ‘ismeta melaîketa ji gunehan ew ẋalibî ye. Emma melaîketan ku ji nûrê ne çewa ku ḥedîsa Muslîm dibêje, û îblîs ji agir e çewa ku nesa ayeta [346]خَلَقْتَنِي مِنْ نَارٍ وَخَلَقْتَهُ مِنْ طِينٍ ew jî ne zirar e. Lewra nar û nûr cinsê madda wan yek e. İxtilafa wan bi ‘ewarida ye. Zêdeyê wî qasî ḥedîsa Muslîm li ser ẋalibê ye. Yanî ẋalibê wan ji nûrê ne. Lewra di zahirê gelek esera de, hinek melaîke ji agir xuliqî ne û hinek ji berfê û hinek ji tişkî dî.

İblîs ku ‘isyan kir Xudê Te‘ala wî mesix kir bi sûretê qebîḥ. Bi xûre lîwat kir. Weya di hêtek wî zeker, di yekî de ferç hene cîma‘ê dike. Weya hêka dike dibin ferx ji bo tenasûlê. Sê qewlin di tensaula şeytan de. Eseḥê wan ê paşî ye. Çewa ku Xerpûtî di Şerḥa Burdeyê de gotiye.

Cinan: Cem’ û “cin” di nusxekî de “cennat” cem‘a cennetê ye. Di xulqîyeta wan de xîlaf heye. Cismên hewaî ne weya nûrî ne weya cewherê mucerred in. Yanî besît in. Li herdû qewlê pêşîn murekeb in. Yanî cuz ê ẋalib di wan de hewa ye yan agir e. Çewa ku melaîket ji her çara ne. Qismê pir di wan de nûr e. Çewa ku Alûsî zikir kiriye di sûretê Ḥîcr de. İbnî Ḥecer gotiye: “Qur’an û ḥedîs delalet dikin ku eslê cina agire.” Ayet [347]وَالْجَانَّ خَلَقْنَاهُ مِنْ قَبْلُ مِنْ نَارِ السَّمُومِ “Can” bavê cina ye. نار السموم bayê pir germ ku di kuje. Yan agirê bê dûxan. Ḥedîs: خُلِقَتِ الْمَلَائِكَةُ مِنْ نُورٍ وَخُلِقَ الْجَانُّ مِنْ مَارِجٍ مِنْ نَارٍ وَخُلِقَ آدَمُ مِمَّا وُصِفَ لَكُمْ[348] “Maric” pêtiya agire ji dûxanê safî ye, eslê cina ye çewa ku ax eslê însana ye. Melaîket ji ronîya wê xuliqî ne. Loma ḥelîm in, nerm in. Geleka gotine: Can îblîs e, cin û şeytan ji zurrîyeta wî ne. Cinsê teva yek e lakîn muxtelîf in. Mu’mînê wan hene, kafirê wan hene. Ji kafirê wan re tê gotin “şeytan.” Carna ḥerbê dikin. Li nikḥerba wan babîsok radibe lê hemî babîsok ne ḥerb in. Belkî ji hemberîya du bayan çê dibe dema li hev dikevin.

Gotine: Cin berya İblîs li erdê hebûn. Hinka gotine: “Cin” û “bin” bûn ku du qebîle ê wan in çewa ku Bidayet dibêj e. Dema ku bêemrîya Xudê kirin Xudê Te‘ala ‘eskerek ji milyaketa şande ser wan navê wan “cin” bû, wan tarûmar kirin. İblîs wê

[346] Te min ji agir wî ji axê xuliqand. (E’raf 12)

[347] Me cin jî berî(ya xulqa însan) ji agirekî (dijwar û şewitandox û) bê dûxan xuliqand. (ḥîcr 27.)

Gotina ku (cin cismê hewayê ne îḥtîmal ku ji vê ayetê bê. Lewra “semûm” bayê germ e.

[348] Melaîket ji nûrê, cin ji agirê bê duxan, Hz. Adem jî ji wî tiştê ku wesfê wî ji we re hat beyankirin hatin xuliqandin. (Ji Muslîm hatiye rîwayetkirin.)

demê zarok bû. Wan milyaketan wî girtin birin asîman, di nav wan de ma. Hinka gotine İblîs wê demê ser‘eskerê wan milyaketa bû. Navê wî ‘Ezazîl bû.

### 2.2.21. Rizq

48- Wekî yek in ev herdû bê şek temam, di rizqiyetê da ḥelal û ḥeram

Wekî yek in: Wek hev in. Yanî ḥelal û ḥeram di rizqbûnê de wek hev in. Çewa malê ḥelal rizq e. ‘Eynî wisa malê ḥeram jî rizq e. Ev redda Mu’tezîlîya ye ku dibêjin: “Malê ḥeram ne rizq e.”

Rizq: Li nik ehlê sunnetê tişkî ku Xudê Te‘ala sewq dike bi bal ruḥbera ve û menfî‘etê jê dibinin. Çi xwarin be, çi lixwekirin be, çi ẋeyrî wan.

Mu’tezîlîyan rizq bi du terza tefsir kirine:

Yek: Tiştê ku milkê meriv be, çi xweyê wî menfî‘etê jê bibine çi na. Ev gotin divê ku tiştê kole û ḥeywan dixwin ne rizqê wan be. Lewra ne milkê wan e.Hem divê ku rizqê Xudê Te‘ala hebe, lewra her tişt milkê wî ye digel ku ji milkê Xudê Te‘ala re nayê gotin rizq

Dido: Tiştê ku mani’ tune meriv jê menfi‘etê bibîne. Li ser herdû tefsîra jî lazim tê ku kesê malê wî ḥeram be Xudê Te‘ala rizq nadê. Em redda wan dikin bi ayeta وَمَا مِنْ دَابَّةٍ اِلَّا عَلَى اللّٰهِ رِزْقُهَا[349] delîla Mu’tezîlîyan wiha ye: “Ê ku rizqa teva dide her Xudê ye. Tiştê ku bête nîsbet bi bal Xudê ve nabe ḥeram be û xuroẋê wî musteḥeqê ‘ezab be. Ema xuroẋê ḥeramiyê musteḥeqê ‘ezab e. Lewra ḥeram nayê nîsbetdan bi bal Xudê Te‘ala ve. Ḥeram ne rizq e.” Em redda wan dikin, dibêjin: “Xuroẋê ḥeramiyê musteḥeqê ‘ezab e ku xebata wî pîs e. Lewra bi îxtîyara xwe di esbabê ḥeramîyê de xebitiye û guh nedaye esbabêḥelaliyê.”

“Gotina wan ku: “Heram nayê nîsbetdan bi bal Xudê Te‘ala, lewra qebîḥ e.” Em redda wan dikin dibêjin: “Qebaḥet di îcadkirinê de tune. Ancaẋ di kesbê de heye.”

### 2.2.22. Tefadula Esḥaban

49- Bibêjim te fedla seḥabê Resûl, bi can bike bawer bi dil ke qebûl

50- Ebûbekrê Siddîqê yarê şefîq, ewe sanîyesneyn di ẋarê refîq

[349] Hîç ruḥber nîne ku rizqê wî ‘aydê Xwedê Te’ala nebe.(Hûd )

51- Ji ewwel di fedlê seramed ew e, kerîm e û saḥib keramet ew e

Siddîq: Ev leqeb Pêyẋember (sellelllahû ‘eleyhî we sellem) lê danî. Lewra tesdîqa resûltîya wî û mî’raca wî kir bê tereddud. Çewa ku Teberî gotiye. Navê wî ‘Ebdûllah bîn ‘Usman ‘Ebû Quḥaf e.

Yarê şefîq: ‘Elametkî şefqeta wî eve: Wexta hîcretê bi şev digel Pêyẋember (sellelllahû ‘eleyhî we sellem) derket ji Mekkê, çûn devê şikefta Çiyayê Sewr, Ebû Bekr berê çû hundur, destê xwe peland, çiqas qulikek di şikeftê de dît zûlikek ji cilê xwe kir û xistê, ḥetta cilê wî qediyan, qulekî tenê ma nigê xwe tê de danî. Gazî Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) kir got: “Were min şikeft ‘ediland.” Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem ) serê xwe danî dawa wî û raza. Marekî bi nigê wî veda. Tevnegerîya lê ji ber êşa wî giriya, hêstirê çavê wî bi ser wechê Pêyẋember de (sellelllahû ‘eleyhî we sellem)hatin xwar, şiyar bû got: “Çibû bi te?”Got: “Mar bi nigê min veda.” Pêyẋember nigê wî mesiḥ kir weya tuka xwe tê da riḥet bû.

Sanîyesneyn di ẋarê: Ê ku yek ji herdûwa ye. Di şikeftê de Ebû Bekre (rediyellahû ‘enhû), bi mucîbê vê ayeta kerîme فَقَدْ نَصَرَهُ اللّٰهُ اِذْ اَخْرَجَهُ الَّذِينَ كَفَرُوا ثَانِيَ اثْنَيْنِ اِذْ هُمَا فِي الْغَارِ اِذْ يَقُولُ لِصَاحِبِهِ لَا تَحْزَنْ اِنَّ اللّٰهَ مَعَنَا[350] yanî Xudê Te‘ala alîkarîya Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) kir dema ku kafiran bûne sebebê derketina wî di ḥaletê ku yek bû ji duduwan. Dema ku herdû di şikeftê de bûn, dema ji hevalê xwe re got: “Meḥzûn nebe Xudê Te‘ala bi me re ye.” Yanî alîkarîya Xudê û muḥafeza wî bi me re ye. Rîwayet bûye ku kafiran li dora şikeftê geriyan, çav bi wan neketin. Ebû Bekir got: Eger wana di vir de werin emê di vir de herin. Ebû Bekr nihêrî ku şikeft ji alî dî ve vebû beḥrek pêveye. Gemîyek li kenarê beḥrê sekinîye.[351]

Ser amed: Pêşketin. Yanî Ebû Bekr di fezl û keremê de ji her efradê ummetê pêştir e. Ji ẋeyrî enbîya ji her însanî efdaltir e. Ḥedîsa seḥîḥ dibêje: Roj derneketiye û neçûye ava li ser kesekî çêtir ji Ebû Bekir ji ẋeyrî Pêyẋember. Murad bi lefzê أَتْقَى di ayeta وَسَيَجَنَّبُهَا الْاَتْقَى[352] de Ebû Bekr e. Yanî teqwatirê ummetê ye. Lewra malê xwe tev di riya Xudê Te‘ala de serf kir di gel ku serekê tucara bû. Tiştek ji xwe re nehişt. Pêy

[350] Bê gûman Allah Te‘ala alîkarîya wî kiribû, dema ku ew ji duduya yek bû û kafira ew (herdû ji Mekkê derxistibûn û) ew di şikeftê de bûn û wî (ji hevalê xwe re) digot: Meḥzûn nebe birastî Ellah Te‘ala digel me ye,(Tewbe: 40)

[351] Rûḥul-Beyan

[352] Ê mutteqîtir dê ji wî (agirî) bê bi durxistin.(Leyl: 17)

ẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) got: “Te çi ji ehlê xwe re hişt ?” Got:“Min Xudê û Resûlê Xudê ji wan re hişt.”[353]

52- Li pey wî bi ḥeq ‘Umerê dînpenah, bi fetḥê di wî şa ne xwendkar û şah

53- Xîlafet kemer bû mecala wî best, ji ḥukmê wî pişta muxalif şikest

Li pey wî bi ḥeq: Yanî piştî Ebû Bekr ê ku ji ummetê tevê efdeltir e ‘Umer e.

Dîn penah: Muḥafizê dîn, Lewra Îslamîyet pê qewîn bû dema ku musluman bû. Hem dema ku bû emîrul mu’mînîn, çewa ku di nezmê de ye. Emma qewîna İslamê bi muslumanîya wî, lewra berya wî esḥaba bi dizî limêj dikirin, piştî ku musluman bû eşkere limêj kirin. Ew ket sefekî, Ḥemze ket sefa dî İslamîyet xalib geriya. Kafir keribîn bi ḥesretek pir. Lewra nema karibûn têkilî esḥaba bibin bi ziyanî. Hem şeytan ji wir reviya, çewa ku ḥedîsa seḥîḥ dibêje.

Şa ne: Kêfxweşin

Xwendekar: Reîs

Şah: Padîşah, lewra li ser kafiran fexrê dikin bi firehkirina dewleta İslamê û fetiḥkirina bajarê mezin. Di zanin ê ku kelehên ‘asê û bajarê zor sitendiye ‘Umer e.

Muxalif: Yanî kafiran. Pişta wan şikest yanî quweta wan ze‘îf bû. Rê li wan teng bû. Ji ber ku eraziyên fireh û bajarên pir ji destê wan derketin ku Misr û Lubnan û Sûrîye û ‘İraq û qismek jî Tirkiye û İranê.

54- Li pey wî ye ‘Usman bi ḥeqqê ḥekîm, di ‘ilmê ‘elîm û di ḥilmê ḥelîm

55- Ji Kerrarî efdaltir e bê gûman , ev e î’tiqada me der ḥeqqê wan

Lipey wî ye ‘Usman: Yanî piştî ‘Umer di fedl û qenciyê de ‘Usman zun-Nûreyn e. Ji hemî Es ḥaba qenctir e ji ẋeyrî Ebû Bekr û ‘Umer.

Zun-Nûreyn: Yanî xweyê du nûra. Lewra du qîzê pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) nîkaḥ kiribû. Ewela Rûqiye, ew wefat bû, paşê Ummû Gulsum, ew jî wefat bû, Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) got: “Usman bi zewicînin. Eger li nikmin ya sisiya hebûna minê wî bi zewicanda. Min wî ne zewicandiye îlla bo ḥeya ji cem

[353] Sîretû Zeynî Deḥlan û Şerḥûl-Hemzîye Lî İbnî ḥecer

Xudê Te‘ala.” Çewa ku Teberanî rîwayet kiriye. Di kitêbê siyerê da: “Kesî du qîzê Pêy ẋember nîkaḥ nekiriye ji ẋeyrî ‘Usman.”

Bi ḥeqqê ḥekîm: Bi wê ḥeqîya ku Xudayê ḥekîm îzhar kiriye.

Di ‘ilmê ‘elîm: Di sifetê ‘ilmê de pir ‘alimekî mahir bû. Bi delîla ku tertîba Qur‘anê wî danîye. Berya wî jî geleka tertîb kiribûn. Piştî ku wî ya xwe deranî ê wan tev da şewitandin. Temmamê ‘alema İslamê qebûl kirin ku esḥab tev muctehîd in. Lewra dema ku tertîb kir temmamê seḥabîya li ser da civandin ji bo ẋeletî nekevê.

Di ḥilmê ḥelîm: Di exlaqê xweş û nerm de ji herkesi zêde bû hingî ḥeya wî pir bû. Ebû Ne‘îm rîwayet kiriye ku Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) gotiye: “Usman ḥeya wî bêhtir e ji ḥeya hemî ummetê.” Emma Eḥmed û Muslîm rîwayet kirine ku Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) gotiye: “Qey ez ḥeya nakim ji zilamekî ku melaîket jê ḥeya dikin.” İbnû ‘Esakîr rîwayet kiriye ku du xeslet di ‘Usman de hebûn di Ebû Bekr û ‘Umer de radîyellahû ‘enhûma tune bûn.

Yek: Sebir kir ḥeta hat kuştin zulmen

Dudu: İnsan civand ji bo tertîba Qur‘anê.[354] Yek ji ḥilma pir bû. Yek ji ‘ilmê pir bû.

Kerrar: Hucûmker. Ku ‘Elî ye. Keremellahû Wechehû. Lewra daîma hicûm dikir ser kafiran. Tu car bi paş nediket. Ne di tengî û ne di firehîyê de. Yanî di î’tiqada me ehlê sunnetê de ‘Usman ji ‘Elî efdaltir e bê şubhe.[355] Ebû Bekr û ‘Umer jî ji wan efdaltir in.

---

[354] Zeynî Deḥlan

[355] Eḥmed Hîlmî li vir bi zimanê ‘Erebî kurteşerhek nivîsîye. Wergera wê wihareng e: Selefê s salihînê ‘esra sêyemîn û yên dî ewil li ser efadlîyeta hezretî Ebûbekir, paşê li ser a hezretî ‘Umer, paşê li ser a hezretî Osman paşê jî li ser a hezretî ‘Elî îttîfaq kirine. Hedîsê sehîhê ku bi aşîkarî delaletî vê yeke dikin wek delil nişan dane. Lê şîîyan bi qebûlikirina serdestiya hezretî ‘Elî a li ser wan hersiya muxalefeta wan kirine û di vî warî de hedîsên ku delaleta wan aşîkar nîne wek delil nişan dane. Gavekî dî jî bi pêşve çûne û gotine: “ Ji sehabîyan kesê ku herî bêtir di şibhe hezretî pêxember, kesê en ‘alim, kesê en cesur hezretî ‘Elî ye. Ji lew xelîfe ew e, mezhebê wî heq e. Eshab bi zullmkirina li wî tawanbar kirine. İbnî Xuzeyfe û Sufyanê Sewrî û hinek kesên ji ehlê Sunnnetê jî efdalîyeta hezretî Elî a li ser Hezretî Osman qebûl kirine. Çewa ku di Nebrasê de hatiye gotin kesên wek İmam Malîk û İmamul-Heremeyn jî di vî warî de xeber nedane. Aha ev di şerhul-‘Eqaîdê de wechê terdîda peyva Se’d e. Se’d wiha dibê: “ Ji ber ku efdalîyeta Şeyxeyna û muḥebbeta herdû zava wek ‘elametên ehlê sunnet û welcema‘etê tên zanîn Selefa di efdalîyeta Hezretî Osman a li ser Hezretî ‘Elî de sikût kirine. Eger mebest ji efdalîyetê pirbûna sewaba be însaf di tewaqqufê (sikût û nexeberdan) de ye. Eger mebest ji efdalîyetê pirbûna wan wesfên ku ehlê aqil dibêjin be tewaqqûf ne dudurust e.”Di Nebrasê de tê gotin ku “heqîqeten fazîletên hezretî ‘elî pir in. ‘İlim, camêrî, kemalata cîhadê, îçtîhada di ta‘etê de, belaxeta di we’zê de, hem di halê mayînêde hem di seferê

56- Di pey wan ‘Elî saḥibê Zulfîqar, siwarê li duldul şehê namîdar

57- Tefewwûq li ser yê di mayî heye, bi me’na birayê Resûlê me ye

Saḥibê Zulfîqar: Xweyê şûrê kû navê wî “zulfîqar” e. Zulfîqar: Şûrê bi feqr e. Lewra “fîqar” cem‘a “fiqretê” ye bi me’na “Zulfeqar” yanî “xweyê movik.” Lewra tê de wek movikê piştê hebûn. Dibêjin: Ḥesinek ji bin erdê derxistiye ji ber Ke’bê, Zulfîqr jê çê kiriye. Gelka gotine: Zulfîqar şûrê Munebbîh bîn Ḥeccacê Sehmî bû. Di Ḥerba Bedrê de bi kurê wî ‘As re bû. ‘Elî wi kuşt û şûrê wî anî da Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem.)

Di rîwayetkî de heye ku Belqîs ḥeft şûr hediye dane Suleyman. Yek ji wan Zulfîqar e. Paşê gihîşte ‘As bîn Munebbîh. Hinka gotine: Di rîwayetkî de jî heye ku ‘Elî gotiye: Cebraîl gotiye ji Pêyẋember re (selellaahû ‘eleyhî we sellem) li Yemenê senemek heye, hesin lê hatiye alandin. Yekî bişîne bira senem hûr ke û hesinê wî bîne. Pêy ẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) min şand. Ez çûm min wî senemi hûr kir û hesin anî. Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) du şûr jê çê kirin. Navê yekî danî “Zulfîqar” yekî jî “Mexzem.” Zulfîqar ji xwe re hişt Mexzem da min. Paşê Zulfîqar jî da min. Dema ku dî ez ḥerbê pê dikim, roja Uḥudê got: لَا سَيْفَ إِلَّا ذُوالْفِقَارْ, وَلَا فَتَى إِلَّا عَلِي[356] Hinka gotine: Ev beyta İbnî Ebî Behîce ye. Di ḥerba Ûḥûdê de gotiye:

**لَاسَـيْفَ إِلَّا ذُوالْفِـقَـارْ وَ لَا فَـــتَـــى إِلَّا عَـــلِـي**

**فَـإِذَا نَـدَبْـتُـمْ هَـالِـكًـاًفَـابْـكُوا الْـوَلِيَّابْـنَ الْـوَلِـي**[357]

Duldul: Hêstirek sipî bû. Padîşahê Misrê ji pêy ẋember re (selellaahû ‘eleyhî we sellem) şandibû. Ewwelê hêstira ku Musluman lê siwar bûne ew e. ‘Umur kir ḥeta

---

de pir mayîna li cem hezretî pêxember, pirbûna menqibeyên di derheqê hedîseyên wî de, peydabûna terîqetê tesewûfî a ji wî û… hwd.

Xewsê ‘Ezem di Mîhnetê de wiha dibê: “Eger ewlîya û şuhûdên wan tenê bimana ji temmamê eshaban bi tenê hezretî ‘Elî di pejirandin. Lewra îmdada ku ji wî didîtin ji kesekî din nedidîtin. Lakîn ji ber ku nesla esra yekemin di efdalîyeta hersê Xelîfeyan de îtîfaq kirine wan jî wisa qebûl kiriye. Wek ezretî ‘Elî di hewara wan de nehatibin jî wan jî fêmkirin ku hersê xelîfe efdaltirin.

Di Nebrasê de wiha tê gotin. “ Di vî meqamî de ya herî rast ew îqar e ku efdalîyet li ser pirbûna sewab e. Ne ew tiştin ku ehlê aqil ji fezîleta ḥesibandine. Lê Se’d di vî warî de musamahe nişan daye û peyva wî nigê wî şemitandîye. Heta me seh kiriye ku şîî peyva wî wek delil nişan didin, ji telebeyê ‘ilm jî hinek kes xwe bi wî ve girê didin.” Ji ber tiştên wihareng hinek kesa ew bi rafizîtîyê tewanbar kirine.Nebras dibê ku “Lazime ‘ulema ehmmîyetê bidin mewzûbehsa efadliyetê.”“Yanî ne bi awayê ji rêderketinê belkî bi awayê însafê

[356] Ji bil zulfîqarê şûr, ji bil ‘elî mêrxwas nîne

[357] Tu birayê mine dunya û axretê yî. (Nurul Ebser)

diranê wê ketin û kor bû. Jê re ce hûr dikirin. ‘Elî lê siwar dibû bi xariciya re ḥerb dikir. Paşê Ḥesen lê siwar bû, paşê Ḥuseyn, paşê Muḥemmed Ḥenefî, yekî tîrek berdaê kuşt.

Tefewwûq: Bilindaya ‘Elî (keremellahû wechehû) bi me’na birayê Resûlê me ye. Yan tefewwûqa ‘Elî li ser seḥabeyê mayî ewe me’na ku ‘Elî birayê Pêyẋember e (sellelllahû ‘eleyhî we sellem.) Yanî me’na ku ‘Elî bûye birayê Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) çewa ku di ḥedîsa de hatiye eve ku yanî ji hemî esḥabeên mayî efdeltir e piştî hersê xelîfa. Wan ḥedîsên ku dibêjin : ‘Elî (keremellahû wechehû) bûye birayê Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) delalet nakin ku ‘Elî ji hemî seḥabîyan digel hersê xelîfeyan efdeltir e. Bi vê beyanê hate zanîn ku hemî ḥedîsê di menaqibê ‘Elî de keremellahû wechehû hatine wiha têne me’nakirin. Mu’temedê şî‘îyan rizandî ye. De’wa wan sade ‘esebîyet e ku loma tefdîla ‘Elî li ser hersê xelîfeyan dikin.

ḥedîsên ku ji biratîyê xeber didin evin, digel beyana sebebê û redda wan:

Dema ku Muslumanê Mekkeyê hîcret kirin çûne Medînê bûne mihacir, ehlê Medînê jî ku alîkarîya Pêyẋember û muhacira kirin bûne ensarî. Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) emir kir ku her yek ji mihacira û yek ji ensarîya bira destê biratîyê bihevdin û bibin birayê hevê axretê. Da ku ‘eleqa wan bi hev zêde bibe ku pir ji hev ḥes bikin. ‘Elî hat çavê wî hêstir dikirin got: “Ya Resûlûllah te biratî xiste nav seḥaba teva û nexiste nav min û kesî.” Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) got: أَنْتَ أَخِي فِي الدُّنْيَا وَالْآخِرَةِ[358] Bi vêḥedîsê ‘Elî ji esḥaba teva qetiya. Hem bi vê ḥedîsê jî vediqete ku Pêyẋember û esḥaba çûne ẋezwekî, ‘Elî hiştin got: Ya Resûlellah te min kir xelîfe digel jina û zaroka. Pêyẋember got: أَمَا تَرْضَى أَنْ تَكُونَ مِنِّي بِمَنْزِلَةِ هَارُونَ مِنْ مُوسَى إِلَّا أَنَّهُ لَا نُبُوَّةَ بَعْدِي[359] Yanî tu birayê minî. Eger piştî min pêyẋember hebûwa tê bibûna pêyẋember çewa ku Harûn birayê Mûsa bû (‘eleyhîm es-elam) û bû pêyẋember.

### 2.2.22.1. Neseb Û Jiyana Her Çar Xelifeyan

Ebûbekir bîn Quḥafe bîn ‘Amr bîn Ke’b bîn Esed bîn Teym bîn Murre bîn Ke’b. Murre bavê ḥeftaa ye ji pêyẋember re (selellaahû ‘eleyhî we sellem) ‘Emrê wî 63 sal e. Wefata wî sala 13 h, 23 Cemad îl-axir, bi axiwîna birîna ku mar pê veda bû.

[358] Tirmîzî, Taberanî, ḥakem Mustedrek

[359] Gelo ma tu naxwazî ku cîhê te ê li nêk min wek cîhê Harûn ê li nêk Mûsa be. Bes (ferq ewe ku) nubuwet bi min re xetim bûye. (Muslîm, Tîrmîzî)

‘Umer bîn Xettab bîn Nufeyl, bîn ‘Edîy, bîn ‘Ebd ul-‘Uzza, bîn Rubaḥ, bîn ‘Ebdûllah, bîn Qert, bîn Rezaḥ, bîn ‘Edîy bîn Ke’b ku bavê heşta ye ji pêyẋember ra (selellaahû ‘eleyhî we sellem) ‘Emrê wî 63 sale. Ebû Lu’lue ê kafir wî kuşt bi xencera jeḥrkiri, di ser limêja sibê da, 26ê Zîlhîcce sene 23 h.

‘Usman bîn Xettab bîn ‘Effan bîn Eb îl-‘As bîn Umeyye bîn ‘Ebdu ş-Şems bîn ‘Ebd ul-Menaf ku kalê kalê pêyẋember e (selellaahû ‘eleyhî we sellem.) Hatiye kuştin di 7 yan 8 ê Zîlhîcce sene 35 hîcrî ye. ‘Emrê wî 80 yan 87 yan 88 yan not sal e. Di Be’qî’ê de medfûn e. Lê qebra wî xefî ye.

‘Elî bîn Ebî Talib bîn ‘Ebd ul-Muttelib. ‘Emrê wî 65 yan 63 sal e. İbnî Mu’ucemê xaricî wî kuşt di deriyê camiya Kufeyê de, bi şûrê jeḥrkirî li ferqa serê wî da, weqtê fecrê, meha Remezanê sene 40ê h. Qebra wî xefî ye lê dibêjin li Necefê ye. Mudde ê xîlafeta wan di s. 17 ji Nehcul Enamê de ye.[360]

**2.2.23. Şefa‘Et**

58- Şefa‘et dikin enbîya, ewlîya, bi îzna Xudê bo kesê eşqîya

Şefa‘et: di luẋet de: Wesîle û telbe ye. Wesîle: Kirina ‘emelkî ye ku meriv pê nêzî Xudê Te‘ala dibe. Şefa‘et di ‘urfê de: Bi me’na xwestina xêrê ye ji xelqê re.

Enbîya, ewlî ya: Murad bi ewlîya kesê saliḥ e. Melaîke jî daxilin. Çiqas kesê qenc û saliḥ hebe wê di qiyametê de şefa‘et bike ji bo wan gunehkarê ku pê ve ‘eleqedar dibû di dunyayê de. Ḥeta ḥeywan jî şefa‘et dikin ji wî kesî re ku qencî bi wan kiriye. Çewa ku ‘Ellame En Newbî gotiye.

Bi îzna Xudê: Ḥeta ku Xudê Te’ala şefa’et û mehderê nede van kesan mehder tune. Derê îznê ancaẋ Muḥemmed Mustefa (selellaahû ‘eleyhî we sellem) ve dike.

Bo kesê eşqiya: Murad bi eşqiya di vir de ne kafir in. Lewra şefa‘et û mehder ji wan re tune. Çi ku bê feyde ye. Çewa ku Xudê Te‘la gotiye:

[360]Tefsîlata vê babeta ku seyda nîvcû hiştiye û hewaleyê nehcul enamê kiriye di şerha nehcul enamê de wihareng e: Si (30) salî xelîfetî kirine û buhurandine. Murad bi xelîfetîya wan eve ku ketine cîhê Pêy‘xember (s.a.w.s.)di hemî mesleḥetên Muslumanan de. Xelîfetîya EbûBekir 2 sal û 3 meh û 10 roj bû. Ya ‘Umer 10 sal ûmeh û 8 roj bû, ya ‘Usman 11 sal û 11 meh û 9 rpj bû, ya ‘Elî 4 sal û 9 meh û 7 roj bû. Yekûn 29 sal û 6 meh û 4 roj in. Çewa ku İmamê Sûyûtî beyan kiriye. (Tuhfetul Murîd 1001.) Sî sal temam nebû îlla bi Muddetê Xelîfetîya ḥesen bîn ‘Elî. Muddê xelîfetîya ḥesen bî ‘Elî 6 meh bû. Ne gihîştibû hefta. Bi vê beyanê mu’cîza Pêy‘xeber ‘eyan û xwîya ye. Lewra gotiye: «الخلافة بعدي في أمتي ثلاثون سنة ثم يكون ملكا» رواه أحمد والترمذي وصححاه.(Camî’us-Se ‘xîr) “yanî xelîfetîya ḥeq piştî min di nav ummeta min de sî sal e. Paşê wê ew xelîfetî bibe melîk. Yanî wê bibe paşatî”(Rehebrê ‘Ewam Şerḥa Nehcul Enam)

فَمَا تَنْفَعُهُمْ شَفَاعَةُ الشَّافِعِين[361]

مَالِلظَّالِمِينَ مِنْ حَمِيمٍ وَلَا شَفِيعٍ يُطَاعُ[362]

Ev beyt redda mu’tezîlîyan dike ku înkara şefa‘etê dikin dibêjin: “Faîde tê de tune. Lewra gunehê kebaîr ‘efû nabin bê tobe di dinê de.” Delîla wan van ayeta ne û ayeta وَاتَّقُوا يَوْمًا لَا تَجْزِي نَفْسٌ عَنْ نَفْسٍ شَيْئًا وَلَا يُقْبَلُ مِنْهَا شَفَاعَةٌ[363] ehlê sunetê dibêjin: “Van ayeta xasin bi kafira ve.” Belkî van ayeta ku herdû ayetên pêşî ne îsbata şefa‘etê ji mu’mîna re dikin. Lewra nefya hukmê ji hinek kesa dixwaze îsbata wê ji ẋeyrî wan re. Hem îsbata şefa‘etê tê kirin bi ayeta وَاسْتَغْفِرْ لِذَنْبِكَ وَلِلْمُؤْمِنِينَ وَالْـمُؤْمِنَاتِ[364] û hem bi hedîsa شَفَاعَتِي لِأَهْلِ الْأَكَابِرِ مِنْ أُمَّتِي[365] û ḥedîsa يَشْفَعُ يَوْمَ الْقِيٰمَةِ ثَلَاثَةٌ: اَلْأَنْبِيَاءُ ثُمَّ الْعُلَمَاءُ ثُمَّ الشُّهَدَاءُ[366] û ẋeyrî vana.’Hedîs di babê şefa‘etê de pir in. Me’nayê wan pir in.

### 2.2.24. Tesira Du‘ayan

59- Di ẋeyb û ḥuzûrê du‘ayan eser, dibêtin ji bo ra eya ba xeber

Ba xeber: Kesê ku xebera wî ji tişta heye, ‘eqilmend e, ḥeqîyê qebûl dike. Yanî ji du‘ayan re te’sir heye. Qebûl dibin çi meriv ji ḥazira re dua bike çi ẋaîba re, çi saẋ çi mirî. Di vê meselê de xîlafa Mu’tezîliya heye ku înakara te’sîra du‘ayê dikin.

Li nik ehlê sunnetê du‘a qebûl dibin bi şertê ku adabê du‘ayê li cîh bin. İmamê ẋezalî deh adab zikir kiriye.

1- Weqta muşerref, wek nîvê şevê w berya şeveqê w roja ‘îdê w roja Cum‘ê w meha Remezanê

2- Di ḥalê muşerref de, wek ḥalê ḥerbê w rabûna limêjê w piştî wê û ḥalê secde w fitirînê w çûna camîyê w navbeyna azan û qametê w ḥalê tengbûna dil bi zikr û ẋeyrî wê

---

[361] İdî şefe‘eta şefa‘etkiroxa hew fêde didit wan. (Muddesir 48)

[362] Bo zalima ne şefa‘etkarek ne jî hamîyek heye. (‘Xafir 18)

[363] Ji rojekî wisa bitirsin ku di wê rojê de tu kes nikare diber kesî de tiştek bide. Ji tu keksî şefa‘et jî nayê qebûlkirin. (Beqere 48)

[364] Ji bo gunehên xwe û (gunehê) mu’mînên mêr û jin îstî’xfar bike.(Muhammed 19)

[365] Şefa ‘eta min bo wan kesên ji ummeta mine ku gunehê mezin dikin. (Ebû dawûd. Tîrmîzî, Beyḥeqî. Seḥîh e)

[366] Di roja qiyametê de sê qisim kes şefa‘et dikin: Enbîya, paşê ‘ulema, paşê jî şehîd. (İbnî Mace 4313, Beyḥeqî Şe’bul İman)

3- Berê xwe bide qiblê, destê xwe bide berhev, billind ke, paşê di ser çavê xwe bide.

4- Bi zelîlî û feqîrî, ne bi sec' û kelamê fesîḥ

5- Bi dengê xefî ne bilind

6- Bi zarîn û îştîyaq û îḥtîyacîya pir di gel xewf û tirsa dil

7- Yeqîna qebûlê. Bira zen neke ku du'ayê wî qebûl nabe ji ber ku gunehkar e. Lewra Xudê Te 'ala du'a İblîs qebûl kir ku wî saẋ hişt. Ayeta أُدْعُونِي أَسْتَجِبْ لَكُمْ[367] ne xase bi saliḥan ve. İbnî 'Eta di serê Ḥîkemê de gotye: من علامة الاعتماد على العمل، نقصان الرجاء عند وجود الزلل[368]

8- İl'ha'h û israr: Bêwe ku sê cara weya bêhtir tekrar bike. Û bira 'ecele neke. يُسْتَجَابُ لِأَحَدِكُمْ مَالَمْ يُعَجِّلْ؛ يَقُولُ دَعَوْتُ فَلَمْ يُسْتَجَبْ لِي[369] yekî ji mezina gotiye: "Ev bist sale ku ez du'a dikim daku ez malaye'nî bi terkinim hê qebûl nebûye. Lê hêviya min heye ku qebul bibe." Egre du'a bi paş ket bêje الحمد لله على كل حال[370]

9- Berî du'a zikir bike. Bi desmêj beje سُبْحَانَ رَبِّيَ الْعَلِيِّ الْأَعْلَى الْوَهَّابْ[371] selewata bide di serê du'a û paşîya wê de.

10- Ev adabê deha eslê qebûla du'a ye û ruknê wê ye. 'İbaret e ji sê tişta

Yek: İxlasa tam e ku bi qelb û ruḥê xwe berê xwe bide Xudê Te'ala. 'Eleqa xwe ji hemî şuẋlê dinyewî bibire. Lewra ku qelb ẋafil be du'a qebûl nabe çewa ku ḥedîsa Tîrmîzî dibêje.

Dudu: Paqijkirina bedenê bi malê ḥelal û toba ji hemî guneha. Kesê ku tişkî wî ḥeram be toba wî na qebûl e çewa ku ḥedîsa Muslîm dibêje. Hem paqijkirina ji kibr û ḥesed û ẋeyrî wan ji gunehan. Ke'bul 'Ehbar gotiye: "Nebî Mûsa di gel qewmê xwe sê car çûne du'a baranê. Nehat. Lewra yekî fesad di wan de hebû. Piştî ku tobe kir hê hat."

[367] Du'a bikin da ez îcabet bikim. ('Xafîr 60)

[368] Dema însan xeta kir û pê re di recaê de, yani di du'aê de noqsanî kir, viya 'elamet e ku ew kes bi 'emelê xwe î'tîmad dike.

[369] Ji ber ku wergera vê îbarê di nav metnê orjînal de ji teref muellîf ve hatiye kirin. Me ev îbare wernegerand.(c)

[370] Di her ḥal û karî de jî hemd Xwedê Te'ala re ye.

[371] Rebbê min ê ku herî mestir, bilindtir e û pir dide ji her nuqsaniya pak û paqij e.

Sisê: Zivirandina ḥeq. Her kesê niḥeqî û te’de li kê kiribe, bi çi terzî, bira here balê, çewa emrê wî bike bira wisa bike, yan lê ḥelal bike. Sufyanus-Sewrî gotiye: “Ḥefta sala li benî İsraîl bû ẋela, çiqas zarî û du ‘a dikirin jî ne di qelibî. Xudê Te ‘ala got: Ḥeta hun heqê hev eda nekin û te’deya xwe ne terkînîn ez reḥmê li we nakim. Wisa kirin Xudê Te‘ala baran da wan. Yekî tobe kir, bi mal û canê xwe xebîtî ḥeta ku ḥeqqê herkesi ji situyê xwe deranî. Malê wî qediya du zêrê yekî Yehûdî lê ma. Çû balê got: Min tobe kiriye min ḥeqqê herkesi eda kiriye. Ma ye du zêrê te di sutuyê min de. Ka te çewa divê ez wisa bikim. Cihû got: Here filan derê bi kole du zêrê min tê de ne. Ez li te ḥelal bikim. Çû kola du zêr dîtin anî dayê. Cihû got: Toba te qebûl bûye. Lewra zêrê min di wir de tunebûn. Min tecrûba te kir. Tewrat dibêje: Kesê ji dil tobe bike berê xwe bide Xudê Te‘ala ax di deste wî de dibe zêr.”

Cewaba du‘a û qebûla wan ne yek in. Dema ‘ebd dibêje “ya Reb! “ Xudê Te‘ala dibêje: “Lebê ya ‘ebdê min.” Lewra Xudê Te‘ala we’de daye ku cewaba du‘ayê dide bê şek û şubhe. Ema qebûla du‘ayê bi me’na dayîna mûrada meriv, ew carna derḥal dibe, carna piştî zemankî ye. Carna dimîne axretê. Carna bi hawakî dî qencî dike. Weya belayê def’dike. Ne bi hawayê ku meriv dixwaze. Lewra Xudê Te‘ala çêtir zane. Çewa ku ḥedîs dibêj e.[372]

Di ḥedîsa Beyḥeqî de: Du‘ayê sê kesa mu ḥeqqeq qebûl dibin: Ḥakimê ‘adil, kesê bi rojî, Kesê mezlûm gerçi fasiq be, belkî ger kafir be, çewa ku ḥedîsa İmamê Ḥenbelî dibêje. Yekî file nifirîn li qazîkî kir ku zulm lê kiribû. Xudê Te‘ala wî qazîyî mesix kir. Gerand kevir.[373]

Tu bizan: Ev beyt qediya muhmele ye[374], di quwwa mûceba cuzî’yye[375] de ye. Yanî gerçê hinek du‘a qebûl dibin hinek jî qebûl nabin, dema muxalifê qeza a İlahî be. Ema qeza a mu‘elleq ew defi’ dibe bi du‘ayê çewa ku ḥedîsa Tîrmîzî dibêje: لاَ يَرُدُّ الْقَضَاءَ

[372] Rûḥ ul-Beyan

[373] Şerḥa ‘Eynul ‘İlm.(Rû’hul beyan)

[374] Qediya muhmele: Qaîde ya ne diyar, ango bi Tirkî belirsiz önerme

[375] Quwwa mûceba cuz’î: Qaîdeya musbet, ango bi Tirkî müsbet önerme

[376]اِلَّا الدُّعَاءُ hatiye tefsirkirin bi qeza ku mu‘elleqê bi tişkî ye wek du‘ayê mesela. Ne qeza a mubreme. Yanî muhkema lazimul wuqû’. Ayeta [377]اُدْعُونِي أَسْتَجِبْ لَكُمْ ji vê qebîlê ye.

### 2.2.25. Çuna Cennetê Bi Fedla Xudê Te‘ala

60- Bi fi’lê di qenc da nekî minnetê, bi fedla Xudê dê biçî cennetê

Da… ilx: ‘Illet e ji bo ku çûna cennetê bi fedla Xuda ye. Ne bi ‘emel e. Yanî ‘i’tîqad bike ku duxûla cennetê bi fedl û kerema Xudê Te‘ala ye. Ne bi ta‘aet û ‘emelê qenc e. Da tu bi ‘emelê Xwe ne pesinî, minnetê nekî, ne bêjî: “Ez bi ‘îbadetê xwe musteḥeqqî cennetê bûme.” Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem)gotiye: «لَنْ يَدْخُلَ اَحَدُكُمُ الْجَنَّةَ بِعَمَلِهِ وَاِنَّمَا تَدْخُلُونَهَا بِرَحْمَةِ الله وَبِفَضْلِهِ». قالوا: «وَلَا اَنْتَ يَا رَسُولَ الله». قال: «وَلَا اَنَا، اِلَّا اَنْ يَتَغَمَّدَنِيَ اللهُ » [رواه الشيخان][378]

‘Abidek hebû, ‘ibadetê Xudê Te‘ala dikir. Da ku Xudê menfi’etkî lê bike. Bîst salî dewam kir, tiştek jê re peyda nebû. Ma ḥeyirî got: Ev çewa dibe? Ev bîst sale ez yek tişkî ji Xudê di dixwazim û nade min. Xudê Te‘ala wê demê nefsa wî û ef’alê wî pê da naskirin. Hişyar bû got: Ez eḥmeq im. Dema ku Xudê Te‘ala zatê min û ef‘alê min û siḥeta bedena min xuliqandiye, mekanê ‘îbadetê min û ava desmêja min û cilê ez pê disitirim û zemanê ku ez tê de ‘ibdet dikim tev mexlûqê Xudê ne. Ka min çi ‘emel kiriye ḥeta ku ez bibim musteḥeqê ecrê. Na wellahî min tiştek nekiriye. Min ef‘alê Xudê ḥesab dikir ku ê min in û bi wan min teleb dikir. Min tobe ya Reb! Min tobe! Ku toba seḥîḥ kir, Xudê Te‘ala wek dilê wî dayê. Û me’rîfeta xwe jê re zedekir. [379]

Di ḥedîsê de hatiye ku di zemanê pêşî de ‘abidek hebû, pêncsed salî ‘îbadetê Xudê Te‘ala kir di cezîrekî beḥrê de, Xudê Te‘ala jê ra kanîkî ava şêrîn deranî û darek hinarê hêşîn kir. Rojê hinarek di girt wê hinarê di xwar. Jê re kafî dihat. Xudê Te‘ala siḥeta bedenê dayê jê re ‘îbadet kir bê keslanî û sistanî. Ji Xudê xwest ku di ḥalê secde de wefat bibe. Di qiyametê de wê Xudê Te‘ala bêje: Vî ‘ebdê min bibne cennetê bi reḥma min. Ewê bêje: Bi ‘emelê min. Wê Xudê Te‘ala bêje: Ev qas nîmetê pir ku min li te kirine temmamê ‘îbadetê te şikrê yek nî’metkî tenê der naxe. ‘İbadetê pêncsed sali bi

---

[376] Ji bil du‘a qeza bi tişkî dî nayê redkirin.

[377] Ji min re du‘a bikin da ku ez dua we qebûl kim. (‘Xafir 60)

[378]“Hîç kesek ji we bi ‘emelê xwe nikare biçe cennetê. Tenê hun dikarin bi rehmet û îhsana Xwedê Te‘ala biçin cennetê.” Pirsîn gotin: “Ya resûlûllah gelo ma tu jî” Got eger Xwedê Te‘ala min ‘xerqî rehmeta xwe neke ez jî” (Ev hedîs ji teref Şeyxeyna ve hatiye rîwayetkirin)

[379] Ebrîz bi îxtîsar

nîmetê dîtina çav tê qiyaskirin lê dernayê. Xudê dibêje: Wî têxin agir. Melaîket wî kaş dikin. Gazî dike. Ya Reb bi reḥmeta xwe min têxe cennetê. Xudê Te'ala dibêje: Wî bizvirînin û têxn cennetê bi reḥmeta min. Ev ḥedîs dirêj e. Ḥakim rîwayet kiriye û seḥîḥ dêra ye. Çewa ku di "Muxtesera Tuhfetul Murîdê" de ye. Eḥmed bîn Mubarek di "Ebrîzê" de gotiye: İmamê Suyûtî di kitêba "Budûrus- Safîre" de zikir kiriye.

Wel ḥasil: Her tişt bi teqdîr û îcada Xudê ne. [380] اِنَّا كُلَّ شَيْءٍ خَلَقْنَاهُ بِقَدَرٍ teqdîrat jî berya mexlûqa hatine nivîsandin. [381] كَتَبَ اللهُ مَقَادِيرَ الْخَلَائِقِ قَبْلَ اَنْ يَخْلُقَ السَّمٰوَاتِ وَالْاَرْضَ بِخَمْسِينَ اَلْفَ سَنَةٍ Ehlê cennetê wê demê hatine naskirin. Çewa ku ehlê agir jî wê demê hatine naskirin. [382] قِيلَ: يَا رَسُولَ اللّٰهِ أَعُلِمَ أَهْلُ الْجَنَّةِ مِنْ أَهْلِ النَّارِ؟ قَالَ: نَعَمْ. قِيلَ: فَفِيمَ يَعْمَلُ الْعَامِلُونَ؟ قَالَ: كُلٌّ مُيَسَّرٌ لِمَا خُلِقَ لَهُ Yanî her kes hatiye sehlkirin ji wî 'emelî re jê re xuluqiye. Kesê se'îd 'emelê ehlê cennetê jê re sehl e, kesê şeqî 'emelê ehlê şeqawetê jê re sehl e. 'Emel her metlûb e çewa ku Xudê Te'ala emir kiriye.[383] Hate zanîn ku ta'et nake lazimê xwe sewabê. Guneh nake lazimê xwe 'ezabê. Ancaẋ ta'et û gunehkarî du ḥeb 'elamet in. Delalet dikin li ser sewabdana mutî'a û 'ezabdana gunehkara. Ne ta'et menfi'etê dide Xudê Te'ala, ne gunehkarî zirarê didê. Çewa ku şêxê nazim gotiye di Mem û Zînê de:

Yekrû ne li nik te kufr û îman, yeksû ne li nik te xuld û nîran

Ḥaşa ji kemalê Re'feta te, dûr e ji celalê reḥmeta te

Kufr û gunehan bikî behane, laiq te bitin ev e şehane

Emma ayeta [384] اُدْخُلُوا الْجَنَّةَ بِمَا كُنْتُمْ تَعْمَلُونَ yanî: Bikevin cennetê bi sebeb wî 'emelê ku we di dinayayê de kiriye, yanî di bedêla wî 'emelî de. Zahirê ayetê divê ku çûna cennetê bi 'emel e. Çi bê ( ب ) ji bo sebebiyet be, çi ji bo bedelîyet be. Wihareng e emsalê wê ji ayeta. Wê demê muxalefet di navbeyna ayetan û ḥedîsan de çê nebû. Lihevderketina ayet û ḥedîsê çewa ku Rûḥul Beyan dibêje wiha ye: "Çûna cennetê ne ji bo nefsa 'emel e belkî ji bo ku Xudê Te'la we'de daye ji 'emeldara re ku fedl û îḥsanê li wan bike wan

[380] Bê gûman me her tişteki li ser qederek (mîheng u mîzanek) xuliqand. (Qemer 49)

[381] Xwedê Te'ala qedera erd û asimanan pêncî hezar sal berya xuliqandina wan nivîsandiye.(Muslîm û Tîrmîzî.)

[382] Ji (Resûlûllah) pirsin: "Ya Resûlûllah gelo ehle cennet û cehennemê kifşin." Got: "Belê." Gotin: "Madem wiloye vêga însan çima 'emel dike?" Got: "Ji her kesî re ew tiştê ku ji bo wî hatiye xuliqandin tê hêsankirin." (Bûxarî û Muslîm)

[383] Tac 1/38

[384] Bikevin cennete bi sebebb wî 'emelê (qenc ê) ku we (li dinyayê) dikir. (Neḥl 32)

bibe cennetê.” Wê demê ‘emel dibe wekî sebeb ne ku sebeb e di ḥeqîqet de… îlx. Kesê ku ‘emel bike dikeve ber we’da Xudê Te‘ala ku reḥmê lê bike. Kesê ku neke nakeve ber. Lê ku dîsa reḥmê lê bike mani’ tune ku îman hebe. Yan lihevderketina ayet û ḥedîsê wiha ye: Murad ji çûna cennetê di ayetê de teqsîma dereceê û menzîla ye li gor ‘emel. Kesê çiqas pir ‘emel bike li wê gorê qesr û baxçe û ḥorîyê wî pir in. Çewa ku ‘Elîyê Qarî û Ruḥul Beyan gotine.

### 2.2.25.1. Cennet Û Cehennem Vêga Hene

61- Bihişt û cehennem hene vê demê, fena nabin û naçine ‘edemê

Hukumkirina bi hebûna cennet û cehennemê di ḥalê ḥazir de redda ser Qederîyan û Necarîyan û Ceḥmîyan û gelek Mu’tezîlîyan e ku dibêjin: “Vê ga nînin. Wê Xudê Te‘ala wan di qiyametê de îcad bike.” Gotina wan muxalifê ayet û ḥedîs û îcma‘a ‘ulema ye. Wekî niha ayeta [385]أُعِدَّتْ لِلْمُتَّقِينَ yanî cennet hatiye hazirkirin ji mutteqîyan re û ayeta [386]أُعِدَّتْ لِلْكَافِرِينَ yanî cehennem hatiye ḥazirkirin ji kafiran re. Tiştê ku hatibe ḥazirkirin lazime anha hebe. Û delîl li ser tunebûna wan tune.

Fena nabin… ilx: Lewra Xudê Te‘ala di ḥeqqê wan de gotiye: [387]خَالِدِينَ فِيهَا اَبَدًا çewa ku Se’deddînê Teftazzanî û Seyelekûtî gotine. Ev gotina pir ‘aliman e. Şêxê nazim li ser vî qewlî meşiya ye. Emma ayeta [388]كُلُّ شَيْءٍ هَالِكٌ إِلَّا وَجْهَهُ me’na wê ev e: كُلُّ شَيْءٍ her tişt, çi cennet, çi cehennem çi ẋeyrî wan هَالِكٌ tuneye di ḥeddê zatê xwe de, lewra hebûna tişta ne bi zatê wan û nefsa wan e belkî bi sipartina bi bal Xudê Te‘ala ve ye. Hebûna wan ‘arizî ye. Ji tune peyda ye bi îcada Xudê Te‘ala. Xudê Te‘ala wan ragirtiye.[389]

---

[385] Ew (cennte) ji bo mumîna hatiye amadekirin. (Alî İmran 133)

[386] Ew (cehennem) ji bo kafira hatiye amadekirin (beqere 24)

[387] Dê heta bi hetayê di wir de bimînin. (Nîsa 169/57)

[388] Ji bil wechê wî dê her tişt helak bibe. (Kasas 88)

[389] Eḥmed Hîlmî bo beyanê li vir kurteşerheke bi ‘Erebî nîvîsîye wergera wê ya bi Kurmancî wihareng e: Ji bo ku mesela“tunebûna”her mumkînî a di nefsa xwe de bigîje encamekî em di vê babetê de vê beyana Şex ‘Ebdulezîz ed-Debbax teqdîmî xwendevanan dikin. Şagirdê wî Eḥmed bîn El-Mubarek jê pirsî: Musa mirovek ji ehlê muşahede ye. Gelo digel zanîna bi peyva Ellah teala a ku“ne mimkûne ku tu min bibînî”çawa ru’yet xwestiye? Ma ru’yet muşahedê qewî dike?Şêx wihareng bersîva wî da: “Ji bo ehlê muşahedê Muşeheda Zatê ‘Alîyye ji ef‘alên wî xalî û veqetandî nînin.Eger ef‘alên Zatê ‘Alîyye qut bibin wê demê aşîkar dibin.Eger bi qasî muddetê qirpandina çavekî ef’alên wî qut bibin ‘alema hebûnê bi temmamî serobin dibe nizama kaînatê xera dibe. Ji lew tu hebûnek nîne ku ji ‘ef alên Xweda xalî be. Fî’lên di wî sebebê hebûn û beqa ya madde ye. Perda di nabeyna Zatê ‘Alîyye û muşehedê de ev e. Eger Xwedê Te ‘ala ef ‘alên xwe nekira perde herkes dê bişewitiya, temmamê mexlûqatên kaînatê wê bi heliyana.Ji ber ku ji bo ehlê wê muşahede ne aşîkar e, ef‘alên wî jî di menzîla qirş û qalên li ber çav in de ne. Ji bo ku ji muşahedê re nebin perde Musa ji Xweda daxwaza rakirina perdê kiriye. Xweda wiha ferman kiriye: “ Eger ez ef‘ala ji navbeynê rakim mewcûdat dê serobin bibe. Ev çiya ji te bihêztir e, cirmê

Murad bi tuneî di vir de tiştê ku hebûna zatî jê re tune. Lewra hebûna wî wekî hebûnê ye.[390] Yanî gerçê di zahirde jî lê tune tê ḥesab.

Se'd gotiye: Durust e ku murad bi ayeta كُلُّ شَيْءٍ هَالِكٌ kullê mimkûna halik e di ḥeddê xwe de. Yanî wicûda mexlûqata bi nezer bal wicûda xaliq ve wek 'edemê ye. Ne mu'teber e. İmamê ẋezalî gotiye: Mimkun daîm halik e di ḥeddê zatê xwe de. Ne ku wê here helakê û fena be ji ẋeyrî zatê Xudê Te 'ala. Ew bi tenê heye di ḥeddê zatê xwe de. Lewra wacibul wicûd e. Her heye wê her hebe.

Ev tiştê ku me neqil kir di beyana ayetê de îḥtimalek e. Ne qet'î ye. Lewra te'wîl e. Emma zahirê ayetê divê ku her tiştek fena bibe ji ẋeyrî zatê Xudê, çi cennet, çi cehennem çi ẋeyrî wan. Ev jî qewlek e hinek 'alimê mezin li ser meşiyan e. Seydayê Mele Xelîl qebûl kiriye. Lewra gotiye: "Di gel hindî eşya fena dê bibin… îlx." Emma ayeta خَالِدِينَ فِيهَا أَبَدًا yanî piştî ku ehlê cenet û cehennemê çûne cme Xweda êdî nema fena dibin û namrin û dernayên. Lê berya çûnê wê fena bibin. Weya emê bejin di tewfîqa herdû ayetan de "wê fena bibin lê zemanekî hindik. Mîqdarê leḥzekî wê zû vegerin. Ew fenabûn î'tîbar jê re tune. Ne mani'ê ebedîbûnê ye."

Xîlafa ku di fenabûna cennet û cehennemê de ye di hinek tiştê dî de jî carî dibe. Tev de heştin: 'Erş, Kursî, Qelem, Lewh ul-Meḥfûz, Cennet, Cehennem, Ruḥ, Hestiyê Qarçikê. Çewa ku İmamê Suyûtî beyan kiriye.

### 2.2.25.2. Cennet Û Cehennem Vêga Li Ku Der in

Nessa serîḥ di te'yîna cîhê cennet û cehennemê de tune. Lê ekserê 'alima gotine: "Cennet li asîmanê ḥeftaa ye. Cehennem li bin erdê ye. Çewa ku Se'deddîn et-Teftazzanî û Celaleddîn ed-Dewwanî gotine." Delîlên ku li ser cîhê cennetê ne ayeta عِنْدَ سِدْرَةِ الْمُنْتَهٰى[391], عِنْدَهَا جَنَّةُ الْمَأْوٰى[392] û ḥedîsa اَلْجَنَّةُ فَوْقَ السَّمٰوَاتِ السَّبْعِ تَحْتَ الْعَرْشِ[393] û hedîsa سَقْفُ

wî jî ji te qewîtir e. Ka lê meze ke eger ew ji ef'alên minê li ser wan re tehammul bikin û li cîhê xwe bimînin belkî tu jî dê karibî min bibînî." Çewa ku Rebbê wî li çiya tecelli kir çiya ji ber şîddeta tesîra Zatê 'Alîyye û rabûna ef'alan a ji ser çiya ji hev belawela bû. Toz û dûxana wî bi hewa ket. Musa jî tehhemmul nekir xeriqî.(îbrîz 141)

[390] Şîhab

[391] Li nik Sidretul Munteha (Necm 14)

[392] Cennetul me'wa li nik wê (sidretul muntehayê) ye. (Necm 15)

[393] Cennet heft qat li ser asîman di bin 'Erş de ye. (Tercüme ettir)

[394]الْجَنَّةِ عَرْشُ الرَّحْمٰنِ Ev ḥedîs delalet dikin ku cennet di ser Kursîyê de ye û ne munafîye ji gotina ekserê ‘ulema re. Lewra me’na gotina wan: Cennet di serîya asîmana re ye li jora wan e. Lakîn muxalife ji bo zahirê ayeta وَسَارِعُوا إِلَى مَغْفِرَةٍ مِنْ رَبِّكُمْ وَجَنَّةٍ عَرْضُهَا السَّمٰوَاتُ وَالْاَرْضُ اُعِدَّتْ لِلْمُتَّقِينَ[395] zahirê ayetê divê ku firehîya cennetê wek firahîya ḥefta asîmana û erdê be ku tev bi ser hev ve bin. Cennet ku li ser kursî be lazime ku pir mezintir be ji asîmana û erdê. Belkî di ser asîman re be jî. Wisa lazim tê. Lewra ayeta عَلٰى سُرُرٍ مُتَقَابِلِينَ divê ku cennet kurrewî be. Çewa ku asîman û erd kurrewî ne. Cennet dibe kurrekî muḥîtê bi asîmana û erdê. Cewab ji pêş wê muxalefetê ve eve ku: Ayet ne li ser zahirê xwe ye. Belkî kînayetê ji meznaya cennetê ye. Yanî cennet ji asîman û erdê wasi’tir e. Lewra ‘Ereb gelek cara wesfê tişta bi erdê dikin dema ku îrada wis‘etê bikin.[396] Delîlên li ser kewna cehennemê ku li bin erdê ye buhurîn di Rehberê ‘Ewam de. (s 28.)[397]

Ustad Bedî‘uz-zeman di Mektûba ewil de gotiye: “Cehennem li gor hinek rîwayeta li bin erdê ye.[398] لَايَعْلَمُ الْغَيْبَ إِلَّا اللّٰهُ[399], قُلْ اِنَّمَا الْعِلْمُ عِنْدَ الله Kureya erdê bi ḥereketa senewîye daîrekî li dora meydanekî çê dike ku wê bibe mecme‘a ḥeşrê, cehennem bû di bine wê medara senewîye de, di nîvê agirekî perdekirî bê nûr de ye ku nehatiye dîtin û ḥiskirin. Ew mesafa mezin ku bi seyaḥeta ‘erdê tê meydanê, tê de pir mexlûq hene naên dîtin. Lewra bê nûr in. Çewa ku heyv dema ku nûra wê jê tê kişandin digere ẋaîb, ‘eynî wisa pirê kure ê mexlûqa hene bê nûr in. Li hember çavê me ne û em nabînin. Qedîrê Zul Celal mulkê wî pir fire ye. Cehnnema kebîr li kê der bi cîh bike wê bike.

---

[394]Tawanê cennete ‘erşê Rehman e.(Bûxarî di babê cîhadê de rîwayet kiriye.)

[395] Ali ‘İmran 133

[396] Ev beyan ekserî ji gelnbewîya ḥaşîya Celal e.)

[397] Seyda vê babetê di rehberê ‘ewam de wihareng şîrove dike: Cehennem jî li bin heft tebeq erdê ye bi delîla ayeta وَاِذَا الْبِحَارُ سُجِّرَتْ(tekwîr 6.)Yanî behr bên vêxistin û bigerin agir Çewa ku İbnî ‘Ebbas gotiye bi delîla ḥedîsa Ebû Dawûd إن تحت البحر نارا yanî “bi teḥqîq di bin beḥrê de agir heye.” Û bi delîla ḥedîsa Muslîm di hamîşê qestelanî de. 10/296 Tercuma wê eve: Ebû Hureyre got em digel Pêy‘xember (s.a.w.s.) rûniştî bûn, dengê girmînkî hat. Pêy‘xember (s.a.w.s.) got: (Hun zanin ev çiye.) Me got: Xudê û Pêy ‘xemberê wî bêhtir dizanin.) Got: ( Ev kevireke ev heftê sale hatiye avêtin di agirde ew di şwitî di agir de vê demê hate gihîşte binî.) Û bi delila gotina Îbnî ‘Umer(Beḥr tebeqa cehennemê ye.) Çewa ku Tezkîreta Qurtûbî dibêje. Ev gotin û riya ekserê ‘ulema ne. Lê ‘ellamê sanî Se’deddînê Teftezanî gotiye: Nessa serîḥ di beyana cîhê cennet û cehenneme de tune. Anca‘x Xudê Te‘la di zane li kê der in. Ya ḥeq ev e. (Rehberê ‘ewam 28.)

[398] Bêje ku ‘ilmê wê li nik Ellah Te‘ala ye. (Mulk 26)

[399] Ji bil Ellah Te‘ala kes bi ‘xeybê nizane.

Cehennem dudu ne. Se’xîr û Kebîr. Esẋer çewa ku di ḥukmê dendika kebîr de ye û wê înqilab bibe bi wê. ‘Eynî wisa wê bibe menzîlek ji wê. Cehennema Seẋîr di bin erdê de ye. Yanî di merkeza wê de ye. Binê kure ê merkeza wê ye. Di ‘ilmê “tebeqat ul-Erd” de me’lûme ku ekseriya di kolana her 33 metra de derecekî ḥeraretê zêde dibe. Ḥeta merkezê ku nîvê “Qetrul Erd e.” Ji şeş hezar kusûr kilometre dused hezar dereceê ḥeraretê têne meydanê. Yanî agirekî muwafiqê ḥedîsa ku dibêj e: “Bi du sed carî ji agirê dunyayê şedîdtir e.” Ev cehennema seẋîra ku di ḥedîsa de tê îşaretkirin di dunya û axretê de û di ‘alema berzexê de gelek wezîfeyên Cehennema Kebîr dide dîtin. Di axretê de wê kureya erzê bi sekna xwe di medara senewîye de birije meydana ḥeşrê. Yanî wê ji hevbikeve bibe cuzê la yetecezza. Û bi emrê İlahî wê Cehennema Seẋîr teslîmî Cehennema Kebîr bibe. Hem ji qudreta zatê Zul Celal û ji ḥîkmeta wî ne dûr e ku cehennema mezin veşêr e di dendika qasî neynikê de.

Di İşaratul İcazê de gotiye: Cehennem tewandî ye. Li hev hatiye pêçan. Di hundurê merkeza erdê de. Di qiyametê de wê înfîlaq bike. Ji hev vebe, mezin bibe.

Xatime: Hîreql mektûbek şand ji pêyẋember re (selellaahû ‘eleyhî we sellem) tê de got: “Tu de’wa min dikî bi bal cennetekî ve firehîya wê erd û asîman e. Ka agir li kê derê ye?” Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) got:[400] سُبْحَانَ الله فَاَيْنَ اللَّيْلُ اِذَا جَاءَ النَّهَارُ

Eslê sualê ev e: Sabite ku cennet li asîman e. Cehennem li bin erdê ye. Ku ḥeft asîman û erd firehîya cennetê bin cîhê cehennemê namîn e.

Ḥasilê cewabê: Li ser teqdîra teslîma ku cennet û cehennem di ‘alema eflaka de ne. Qudreta Xuda pir e. Kare cennet û cehennemê di yek cîhekî de îcad bike. Çewa ku şev û rojê îcad kiriye û wan daxilî hev dike. Xudê Te ‘la gotiye: يُولِجُ اللَّيْلَ فِي النَّهَارِ وَيُولِجُ النَّهَارَ فِي اللَّيْلِ[401] Yanî tarîtîya şevê datîne cîhê rohnîya rojê. Û rohnîya rojê jî datîne cîhê tarîtîya şevê. Wekî ku tu mûmekî di hundurekî tarî de vêxî û bitefînî çewa ku Keşşaf dibêje.

Di kitêbê fiqhê de sabite sî ne bi tenê bona tavê çê dibe. Yanî ji xwe heye. Bi derbûna tavê ji ḥessa me ẋaîb dibe. Şêx Eḥmedê Xanî ji vê me’nayê gotiye:

“Qeḥra xwe bikî eger tu zahir, cennet li me dê bibite agir

[400] Subhanellah! Gelo dema ku roj tê şev bi ku ve diçe.

[401] Ew rojê ji şevê, şevê ji rojê dertine.(ḥec 61)

Wer feydê bikî seḥabê reḥmet, Dozex li me dê bibête cennet.”[402]

Qudreta Xudê çewa li ser tedaxula şev û rojê heye wisa li ser tedaxula cennet û cehennemê jî heye. Tedaxula ecsama ku ‘Muḥal e. Çewa ku nezeriyatê Ḥîkmetê de heye. Ancax bi nezer bi bal Qudreta me mexlûqa ve ye. Ji ber vî qasî pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) kelîma te‘eccûbê îstî’mal kir. Lewra Hîreqil bi qudreta Xudê zanibû. Delîlek vê tedaxulê dîtina pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem)ji cennet û cehennemê re li asimana di şeva mi’racê de. Vê beyanê qenc bigre

**2.2.26. Ḥîsabê ‘Emelan**

62- Yeqîn dê bibîtin di yewma qiyam, ḥîsaba ḥelalê ‘ezaba ḥeram

Ḥîsaba ḥelalê… îlx: İşaret e bi bal ḥedîsa ku Beyheqî û İbnî Ebî d-Dunya rîwayet kirine. حَلَالُهَا حِسَابٌ وَحَرَامُهَا عَذَابٌ[403] Ev mesele bi meqalê Îmamê Ẋezalî ḥel dibe. Gotiye: “Mirin ne tunebûne belkî cûdabûna ji ḥeskirina dunyayê ye û çûna bi bal ḥuzûra Xudê Te‘ala ye.” Wê demê salikê rahê axîretê ew kese ku dixebite di esbabê fikr û zikr û ‘emelê ku dunyayê digerîne dujmin û meriv ji lezzeta wê dibirîne bi yek carî. Van hersê tiştan digel esbabê wan îmkan nabin îlla bi riḥetî û selameta bedenê. Riḥetîya bedenê jî nabe îlla bi quwet û lîbas û xanî. Ji van re jî sebeb hene. Divê ku meriv bi xebite mîqdarê ku lazime ji meriv re. Eger merivek wî mîqdarî bigre ji bo para nefsê bi qesda lezzet û nîmeta, ew dibe ji ewladê ku muştaq in ji para wî re.

Para dunyaê liser du qisma ye: Yek xweyê xwe dike musteḥeqê‘ezab. Navê wî ḥeram e. Yek jî dibe mânî‘ê dereceyên bilind. Ḥesab li ser xweyê xwe dirêj dike. Navê wî ḥelal e. Kesê ‘aqilmend û qewîn î’tîqad, zane ku sekna dirêj ji bo ḥesabê di ‘ersa qiyametê de ‘ezab e. Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem)gotiye: مَنْ نُوقِشَ فِي الْحِسَابِ عُذِّبَ[404] lewwra gotiye: حَلَالُهَا حِسَابٌ hem dîsa gotiye: حَلَالُهَا عَذَابٌ Lakîn‘ezabê ḥelalê xefîtir e ji ‘ezabê ḥeramê wî. Belkî eger ḥesab tunebe wê fewtandina dereceyên bilind di cennetê de û ḥesreta li ser fewtandina wan ji bo hinek parê pêş bibin ‘ezab. Lewra çiqas nîmetê dinyawî hene û li nihêrtina hêşînahî vexwarina ava cemidî, noqsanî para axretê çê dikin sê qat û zêdetir. Çewa ku ḥedîsê seḥîḥ dibêjin: Ḥeram û ḥelalê dinyayê çi hindik û çi pir tev mel‘ûn in îlla tiştê ku ji bo quweta ‘ibadet û teqwayê be. Ew ne ji

402 Mem û Zîn

403 Helalê wî hîsab e. Heramê wî ‘ezab e.

404 Di derheqê ḥesab de bi kê re nîqaş bêkirin, ‘ezab lê tê kirin.

dinyayê ye. Lewra çi tiştê ku ne ji bo Xudê Te‘ala be ew ji dunyayê ye. Emma tiştê ku ji bo Xudê Te‘ala be ew ne ji dunyayê ye.[405]

### 2.2.27. Sual Û ‘Ezabê Qebrê

63- Ji bo ehlê xeyran necat û riza, ji bo ehlê şerra ‘îqab û ceza

64- Di qebrê dibêtin ji xelqê mirî, sûala Nekîrî digel Munkerî

Di qebrê… ilx: Yanî kesê ku bimre wê du heb melaîket bi kevin qebra wî, navê wan “Munekr û Nekîr in.” Wê sualê jê bikin, yanî wê jê bi pirsin, bejin: “Rebbê te kî ye? Pêyẋemberê te kî ye? Dînê te çiye? İmamê te kîye? Qibla te çiye? Birayê te kî ne? Xuşkê te kî ne?”

Munker û Nekîr du ḥeb melaîket in. Hatine te’yînkirin ji bo suala miriya.

S: Çewa du melaîket ji hemî miriya pirsê dikin di her derê de?

C: Melaîketê sualê pir in. Navê hinka “Munker” e, ê hinka “Nekîr” e. Her mirîkî du ḥeb ji wan diçin ser. Çewa ku “Reqîb û ‘Etîd” jî wisanin. Gotina ku di şibhe rastê ev e. Çewa ku îmam Ḥelîmî û İmam Suyûtî gotine. Hatiye seḥkirin ku esera İslamê li mirî zahir bibe “Munker” sualê jê dike. Esera kufrê be “Nekîr” di pirse. Navê wan wisa ye. Lewra hogirî bi wan çê nabe. Şiklê wan ‘ecîb û ẋerîb e. Naşibhe melaîket û însanan û ḥeywanan. Lê Xudê Te‘ala lutf û reḥmetê li mu’mîna dike, her yekî bi şeklekî têne ser li gorî ‘emel û î’tiqada wî.

Di ḥedîsa İbnû Mes‘ud de çewa ku İmamê ẋezalî zikir kiriye: İnsan ku dimre ewela melaîketek gazî wî dike. Navê wî “Rûman” e. Zûlekî ji kefenê wî dike û dibêje: ‘Emelê xwe li ser binvîse. Ev kaẋeda te û tiliya te qelêma te û tuka te ḥubra te ye. Dinvîse, paşê Rûman wî zûlikî bi sutuyê wî ve dike. وَكُلَّ اِنْسَانٍ اَلْزَمْنَاهُ طَائِرَهُ فِي عُنُقِهِ[406] ew ‘emel e. Paşê herdû fitnebazê qebrê daxil dibin. Du melaîket in. Reş in, çav hêşîn in. ‘Erdê qul dikin bi qîlê xwe. Porê wan li ser ‘erdê kaş dibe. Dengê wan wek birûskê ye. Çavê wan wek birqê ye. Nefesa wan wek bayê gur e. Ciniḥê ḥesin bi wan re ne. Li çiya bidin di hedimin. Dema ku ruḥ wan dibîne direve dikeve herdû qulê poz. Ji sîngê berjêr saẋ dibe. Lê nikare tevgerê bike. Ancaẋ dibhize û dibîne. Bi hişkî sitûrî diçinê. Ax jê re dibe wek avê. Çiqa bileqe fire dibe. Sûalê jê dikin… ilx. Ḥedîs dirêj e.

[405] İhyaul-‘Ulûm 3/274

[406] Me teyrê (‘emelê) her însanî li ustuyê wî pêça. (İsra 13)

Suala qebrê ji Pêyẋember nayê kirin. Ji şehîdê ḥerba kafiran nayê kirin. Ji zaroka nayê kirin di eseḥ de. Wiharenge kesê ku roja înê û şeva înê bimre. Bi delîla ḥedîsa Eḥmed û Tîrmîzî: مَامِنْ مُسْلِمٍ يَمُوتُ يَوْمَ الْجُمُعَةِ اَوْ لَيْلَةَ الْجُمُعَةِ إِلَّا وَقَاهُ اللّٰهُ فِتْنَةَ الْقَبْرِ[407] ‘Elîyê Qarî di şerḥa Muşkatê de gotiye: “مَنْ” faîda ‘umûmî dide. Şamilê fasiqa tê îlla ku tenwîna “مُسْلِمٍ” ji bo te’zîmê be. İmamê Suyûtî gotiye: “Murad bi fitna qebrê sual û ‘ezab e.” Lê ekserê ‘ulema gotine: “Sual her heye.” Murad bi fitnê ‘ezab e çewa ku İ‘ane û Cemel û ẋeyrî wan dibêjin. Meha Remezanê wek înê ye, murada bi qebrê ‘alema berzex e. Di Cemela Fiqhê de, ekserê ‘ulema gotine: Sual ji kafira re tune. İmamê Suyûtî gotiye: Hinek însan ji hemî ‘emelê wî tê sualkirin, hinek jî be’dekî, ne wek hevin.

Di ḥedîsa Buxarî de, herdû milyaket wî didine rûniştandin dibêjin: ‘‘Te çi digot di ḥeqqê vî zilamî de?”(Muḥemmed[408]) Emma kesê mu’mîn dibêje: “Ez şehde didim ku ew ‘ebdê Xudê ye û resûlê wî ye.” Dibêjin: “De li cîhê xwe binhêre di agirde, Xudê wî bedel kir di cîhekî cennetê de.” Dinhêre herduwa jî dibîne. Di ḥedîsa îmam Eḥmed û Ebû Dawûd de: Qebra wî fireh dibe ḥeftaê gazî, di hinka de jî çil gaz e, di hinka de mîqdarê ku çav dibîne. İmamê Qurtûbî gotiye: “Ev îxtilaf li gorî ‘emelê pir û hindik e.” Emma kesê munafiq di cewaba sualê de dibêje: “Ez nizanim.” Bi çakûçê hesin lê didin. Qêrîn jê diçe. Herkes dengê wî dibhîz e ji ẋeyrî însana û cina. Çewa ku însanek li nik meriv razayî be û di xew de mar pê vede di qîre û meriv dengê wî nabhîze. Çewa ku di ḥedîsa Buxarî de ye.

Sual bi çi zimanî ye? Qestelanî gotiye: Zahirê ḥedîsa مَا كُنْتَ تَقُولُ فِي هَذَا الرَّجُلِ..الخ[409] divê ku bi ‘Erebî be. Bacûrî Gotiye: Her kes bi luxet û zimanê xwe tê sualkirin. Suala ‘Ereba bi Erebî, ya Kurmanca bi Kurmancî ye û hakeza. Qewlê seḥîḥ ev e. Teqwîya Qestelanî hatiye kirin ku hinka guhdarî kirine dengê sualê bi ‘Erebî hatiye wan[410].Belqînî gotiye: Sual bi Suryanî ye.İmamê Suyûtî gotiye:

---

[407] Xwedê Te‘ala her Muslumanê ku di êvara İnê weya di roja İnê de wefat dike ji ‘ezabê qebrê di parêze.

[408] Di metnê Orjînal de piştî sualê Navê “Muhemmed” hatiye nivîsandin. Mebesta muelîf ewe ku ew zilamê nîşandayî Hezretî Muhemmed e. (c)

[409] Tu di derheqê vî zilamî de çi dibêjî… ilx(Bûxarî, Muslîm, Ebû dawud, Tîrmîzî)

[410] Cemel

**مِنْ عَجِيبِ مَا تَـرَى الْعَيْنَانِاَنَّ سُـؤَالَ الْقَـبْرِ بِـالسُّـرْيَـانِي**

**اَفْـتَى بِـذَاكَ شَيْخُـنَـا الْبَلْقِـينِيوَ لَـمْ اَرَهْلِـغَـيْرِهِبِـعَـيْـنِي[411]**

Li ser gotina ku sual bi Suryaniye çar kelîme ne: “Etre”, “etreḥ”, “salîḥîn”, “kare” Me’na wan:

Me’na wan:

1. قم يا عبد الله[412]

2. فيمن كنت[413]

3. من ربك وما دينك[414]

4. ماتقول في هذا الرجل الذي بعث فيكم وفي الخلق أجمعين[415]

Warid bûye ku ḥifza van her çar kelîma delîla xatîme ya ḥesene.[416] Şêx ‘Ebdul ‘Ezîz ed-Dîba’ gotiye: “Sual bi Suryaniye. Lewra luxetê melaîket û ruḥa bi Suryanî ye. Evê ku cewaba Munker û nekîr dide ruḥ e ne cesed e.”Suala مَّرَازْهُو cewaba meyit ku mu’min be: مَّرَادْاَزِيرْهُو her ḥerfekî ji sual û cewabê îşaret e bi bal çend me’na ve. Tefsil di İbrîzê de ye.[417]

Piştî sualê qebir li mirî tê hev. Kes ji givaştina qebrê xelas nabe ḥeta bi zaroka jî. Lewra İbrahîm kurê Pêyẋember (selellaahû ‘eleyhî we sellem) jê xelas nebûye. Çewa ku ḥedîsa Ebû Ne‘îm dibêj e. Di ḥedîsa Nesaî de: Se’d bîn Mu‘az dema şehîd ket ‘erş hejiya. Derê asîman vebû. Heftê hezar melaîket nazilê ser cenazê wî bûn. Di gel wî qasî qebir lê hate hev. Parxwanê wî di hev re bihartin, ji peşkê mîzê. Tefsîl di “Şerḥ ul-Sudura” İmamê Suyûtî de ye.

---

411 Çi ‘ecêbe ku çav dibînîn suala qebrê bi Zimanê Suryanî pêk tê

Ev fikr, fikra şêxê me yê Belqînî ye, ji bil wî min nedît ku kesî tiştek wihareng gotiye

412 Rabe ya Ebdê Xweda

413 Tu ji ku hatî

414 Rebbê tu kîye dînê te çiye.

415 Gelo ma tu di derheqê vî mirovê ku ji we û temmamê xelqê re hatiye de çi dibêjî.

416 Bacurî

417 R 121

‘Ezabê qebrê ji fesadî û ji peşkê mîzê ye çewa ku di ḥedîsa Buxarî û Muslîm de ye. Di ḥedîsa îbnî Ebî Şeybe de. [418]تَنَزَّهُوا مِنَ الْبَوْلِ فَإِنَّ عَامَّةَ عَذَابِ الْقَبْرِ مِنْهُ

Fewaid

1- Zikra qebrê li gor ẋalibê ye. Sual û ‘ezab ji miriya re heye. Çi di avê de bi xeniqe çi di zikê ḥeywana de be. Çi bi şewite bi ber bayê keve. Lewra dibe ku ruḥ bikeve cuzekî tenê û dibe ku bikeve tevî. Em bi eḥwalê ‘alema berzaxê nizanin.

2- Di ḥedîsa Tîrmîzî de: Qebr yan baxçekî cennetê ye. Yan kûrek agir e. Murad pê baxçe û agirê ‘alema berzex in. Ne cennet û cehennema ḥeqîqî ne.

3- Kesê saliḥ ku ruḥ lê dizvire li nik sûalê zen dike ku roj li ber ava ye û ji xew şiyar bûye. Dibêje: Bi seknin ez limêj kim.

4- İnsan ku dengê ‘ezabê qebrê bibhîz in li ser ḥalê xwe namînin. Lewra ji dengê birûskê şedîdtir e. Hem wê kafir tev musluman bibin. Lewra dibe ‘eyanî. Ḥîkmeta îlahî ku îmana bi ẋeybê ye dikeve te’tîlê.

5- İnkara melaîketa kufr e. Ji ẋeyrî munker û nekîr. Lewra îxtilaf di wan de heye. İnkara wan fisq e ne kufr e.[419]

6- Ev beyt redda hinek mu’tezîlîyan û hinek rafiziyan dike ku ‘ezabê qebrê û sualê înkar kirine çima ku bi çav nabînin di gel ku ayet û ḥedîs pir îsbata wan dikin.

### 2.2.28. Mêzina Xêr Û Gunehan

65- Di ḥeşrê terazî û mîzan heye, xerabî û qencî û kêşyan heye

Ḥeşr: Kombûna însana û ḥeywana û cina di ‘erda axretê de ji bo ḥesab u ‘emelê qenc û xerab.

Terazî û mîzan: herdû yek in. Navê aletê weznê ne. Murad pê alatê ku ‘emelê qenc û xerab pê tê weznandin. Mîzan ḥeqîqî ye. Du kefê wê hene û zimanê wê heye ku sitûna nîvê wê ye çewa ku İbnî ‘Ebbas gotiye. Kefa rastê ji nûrê ye. Cîhê ḥeseneta ye. Li hember cennetê ye. Kefa çepê cîhê seyîata ye. Ji zulmetê ye. Li hember cehennemê ye.

---

418 Xwe ji peşkê mîzê bi parêzin lewra giranîya ‘ezabê qebrê ji wê ye.

419 Tenwîirul Qulûb

Mîzan yeke li nikcumhûr. Cem‘a wê di ayeta وَنَضَعُ الْمَوَازِينَ الْقِسْطَ لِيَوْمِ الْقِيٰمَةِ[420] ji bo meznaya wê ye weya ji bo ku pir ‘emelan pê têne weznandin. İmamê Şe’ranî li ser xeber daye bi delîla. Ku te divê here li “Yewaqît”ê binhêr e.

Xerabî û qencî… ilx: Yanî ‘emelê qenc û xerab ku însan di dunyayê de dike, di axretê de heye, îsbat kiriye. Lewra tiştek ji ‘ilmê Xudê Te‘ala ẋaîb nabe. لَايَضِلُّ رَبِّي وَلَا يَنْسٰى[421] Hem lewra hemî ‘emelê ‘îbadadi defterê melaîketa de nivîsandî ne ji bı çerya ser ‘adet. Çi ef‘al; bi delîla ayeta وَاِنَّ عَلَيْكُمْ لَحَافِظِينَ[422], كِرَامًا كَاتِبِينَ[423], يَعْلَمُونَ مَاتَفْعَلُونَ[424] çi ‘eqwal; bi delîla ayeta مَا يَلْفِظُ مِنْ قَوْلٍ إِلّا لَدَيْهِ رَقِيبٌ عَتِيدٌ[425] çi niyet û tesewûrat; bi delîla ayeta اَمْ يَحْسَبُونَ اَنَّا لَا نَسْمَعُ سِرَّهُمْ وَ نَجْوَاهُمْ بَلٰى وَرُسُلُنَا لَدَيْهِمْ يَكْتُبُونَ[426] “Sirr:” ḥedîsa nefsî ye. “نَجْوٰى” peyva bi dizî ye.

S: Melaîket bei ẋybê nizanin bi delîla ayeta لَا يَعْلَمُ مَنْ فِي السَّمٰوَاتِ وَالْأَرْضِ الْغَيْبَ إِلَّا اللَّهُ[427] çewa niyet û sirra dinvîsin?

C: Ji her tiştî re ‘elamet heye. İnsan ku qesd û niyeta wî qenc be bîhna miskê ji devê wî tê, ku xerab be bîhna genî ji devê wî tê. Melaîket bi bîhnê zanin weya keşf ji wan re çê dibe. Wekî ewlîyaê ummetê. Di vir de xîlafa îmamê Ḥenîfî heye ku gotîye: “Melaîket esrarê qelbîye nanvîsin.” Lakîn ḥesab her heye bi delîla ayeta وَاِنْ تُبْدُو مَا فِي اَنْفُسِكُمْ اَوْ تُخْفُوهُ يُحَاسِبْكُمْ بِهِ اللهُ[428] û ayeta تُبْلَى السَّرَائِرُ[429]

Kêşan heye: Yanî weznandina ‘emela ḥeq e sabit e. Mu’tezîlîyan înkar kirine. Lewra ‘emelan ‘erez û me‘anîne, qebûla weznandinê li xwe nakin.

Cewab: Defterê’emela têne weznandin. Ne ‘emel bi xwe. Çewa ku di ḥedîsa Tîrmîzî de dibêje.Not û neh defetrê zilamekî ji ummetê tev ji guneha ne, têne danîn di

[420] Em dê di roja qiyametê de terazîyên ḥessas deynîn.(Enbîya 47)

[421] Rebbê te ne şaş dibe, ne jî ji bîr dike. (Taha 52)

[422] Bê gûman li ser we muḥafiz(ên çavnêr) hene. (infîtar 10)

[423]Katibên nivîskarên bi şan û şeref (İnfîtar 11)

[424] Hun çi ‘emelî bikin ew pê dizan e. (İnfîtar 10)

[425] Tu peyv nîne ku bê telafûzkirin û ji teref melîketek (qeydkirox û)nêz ve neyê qeydkirin. (Qaf 18)

[426]Gelo ma ew dibên qey ku emsirr û xeberdanên wanê bi dizî nabhîsin. Naxêr na! Qasidên me tiştên li nik wan dinvîsin. (Zuxruf 80)

[427] Ji bil Ellah Te‘ala kes bi ‘xeyba erd û asînanan nizane. (Neml 65)

[428] Hun dixwazin tiştê di hundur xwe de aşîkar bikin dixwazin jî veşêrin (kêfa we dizane lê bele) Ellah Te‘ala de we ji ber wan bikşîne ḥesab. (Beqere 284.)

[429] Sirr tên vekirin. (Tariq 9)

ferekî mêzînê de. Paşê kaẋidekî biçûk tê de kelîma şehadetê heye, tê danîn di fera dî de, wan deftera dadgerîne. Weya emê bejin: “Her sê qismê ‘emelan dibin ecsam, ‘emelê qenc dibin cismen nuraniye, ê xerab dibin cismen zulmanîye, têne weznandin.” Herkes ‘emelê xwe bi çavê xwe dibine çi pir çi hindik bi delîla ayeta فَمَنْ يَعْمَلْ مِثْقَالَ ذَرَّةٍ خَيْرًا يَرَهُ[430] وَمَنْ يَعْمَلْ مِثْقَالَ ذَرَّةٍ شَرًّا يَرَهُ[431] Ekserê mufessîra mudaf teqdîr dikin dibêjin: «يَرَهُ» أي يَرَ جَزَاءَهُ، أي جَزَاءَ عَمَلِهِ[432] Lakîn ḥemla ayetê li ser zahire wê qenctir e. Lewra şerrê biçûk tê ‘efûkirin cezayê wî tune bi delîla ayeta وَيَجْزِيَ الَّذِينَ اَحْسَنُوا بِالْحُسْنٰى الَّذِينَ يَجْتَنِبُونَ كَبَائِرَ الْاِثْمِ وَالْفَوَاحِشَ اِلَّا اللَّمَمَ[433] û ḥedîsa ku dibêje: “Gunehên biçûk bi desmêjê‘efû dibin”[434] çewa ku kitêbên fiqhê dibêjin. “Ellahûmme” ku murad bi dîtina ceza dîtin û zanîna bi tesewûra cezayê di ḥissa wî de bi elem û eziyet. Lewra esil di kelama de ‘edem teqdîr e. Hem lewra muwafiqê nezeriya ḥîkmetê ye. Se’dedînê Teftazzanî di şerḥa ‘Eqaîdê de îsbat kiriye ku duruste dîtina hemî mewcûdadata çi wacib ku Xudê Te‘ala ye çi mumkînat ku hemî mexlûqat in. Wek deng û te’m û bîhn û ‘alem û îradet lakîn em nabînin. Lewra Xudê Te‘ala dîtina wan bi hawayê ku bibe ‘adet îcad nekiriye di ‘ebda de ne ku dîtina wan memnu‘e[435] Dîtin mimkûne belkî waqi’ bûye. Lewra sabite bi hawayê xarîqul ‘adet

---

[430]Kî ku biqasî misqalekî jî xêrê bike wî dibine. (Zelzele 7)

[431] Kî jî ku bi qasî misqalekî şerrê bike ew jî wi dibine. (Zelzele 8)

[432] Yani cezaê ‘emelê xwe dibîne

[433] Ji bo ku mukâfata qencîkara bi îhsanek baş bidit wan. Ew (qencîkar) ew kesin ku ji bil qusûrên biçûk xwe ji gunehên kebaîr û fuhşîyatê di parêzin.( Necm 31- 32)

[434] Li vir kurteşerheke bi Zimanê ‘Erebî hatiye nivîsandin wergera wê wihareng e: Ji İbni ‘Umer (r.a.) hatiye riwayetkirin: Pêğember (a.s.w.) gotiye: “Kesê desmêj bigre û li ser azayên xwe zikre Xweda teala bixwine temamê bedena wi tahir dibe. Kesê desmêj bigre û zikre Xwedê teala nexwine cihê ku av di ser de derbas dibe ew tenê tahir dibe. (El Beyan fi mezhebil-imam Şafii, babu sifetil-wudu). Wek vê riwayetê di mecmu‘ê de ji derbas dibe. Ji Ebu Hureyre hatiye riwayetkirin dibêje: “Mana ku dibêje temamê bedena wî tahir dibe yan jî cihê ku av di ser de derbas dibe tahir dibe eve: yani ji gunehên biçuk paqij dibe.” (Binhêre li mecmû’ê, babê sifetul wudu’)

[435] Muelîf li vir kurteşerheke bi ‘Eerbî nîvîsîye. Wergera wê wihareng e: Di heqîqeta mezhebê Eş‘arîye û Selefê Salih de dîtin, ji înkîşafa serdestir a ji înkîşafa îlma ku piştî îdarqa tam û vekirina çav îbaret e.

İdraqa ji dîyaran, bi awayê normal ancax di halê durahîya mutedil weya nêzkahîya mutedil de peyda dibe. Ev bawerîya pisporên matematîkê ye. An jî di çav de bi hîsseke muştereka ku piştî sûretê kesan di hiş de dikeve qalibekî hasil dibe. Wek qalibê wî tiştê ku di neynikê de tê nexşkirin. Ev jî bawerîya ehlê tebî‘etê ye.

Bo me îdraqa di derheqê Xwedê Te‘ala de li axretê bê peyda buna van şertan pêk tê. Aha ji “ru’yeta bê keyfîyet” mebest eve.Yanî ew şert û şurtên ku bo dîtîna cism û ‘arazan pêwistin di vê dîtinê de ne pêwistin. Naxwe ne di mana “ dûrbûna ji temmamê ḥal û sifetan” de ye.

Bi rastî ev şertên han li gorî Eş‘arî û etba‘ên wan sebebên ji rêzê ne. Li dinyayê bê hebûna wan jî dîtin mimkûn e. Çewa ku ‘Emayên Çîn kelmêşên Endulusê dîtine. Li gorî vê dîtina her mewcûdatî minkûn e wek deng, reng, tam û bêhnan. (Haşîya Şerhul-Celaleyn. Ji Gelenbewî bi kurtî hatiye wergirtin.)

ku ehlê keşfê sûretê ‘emelan dibînin di ‘alema misal de. Hate zanin ku hersê qismê ‘emelan sabitin di dunyayê de dewam dikin.

Ustad Bedî‘uzzeman di “Mesnewîya ‘Erebî” de gotiye:[436] Esil di tişta de beqa ye, ḥeta umûrê seyale ê ku zû zail dibin wekî kelîmat û teswîrata ji wan re jî hinek cîhê din hene di wan de muḥafeze dibin ji zewalê. Lakîn sureten di guherin. Ji sûretkî dikevin sûretkî. Ḥeta ku guya hemî tiştan hatine wezîfekirin ji ḥifza “tişt” re bi temamî yan bi wechekî. Bi ihtimama kamil lez dikin ji wî bigrin û di qelbê xwe de dêynin. Ḥîkmeta cedide li vî sirrê ha hişyar bûye lakîn bê beyan. Loma ku xeta kir bi îfratî û got: ‘Edem tune mutleqa, belkî terkkub û înḥîlal e. Kella belkî terkib e bi sin‘etê Xudê Te‘ala û teḥlîle bi îzna wî û îcad û î’dam e bi emrê wî. يَفْعَلُ مَا يَشَاءُ[437] û يَحْكُمُ مَا يُرِيدُ[438]

Weḥîd ed-Dîn Xan di kitêba xwe de[439] îzaḥek daye vê mîsalê. Tê de îsbat kiriye bi sûretkî qet’î ku niyet û eqwal û ef‘alê însana tev mewcûd in, di qezayê de baqî dimîn. Delîlê wî li vir hilnayên. Gotiye: Zanayê ‘esrî di şuẋilin ku alet çêkin ji bo ku ḥereketê kesên zemanê pêşî bibbînin. Û dengê wan bi zivirînin ku her kes bibhîze. Lê hêj ne gihîştine wê meqsedê. Ancaẋ aletkî çêkirinê ku ḥereketê zemankî kin çend sa‘etê pêşî kare nişan bide, lê ḥereketa kevn ji ber ku pêlê ḥereketa wan ze‘îf bûne nişan nade. Ev alet di înglîz û Ammerîka de tê îstî’malkirin. Suretê her tiştî dikşîne. Çi di rohnîyê de çi di tarîtîyê de. Ḥeta şevekî di semaê Newyorkê de firokek meçhul buhurî, paşê bi wî aletî pêlê ḥerareta wê teyarê tesbît kirin. Û şekl û new‘ê wê fêhm kirin. Ema teyb û radyo w sinema û televizyon, anacaẋ deng û ḥerareta ḥalê ḥazir muḥafeze dikin û neşr dikin û nişan didin.

Ji van beyana tê zanîn ku nezeriya axretî ne dûrî vî qasî ye. Bêwe ku Xudê Te‘ala hemî ‘emelê ‘ibada ji zarûtîya wan ḥetanî mirina wan bi wan bide dîtin di ḥukmê fîlmê sinema û televîzyonê de. Di ber çavê wan de bide derbaskirin da ku ji înkarê re çare nemine. Çewa ku Ustad Bedî‘ûzzeman di “Buyuk Sozlerê” de gotiye. Hem ne dûre ku Xudê Te‘ala hemî ‘emelan bigerîne ecsamê giran bi terazîyê bikşîne.

---

[436] 174

[437] Çi bixwaze wî dike (Alî ‘İmran 40)

[438] Çewa bivê wisa hukum dike

[439] El İslam Te‘te Dewîl-‘ilm

Weya emê bêjin meqsed bi wezna tişta ku mîqdarê wan xwîya bibe. Ji wî qasî re aletê muxtelîf hene wek “mêzîn û qapanê”ji bo beyana tiştê giran û “sa‘et” ji eczaê şev û rojê re û “îstîrlab” ji beyana mîqdarê ḥereketê roj û sitarê re,“termometre” ji beyana dereceyê sar û germê re. Hem wek ‘erûdê ku mîzana şi’rê ye. Û ‘ilmê “neḥw û mentiqê” ku mêzîna kelamê ne. Tefsîl di “Yewaqîta İmamê Şe’ranî” de ye.

**2.2.29. Sirat**

66- Sirat ew pir e pur bi xewf û xeter, cemî‘ê xelaiq dikin lê guzer

Yanî sirata ku beḥsa wê di ḥedîsa de heye. Navê wê pira ku pir bi xof û xeter e. Yanî tirs û heybeta wê pir e. Lewra li ser wê cehennema ku ji beḥra muhit firehtir e bi hezar caran, ji mû ziravtir e, ji şûr tûjtir e. Çewa ku di ḥedîsa Muslîm de ye.

Mu’tezîlîyan înkar kirine gotine: “Nabe ku xelq di ser de herin di gel ku evqas zirav û tûj e.” Ehlê sunnetê gotine: “Xudayê ku quwet daye teyra di hewa de seyr dikin, kare însana jî li siratê bide meşandin.” ‘İz Bîn ‘Ebdus-Selam û Şêxê Qerafî û Zerkeşî ev ḥedîs te’wîl kirine. Gotine: “Kînayetê ji meşeqqet û zeḥmetîya pir e. Wê demê dibe muwafiqê ḥedîsên ku dibêjin li herdû teniştê wê melaîket hene û tê de “Kellûb” -çengelê mezin- hene ku xelq bi wan ve di‘eliqin di sekinin. Weya di siratê wer dibin bi wan ve dimînin. Pêtiyê agir wan di şewitînin ḥeta şefa‘et bi gîje wan. Li ser siratê sitrî û dirik hene ezyetê didin xelqê. Tev ‘elaqê dinyayê ne. ‘Ededê wan bi mîqdarê xeta û guneha ne.

Lez û bi paşketina li ser siratê li gorî cehda wan e di merdiyatê Xudê Te‘ale de. Kesê ku li dinayê lez bike di merdiyatê de wê di siratê de zû here. Kesê ku keslanî bike wê dereng here. Kê li dinyayê buhuradina ser sirata İslamê kiribe ‘adet wê bi sehlî li ser sîrata axretê here. Ê ku nekiribe ‘adet wê bi zeḥmetî here û nigê wî bi şemite.

‘Alima gotine: “Hewz û Sirat teşkil dibin li gorî ‘emel û ‘ulûman. Ḥewz ‘ilmê şerî‘etê ye. Sirat ‘emelê wî ye. Kî çi mîqdarî ‘ilmê şer‘ê bigre û çi mîqdarî pê ‘emel bike bi wî mîqdarî ji ḥewzê vedixwe. Li ser siratê di meşe. Sirata şerî‘etê li dinyayê me’newî ye. Wê li wir bibe hissî ji wê pê ve tu rê naçin cennetê.” وَاِنْ مِنْكُمْ اِلَّا وَارِدُهَا[440]

Şêx Muḥyîddîn gotiye: “Sirat fireh dibe û zirav dibe bi mîqdarê rohniya ‘emelê saliḥ. Firehiya sirata her kesî bi mîqdarê belavbûna nura ‘emelê wî ye. Loma ji hinka re

[440] Ji we tu kes nîne ku nece wir (Meryem 71)

zirave ji hinka re fire ye di gel ku yek tenê ye.” Û gotiye: “Sirata ku te dighîne cennetê sirata hîdayeta ku te ji nefsa xwe re çê kiriye ji ‘emelê saliḥ, dema tu bibînî tu nas dikî ku sin’etê te ye. Te bi destê xwe bîna kiriye. Wiharenge ḥorî û qesr û baxçe ê cennetê netîce ê ‘emelê sal‘ih in. Menazîl û derekat û agirê cehennemê netîceê gunehkarî û bê emrîya Xudê Te‘ala ne.”

Di ḥedîsê de hatiye «مَنْ صَلَّى كُلَّ يَوْمٍ اِثْنَتَيْ عَشَرَةَ رَكْعَةً بَنَى اللهُ لَهُ بَيْتًا فِي الْجَنَّةِ، وَمَنْ قَالَ سُبْحَانَ الله -مَثَلًا- غَرَسَ لَهُ شَجَرَةً فِي الْجَنَّةِ[441] û gotiye: Cennet û cehennem vê gavê hene lê binaa wan temam nebû ye. Lewra ji ‘emelê mukelefan têne bînakirin. Kengê dunya qediya û zemanê teklîfê xelas bû wê avakirina wan jî temam bibe.[442]

Cemî‘ê xelaîq: temamê mexlûqatê ku ‘îbaretê ji mu’mîn û kafira ne

Dikin lê guzar: Derbasî li siratê dikin. Yanî emrê wan tê kirin ku di ser de derbas bibin. Herçî kafir û gunehkarê musteḥeq wê tê werin bikevin agir. Wê werin xwarê wekî ku zerratê nava tîrêjê têne xwarê. Herçî mu’mînê qenc wê di ser de herin li gor ‘emelê xwe. Hinek bi beza piya, hinek bi meşê, hinek li ser çoka. Piştî ku ji siratê xelas bin wê bikevin pirekî tê de ḥefta ‘eqebe hene. Di ‘eqeba ewil de pirsa kelîma şehadetê ji wan tê kirin, di ya duduya de pirsa limêjê tê kirin, di ya sisiya de pirsa rojîya Remezanê dikin. Di ya çara de pirsa zikatê dikin. Di ya pênca de pirsa ḥecc û ‘umrê dikin. Di ya şeşa de pirsa desmêj û ẋuslê dikin. Di ya ḥeftaa de ku ji teva zeḥmettir e pirsa zulm û neḥeqîya li mexlûqa dikin. Kesê ku di van ‘eqeba tevan de cewab bide û sûcê wî tune be wê here cennetê. Kesê ku di yekî de qusûr kiribe wê di ‘eqeba wî de bi mîne ḥetta ku Xudê Te‘ala ḥukmê xwe li ser carî bike. Lê nakeve agir. Lewra ji sirata mezin xelas bûye. Çewa ku İmamê ẋezalî û Şe’ranî gotine.

Gelek ‘aliman gotine sirat ji îmtiḥana mu’mînê qenc û xirab e. Yanî kafir naçine serê. Wê ji ewel ve herin agir. Lewra musteḥeqê ceza ne. İmtiḥan ji wan re tune. Lakîn eseḥ ewe ku Şêxê Xanî gotiye. Ku wê herkes here siratê, îlla wanê ku sitûkî ji agir dertê û wan ji nav ehlê meḥşerê hiltîne dixe cehennemê. Û îlla wanê ku bê ḥesab diçine cennetê. Lewra ḥedîsê seḥîḥ di ḥeqqê wan de hene.

---

[441] Kesê ku her roj duwazde rek’et limêj (selatudduha) bike Ellah Te’ala di Cennetê de jê re xanîkî bîna dike. Û mesela kesê ku bêje subhanellah di cennetê de dareî datîne.

[442] El Yewaqît liş- Şe’ranî.

### 2.2.30. Xatime Û Munacat

67- Cehennem di bin da û cennet li pêş, li ser wê İlahî tu destêm nekêş

68- We ger ne ezê mucrimê bed‘emel, di zanim ku dê bête pê min zelel

69- Bi zenb û qusûrê di min tu nekî, di gel min bi îḥsan û lutfa xwe kî

70- Min û cumle ummeta Mustafa, bibî cennetê tabi‘ê Mustefa

Li ser wê: Li ser siratê

We ger nekî: Eger tu deste min negrî bi reḥmeta xwe min derbas nekî ya İlahî

Ezê mucrîm: Ezê ku xweyê sûc im

Bed‘emel: Ezê ‘emel xerab

Zelel: Şemitandin

Yanî ez dizanim ku wê nigê min ji siratê bi şemite ezê bikevim cehennemê. Lewra ez musteḥeqqê ‘ezab im. Di ḥedîsê de hatiye: “Ê ku li siratê di şemitin pire wan jinin. Û hatiye: Dema ku xelq diçin ber siratê dengek ji bin ‘erş dibêje: Herçî mu’mîn bibihirin li ser siratê. Herçê bê emrîya Xudê kiribe bira bisekine فَيَا لَهَا مِنْ سَاعَةٍ[443] We hatiye: Ku kesê ku di ‘irzê birayê xwe yê mu’mîn de peyîvî be tê ḥebiskirin û jê re dibêjin: İsbat bike wî tiştê ku te di ḥeqqê birayê xwe de gotiye. Eger îsbat neke wê bi şemite nav agir.[444]

Di gel min… îlx: Yanî bi min re mu‘amele bike ya Reb bi îḥsan û lutfa xwe.

Tabi’: Peyrew. Yanî me bibe cennetê bi peyrewîya Muḥemmed Mustefa (sellelllahû ‘eleyhî we sellem)

Temme: Bi alîkarîya Xudayê Kerîm û ḥekîm me te’lîfa vê şerḥa delal û nefîs temam kir. Di meha Cemadîyel Ewel de 1044 h. Subat 3. 3999 Rûmîye. Şûbat 16 1984 miladîye. Yewmel Xems.

---

[443] Emma dema ha!

[444] Tezkîretul-Qurtûbî

## 2.3. METNÊ EQİDA ŞÊXÊ XANÎ

BİSMİLLAHÎRREḤÎYM

1- Li ba te muḥeqqeq bitin ev cewab, duhû gote min hatifî bê ḥîcab

2- Sa Eḥmed sena ke bi qewlê seḥîh, li tewḥîdê Barî bi qewlê fesiḥ

3- Xudê yêke bê hevrîyû bê heval, ne me’zûlîye ne mirin ne zewal

4- Ne esl û fesl û ne da û ne bab, heyin wî heyîna wî nabit ḥîsab

5- Ji bo wî çunîne cîhat û mekan, ne manend û misl û ne hemta nişan

6- Li wî ra neborîne weqt û zeman, ne sal û ne mah û ne ḥîn û ne an

7- Ebed dê hebitin ezel her heye, di dinya û ‘uqba Xudayê me ye

8- Ewî aferandin em û cumle xelq, nehin ẋeyrê wî qet çu xaliq bi ḥeq

9- Resûlê di wî cumle heqq in temam, xusûsa Muḥemmed ‘eleyhîsselam

10- Ku serdefterê cumle ‘alem ew e, nubuwet xwe meketûb e xatem ew e

11- Xudê aferandin ji bo wî felek, ji bo xizmeta wî şîhandin melek

12- Ku Qur’an ji ‘erşan digel wan hinar, ji bo wî ḥebîbê xwe yê bextiyar

13- Ji bal xwe bûraqek ji bo ra şihand, lê zînek muresse’ ewî rûnîhand.

14- Bûraqê digel Refrefê dest bi dest, bi emre Xûdê ew birin pêşî dest

15- Di ḥefta asîmanan ewî îwerand, bi qas3i du qewsan vî bal xu gîhand

16- Hilanî Xudê perde rakir nîqab , cemala Xudê dît ewî bê ḥîcab

17- Du caran bi çehvan cemala wî dit, li derrî melaîn dibêjin nedît

18- Nebe bê sebeb munkîrê “qed rea”, ji xelqê “tumarûn ‘ela ma yera”

19- Eger tu dibêjî li ku dî Xûda, Xudê go li nik Sîdretul munteha

20- Muḥeqqeq bizan wî Xudê dîtîye, we lêkîn nizanit ḥeqîqet çiye

21- Ji bo wî çunîne nezîr û şebîh, kesê wesfî kit dê çi bêjit bedih

22- Sifatê di seb‘e ji bo zul celal, bizan ḥefta in ey ‘arifê pur kemal

23- Xweşî, şîn û zanîn û vîn û kelam, bihîstin digel dîtinê bûn temam

24- Qedîm in wekî zatê cumle sifat, ne ‘eynî di zatî ne ne ẋeyrî zat

25- Xudê nîne cewher ne cism û ‘ered, ne kulle ne be’d e bizan bê ẋered

26- Eger bê guneh me mu‘ezzeb bikit, ji wî ra heye me mueddeb bikit

27- Rewa ye bikit ew li xelqê meşaq, bi qeḥra xwe teklîfa “ma la yutaq”

28- Erê key bi zulmê tekelluf dikit, di mulkê xwe de ew teserrûf dikit

29- Li me ferz e herçî ji bo wî bi kêr, ne ferz e li wî ya ji bo me bi xêr

30- İrade dikit ew bi xêr û şerran, riza nîne emma bi fi’la şerran

31- Bizan bende muxtarê fi’la xwe ye, ne Xaliq ne mecbûrê fi’la xwe ye.

32- Muwafiq nebit qewl û niyet ‘emel, li ba me dibêtin di îman xelel

33- Mirovê bi îman di dojê muqîm, bizane ku namînitin ey ḥekîm

34- Musluman bi qetl û zînayê çu car, ne kafir dibe ne muxelled di nar

35- Ji me’sîyyetan lazime tewbe zû, guneh nîne tewbe nebêtin li dû

36- Ne me’zûr e cahil ku ‘aqil bitin, ji Xaliq bi cehla Xu ẋafil bitin

37- Mirovê nezan bêt û nadan û sist, dibêtin bi teqlîdê îman durust

38- Di weqtê ‘ezabê Xudê kit nuzûl, li ser kafiran nîne îman qebûl

39- Ji ‘ezl û gunahan nebî bûn berî, ji bo qismê jin nîne pêyẋemberî

40- Welîyan keramet dikin jê zuhur, dikin xerqê ‘adet gelek jê sudur

41- Xudê dê bibînin Musluman bi çav, weki sahî bêtin heyîva tevav

42- Ji bîr dê bikin nî’meta cenneteê, wekî dest bidin dewleta ru’yetê

43- Betale tenasux mûḥale ḥulûl, meke îttîḥada du tiştan qebûl

44- Eger tiştekî pur muhezza bikî, qebûl nakit îdî mucezza bikî

45- Heyûla çu nîne ‘edîm e ‘edîm, dinê kafir yê dibêjit qedîm

46- Meke lec di Loqman û İskenderî, ji bo wan ne me’lûm e pêyẋemberî

47- Melaîk şeyatîn û cinnan wicûd, heye da nekî bûyîna wan ciḥûd

48- Wekî yêk in ev herdû bê şek temam, di rizqiyetê da ḥelal û ḥeram

49- Bibêjim te fedla seḥabê Resûl, bi can bike bawer bi dil ke qebûl

50- Ebûbekrê Siddîqî yarê şefîq, ewe sanîyesneyn di ẋarê refîq

51- Ji ewwel di fezlê seramed ew e, kerîm e û saḥib keramet ew e

52- Li pey wî bi ḥeq ‘Umerê dînpenah, bi fetḥê di wî şa ne xwendkar û şah

53- Xîlafet kemer bû mecala wî best, ji ḥukmê wî pişta muxalif şikest

54- Li pey wî ye ‘Usman bi ḥeqqê ḥekîm, di ‘ilmê ‘elîm û di ḥilmê ḥelîm

55- Ji Kerrarî efdaltir e bê gûman, ev e î’tiqada me der ḥeqqê wan

56- Di pey wan ‘Elî saḥibê Zulfîqar, siwarê li duldul şehê namîdar

57- Tefewwûq li ser yê di mayî heye, bi me’na birayê Resûlê me ye

58- Şefa‘et dikin enbîya, ewlîya, bi îzna Xudê bo kesê eşqîya

59- Di ẋeyb û ḥuzûrê du‘ayan eser, dibêtin ji bora eya ba xeber

60- Bi fi’lê di qenc da nekî minnetê, bi fedla Xudê dê biçî cennetê

61- Bihişt û cehennem hene vê deme, fena nabin û naçne ‘edemê

62- Yeqîn dê bibêtin di yewma qiyam, ḥîsaba ḥelalê ‘ezaba ḥeram

63- Ji bo ehlê xeyran necat û riza, ji bo ehlê şerra ‘îqab û ceza

64- Di qebrê dibîtin ji xelqê mirî, sûala nekîrê digel munkerî

65- Di ḥeşrê terazî û mîzan heye, xerabî û qencî û kişyan heye

66- Sirat ew pir e pur bi xewf û xeter, cemî‘ê xelaiq dikin lê guzer

67- Cehennem di bin de û cennet li pêş, li ser wê İlahî tu destêm nekêş

68- We ger ne ez ê mucrîmê bed‘emel, di zanim ku dê bête pê min zelel

69- Bi zenb û qusûrê di min tu nekî, di gel min bi îḥsan û lutfa xwe kî

70- Min û cumle ê ummeta Mustafa, bibî cennetê tabi‘ê Mustefa

**ENCAM**

Danasîna Ehmed ‘Hîlmî el-Qo‘xî û berhema wî ya Rehberê Sanî Şerha Eqîda E‘hmedê Xanî bo kurdolojîyê muhîm in. Lewra Ehmed ‘Hîlmî el-Qo‘xî gelek berhemên Kurdî te’lîf kiriye gelek berhemên kevnarê wek Eqîda Ehmedê Xanî, Nûbihara Biçûkan, Nehc-ul Enam, Sirrul-Mehşer u… hwd bi keda wî hatine şerhkirin û di lîteratura Kurdolojîyê de cîh girtine.

Di encama vê xebata me de derket holê ku Ehmed ‘Hîlmî- el-Qo‘xî nivîskarek welûd e. Gelek berhem te’lîf kriye. Gelek berhemên Kurdî ji goşê medresa derxistiye û ji windabûnê xelas kiriye. Hinek şerh kiriye hinek jî îstînsax kiriye. Lê ji ber ku temmamê berhemên Ehmed ‘Hîlmî- el-Qo‘xî bi ‘Herfên ‘Erebî hatine nivîsandin. Ji bo îstîfada nifşê nû ê ku ji xwendina herfên ‘Erebî Mehrûm in pêdivî bi latînîzekirina van berheman heye.

Bi vê xebata me dê Ehmed ‘Hîlmî el-Qo‘xî bê naskirin. Wê bi vê xebatê riya lêkolînên li ser Ehmed ‘Hîlmî el-Qo‘xî li ber xwendevanên Kurdoljîyê vebit. Ev xebata me dê gelek xebatên dî li pêy xwe bîne. Lewra di vê xebatê de derket holê ku gelek berhemên Ehmed ‘Hîlmî el-Qo‘xî ê Kurdî hene ku hê kes li ser wan ne xebitiye.

Me bi wesîla transkrîbsîyona Rehberê Sanî Şerha Eqîda E‘hmedê Xanî îsbat kir ku berhemên Kurdî yê kevnar ji nezmê îbaret nîn în. Gelek berhemên Kurdî yên pexşan jî hene ku di goşê medresa de hatine jibîrkirin. Lazime ew berhem jî di camî‘eya Kurdolojîyê de bibin mijara tezan. Lêkolîn li ser wan pêk bên da ku nifşê nû ji wan mehrûm nemînin. Lewra berhemên pexaşnî jî ji bo Kurdolojîyê gelek muhîm in. Ev xebata me dê di vê babetê de wek nimûneyeke mutewazî cîhê xwe bigre.

Dîsa di vê xebata me de derket holê ku Rehberê Sanî Şerha Eqîda E‘hmedê Xanî di warê ‘ilmê kelam de berhemeke ‘ilmî ye. Di vê berhemê de wek çavkanî gelek berhemên kevnarê sereke hatine bikaranîn. Mijarên eqîdê yên sereke hatine vekolin û di vî warî de bawerîyên cûrbecûrê ekolên itiqadî hatine zikirkirin. Ev xebata me dê wek materyalek ‘ilmê kelam di lîteratura zanistiya İlahîyatê de jî cîhê xwe bigre û ji xebatên pêşerojê re bibe bingeh.

**ÇAVKANÎ**

Adak, Abdurrahman, **Destpêka Edebîyata Kurdî Ya Klasîk,** İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar, 2014.

Bêcirmanî, M. Muḥemmed, “Seydayê Min Mela Eḥmedê Qoẋî”, **Kovara Kelha Amed**, j. 16, Nîsan 2013.

Bozdaş, Celal, “Hevpeyivîn Bi Mele Celalê Pîranî Re”, **Kovara Kelha Amed,** j. 16, Nîsan 2013.

Ekîncî M. Salîh, “Di Derbarê Ehmed ‘Hîlmî el-Qoxî de Hevpeyivîna Bi Maîlê”, tarîxa hevpeyivînê 15.10.2015.

El-Qoẋî, Eḥmed Ḥîlmî, **Rehberê Sanî Şerha Eqîda Eḥmedê Xanî,** (Weşanxane, cîhê weşanê û tarîxa çapê ne diyar e,) 1984.

Epözdemîr, Şakir, **Medreseyên Kurdistanê Di Dewra Mîran û Neqşebendîyan De,** İstanbul: Weşenxaneya Nûbîhar, 2015.

Farûq, Eḥmed, “Sin‘etê Xet Û Seydayê Mela Eḥmed Bi Xettadî”, **Kovara Kelha Amed,** hj. 16, Nîsan 2013.

Gözeten, İbrahim, “Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wîya Nehcul-Enam Metn û Lêkolin”, **(Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi),** Muş Alparslan Ünîversitesi, SBE, 2015.

Hîlmî, Mele ‘Ebdulquddûs, "Seyda Mela ‘Ehmed Ḥîlmî el-Qo‘xî”, **Kovara Kelhaamed,** j. 17, 2013.

Hîlmî, Mele ‘Ebdulquddûs, “Xebatên Seydayê Ḥîlmî”, **Kovara Kelha Amed,** j. 16, Nîsan 2013.

Karaman, Cevdet, “Ahmed Ahmed Zîyauddin Gümüşhanevi Hazretlerinin Mürşidi Mevlana Halidi Bağdadi’nin Hayat Hikâyesi” **I. Uluslararası Ahmed Zîyauddin Gümüşhanevi Sempozyumu,** Ankara: Gümüşhana Üniversitesi Yayınları, 2014.

Kayhan, Bayram, “Klasik Medreselerin Kurumsal Yapısı”, **(Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi)** Süleyman Demirel Üniversitesi, SBE, 2014.

Kılıçarslan, Mele Enver, “Di derbarê Ehmed Hîlmî el-Qo ‘xî de hevpeyivîna bi maîlê,” tarîxa têkiliyê 15.09.2015.

Ozaydin, Dr. Mûrat, **Şeyh Abdurrahman Aktepe,** İstanbul: Cihan Yayınları, 2009.

Öz, Ruḥullah, “Molla Eḥmed el-Cizîrî’nîn Dîvaninda Kelamî Konûlar”, **(Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi),** Harran Üniversitesi, SBE Kelam Anabilim Dalı, 2013.

Özdaş, Haşim, Kuran’ın Kürtçe Çevirilerinde Karşılaşılan Problemler Ve Meala Fîrûz

Şerha Qurana Pîroz Örneği, **(Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi),** Dîcle Üniversitesi, SBE, 2015.

Yalçin, Abdussamed, “Hevpeyivîna Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De”, tarîxa têkildarîyê 20.11.2015.

Yalçin, Abdulsamet, **“**Di Derheqê Eḥmed Ḥîlmî De Hevpeyivînên Bi Telefonê,” Tarîxên têkildarîyê: 09.10.2015, 30. 02.2016, 14.08.2016, 14.09.2016, 9.11.2016.

Yazıcı, Ziya, “Medrese” **Şamîl İslam Ansiklopedisi,** Cilt 8, Şamil Yaınevi, İstanbul, 2000.

Yıldırım, Kadri, **İnanç Risalesi,** İstanbul: Weşanxaneya Avesta, 2008.

Zinar, Zeynelabidîn, **Xwendina Medresê,** Stocholm: Weşnxaneya Pencînar, 1993.

Zinar, Zeynelabidin, Di Nava Medreseyên Kurdî De Giringiya Medreseya Extepê, **Medrese Ve İlahîyat Kavşağinda İslamî İlimler Uluslarası Sempozyumu,** Bingöl Üniversitesi yayınları, Bîngöl: 2012.

Zinar, Zeynelabidin, **Numune Ji Gencîneya Çanda Qedexe**, Stocolm: Weşana Yekîtîya Nivîskarên Kurd, 1991.

**PÊVEK 1.**

**Ferhenga Rehberê Sanî**

| | |
|---|---|
| Azbat: | Mebest jê malbat e. |
| ‘Adem: | Bi mana tunebûnê ye. |
| ‘Adetê milûkan: | ‘Adetê hukumdar û padîşahan. |
| ‘Alema eflaka: | Cîhana di asîmanan de |
| ‘Alim: | Kesê zana û ailmend, pisporê ‘ilmên İslamî, kesê pirxwenda. |
| Batinê mî’racê: | Mana mî’racê ya hundurî |
| Bê nihayet: | Bê dawî |
| Bedîhî: | Bi aşîkarî |
| Beqa: | Ebedîyet, bê dawî bûn. Ev peyv di Rehberê Sanî de wek “navê wî tiştî ye ku dil di reve ji teqdîrkirina nîhayeta wî” hatiye tarîfkirin |
| Besatet: | Besît, sade, ne tevlihev, rast |
| Beser: | Dîtin |
| Besera mexlûqa: | Dîtina mexlûxa |
| Caiz: | Hemî tiştên ku li gorî dîn kirin û nekirina wan serbest e. |
| Cema‘etek muḥeqqîq: | Komek kesên ku bi hûrgulî li pêy heqîqetê digerin. |
| Cemad: | Tiştên ne candar ê wek kevir, ax, maden û… hwd. |
| Cemadat: | Cismên zuha hişk, tiştên ne ruhber |
| Cemala eḥedî: | Xweşkahî û sipehîya Xwedê Te‘ala |
| Cumhûrê‘aliman: | Giranîya ‘aliman |
| Dabel‘andin: | Daqurtandin |
| Deccal: | Li gorî rîwayetan ew kese ku wê di axrê zeman de bê û heq wek batil, batil wek heq nîşan bide û gelek însanan bibe ser delaletê |
| Delîlên yeqînî: | Delîlên ku şubhe tê de nîne |
| Eḥed: | Yekî bi tenê |
| Eḥkamul-Ḥakimîn: | Hakimê li ser ḥakima. |

Ebedî: Her heyî, bê dawî, ḥeta bi ḥetayî

Ecnas û efradê : Pirhejmarîya cins u ferda ye

Ef‘al: Fi’l û kirin, kar, şuxl

Ehle ‘ilmê ḥedîs: Pisporên ‘ilmê ḥedîsê

Ehlê ta‘etê: Kesên ‘abidê ku di îbadetê xwe da daîm û qaîm û ji Xwedayê xwe re serngun in.

Elfaz: Pirhejmarîya lefz û gotin û peyvan

Enwarê me’rîfetê: Ronahîyên naskirinê

Erwaḥ: Pirhejmariya ruḥ

Esẋer: Biçûk

Esmaul Ḥusna: Navên Xwedê Te‘ala yên herî xweşik

Esrarê ẋeybê: Sirrên ẋeybê.

Esrarê qelbîye: Sirrên ku di qelb de veşartî ne,ji teref xwedîye xwe ve nayên eşkerekirin.

Eşrefe mexlûqa: Qenctir û çêtirê hemî hebûna

Ewsaf: Pirhejmarîya wesfa

Ewwel: Yê pêşîn

Ezelî: Yê ku destpêk jê re nin e, her hebû, her heye

‘Ellemul ‘alimîn: Zanayê ji her kesî zanatir, ‘alimê ‘alima. Wesfekî Xwedê Te‘ala ye. Bi vî wesfê xwe Xwedê Te‘ala ‘alimê ‘alima ye. Bi her tiştî di zane. Hemû zanîn ji tecellîyatê vî wesfê wî ne.

‘Erş: Di ferhengan de bi mana tiştên bilind, herî tiştên ku heqîqeta wan bi tenê ji teref Xwedê Te‘ala ve tê zanîn, tebaqatê asîmanê nehemînê ku bê sînorîya qudreta Xweda herî bêtir li wir tecelli dike hatiye tarîfkirin. Di metnê Rehberê Sanî de bi mana tebaqatên asîmanan hatiye bikaranîn.

‘Esebîyet: Halê hêrsê, gelperwerîya neerênî, nîjadperestî, çi mafdar, çi ne mafdar di her ḥal û karî de parsatina qewm û eqreba û hîzba herî nêz.

| | |
|---|---|
| ‘Esirandin: | Ji bo derxistina ava mêweyan û çêkirina dimis guvaştina mêweyan. Ji ber vê yekê ye ku li hinek herêmên Kurdistanê ji cîhê çêkirina dimis re me’ser tê gotin. |
| ‘Etîd: | Navê milyaketekî ye ku guneh û sewabên însan dinvîse |
| ‘Ezilbûn: | Vekişandina ji wezîfê |
| Fehm: | Fam, têgihîştin, |
| Fenabûn: | Tunebûn |
| Firû’: | Tiştên ku di mijarekî de wek teferruat in, ne eslî ne. |
| Gera felekê: | ‘Alema ku seyyareyên asîman bi mîqdarê 360 dereceyî tê de digerin. |
| Gotinê mu’teber: | Peyvên ku meriv dikare pê ewle bibe û baweriiya xwe pê bîne. |
| Halê rimûz: | Bi ḥahlê ‘işaretê weya zimmen |
| Ḥebîbûllah: | Ḥeskiroxê Xwedê Te‘a. Mebest jê Hezretî Muḥemmed e |
| Hewa nefsê: | Daxwazên nefsî |
| Hîdayet: | Riya rast, fêmkirina rastiyê û teslîmîyeta jê re, rênîşanîya Xwedê Te‘ala û qebûlkirina emr û nehyên wî, tobekirina ji gunehan û pejirandina riya ta‘et ‘îbadetê. |
| Ḥades: | Tiştê ku di paş de ji teref Xweda ve hatiye tê xulqandin peyda dibe û derdikeve holê |
| Ḥedîsa qudsî: | Ew hedis in ku mana wan ji teref Xwedê Te‘ala ve wek îlham daketiye qelbê pêyẋember lakîn lefzê wân aîdê pêyẋember in |
| Ḥedîsa seḥîḥ: | Ew hedîs in ku bi wesîla rawîyên rastgo bi senedek qewî û zincîrek bê navbir hatine rîwayetkirin. Di seneda wan de tu xelel nînin, muwafiqê Quranê ne û tu qusûr di wan de nînin. |
| Ḥelal: | Hemî tiştên ku Xwedê Te‘ala destûra kirina wan daye û di kirin, bikaranîn, xwarin û vexwarina wan de ji hela dîn ve tu astengek nîne. |
| Ḥeqaîq: | Pirhejmarîya heqîqetê, rastî |

| | |
|---|---|
| Ḥeram: | Hemî tiştên ku Xwedê Te ‘ala destûra kirina wan nedaye û di kirin, bikaranîn, xwarin û vexwarina wan de ji hela dîn ve astengek heye. |
| Ḥesenet: | Xêr û qencî, ‘emelê qenc, kirinên baş, |
| Ḥîkmet: | Zanîn, zanîstî, naskirina Xweda a bi heqîqî, wehîy, hereketa li gor rêbazên eql û ferasetê, dûrnasî, tiştên ku însan ji kirinên cahilî bi dûr dixe û bi bal başiyê ve dikşîne, fehm û îdraqa di fêmkirinê de, qabiliyeta biryardayîna rast, hereketa li gor emr û nehyên İlahî, delîlên bê şek û şubhe, mebest û feyda bikaranîna emra û bikarneanîna nehya. |
| Ḥuccet: | Delîl |
| İḥya: | Nûvejandin û jîndarkirin |
| İ’dama ḥewadîsan: | Mirina hemî tiştên ku paşê hatine xuliqandin |
| İ’tiqad: | Bawerî |
| İfna: | Fenakirin, tunekirin, |
| İfrat: | Jiḥedderketin, hereketa bê wezn, di warê dîn de meşa li gor xweserîyê ne li gor wezna Quran û Sunnetê |
| İlmûllah: | Zanîna Xwedê Te‘ala |
| İmana muqelîdî: | Bê delil û lêkolin bawerîya bi kesekî, di warê dîn de bê delil û lêkolin bawerîya bi muctehîdekî û meşa li gor rêbazên wî |
| İmate: | Kuştin, jiholêrakirin |
| İnbat: | Hêşînkirina nebatata |
| İnkişaf: | Vebûn, derketina meydanê, pêşveçûn, zanîna sirrên veşartî |
| İradetullah: | İrada Xwedê Te‘ala |
| İsmeta melaîketa: | Bêgunehîya melaîketa |
| İsti’malkirin: | Bikaranîn |
| İşraq: | Ronîkirin û derketina rojê |

| | |
|---|---|
| İxlas: | Semîmîyet, ḥeskirina ji can û dil, di her hal û karî de lêgerîna li riza Xwedê Te‘al |
| İzhar: | Derxistina holê, aşîkar kirin |
| İztirar: | Bêçarî û mecbûrîyet. |
| ‘Ilmê ‘eqîdê: | Zanistiya di warê bawerîyê de |
| ‘Ilmê fiqhê: | Zanistiya di derheqê îbadet, muamelat û hukm û ehkamên jiyana li gor İslamê de |
| ‘Ilmê tewḥîdê: | Zanistiya di derheqê yekîtîya Xwedê de. |
| ‘İbad: | Pirhejmarîya ‘evda ye |
| ‘İtab: | Şermezarkirin, gazin û lome |
| Kaîbet: | Navê deveya Salih pêxember e. |
| Kebîr: | Mezin. |
| Kelam: | Tekelum, peyv, gotin, xeberdan. |
| Kemalîyet: | Mukemmelîyet, kamilbûn, kemilîn. |
| Kemiyet: | Pirhejmarî an jî kêmhejmarîya bê wesf û sifet |
| Keramet: | Ḥalê xarîquladeyê ku bi destûra Xwedê Te‘ala ji welîyan peyda dibe. |
| Kesafet: | Tîr, şêlû. |
| Keyfîyet: | Qelîte, mukemelîyeta bi wesf û ewsafan |
| Kezab: | Derewkar |
| Kufra serîḥ: | Kufra aşîkar. |
| Kursî: | Cîhê bilindê bo rûniştinê, di camîya de cîhê we’z û nesîhetê melayan, di medresa de cîhê rûniştandina muderrîs, meqamê manewî, tebeqeyek asîmana di ‘erşê de |
| Lewḥ ul-meḥfûz: | Ew kitêba li nêk Xwedê Te‘ala ye ku teqdîra Xwedê Te‘ala a di derheqê temmamê mexluqatan de tê de qeydkiriye bes eqlê însan nikare heqîqeta wê îdraq bike. |

| | |
|---|---|
| Leyletul Qedr: | Şeva Qedrê ku Quran tê de dahatiye. |
| Li kullî ḥal: | Di her hal û karî de. |
| Lîqa: | Leqa, dîtin. |
| Luẋat: | Ferheng. |
| Meḥbûb: | Yê kut ê ḥeskirin. |
| Me’wûl: | Te’wîlkirî. |
| Mebde’ : | Destpêk. |
| Meded: | İmdad û alîkarî. |
| Melekul mewt: | Melkemot, ezraîl, |
| Memnû’ : | Menkirin, Tiştê ku tê qedexekirin |
| Menhiyat: | Hemî tiştên ku li gorî şer‘etê ḥeram in. |
| Meqsûd: | Mexsed. |
| Meratib: | Pirhejmarîya merteba ye. |
| Merteba ‘alî: | Mertebeya herî bilind. |
| Merzîyatê îlahî: | Tiştên ku bi razîbûna Xwedê Te‘ala ne. |
| Metlûb: | Teleb, daxwaz |
| Mîzan: | Mêzîn, terazî, hukmê ku heq û batil ji hev vediqetîn e, terazîya ku li axretê xêr û gunehê însana di pîve. Ev peyv di Rehberê Sanî de wek “aletê ku ‘emelê qenc û xerab pê tê weznandin” hatiye tarîfkirin |
| Muḥsîn: | Yê îhsan dike, camêr. |
| Mu’cîzat: | Pirhejmarîya mûcîzeyan. Mûcîze ew xarîquladet in ku ji teref pêxemberan ve bi destûra Xwedê Te‘ala pêk tên. Wek qelişîna behrê ji hezretî Musa re, Hatina deveê ji hezretî Salih re, dahatina Quranê ji hezretî Muḥemmed re… hwd. |
| Mubaleẋe: | Mezinkirin |
| Mubteda: | Destpêk, Qismê yekemînê hevokê ku fail di xwe de di ḥewîne. |

Mumteni’: Tiştê ku pêkhatina wî ne mimkûn e.

Munacat: Du‘a.

Munewer: Tiştê ku bi nûrê hatiye xemilandin. Di Rehberê Sanî de bi vê manê hatiye bikaranîn. Bes di ferhenga de ji bil vê manê wek kesê ‘alim, zana, rewşenbîr jî hatiye tarîfkirin.

Munkîr: Kesê derewdêrandox

Munteha: Cîhê dawîya dawî.

Muqteda: Yê li pêş diçe û tê şopandin, pêşîva

Murîd: Yê ku îrade dike û dixwaze.

Musteqbelê mute‘aqib: Pêşiya ku wê di dora xwe de bê.

Muşahed: Dîtin, şahidi.

Muşahede: Dîtin û sêrkirina bi çav.

Muşerefbûn: Bi şerefbûn.

Muşrîk: Kesên ku şirîka ji Xwedê Te‘ala re çêdikin.

Mutabe’et: Tabîbûn.

Mute‘ellîq: Têkilda, ‘eleqedar.

Muteceddîd: Tiştê ku kevne û tê nûkirin,

Muteceddîdê me’lûm: Tiştê nûkirîyê ku tê zanîn.

Mutecedîdê wehmî: Tiştê nûkirîyê ku tê zeenkirin.

Mutekelîm: Yê ku di peyive.

Mutî’: İta‘etkar.

Muxeyyer: Ji halekî veguherîna bi bal halekî dî ve.

Nehin: Nîninin.

Neqandin: Pejirandin, hilbijartin.

Nezm: Peyv û nivîsa bi kêş û qafiye.

Nûn ji bo cem‘ê ye: Ḥerfa nûn ji bo pir hejmaîyê ye.

Nuzûl: İnzal, daketin.

Pare ê napar: Tiştê ku îdî hew perçe dibe.

Qadir: Yê Xwedî hêz û quwwet û qudret.

Qaîmê bi zatê xwe: Yê ku bi xwe û ji xwe di mîne. Mayîna wî bi wesîla tişta nîne.

Qeḥr: ẋezeba.

Qelem: Pênûs.

Qewlê raci': Peyva ku şayanî pejirandinê ye.

Qiraet: Xwendin.

Rebbê kaînatê: Terbîyedarê kaînatê

Rîsalet: Wezîfa pêyxemberîyê.

Rubûbîyet: Rebtî, terbîyedarî.

Rucu': Vegerîn.

Sailê ẋeybanî: Kesê ku ji nedîtî ve pirsa di dipirse.

Sani'ê ḥekîm: Hunermendê ku her kare wî bi ḥîkmet e.

Seẋîr: Biçûk.

Selefê saliḥîn: Pêşîvan û rehberên muslumana ê ewilîn.

Semed: Wesfekî Xwedê Te'alaye. Mana wî ewe ku Xwedê Te'ala bi tu hawayî hewcedarê tu kesî nîne herkes û her tişt muḥtacê wî ne.

Senem: Pût

Seyîat: Pirhejmarîya guneh û neqencîyan

Seyr û sulûk: Ev termek tesewûfî ye. Wek riya pijîn û kemalandina di oğrira terîqetê de hatiye tarîfkirin. Di vê rê de hinek cewr û cefa û eziyet hene.

Sîdretul Munteha: Li gorî rîwayetan tebaqatê ḥeftaemînê asîman e. Ḥezretî pêyxember di vî mmeqamî de bi Xweda re xeber daye.

Sifat: Wesf.

Sirrê qurbîyetê: Sirrê nêzikbûnê

| | |
|---|---|
| Şamil: | Di xwe de ḥewandin, rapêçan. |
| Şemail: | Exlaq, edeb, şekl û şemalê hezretî pêxember. |
| Şemûs: | Nerihet. |
| Şerî‘et: | Qanûn, nîzam, temmamî ḥukm û eḥkamên İslamê |
| Şirût: | Pirhejmariya şertê ye. |
| Te‘elîq: | Girêdan û zeliqandina bi tiştekî ve |
| Teḥrîr: | Şîrove. |
| Te’lîf: | Ew berheme ku ji teref kesek mu‘eyyen ve bi awayek taybet tê afirandin. |
| Te’wîl: | Şîrovekirin, aşîkarkirina manayên ne aşîkar. |
| Te’zîm: | Nîşandana ḥurmetê |
| Tebdil: | Veguherîn |
| Tekelum: | Xeberdan. |
| Tekwîn: | Xuliqandin, afirandin, wesfekî Xweda ye. |
| Teltîf: | İltîfat. |
| Tenfîz: | İnfaz, bicîhanîn. |
| Tesdîq: | Rastdêrandin. |
| Tesewûf: | Di warê fêmkirin û ji jiyana İslamî de ew rê ye ku îbadet û zuhdê derdixe pêş. Di vê rê de zuhd, teqwa, pêgirtina bi murşîdekî, seyr û sulûk û… h.w.d. esa in. |
| Tiştê qebî’h: | Tiştên pîs û nebaş |
| Tiştên xerîqul ‘adet: | Tiştên ji ‘adetê derê ne li gor carîadeta kewnî |
| Turzîq: | Ê ku rizq dide. |
| Tuxlîq: | Ê ku di xulqîne. |
| ‘Ulûmên Quranê: | ‘İlmên Qur‘anê. |
| ‘Umur : | Pirhejmarîya kar û şuxl e. |

| | |
|---|---|
| ‘Urûc : | Hilkişîna bi bal jor ve |
| Wacib: | Tiştên ku kirina wan mecbûrî ye |
| Wacibul wicûd: | Yê ku hebûna wî ji wî ye û bo hebûna xwe muhtacî kesî nîne. |
| Waqi’bûn: | Pêkhatin. |
| Weḥdanîyet: | Yekîtî. |
| Welayet: | Dostanî, wekalet, ḥeskirin. |
| Xatîme: | Dawî |
| Xefî: | Veşarî. |
| Xelel: | Kêmasî, noqsanî, xeletî. |
| Xîlaf tê heye: | Li ser nîqaş heye. |
| Ẋeyb : | Hemî tiştên ku bi çav nayên dîtin, bi eql û hîssîyatan agahî di derheqê wan de nayê peydekirin, bûyerên pêşerojê ê ku hê pêk nehatine û… hwd |
| Zatê ‘elî: | Yê paweberz û bala. |
| Zî şi’ûr: | Hemi tiştên xwedî eql. |

**PÊVEK 2.**

**Hevpeyivîna Bi ‘Edussamed Yalçin Re**

S. Malbata Seyda ji kune û çewa hatine Amedê?

B. Malbata seyda ji hêla Qulpê ya ku niha navçeya Diyarbekir e. Ji qebîla Hevêda ji gundê Hacana ne. Pêşiyên wan ji Hacana hatine Barava, erdê ku niha gundê Qoẋî û ‘İsepar li ser in bicîh bûne û gundê Qoẋî û ‘Îsepar jî wan avakirine. Du bira bûne, erda li hev parê kirine. ‘İsepar ji kalanê Sêyda re dikeve. Nufûsa wan a fermî niha li ser ‘Îsepar e bes naçin ‘Îsepar, li Qoẋî dimînin.

S. Gelo di malbatê de kevneşopiya xwendinê heye an na? Eger hebe hun dikarin ji kerema xwe hinek agahîyan bi me re parve bikin

B. Di malbatê de kevneşopiya xwendinê heye. Bavê diya Seyda Seydayê Mela Resûl ‘alimekî gelek mezin bû, dersa Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî û birayê wiyê mezin Şêx Muḥemmed Can daye. Bavê seyda Mela Yûsuf mela bû. Lawên seyda jî hemû mela ne. Sê ḥeb ji wan ji medresan derketine. Torinên seyda jî keç û law tev medrese xwendine û hê jî dixwînin.

S. Gelo seyda li ku û li cem kê xwendiye? İcaza xwe ji kê wergirtiye?

B. Seyda li cem Mela M. Şerîfê Bêkendê, Mela Mihemmed Şerîfê ‘Erebkendî, Mela İbrahîmê Bellê, Mela Yasînê Şemê (Yusrî), Mela Se‘îdê Taxikî xwendiye. İcaza xwe ji Mela (şêx) Mûhemmedê ‘Erebkendî sitendiye

S. Seydayên Seyda ê herî meşhûr kî ne

B. Yên herî meşhûr Mela Yasînê Yusrî (Şemê) û Mela Mûhemmed Şerîfê ‘Erebkendî ne.

S. Seyda Bavek çewa bû?

B. Seyda bi zarokan re zarok bû. Digot: “Hûn zarokê xwe yê ewil bi terbiye rakin, yên dû wî jî wê wek wî rabin.” Jiyana wî temamen sunnet û şerî’et bû. Tişkî dema bikirana mutleqa di şerîetê de cihê wê hebû. Ḥelal û ḥeram zêde dîqqet dikir û di malê de jî dabû rûniştandin. Xwarinek dema biketa erdê û necis bibûna ne dihişt zarok têxin devê xwe û bixun. Di xwarin, vexwarin, rabûn, rûniştinê de ji biçûkan ḥeta bi mezinan li gorî adaban dida kirin. Ne ji ḥeramiyan tenê ji mekrûhan jî di parêzand. Li gorî temenê

zarokan eḥkamên şer’î biwan dida kirin. Zemanê xwe tu carî bi kêf û lîstikê derbas ne dikir. Daîm bi teftêşa ‘ilmî re meş ẋul bû. Ne bi ‘ilmên dînî tenê bi yên fennî ji di xwest zarokên wî pêşde herin. Rojevê di şopand û jê hayîdar bû.

S. Seyda Mamostekî çawa bû.

B. Bê feqî sebra wî nedihat. Gerek îlleh ders bidana. Hinek demên ku fetret tên ḥesibandin.  xaric, wekî din ji dema ku îcaze stendibû ḥeta salên wiyê paşî yek dido be jî feqiyên wî hebûn. Li hember feqiyan bi şefqet bû. Dersa ku dida gerek feqî fêm bikirana. Ji bo fêm bike gelek diber dida. Ger feqî ne ê fêmkirinê bûna wî ji wê kitêbê dizivirand kitêbeke berjêrtir.

Me’lûme gelekbûna feqiyan û dersdana feqîyên ku kitêbên wan li jorin meziyet û meznayî ye ji bo seydayekî. Ḥeta hinek feqîyên ku heq nakin li ba hinek muderrisan îcazê jî distînin. Bes kêfa Seyda ji şuhretê re ne dihat. Li gora sewiya feqiyan ders dida wan. Feqîkî kitêbên jor dixwîne û ne di sewiya kitêba xwe de be, kêmtir be wî ji wê kitêbê dizivirand kitêbeke jêrtir. Ji hinik feqiyan re jî digot “tu ji xwedinê re nabî, here ji xwe re karkî din bike, zemanê xwe beyhûde di medresan de derbas neke”. Ji ber van usûlên wî gelek cara feqiyan xwe li Seyda ne digirtin. Belkî dîsa ji ber van usûlên wî dayina îcazê nebû qismet jê re.

Ji bo dersdana feqiyan tu carî teftêşên xweyê ‘ilmî terk nekir. Di ber dersan re nivîsên xwe jî dikir. Ji bo ku ehemmiyet dida nivîsandinê eẋleb heftê de pênc rojan ders dida. Me’lûme di medreseyan de jiẋeyrî înê şeş rojên din ders heye. Rojên xweyên din yên te’tîlê jî hemî bi teftêş/lêkolîn û nivîsan derbas dikir. Ku melan rihet îcazeta didan li hember wan bû û digot gerek ji bo şuhretê îcazet neyê dayîn. Ji bo ku nebe şohret îcazet neda zarwê xwe jî.

S. Usûla Seyda a di medresê de çewa bû.

B. Usûla Seyda usûla klasik bû. Yek bi yek dersa feqiya dida. Hinekî ku dersê wan nêzî hevbûna jî wan dikir hevalders. Di dersdayinê de ‘îbaret yek yek dixwend û me’ne dikir. Hinek nuqteyên muşkil piştî îzah dikir û pê ve bi feqî dida tekrarkirin. Ehemmiyet dida ezberkirina metna, ne dixwest metnên ne ezberkirî têkevin serhev. Piştî feqî hat sewiyekî pê ve Seyda wî serbest berdida, di metn û xwendina dersê de zor ne didaya. Gelek mele dersa ku wê bidin rojkê berya dersê wê dersê mutale dikin. Bes Seyda ji ber teftêşa ‘ilmî mutale nedikir. Ev jî dibû sebebê ku feqî xwe lê negrin.

S. Seyda Di medresa xwe de kîjan kîtab dida xwendin.

CEWAB: Kitêbên rêzê dida xwendin. Bes li gora sewiya feqiyan hinik kitêban diguhert, di dewsa kitêbên rêzê de hinkî din dida xwendin. Yan jî digel wan dida xwendin. Mesela di bedêla Şerhul-Qitra İbnî Hîşam de Şuzûruz-Zeheb dida xwendin. Feqiyê ku dixwendin jî gelek kêfa wan jê re dihat, di ‘ecibandin. Çimkî cami’tir e. Di wê demê de hayê gelek muderrisan ji vê kitêbê tune bû. Di fiqhê deẋayet, Umdetus-Salik û Mînhac dida xwendin. Gelek muderrisan Sa’dullah Gewre û Netaic didan xwendin, bes Seyda vana nedida xwendin.

Ji kitêbên piştî Camiyê kêfa wî gelek ji Muxteserê re dihat. Kitêbên piştî Camiyê meriv kare bêje hemiya dida xwendin. Di gel wan hinik rîsalên ku wî telîf kiribûn dida xwendin. Wek Errîsaletul- Ḥilmiyye fîl-qewa’îdil-wed’îyye û metnê mentiq û munazerê, îstî’are. Van rîsala nehatine çapkirin. Gelek muderrisan ji Cem‘ul-Cewami’ê teberruken dersek yan dido didan xwendin û dev jê ber didan. Bes Seyda digot: “Cem‘ul-cewami’ kitêbeke gelek bi fêde ye” û dixwest hemî bide.

Ji usûlê ḥedîsê Dawudê Qersî dida xwendin. Dixwest ku Sozlera Ustad Bediuzzeman bi ders were xwendin û hinik ders daye jî.

S. Keda Seyda a li ser edebîyata kilasik çewa bû?

B. Keda wî bi Şerha Mem û Zînê destpêkiriye. Şerha Mem û Zînê di sî saliya xwe de hê xortbû temamkiriye. Bi tertîbkirina Dîwana Cami’ xebatên wî dewam kirine. Dîwana Cami’ bi carkê re ne qedandiye. Bi xebatên xweyên ‘ilmî re qesîde jî dicivand. Ji melayên hemdemê xwe û kesên ‘eleqedar bi edebiyata Kurdî dipirsî “filan qesîde” yan jî “filan dîwan li cem te heye yan na?” Yan jî “çi qesîde li cem te hene?” Bi vî şeklî bi sala xebitî, merev kare bêje belkî zêdeyî deh sala xebata bi vî şeklî dewamkir.

Piştî vana Rehberê ‘Ewam Şerha Nehcul-Enam a Seydayê Mela Xelîlê Sêrtî, Rehberê Sanî Şerha ‘Eqîda Şêx Eḥmedê Xanî telîf kir. Di sala 1983 m. de van herdû telîfên xwe çap kir. Dema ku van telîfa çêdikir xebatên wiyên li ser Diwana cam’i jî dewam dikir.

Pişt re Gulzara Hemûkan Şerha Nûbihara Biçûkan çêkiriye. Tevî telîf û nivîsandina ji bo çapkirinê sê sala bi vê berhema biçûk re meş ẋûlbûye.

Dûv re şerha mewlûda Bateyî çêkiriye. Telîfa wê qedand lê ‘umrê wî têr nekir ku binvîse û çapbike.

S. Gelo Seyda bi sebeb çapkirina kitêbên xwe ket hebsê an na?

B. Tucar neketiye hepsê. Bes piştî ku Fethul-Celîla Seydayê Mela Huseynê Kiçik li ser me’fuwatên Seydayê Mela Xelîlê Sêrtî çapkır, Qereqola Bismil wî gazî îfadê kir, çû îfade da.

S. Orjînlatiya berhemên Seyda çine

CEWAB: ji nivîsê ḥeta me’ne û muhtewiyatê hemî cîhetên berhemên Seyda orjînal in. Xassên bi wî ve ne. Seyda berhemên xwe hemî bi destê xwe, bi xettê xweyê orjînal nivîsandiye. Xettatên meşhûr dibêjin: “Xettê wî ne di wezna xettê me de ye, xettê wîẋerîb e bes gelek şêrîne.” Seyda ji nivîsandin û xett gelek zewq distend. Jê ne ‘aciz dibû ne jî dibetilî.

Di muhtewayên berhemên xwe de tiştê gotiye merev kare bêje di dereca heqqulyeqînê de ne. ‘Iilmê wî ne ‘îbaretê ji zanebûn û dîtinê bitenê ye, bizzat di nav wan de maye û serpêhatyên wî ne. Dema şerha Mem û Zînê nivîsand ji‘eşqa mecazî derbasî eşqa İlahî bû. Xwe hinda dikir, bi roja Mem û Zîn, qesîdên Cezerî û Mewlûda Bateyî dixwend û digiriya. Bi hemî cismê der û dorê xwe re diaxivî. Ji haletên beşerî der diket. Bi Sozler a Ustad Bedîuzzeman hat ser hişê xwe.

Hemî berhemên Seyda ‘ılmî ne, di tesîra tesewifê de ne. Seyda tu carî ji tesewifê dûr neketiye. Şerha Mem û Zînê kitêbeke gelek ‘ilmiye. Munasebetên di navbêna xulqiyeta beşer, kaînat û ‘eşqê de li ber xwendevan radixe. Seyda mutesewwif bû bes ne mutesewwifekî mute’essib bû. Gelek melayên hemdemê wî û hevalên wî îctîhadên Îbnî Teymiye qebûl nedikirin, bes Seyda di berhemên xwe de ji İbnû Teymiye neqla tîne.

Di şerhkirina Mem û Zîn, Mewlûda Bateyî, Nûbihar, Nehculenam û ‘Eqîda Xanî de ê yekemin e. Beriye Seyda kesî dî van berheman şerh nekiriye.

S. Eleqa Seyda bi teswûfê re çewa bû? İntisaba wî bi terîqek re hebû an na?

B. Seyda kesekî mutesewwif bû. Mensûbê terîqeta Neqşebendî bû. Ḥeta beriya wefata xwe bi çend sala mensûbê seydayê xwe şêxê ‘Erebkendê bû. Pişt re jî întisabî Şêx ‘Izzeddînê Xeznewî kir. Digot ku merev întîsabî murşidekî neke ne tişkî qenc e.

S.Seyda hevaljînek çewa bû?

C. Seyda mudaxele bi karê pîreka û nav malê nedikir.

S. Di nav malê de Seyda ji bo te'lîma zarwê xwe çi dikir?

B. Cewaba vê sewalê qismek di jor de derbas bû. Zarok dema dihatin heddê temyîzê ji elibêtkê ders dida wan. Wan hînî heramî û ḥelalî dikir. Wan bi qencî û neqenciyê di ḥisand. Di rabûn û rûniştina wan de û di her haletê wan de berê wan dida qencî û tiştên şer'î. Ku dibûn ḥefta salî wan hînî limêjê dikir. Esasên 'eqîdê ji bo zaroka şîfahî bi wan dida hînkirin û ezberkirin. Keda wiya herî mezin parastin bû. Zaroka ji tiştêẋeyrî meşrû', fuhşiyat, heramî û neqenciyan diparast. Piştî ku bûn bîrbir û pêve dixwest ku zarok bi zanebûna xwe riya xwe bibîne, zorê ne dida wan. Bes dersa 'ilmê 'erebî dida wan, yan jî wan dişand medresan. Di hedefa wî de hînbûna zarwê wî 'ilmê 'erebî hebû. Rîsala Wed'ê, Rîsala İstî'arê, Rîsala Mentiqê û Rîsala Munazerê esas ji bo zarwê xwe telîf kiriye. Tesrîfa Mela Elî çapkirî tune bû ji bo zarwê xwe nivîsand. Metnê Unmûzecê û metnê Şurzûruz-Zehebê jî wisa. Ewî van metnan di seha 'ilmê 'erebî de muhîm didît bes bi sebeb ku çapkirî tunebûn ji ber şerhên wan wan nivîsand û da ezberkirin.

S. Çend zarwê Seyda îro bi xwendin û Te'lîmê ve meş ẋul in

B. Çar zarwê wî bi xwendinê meşẋûlin: Mele 'Ebdulquddûs, Mele 'Ebdussamed, Mele Şerif û Mele Mehdî. Ji vana Ebdulquddûs û Mele Mehdî bi te'lîma feqiyan ve meş ẋûlin.

## PÊVEK 3.

### Hevpeyivîna Bi Mele Celal Bozdaş Re

P. Gelo Eḥmed Ḥîlmî el-Qoẋî kesek çewa bû?

B. Bismîllahîrreḥmanîrreḥîm, el ḥemdû Lîllahî Rebbîl ‘Alemîn, wesselatû wesselamû ‘ela Seyyîdîna Muḥammedîn ee ‘’ela alihî we seḥbîhî wessellem.

Pêxember ‘eleyhîsselat û wesselam kerem dike dibêje: “Alim warisê pêxembera ne.” Seyda yê Mela Eḥmed, yek ji wan ‘alima bû ku me’na vê hedîsê fêm kiribû û xwe dabû ber vî barî.

Min Seyda, bîst sal beriya wefata wî naskir. Seyda, heqîqeten, hem ehlê ‘ilmê bû, hem ehlê tesewwifê bû, hem ehlê teqwayê bû, hem ehlê îrşadê bû. Yanî; wesfê ku divê di ‘alimekî de hebin, min kullîyen di Seydayê Mela Eḥmed de dîtin.

P. Hûn dikarin di derheqê şexsiyeta wî a ‘ilmî de çi bêjin?

B. Seyda, me’lûme di ‘ilmên İslamî de mucaz bû. Seyda, di tevî ‘ilman de xeberdar bû. Lê belê Seyda, xisûsen di ‘ilmên ku herkes muhtace de, di ‘ilmê hal, yanî; ew halê ku însan tê de ye çi ‘ilm jê re lazim e di wê ‘ilmê de pêşketî bû.

Cehalet, ji xwe felaket e. Şa’irekî wisa dibêje: “Her tişt tişteke, (‘efû bikin) heya bi rêxê jî tiştek e, lê belê cehalet ne tu tiştek e.” Seyda, dixwest ku însan ji cehaletê xilasbibin. Dema emr û nehyekî pêk bînin hukmê wan bizanibin. Ji ber vê yekê Seyda, her çiqas di tevî ‘ilman de muderris be jî pirtir li ser Fiqhê disekinî. Lewra dema însan fiqha dînê xwe nizanibe, ew însan nikare dînê xwe bi rihetî bajo. Seyda, ji ber vê yekê “Hedîyet-ul Ḥebîb” bi kurmancî nivîsand da ku her kes fêm bike. Yanî; bi zimanê diya xwe bizanibe çi jê re helal û çi jî jê re heram e, ji ber ku pirê însanan bi ‘erebî nizanîbûn, bi Kurmancî nivîsand. Ji bo ku millet karibe bi zimanê xwe dînê xwe hîn bibe. Ne ji devê xelqê, ji kîtaba hîn bibin. Lewra ‘ilmê ji kîtaba tê xwendin pirtir di hişê yekî de dimîne. Seyda, di heman demî de şa’ir û edîb bû, lê belê di wan de muxatabê wî ‘alim bûnn. Lakîn muxatabê Seyda, di Fiqhê de ‘ewam bûn.

P. Uslûbê dersdayîna wî çawa bû?

B. Me’lûme uslûba medresê, prensîbê wî li gor ‘aliman diguherin. Seyda jî bi piranî li ser fêma feqî disekinî bê ka feqî dersa xwe fêm kiriye an na. Ez şahid bûme ku

çend cara bi feqiyên xwe dida tekrarkirin, an jî pê dida xwendin. Dema feqî di cihekî deẋeletî bikirana pê dida tekrarkirin.

P. Kîjan dersan dida xwendin?

B. Me'lûme, ciyê wî medrese bû, Fiqih jî, Tefsîr jî û Nehûw jî hebû.Di tevî ‘ilman de dixweste feqiyê xwe fêr bike. Mesela, hinek medrese hene ku zêdeyî Neḥw û Serfê nedidan feqiyan, lê belê Seyda ne wisa bû dersa Hedîs, Tefsîr, Fiqihê jî dida û Nehw û Serfê jî dida. Belê Serf û Nehw divê bê dayîn, lê belê feqî dema dersên wek Tefsîr, Hedîs û Fiqhê nebîne, di van ‘ilman de kêm dimîne. Dema van dersan di medreseyan de bên xwendin, meraqa feqiyan jî li ser van ‘ilman çêdibe. Di medresa Seyda de temamê ‘ilman wek hev bûn, di teva de ders dida.

P. Têkilî û haletê rûhî ya navbera Seyda û feqiyên wî çawa bû?

B. Seyda, bi qasî ku min nas kiriye, bi biçûkan re biçûk û bi mezinan re mezin bû. Seyda, tu demî mesafe nedixiste navbeyna xwe û feqiyên xwe. Seyda, ewqas ḥez ji feqî dikir û wê rehetiyê didayê ku feqî karibû bi rehetî tiştekî ji Seyda pirs bike. Di medreseyên din de meriv pirsekî ji Seyda bikirana di ya duduyan de meriv te'zîr dikirin. Lê li ba Seyda, ev tişt tunebû. Pênc cara jî feqî ji bo fêmkirina xwe ji Seyda pirs bikirana, Seyda ‘aciz nedibû, belkî hê kêfxweştir dibû.

P. Di derbarê şexsiyeta Seyda a tesewwifî de hûn dikarin çi bêjin?

B. Tesewwif, mîsala tirî ye. Di tirî de qalik, dendik û şîre heye. Yê ku te'm dixe tirî şîre ye. Qalik, wê şîreyê muḥafeze dike, dendik jî toximê wê ye. Feqet esil şîre ye. Tesewwif jî di dîn de wek şîre ye. Yanî; dînekî safî derdixe meydanê. Yanî, dînekî ji mexlûtetî (tevlîheviyê) dûr derdixe.

Tesewwif, ew e ku ne tenê meriv xwe ji ḥeramiyê biparêze belkî ji bo meriv nekeve heramiyekê xwe ji hinek helalan jî biparêze. Seyda, beḥsa Seydayê xwe dikir û digot:“ Seydayê Mela Muhammedê ‘Erepkendê (Xweda wî bi rehma xwe şa bike. Min jî carekî wî dîtibû)heqîqeten li gor şêxên herêma me, min Seydayê Mela Muhammedê ‘Erepkendê cuda didît. Lewra tu tevlîbûna wî bi dinyayê re nînbû. Xaniyê wî kerpîç bû, li ser tejikê rûdinişt, Seydayê Mela Muhammed, ji bilî ser çoka kesî nedîtiye bi hawaki dine, mesela çarmêrkî rûniştiye. Ji xwe murîdê wî jî ji sedî not û neh mela bûn.”

İja Seydayê Mela Eḥmed jî yek ji wan bû. Feqet ferqeka Seyda hebû, ew jî ew bû ku, ew tesewwifa ku pê şerî’et di pêş de neçe û derneyê meydanê kêm didît. Yanî digot: Divê tesewwif bibe alîkar ku pê şerî’et were meydanê. Dema ku Tesewwif bi tenê di tekyê de bimîne û gel pê neḥese ew tesewwif kêm dimîne. Tesewwif, nayê wê me’neyê ku meriv xwe têxe koşeyekê û navbera xwe û Xweda bi tenê çêke. Gava berê min go: “’Alim warisê pêxembera ne.” Vêca li gor vê hedîsê ‘alim divê vî dînî êdî ji însanan re bibêjin. Yanî ji tekyê derxin û têkevin nava xelkê. Seyda, di vir de dixwest ku tesewwifê hê pirtir bi rûh bike. Seyda, dixwest safiyeta îxlas û heqîqeta tesewwifê derxe rastê û însan bibe ehil. Di vê xisûsê de di navbera tesewwifa ku îro belavbûyîye û a Seyda de ferq heye. Ji ber vê yekê vê paşiyê hinek navbera Seyda û ehlê Tesewwifê vebû. Seyda, nêrîna wî gelek fireh bû, razî nedibû ku ehlê tesewwifê di tekya de zikrên xwe bikin û civak bi bal agir ve here.

P. Gelo Seyda şairek çewa bû?

B. Di vî derbarî de zêde zanîna min nîn e. Lê Seyda, ‘aşiqê İslamê bû. Ji xwe yekî ku aşiqê İslamê be van tiştan tevî di hundirê wî tiştî de ne. Mesela Şa’irtiya Seyda, ji ‘aşiqtiya İslamê dihat. Heger ‘aşiqê dîn nînbûna şev û rojê xwe di ber dîn de nedida. ‘Eşq, însan sewqê tiştan dike, heger ku ‘eşq nîn be, meriv bixwaze tiştna bike jî, meriv nikare bike, dema meriv bike jî dawîya wî meriv nayne.

P. Seyda bi çi awayî teşwîqa ‘ilmê dikir û xebatên wî yên di vî derbarî de di çi derecê de bûn?

B. Me’lûme Seyda, muderris bû. Seyda, dixwest ku ehlê ‘ilmê zêde bibin. Seyda, dizanîbû ku bi ‘ilmê nîn be ev dîn li piya namîne. Lewra, *Seyda hem mudderristî dikir, hem dinivîsand, hem digot, hem dida hînkirin.*

Seyda, qîmeta ‘ilmê zanîbû. Lewra ‘ilim, rûh dide însan. Seyda, şev û rojê wî bi ‘ilmê re derbas dibû. Wextê wî, ya diçû medresê yan jî li malê kitêb dinivîsand. Zanîbû ku ‘ilim nîn be însan cahil dimîne û însanê cahil jî ne dinya û ne jî axreta wî dimîne. Mesela, temamê zarokên xwe dida ber ‘ilmê, eviya delil e ku Seyda pir qîmet daye ‘ilmê ku zarokên xwe tev kirine mela. Mesela zarokên melayên din tev di mektebên din de tehsîl dîtine, feqet zarokê Seyda, Seyda wan teva kiriye mela. Dema meriv tiştekî baş bêje, divê di serî de meriv bike ku xelk zanibe ew tişt baş e. Seyda, di fi’iliyata xwe de vê nîşan da.

Dinya di çavê wî de çewa bû, hûn dikarin li ser zuhda wî çi bêjin?

Gava dinê min beḥsa zuhda Seydayê wî kir. Min go: “Di xaniyekî kerpîç de bû, ḥetanî wefat kir.” Seyda, hevalên wî gelek dinya wan xweş bû, heger ku Seyda li pey dinyayê biketina wê ji wan pirtir dinyayê bi dest bixistana. Lewra hem ‘alim û hem zana bû. Lê belê Seyda, zanibû ku dinya ḥeya ciyekî ji meriv re lazim e. Ji wî ciyî wir ve ji meriv re dibe bar. Seyda, zêde qîmet nedida dinyayê. Rojekî ji bo birakî xwe em bûn talibê keçika wî. Go: “Hûn ser çava re hatine, min keçikê da we.” Min go: “Seyda, ma qey tu mesref hûn ji me naxwazin?” Wî jî go: *“Birayê min, em Musulman in û Xweda Rezzaq e. Madem ev zewac sunneteke Resûlûllah e û em vê sunnetê îhya dikin, eviya bi mal îhya nabe. Xweda Rezzaq e û wê rizqê wan jî bide. Heger ku lawik ji xwe re tiştekî dikire dikire, nakire ez jê re tiştekî nabêjim.”* Ha! Di vê ‘esra me de, gelek însan me dîtin, gelek mela û şêx, yan, wan kesên ku diçin de’wa merivantiyê li wan dikin, bi hêsanî nikarin ji bin wî barî rabin. Seyda, bi vê gotinê bi tenê go: “Fatîhakî bixweyne.” Yanî yek dîrhemekî jî teleba tiştekî nekir. Ev delîl bes e û pêdivî bi tu peyveke dinê nîn e. Xaniyê ku Seyda tê de dima hê jî li meydanê ye bi kerpîça bû. Seyda, bi çavê rêwîyekî li dinyayê dinihêrt. Kirinên wî li rastê ne, ne gotinên wî.

P. Di heyata Seyda de, di mesela dunyewî de gelek tengasî derbas bûn. Mesela gelek însanan perê wî dixwarin. Yanî; pere jê bi deyn distendin û digotin emê filan wextî bidin. Belê dema mî‘adê wî dihat nedidan. Bi vî awayî gelek mal û perên wî çûn winda bûn. Piştî ku bû melayê bi qadro jî me‘aş distend, belê ew perê wî çawa dihat diçû ji hinekên din re. Di vê derbarê de hinekên ku wî nas dikin, digotin: “Sersar bû, bi dû malê xwe nediket.” Hinek dibêjin: “Pirî ku xwe bi kitêban ve berdabû, bûbû tiryakiyê kitêban û nikaribû bi tiştnê dinve mijûl bibe.” Hûn vêya bi çi ve girêdidin?

B. Van herdû gotina jî ez qebûl nakim. Seyda, ji bona ku bi rehm bû, hez ji qenciyê dikir û dixwest ku başiyê bike Seyda, wê wezîfa xwe bi cih dianî. Xelkê perê wî nedidanê, ne ku Seyda ji sersarîtî an jî ji meşẋûliyetê li pey nediket, Seyda zanibû ku wî kiriye ji bona Xweda kiriye, ew tiştê ku ji bonî Xweda hatibe kirin li ba Xweda winda nabe. Heger bi dû wan pera ketina wê biketina xirecirê. İca dema ku ‘alimek bi hinek însanên din re xirecirê bike gelek însan wê sûê zenn bikin. Yanî wê bejin: “Ev însanê hanê ji bo dinya xwe bi însanên din re pev diçe.” Seyda, dizanibû ku wan kirinên wan însanan li ba wan namîne, wê Xweda ji wan bipirse. Dibe ku Seyda wan ‘efû jî kiribe.

Lê Seyda, nedixwest ku di navbeyna xelkê de ji bo dinyayê dengê xwe derxe. Lewra îcraata Seyda li rastê bû, tevlî ku melayê bi me’aş bû, di gund de mulkê wî hebû, tevî ku melatiya fexrî kiribû, heger ku seyda bi dû malê dinyê ketina wê serwetekî di pişt xwe de bihêştina. Hûn jî dizanin di zemanê berê de melayên fexrî zekatê, fitra dixwarin, lê Seyda vê yekê nedikir. Ji ber ku nêrîna Seyda li dunyayê cuda bû ev yek dibû.

P. Seyda teqrîben deh sal beriya dawiya ‘umrê xwe nav di xelkê de bi teqwa xwe meşhûr bûbû, gelo teqwa Seyda çawa bû?

B. Xwedê Te‘ala, wesfê teqwayê dide û dibê: “Qencê we li ba min însanê bi teqwa ye.” Gava din me beḥsa tesewwifê kir, di heqîqetê de tesewwif û teqwa gelek nêzî hev in. Seyda jî zanibû xilasî di teqwayê de ye, ḥezkirina Xweda di teqwayê de ye. Van tiştan tev bi hev û din re girêdayîne. Qîmet nedayîna dinyayê, tunebuna kibrê, rehm û… hwd vana ji xwe tev wesfê merivên mutteqîne. Van wesfan di kê de bin ji xwe wê bi teqwayê bigre. Seyda dema di sûkê de derbas dibû, belkî nizanibû kî di berda diçû. Serê xwe bilind nedikir li der û dorê xwe nedinêrt. Edeba Îslamê jî ev e. İro em rî’ayet nakin, lê Seyda rî’ayet dikir. Seyda, dema diçû camiyê jî di nava sikakan de diçû camiyê. Digel ku rêya wî di sûkê de derbas dibû jî ew ji bo çavê wî bi heramiyekî nekeve, di nava sikakan de diçû. Geleka digotin: “Di ber me de derbas dibe û silavê li me nake.” Vêca Seyda, ji ber ku li der û dorê xwe nedinihêrt wan însanan nedidît. Ne ji ber tiştekî wisa dikir, ji teqwa wî bû. An na însanekî weke Seyda xwedî teqwa û mutesewwif digel hedîsa Pêxemberê me di derbarê selamê de çawa bê selam derbas bibe. Sebebê vê yekê ew bû ku Seyda li ber lingê xwe dinihêrt û dimeşiya.

P. Hûn qe tevlî sohbet û we’zên wî bûn, gelo çawa we’z dikir?

B. Belê, ez şahidê hinek sohbetên wî bûm. Seyda, wek hinek xetîban kelîmê xwe dirêj nedikir û ne dixemland. Di çarçowa ayet û hedîsan de, li gorî ku însan fêm bikin, di çarçowa şîretê de, di çarçowa ku ew însan jê îstîfade bikin, di wê çarçoweyê de ji însanan re sohbet dikir. Mesela çend ciya em bi hev dû re çûne, sohbet kiriye, bi dengekî normal we’z dikir.Seyda, belê sohbetên wî li ser ayet û hedîsan bû, lê belê di çarçoweya ‘esrê de îzahata dikir. Seyda, ayet û hedîsan li gor zemanê me tefsîr dikir, weke ku muxatebê ayetê însanên di dema me de ne. Xelkê, bi rehetî gotinên Seyda fêm dikirin. Ji ayet û ḥedîsan jî mîsal dianî, ji ehlê tesewwifê jî mîsal dianî.

P. Gelo Seyda, ji kîjan ‘aliman neqil dikir yan jî mîsal dianî?

B. Seyda, alime kî wisa bû ku ‘esra xwe naskiribû. *Zanibû ku ev ‘ilm yê ‘esrekê nîne. Dibe ku di ‘esrekî de ev ‘ilm hatibe lê belê însan her dem û dewrî de muhtacê ‘ilmê ye.* Mesela tefsîrekî ku pêncsed sal berê hatiye nivîsandin, wî mufessirî li gorî şertê wî zemanî tefsîr kiriye. Lê belê ‘alimên vê demê li gor vî zemanî tefsîr kirine. Heger ku li gor tefsîrên berê tefsîr bikin, cewaba hinek pirsgirêkan wê neyê rastê. ‘Alimên wek, Îbnî Teymîyye, Seyyîd Qutub, Ḥesen El Benna, di medreseyên ku me tê de dixwendin Seydayên me kitêbên ‘esrî qebûl nedikirin. Digotin: Tiştên nû ne. Ḥal bi ewḥale divê ev dîn timî nû bimîne. Dîn ji xwe nû ye, lê belê me xwe nû nekiriye. Ji ber ku me xwe nû nekiriye, em dibên qey divê dîn di qalikekî de be û jê dernekeve derve. Lê belê Seyda, ne wisa bû. Seyda, ji İbnî Teymîyye jî dianî ji Ḥesen El Benna jî dianî, ji Seyyîd Qutub jî dianî, ji ehlê tesewwifê jî dianî. Ji gelek mufessirên cûr e cûr delîlan dianî. Seyda, mesela ji Şî’a, ji İmam Ce’ferê Sadiq mîsala dianî. Di civaka me de wisa bibû ku, hema bê gotin Şî’a weke kuẋeyrî Muslîm bin dihat fêmê. Seyda, di vî derbarî de ufqa wî zehf fireh bû.

P. Me’lûme di zemanê me de ji ber ku fêmberiya cema’etbûn û ummetbûnê bi paş de ketiye, gelek seyda û meşayîxên me munferîd mane. Her Seydayekî mensûbê şêxekî ye û murşîdekî wî heye. Nêrîna Seyda li murşîdan û girêdana yekî bi murşid re divê çawa be bi çi awayî bû?

B. Rojekî em li Paloyê bûn, melayekî di derheqê Şêxan de gotinekî got. Seyda, vegeriya û jê re go: “Tuẋeletî. Murşîdê Kamil, di İslamê de ji her kesî re bi Fêdeye. Heger ku her ‘alimî wezîfa xwe bi cih baniya û dînê İslamê ji herkesî ra bigotina ma ev civak dikete vî halî? Bi ‘eynî şeklî ehlê tesewwifê jî wisa ye. Tesewwifê jî, hinek însanan li gor menfî’et û rewşa xwe teẋyîr û tebdîl kirine û ji însanan re bi awayekî dinê dibêjin. Feqet ev nayê wê me’nê ku temamê murşîdan di vî halî de ne.” Mîsal ji Seydayê Mela Muhammed ‘Erepkendî anî û go: “Dibe ku fikrên me di hinek mijaran de ji hev cudane, lê belê Seyda murşîdek kamil e, lewra di çarçowa Quran û Sunnetê de hereket dike. Ev zat ez şahid bû me, ez li balê mezin bû me, min wî naskiriye ku ew murşîdek kamil bû ye.” Seyda, ehlê tesewwifê bû, lê belê li hember kî bû? Li hember wan kesên ku tesewwifê ji xwe re bi awayê aletî bikardianîn bû. Seyda, murşîda teqdîr dikir. Lewra wan murşîdan gelek bûne wesîle ji bona hîdayeta însanan.

P. Nêrîna Seyda, li hereketên İslamî û di vê çarçowê de li İnqîlaba İslamî a İranê çawa bû?

B. Seyda, ‘alimê zemanê xwe bû û zeman xwendibû. Ji ber ku zemanê xwe xwendibû, divê ji pirsgirêkên zeman re cewab bihatina dayîn. Digel ku sunnî jî bûn, hinek ‘alimên ‘esrî Seydayên me nedihiştin em kitêbên wan bibin medresê. Lê belê Seyda zeman naskiribû, a rasttir ku ‘ilim naskiribû. İran înqîlabek İslamî kiribû. Eviya dinyayê qebûl dikir, eviya ji İslamê re ‘îzzetekî dida nîşandan. Seyda, viya teqdîr dikir. Mesela Îmamê Ce’ferê Sadiq, digel ku seydayê İmamê E’zem e, em bi fetwayê İmamê E’zem ‘emel dikin, em bi yê Ce’ferê Sadiq ‘emel nakin. Seyda, dibê eviya tezat e. Seyda di mesela Şî’î û Sunnî de jî dibê, dîn İslam e, kîtaba me Quran e, Pêxemberê me Muhammed ‘Eleyhîsselat û Wesselam e, Qîbla me teva yeke, evana tev yek in, ev mezheb jî teferrû’atin, evana nakevin pêşiya dînê me. Seyda, bi vî şeklî li mezheba dinihêrt. Seyda tu ferqî nedixist navbera wan, digot: Em Musulman in. Digo: Bila herkes mezhebê xwe bajo. Weke ku Ustad dibê: “Heqqê yekî heye ku bê je a min heq e, lê heqê yekî nîne ku bêje ji ya min pê ve tu heq nîne.” Seyda, bi vî awayî li İnqilabê jî baş dinihêrt. Seyda, yekî wisa bû ku meriv bi rehetî dikare wî ji xwe re bike rehber.

P. Li ser sebra Seyda jî em dixwazin xeberdin, hinek însan dibêjin bêhna wî pir teng bû û ‘eynî dîsa wan kesan dibêjin gelek sebirkêş bû. Eviya nabe tenaqud?

B. Na! Sebra wî li ser heqîqetê gelek pir bû, feqet li hember neheqiyê jî hişk bû, qebûl nedikir. Ji ber ku neheqî qebûl nedikir, sert dihate xwiya kirin. Wekî din ehlê sebr û teqwayê bû. Lê belê li hember neheqiyê ji ber ku sikût nedikir û li hember radibû û digo: “Bila çênebe!” Hineka digo: Tebî’etê wî hişk e.

P. Seyda hê di feqîtiya xwe de dest bi xettatiyê kiriye û heya wefat kiriye jî bi xet ve meşẋûl bû. Ev xettatiya wî di nav hevalên wî de mezîyetekî wî yê zêde bû. Hûn xetê Seyda çawa dibînin?

B. Ne ku fêm kirina me, lê bi şahidiya temamê ‘aliman Seyda xettat bû. Weke Seyda, di herêma me de kêm xettat hebûn, belkî ez dikarim bêjim tunebûn jî.

P. Seyda kitêbê xwe yê ku xîtabê ‘imûmê dikin bi Kurdî telîf kiriye. Di nav kitêbên xwe de Şerha Mem û Zînê bi ‘Erebî çêkiriye. Vê paşiyê “Rehberê ‘Ewam”, “Rehberê Sanî” û “Gulzara Hemûkan şerha Nûbiharê” çêkir. Dîsa “Şerha Mewlûdê” çêkiriye ew nehatiye tebi’ kirin. “Hedyet-ul Hebîb” çêkir û “Dîwana Cami’” cemi’ kir.

Dema ku van kitêba dinivîsand, mesela dema dest bi “Rehberê ‘Ewam” kir, belkî mesela Kurdîtiyê ne wek îro di rojevê de bû, dibe ku milliyetperwerî piçkî hebû, lê belê di nav civakê de ne wek îro bû. Dema ku wî dest bi telîfên Kurdî kir telîfatên Kurdî gelek hindik bûn û her kitêb li her derê peyde nedibûn. Ev telîfatên xwey ku bi Kurdî dinivîsand hûn bi çi ve girêdidin?

B. Birayê min! Vêga dîqqet bikin Allah Te’ala ji her qewmekî re ji wan Pêxember şandiye. Ji bo çi? Ji bo ku ew pêxember bi halê wan dizane. Yanî; hev û dî nas dikin. Te dî dibê merivê têr halê merivê birçî nizane. Feqet merivê birçî halê merivê birçî dizane. Seyda, di nav Gelê Kurd  de bû û halê Kurda wî ji herkesî bêtir zanibû. Ji her kesî bêtir wan nasdikir. Herkes dixwaze ku ji qewmê xwe re fêda wî bêtir be. Te dî Xweda Te’ala di Quranê de dibêje: “Gelî yên ku îman anîne! Xwe û ehlê xwe ji agir biparêzin...” Yanî; pêşî dibê xwe û pey re jî dibê ehlê xwe... Tu di nava civakekî de bî û tu ji wê civakê re xizmet nekî û tu herî ji civakekî din re xizmet bikî bi min eviya ne karê ‘aqil e. Tu di nava vê civakê de rabûyî, tu nanê vê civakê dixwî û tu di nava vê civakê de dijî û diçî ji xelkê din re kar dikî. *Seyda, di nava vê civakê de bû, zanibû ev civak bi vî zimanî xeber dide û encex bi vî zimanî fêm dike. Seyda, bi Kurdî dinivîsand, da ku ev civak jê îstîfade bike.* Heger bi ‘Erebî binivîsandina, ji bilî ‘aliman kesî wê jê îstîfade nekirana. Heger bi Tirkî binivîsandina, wê demê pirê vê civakê bi Tirkî nizanîbû. Seyda, jî bi Tirkî nizanîbû. Heger tu dixwazî ji wê civakê re xizmet bikî divê tu bi zimanê wan binivîsînî. Gava dinê we beḥsa milliyetê kir, yanî ev memleket ji hezar salî û wir de jî Kurd bûn. Mela jî di vê ferqî de bûn, mela beḥsa milleyetê dikirin lê belê di çarçowa İslamê de beḥsa milleyetê dikirin. Xelq, beḥsa milleyetê dike, ji çarçowa Îslamê derdixe.Dema Seyda, van telîfata çêkir, telîfên bi Kurdî hindik bûn. Lê belê vêga hinek însan weke ku van ‘aliman qet haya wan ji vî milletî tunebûye, qet xweyîtî li vî milletî nekirine, qet nexwestine ku fêde bidin vî milletî. Wisa didin nîşandan. Vana nêrînênẋelet in. Ji berê de jî di medresên me de ders bi Kurdî bûn.

P. Di derbarê têkiliyên wî yên bi civakê re hûn dikarin tiştekî bêjin?

B. Minasebeta wî bi ‘aliman re gelek baş bû. Min hinek hevalên wî dî ye, heya ku ji dergahê derneketibû derva herkesî wesfê wî dida. Ewqas mela bû, ewqas baş bû. Lê belê dema hinek fikrên wî guherîn, di wir de hineka nexweş dinihêrtin li Seyda. Temamê hevalên wî yên tesewwifê pesnê wî didan. Tiştê ku min dî jî, ‘eleqayê wî bi


xortan re gelek baş bû. Bi însanên ku ne li hember İslamê ne re, kî dibe bila bibe helîm bû. Lê ku hinek li hember dînê Xweda bûna, li wê derê hilma wî diqediya. Di wê derê de vêcaẋîreta wî dikete fe'eliyetê.

Gotina we ya dawî çi ye di vê derbarê de?

Xweda Te'ala cehd û xebata ku nesîbê wan 'alima kiribû nesîbê me jî bike. Di wê rêya Heq ku ew têde meşiyabûn me jî tê de bimeşîne. Lingê me jî li ser vê de'wa heq sabit bigre. Û wan ji bo me bike rehber û rêzan. Xweda 'alimên wek Seyda zêde bike. Da ku ji civaka İslamî re bi fayde bin û berê civaka Îslamî bidin dînê Xweda û ji binê vê zilletê derxin

**PÊVEK 4.**

**Ji Metnê Orjinalê Rehberê Sanî Serrûpel, Rûpela Pêşîn Û Ya Dawî**



كتاب

رهبر ثانى

تاليف

احمد حلمى القوغى الدياربكرى الاشعرى عقيدةً

غفرالله له ولوالديه آمين

شرحا

عقيدا شيخ احمد بن الياس الخانى

طيب الله ثراه وجعل الجنة مثواه آمين

(1)

# كتاب

# رهبر ثاني

تاليف

احمد حلمي القوغي الدياربكري الاشعري عقيدة

غفر الله له ولوالديه آمين

شرحا

عقيداً اشيخ احمد بن الياس الخاني

طيب الله ثراه وجعل الجنة مثواه آمين

١٧٥ دبی وان علی صاحب ذو الفقار ‖ سواری لدلدل شهی نا مدار
تفوق لسر بی دما بی هیه ‖ بمعنا براى رسول میه
١٧٧ شفاعت دکن انبیا اولیا ‖ باذنا خدى بو کسى اشقیا
١٧٨ دغیب و حضورى دعایان اثر ‖ دبیتن ژبو را آیا با خبر
١٧٩ بفعلى دقنج دا نکى منتى ‖ بفضلا خدى دى بچی جنتى
١٨١ بهشت و جهنم هنه فى دمى ‖ فنا نابن و نا چنه عدمى
١٨٣ یقین دى ببیتن دیوما قیام ‖ حسابا حلالى عذابا حرام
١٨٤ ژبو اهل خیرا ن نجات و رضا ‖ ژبو اهل شرا ن عقاب و جزا
دقبرى دبیتن ژ خلق مرى ‖ سؤالا نکیرى دگل منکرى
١٨٦ دحشرى ترازى و میزان هیه ‖ خرابى و قنجى و کیشان هیه
١٨٨ صراط او پرا پر بخوف و خطر ‖ جمیع خلا ئق دکن لى گذر
١٩٠ جهنم دبن دا و جنت لپیش ‖ لسر وى الهی تو دستم بکیش
وگر نه ازى مجرمى بد عمل ‖ دزانم کو دى بیته پی من زلل
بذنب و قصورى دمن تو نکى ‖ دگل من باحسان و لطفا خوه کى
من و جمله ئ امتا مصطفى ‖ ببی جنتی تابع مصطفى

تم

**PÊVEK 5. Wêneyek Eḥmed Ḥîlmî el-Qoxî**



1

# JÎNENÎGARÎ

Cevdet Karaman di sala 1973yan de Gundê Qemeran (Arslanbeylî,) navçeya Solaxa hatiye dinê. Mekteba ewil li Solaxa, mekteba navîn li Bingolê, lîse jî li bajarê İzmîr xwend. Ji Zanîngeha Anadolê beşa Îktîsadê di sala 2000î de mezun bû. Nuha li Bîngolê wek teknîsyenê laboratuwarê di xebite.

Di lîseyê de dest bi xebatên li ser zimanê Kurdî kir. Xebatên wî yên muxtelîf di kovara *Kelha Amed, Nûbîhar, Nûpelda* de hatine weşandin. Çar berhemên wî yên neçapkirî hene ku yek jê helbest e.

**ÖZGEÇMİŞ**

Cevdet Karaman 1973 yılında Solhan içesinin Arslanbeylî (Qemeran) köyünde dünyaya geldi. İlkokulu Solhan, Ortaokulu Bingöl, liseyi İzmir’de okudu. 2000 ylılında Anadolu Üniversitesi İktîsat Fakultesinden mezun oldu. Bingöl de laboratuvar teknisyeni olarak çalışmaktadır.

Lise yıllarında Kürtçe yazmaya başladı. Muhtelif çalışmaları Kelha Amed, Nûbihar ve Nûpelda isimli dergilerde yayınlandı. Biri şiir olmak üzere yayımlanmamış dört kitap çalışması bulunmaktadır**.**